

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



KÜRT (KURMANCİ) ŞİİRİNDE HAİKU POETİKASI



YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Mazlum SABAZ

DANIŞMAN
Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

VAN-2025

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



POETÎKAYA HAÎKÛYÊ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE



TEZA LÎSANS A BİLİND

AMEDEKAR
Mazlum SABAZ

ŞÊWİRMEND
Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Wan-2025

KABUL VE ONAY SAYFASI

Mazlum SABAZ tarafından hazırlanan “POETİKAYA HAİKÛYÊ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE ” adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.	
Danışman: Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı/Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi. Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.	
Başkan : Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı/Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi. Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.	
Üye : Doç. Dr. İlyas SUVAĞCI Türk Dili Bölüm Başkanlığı/Hakkari Üniversitesi. Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.	
Üye : Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YILDIRIMÇAKAR Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı/Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi. Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum.	
Tez Savunma Tarihi:	14/08/2025
Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum. Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü	

ETİK BEYAN

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

Bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

19/09/2025

Mazlum SABAZ

Teza Lîsansa Bilind
Mazlum SABAZ

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Tebax – 2025

**POETÎKAYA HAÎKÛYÊ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE
KURTE**

Helbesta japonî haîkû, wekî cureya helbesta herî kin a cîhanê tê zanîn. Haîkû/hokkû, di sedsala 17an de ji hêla Matsuo Başôyî ve wekî helbesteka serbixwe hatîye kirin û ji aliyê Masaoka Shiki ve jî di dawîya sedsala 19an de poetîka haîkûyê bi awayekî modern hatîye destnîşankirin. Haîkû di destpêka sedsala 20an de, di helbesta Rojavayê de hatîye nasîn û bi taybetî jî piştî nîveka sedsala 20an, di nav wêjeya cîhanê de cihe xwe girtîye. Cureya helbesta haîkû ji salên 2000î vir ve di helbesta kurdî ya nûjen de tê nivîsîn û bi zêdebûna haîkûnûsên kurd û berhemên wan re cihê xwe her ku diçe di nav wêjeya kurdî de jî digire. Ev tez, li gor poetîkaya haîkûyê li ser vekolîna pênc berhemên haîkû yên bi kurdî (kurmancî); *Haikuya* (2020) Berken Bereh, *Morana Gerdûnêya* (2017) Kawa Nemir, *Dengê Pepûkêya* (2020) Ulku Bîngol, *Gumbila* (2022) Sidîq Gorîcan û *Sîhrên Mizewrana* (2022) Ergîn Sertemî disekine. Vekolîn li ser kêşeya berhemên haîkû yên bi kurdî (kurmancî) yên ku bûne mijara xebatê û herweha haîkûnûsên wan bê ka çawa poetîkaya haîkûyê bi kar anîne û nêzîkbûne, hatîye avakirin. Heta niha di qada wêjeya kurdî (kurmancî) de derheqê poetîkaya haîkûyê û rengvedana wê ya li ser helbesta kurdî (kurmancî) de xebateka berfireh nehatîye kirin. Xebat armanc dike ku vê kêmasîyê temam bike, valahîyê dagire û tevkarîyê li lêkolînên helbesta kurdî bike. Ev xebat, wekî rêbaz her pênc berhemên ji aliyê rûxsar (teşe) û naverokî (tematîk) ve analîz dike. Di vê çarçoveyê de, wekî teorîk jêderkên haîkûyê û poetîkaya haîkûyê ji bo vekolîna mijara bingeîn hatîye amajekirin. Di encama vekolînê de hatîye destnîşankirin ku haîkûnûsên her pênc berhemên li gel hevparîyên xwe poetîkaya haîkûyê li gor ziman û şewazên xwe yên helbestî, gerdûna haîkûyên xwe çê kirine. Herweha xasyetên hunera helbesta haîkû yên klasîk û modern di berhemên de bi kar anîne, kirasê çandî û helbestî yên kurdî li helbesta japonî haîkûyê kirine. Ev xebat, derbarê vekolîna haîkûnûsên kurd û berhemên wan de dê bibe nimûneyek û herweha ji bona vekolînên li ser poetîkaya haîkûyê, semantîka çandî û wêjeya berawirdî dê lêkolîneran teşwîq bike.

Bêjeyên Sereke : Poetîkaya Haikûyê, Helbesta Kurdî, Bereh, Morana Gerdûnê, Gumbil.

Hejmara Rûpelan : XI+222

Şêwirmend : Prof. Dr. Abdulhadi TÎMURTAŞ

Yüksek Lisans Tezi
Mazlum SABAZ

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Ağustos – 2025

KÜRT (KURMANCI) ŞİİRİNDE HAİKU POETİKASI

ÖZET

Japon şiiri haiku, dünyanın en kısa şiiri olarak bilinir. Haiku/hokku, 17. yüzyılda Matsuo Bashō tarafından bağımsız bir şiir haline getirilmiş ve haiku poetikası 19. yüzyılın sonlarında Masaoka Shiki tarafından modern bir özellik kazanmıştır. Haiku, 20. yüzyılın başlarında Batı şiirine girmiş ve özellikle 20. yüzyılın ikinci yarısından sonra dünya edebiyatında yerini almıştır. Haiku şiir türü, 2000'li yıllardan itibaren modern Kürt şiirinde yazılmaya başlanmış olup Kürt haiku şairleri ve eserlerinin artmasıyla birlikte haiku, Kürt edebiyatında da giderek daha fazla yer edinmektedir. Bu tez, haiku poetikasına göre Berken Bereh'in *Haiku* (2020), Kawa Nemir'in *Morana Gerdûnê* (2017), Ulku Bîngol'ün *Dengê Pepûkê* (2020), Sîdîq Gorîcan'ın *Gumbil* (2022) ve Ergîn Sertem'in *Sîhrên Mizewran* (2022) adlı Kürtçe (Kurmanci) haiku eserlerinin analizine odaklanmaktadır. İnceleme, çalışmanın konusu olan Kürtçe (Kurmanci) haiku eserlerinin ve haiku şairlerinin haiku poetikasını nasıl kullandıkları ve ele aldıkları sorunu üzerine kurulmuştur. Şimdiye kadar Kürt (Kurmanci) edebiyatı alanında haiku poetikası hakkında ve onun Kürt (Kurmanci) şiirine olan yansıması üzerine kapsamlı bir çalışma yapılmamıştır. Çalışma, bu eksikliği tamamlamayı, boşluğu doldurmayı ve Kürt şiiri araştırmalarına katkıda bulunmayı amaçlamaktadır. Bu çalışma, yöntem olarak beş eseri biçimsel ve içeriksel (tematik) açıdan incelemektedir. Bu bağlamda, ana konuyu analiz etmek için teorik bir çerçeve olarak haikunun beslendiği kaynaklar ve haiku poetikası belirlenmiştir. Çalışmanın sonucu, beş haiku şairinin ortak noktalarının yanı sıra kendi şiir dil ve üsluplarına göre haikularını, haiku dünyalarını oluşturduklarını göstermektedir. Ayrıca, eserlerinde klasik ve modern haiku şiirinin özelliklerini kullanmışlar ve Japon haiku şiirine Kürt şiirinin, kültürünün özelliklerini kazandırmışlardır. Bu çalışma, Kürt haiku şairlerinin ve eserlerinin incelenmesine dair bir örnek teşkil eder ve aynı zamanda araştırmacıları haiku poetikası, kültürel semantik ve karşılaştırmalı edebiyat alanlarında araştırma yapmaya teşvik eder.

Anahtar Kelimeler : Haiku poetikası, Kürt şiiri, Bereh, Morana Gerdûnê, Gumbil.

Sayfa Sayısı : XI+222

Tez Danışmanı : Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

M.Sc. Thesis
Mazlum SABAZ

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNİVERSİTESİ
İNSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
August – 2025

HAIKU POETICS IN KURDISH (KURMANJI) POETRY

ABSTRACT

Japanese haiku poetry is known as the world's shortest form of poetry. Haiku/hokku was established as an independent poetic form by Matsuo Bashō in the 17th century, and haiku poetics gained a modern character in the late 19th century through Masaoka Shiki. Haiku entered Western poetry in the early 20th century and has taken its place in world literature, particularly since the second half of the 20th century. The haiku poetry form began to be written in modern Kurdish poetry in the 2000s, and with the increase in Kurdish haiku poets and their works, haiku is gradually gaining more ground in Kurdish literature. This thesis examines Berken Bereh's *Haiku* (2020), Kawa Nemir's *Morana Gerdûnê* (2017), Ulku Bîngol's *Dengê Pepûkê* (2020), Sidîq Gorîcan's *Gumbil* (2022), and Ergîn Sertem's *Sîhrên Mizewran* (2022). The study is based on the question of how the Kurdish (Kurmanji) haiku works and haiku poets, which are the subject of the study, use and approach haiku poetics. So far, no comprehensive study has been conducted on haiku poetics and its reflection in the field of Kurdish (Kurmanji) literature and in the Kurdish (Kurmanji) poetry. The study aims to fill this gap and contribute to Kurdish poetry research. Methodologically, this study examines five works from a formal and thematic (content) perspective. In this context, the sources that haiku and haiku poetics draws upon have been identified as a theoretical framework for analysing the main topic. The result of the study shows that five haiku poets have created their own haiku worlds based on their shared characteristics as well as their own poetic language and styles. Furthermore, they have utilised the characteristics of classical and modern haiku poetry in their works and have incorporated the characteristics of Kurdish poetry and culture into Japanese haiku poetry. This study serves as an example for the examination of Kurdish haiku poets and their works and also encourages researchers to conduct research in the fields of haiku poetics, cultural semantics and comparative literature.

Keywords : Haiku poetics, Kurdish poetry, Bereh, Morana Gerdûnê, Gumbil.

Quantity of Page : XI+222

Supervizor : Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	X
PÊŞGOTIN	XI
DESTPÊK	1
A. Geşedana Têgiha Poetîkayê Di Wêjeya Cîhanê De.....	1
B. Helbesta Japonî û Poetîkaya Haîkûyê.....	5
C. Haîkû Di Wêjeya Cîhanê De	8
1. NÎHON Û HAÎKÛ	11
1.1. Nîhon	11
1.1.1. Erdnîgarî	11
1.1.2. Dîrok	13
1.1.3. Civak.....	17
1.1.4. Çand	20
1.1.5. Dîn û Bawerî.....	34
1.1.5.1. Şîntoîzm	35
1.1.5.2. Taoîzm.....	37
1.1.5.3. Konfiçyanîzm.....	38
1.1.5.4. Bûdîzm	40
1.1.5.4.1. Zen Bûdîzm/Bûdîzma Zenê.....	43
1.1.6. Ziman û Nivîs	49
1.1.7. Wêje	52
1.2. Haîkû	60
1.2.1. Geşedana Dîrokî ya Haîkûyê	60
1.2.1.1. Matsuo Bashō û Haîkû	64
1.2.1.2. Masaoka Shîkî û Haîkû	67
1.2.2. Taybetîyên Wê yên Teşeyî	70
1.2.3. Taybetîyên Wê yên Naverokî	76

1.2.4. Rêbaz û Hêmanên Wê.....	80
1.2.4.1. Kîgo.....	80
1.2.4.2. Kirejî	83
1.2.4.3. Torîawase	84
1.2.4.4. Sketch/Şaseî	85
2. HAÎKÛ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE.....	88
2.1. Haiku	91
2.1.1. Vekolîna Teşeyî	92
2.1.1.1. Teşeya Ristesazî	93
2.1.1.2. Kirejî	95
2.1.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî	96
2.1.2. Vekolîna Tematîk	99
2.1.2.1. Gerdûn û Sirûşt	99
2.1.2.2. Demsal	102
2.1.2.3. Zeman û Mekan.....	106
2.1.2.4. Civak û Mirov	110
2.1.2.5. Lîrîzm û Pathos	112
2.1.2.6. Ajel û Riwek	113
2.2. Morana Gerdûnê.....	117
2.2.1. Vekolîna Teşeyî	119
2.2.1.1. Teşeya Ristesazî	119
2.2.1.2. Kirejî	120
2.2.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî	121
2.2.2. Vekolîna Tematîk	123
2.2.2.1. Gerdûn û Sirûşt	123
2.2.2.2. Demsal	125
2.2.2.3. Zeman û Mekan.....	128
2.2.2.4. Civak û Mirov	132
2.2.2.5. Lîrîzm û Pathos	135
2.2.2.6. Ajel û Riwek	137
2.3. Dengê Pepûkê.....	140
2.3.1. Vekolîna Teşeyî	141

2.3.1.1. Teşeya Ristesazî	141
2.3.1.2. Kirejî	142
2.3.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî	142
2.3.2. Vekolîna Tematîk	143
2.3.2.1. Gerdûn û Sirûşt	143
2.3.2.2. Demsal	144
2.3.2.3. Zeman û Mekan.....	146
2.3.2.4. Civak û Mirov	148
2.3.2.5. Lîrîzm û Pathos	149
2.3.2.6. Ajel û Riwek	150
2.4. Gumbil.....	152
2.4.1. Vekolîna Teşeyî	153
2.4.1.1. Teşeya Ristesazî	153
2.4.1.2. Kirejî	154
2.4.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî	155
2.4.2. Vekolîna Tematîk	157
2.4.2.1. Gupik bi Gupik Haîkû.....	157
2.4.2.2. Çîrok bi Çîrok Haîkû.....	166
2.4.2.3. Nav bi Nav Haîkû.....	170
2.4.2.4. Xêz bi Xêz Haîkû	171
2.4.2.5. Demsal bi Demsal Haîkû	175
2.5. Sihrên Mizewran	177
2.5.1. Vekolîna Teşeyî	179
2.5.1.1. Teşeya Ristesazî	179
2.5.1.2. Kirejî	182
2.5.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî	183
2.5.2. Vekolîna Tematîk	185
2.5.2.1. Zivistan.....	185
2.5.2.2. Bihar	189
2.5.2.3. Havîn	193
2.5.2.4. Payîz.....	196
2.5.2.5. Fêrîkî	201

2.6. Berawirdineka Giştî Di Navbera Pênc Berhem û Haîkûnûsan De	208
ENCAM	211
JÊDER	215
ÖZGEÇMİŞ	0



KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
B.a.b.	: Bo agahîyên berfirehtir
ber.	: berhevkar
bnr.	: binêrin
BZ	: Berî Zayînê
ç.	: çap
ç.	: çêkirin
d.t.	: dîrok tune
d.x.	: dîroka xwegihanê
ed.	: edîtor
hwd.	: her wekî din
j.	: japonî
m.	: mirin
Nzk	: Nêzîkî
PZ	: Piştî Zayînê
r.	: rûpel
ss.	: sedsal
url.	: girêkên înternetê
wer.	: wergêr

PÊŞGOTIN

Haîkû, ji wêje, çand û jîyana japonan hatîye guvaştin û parzûnkirin. Matsuo Bashō, estetîk û feraseta mînimâlîst a japonî, zerafeta helbesta japonî ya nerîtî, kêlîyên dîmenên sirûştê, satoriya medîtatîf a zenê di haîkûyê de pevgihandiye û haîkûyê kiriye parçeyek ji helbestê. Helbesta japonî haîkû, zêdetirî sedsal in di nav wêjeya cîhanê de û zêdetirî bîst sal in jî di nav wêjeya kurdî de belav bûye.

Poetîkaya haîkûyê zêdetirî sedsal in bala helbestvan, nivîskar, ramangêr, xwîner, rexnegirên wêjeyê û lêkolîneran kişandiye/dikişîne. Haîkûya ku di nav helbesta kurdî de ji alîyê haîkûnûsan ve êdî wekî helbesteka xwemalî tê dîtin, hêjayî xebatekê bû. Di warê lêkolînên wêjeya kurdî de hindikahîya lêkolînên ku derheqê haîkûnûs û berhemên wan ên haîkûyî de hatî kirin, berê me da vê xebatê. Bi kurdî ji bilî çend nivîsên ku di înternet û kovaran de hatine nivîsîn, derbarê poetîkaya haîkûyê, haîkûnûsên kurd û haîkûyên bi kurdî (kurmancî) de bi awayekî zanistî, birêkûpêk û berfireh nehatine kirin. Me xwest ku haîkûyê bi her awayî hem di qada zanistê de û hem jî di warê helbesta kurdî de bidin nasîn. Ji ber ku ev janreka nû ya ku di helbesta kurdî de şax vedaye, hewceyî lêkolînekê bû.

Mijara vê xebatê “Poetîkaya Haîkûyê Di Helbesta Kurdî (Kurmancî) De” ye ku me pênc berhemên haîkû yên bi kurdî (kurmancî): *Haikuya* (2020) Berken Bereh, *Morana Gerdûnêya* (2017) Kawa Nemir, *Dengê Pepûkêya* (2020) Ulku Bîngol, *Gumbila* (2022) Sidîq Gorîcan û *Sîhrên Mizewrana* (2022) Ergîn Sertemî ji xebata xwe re dîyar kirin. Bi tevahî pênc berhem li gor poetîkaya haîkûyê ji alîyê teşe (rûxsar) û tematîk (naveroke) ve hatine vekolînkirin. Ev xebat armanc dike ku li gel ravekirina poetîkaya haîkûyê, ji hêla teşe û tematîkê ve li ser pênc berhemên haîkû yên bi kurdî (kurmancî) analîz bike. Herweha derheqê haîkûnûsên wan berheman de jî dahûrîn dike ku bê ka bi çi awayî nêzîkî poetîkaya haîkûyê bûne, li gor rêbaz û hêmanên haîkûyê û li gor şeweyên xwe haîkûyên bi kurdî çawa vehonandin e. Bi vî awayî xebata me di warê zanistên wêjeya kurdî hem ji bo derbarê danasîna poetîkaya haîkûyê de dibe gavek, hem jî ji bona vekolîna berhemên haîkûyên kurdî û haîkûnûsên kurd dibe nimûneyek. Bi vî awayî kesên wekî lêkolîner, nivîskar, helbestvan, haîkûhez hwd ji vê xebatê dê sûd jê wergirin û hin tişt ji bo cureya helbesta japonî haîkûyê, haîkûnûsên kurd û haîkûyên kurdî dê zelal bibe.

Di vê xebatê de, me ji bo her pênc berhemên haîkûyê çarçoveya poetîkaya haîkûyê bi kar anî. Li gor vê çarçoveyê me vekolîna xwe ji bo her pênc berheman ji aliyê teşe û tematîk ve çê kir. Mijara me, ji bo ku baş be têgihiştin û di nav çarçoveyeka zanîstî, teorîk û lêkolînî de çê bibe, me cih da mijarên wekî penase û geşedana dîrokî ya têgiha poetîkayê, pêwendî û bandorlêkirina xasyetên helbesta japonî li ser poetîkaya haîkûyê, belavbûn û geşbûna haîkûyê di wêjeya cîhanê de, jêderkên haîkûyê. Ji xeynî van berî dahûrîna pênc dîwanên haîkûyî, me behsa geşedana dîrokî ya haîkûyê di nav helbesta kurdî de kir. Her çiqas di helbesta kurdî de ji aliyê gelek kesan ve haîkû hatibin nivîsandin jî me xebata xwe li ser pênc haîkûnûsên kurdî û berhemên wan ên ku bi kurdîya kurmancî (ji ber ku me zaravayên kurdî yê din nizanîbû) hatine nivîsîn, sînordar kirin. Li gel vê, ji ber ku hemû haîkûyên Berken Berehî wekî berhemeka serbixwe û ‘hemû haîkû’ di nav berhema wî ya bi navê *Haikuyê* (2020, ç. 2.) de cih girtine, me ji bo vekolîna xwe wê pirtûkê esas girt.

Ji layê çavkanîyên nivîskî ve derheqê haîkûyê de bi qasî ku di zimanê wekî tirkî, ingilîzî û hwd.ê de heyî mixabin em nikarin danberhevdanek ji bo zimanê kurdî bikin. Ji ber ku derbarê mijara me de çavkanîyên nivîskî pirr kêmbûn û ji ber hindikahîya çavkanîyên kurdî me pir zehmetî kişand. Zimanê japonî anglo nihongo ji sê alfabeyan (kanjî, katakana û hîragana) pêk tê. Berê zimanê bûgoyî di nav japonan de hem zimanê nivîskî/standart û hem jî yê edebî bû. Helbet em ne alfabeyên japonî dizanin ne jî zimanê bûgoyî. Lewma me xwendin û lêkolînên xwe nedikarîya li ser tekstên resen ên haîkûyî bikirin. Ev jî ji boyî me zorkêşî û serêşîyek bû. Lewra me lêkolîn û çavkanîyên xwe piranî li ser berhem û metnên ku hatine wergerandin (ji japonî bo ingilîzî, ji ingilîzî bo tirkî, ji fransî bo tirkî) û wergerên ku me kirî, (ji ingilîzî bo kurdî, ji tirkî bo kurdî) çê kirin.

Rê û rêbaza vê xebatê, li gel ravekirina geşedana poetîkayê di wêjeya cîhanê de, pêwendîya helbesta japonî û poetîkaya haîkûyê, geşedana haîkûyê di wêjeya cîhanê de, pêkhatayên haîkûyê (wekî erdnîgarî, dîrok, civak, çand, bawerî/felsefe, ziman, nivîs û wêjeya japonî) û taybetîyên poetîkaya haîkûyê, dahûrînandina her pênc berhemên haîkû yê bi kurdî (kurmancî) ne. Bi qasî hewl û quweta xwe di vê xebatê de, derheqê mijara ku me bijartîye de çî û çend cure çavkanî (pirtûk, kovar,

gotar, nameyên masterê, nivîsên înternetê û hwd.) hebin, me feyde ji wan wergirtin. Me li gor teknîkên zanistî, şîrove û analîzên xwe bi awayekî birêkûpêk pêk anî.

Teza me ji destpêkek û du beşan pêk tê. Di destpêkê de piştî danasîna haîkûyê û geşedana wê ya dîrokî, em li ser pênasê, geşedana dîrokî û rêbaza têgiha poetîkayê sekinîn. Me di nav xebata xwe de terma poetîkayê ji xeynî bikaranîna wateya xwe ya “hunera helbestê”, di heman demê de ji bona di feraseta helbesta helbestvanekî/ê û miletekî de jî bi kar anî. Piştî me bandora xasyetên helbesta japonî li ser poetîkaya haîkûyê amaje kir. Li gel van, me bi kurtasî behsa geşbûn û belavbûna helbesta haîkûyê di wêjeya cîhanê de jî kir.

Di beşa yekem de derheqê erdnîgarî, dîrok, civak, çand, ol û bawerî; ziman, nivîs û wêjeya japonî de me agahî dan, ku me ew wekî keresteyên jêderka haîkûyê destnîşan kirin. Herweha, me poetîkaya haîkûyê ji hêla geşedana dîrokî, helbestvanên herî giring, teşe, naverok û rêbazên ku di nivîsîna haîkûyê de hatine bikaranîn, ve vekola. Bi vî awayî, me wekî teorîk jêderkên haîkûyê û poetîkaya haîkûyê ji bona vekolîna me ya pratîk destnîşan kir. Di beşa duyem de piştî ku bi kurtasî bi behskirina geşedana dîrokî ya haîkûyê di helbesta kurdî de, me pênc berhemên haîkûyê ango *Haiku* (2020), *Morana Gerdûnê* (2017), *Dengê Pepûkê* (2020), *Gumbil* (2022) û *Sîhrên Mizewran* (2022) ji aliyê teşeyî û tematîk ve analîz kirin.

Me haîkûyên her pênc berhemên ji hêla binavkirina kêşê kîteyî ve ji ber ku haîkû herweha li gor henaseyê jî tê xwendin, di heman demê de wekî “kêşê hilmî” jî bi nav kir. Berhemên ku bûne mijara xebata me, me ji hêla tematîkê ve li gor gerdûn û sirûşt, demsal, zeman û mekan, civak û mirov, lîrîzm û pathos, ajel û riwekan vekola. Li gel vê, kêşê kîteyan, bêjeyên kirejîyan, kirejîyên bi xalbendî û bêjeyên hêma, remz, metafor û têgihên ku ji hêla haîkûnûsan ve hatine bikaranîn, me li gor hejmara haîkûyan şematîze kirin. Yek ji xasyetên haîkûyê ew e ku bêjeya şanîdera temayekê, di heman demê de ji bo temayeka din dikare bê nîşankirin. Bo nimûne, bêjeya “çîya” wekî şanîder hem temaya sirûştê û hem jî ya mekanê amaje dike. Lewre bêjeya şanîderekê, dikare du yan jî ji du temayan zêdetir nîşan bike. Herweha li gor her temayên ku navên wan derbasbûyî me sê yan jî şeş mînakên haîkûyê dan.

Li gel nimûneyên haîkûyê yên ku vekolîna di berhemên *Morana Gerdûnê* û *Gumbilê* de hatine dayîn, me çendek mînakên xet/îlustrasyon û fotrafan jî bi kar anî. haîkûyên du berhemên angî *Dengê Pepûkê* yê Ulku Bîngol û *Sîhrên Mizewran* ê Ergîn Sertemî nehatibûn numarekirin. Da ku lêkolîna me derheqê van berhemên de bi hêsanî çêbûbûya me li gor rûpela haîkûyên ku tê de cih girtine, hejmar da. Ji xeynî van, du berhemên angî *Gumbil* û *Sîhrên Mizewran* jî hêla xwedîyê berhemên ve li gor xasyetên haîkûyan berhem hatine dabeşkirin û ji her beşekê re sernav hatine dayîn. Bi vî awayî haîkûyên tê de ji alîyê naverokê ve hatine birêkûpêkkirin. Me haîkûyên van her du berhemên di nav yekpareyîya sernavan de analîz kirin. Piştî vekolîna van pênc berhemên weki binbeşek me berawirdinek di navbera van berhemên de kir; cudahî û hevparîya wan di nav tabloyekê de destnîşan kir. Bi encamê re jî me dawî li xebata xwe anî.

Di pêkanîna xebata me de di beşa destpêkê de ji bo pênase, ravekirin û geşedana dîrokî ya têgiha poetîkayê di wêjeya cîhanê de bi taybetî me ji berhemên Aristoteles (Poetîka, 2020), Tzvetan Todorov (Poetîkaya Giriş [Destpêkek ji bo Poetîkayê], 2024) û Alaattin Karaca (Îkinci Yeni Poetîkası [Poetîkaya Îkinci Yenîyê], 2013) sûd jê wergirtin.

Herweha di beşa yekem de ji bo jêderkên wekî erdnîgarî, dîrok, civak, çand, bawerî/felsefe, ziman, nivîs û wêjeya japonî yên helbesta haîkûyê û taybetmendiyên poetîkaya haîkûyê berhemên Milton W. Meyer (Japonya Tarihi [Dîroka Japonyayê], 2022), Jonathan Clements (Kısa Japonya Tarihi [Dîrokçeya Japonyayê], 2023), Mikiso Hane (Kısa Japonya Tarihi [Dîrokçeya Japonyayê], 2023), L. Sami Akalın (Japon Şiiri Tarih ve Antoloji [Helbesta Japonî Dîrok û Antolojî], 1962), Esin Esen (Kadim Japon Şiiri Man'yōshū [Man'yōshū Helbesta Japonî ya Dêrîn], 2019), R. H. Blyth (Haiku [Haîkû], 1965), Kojin Karatani (Derinliğin Keşfi Modern Japon Edebiyatının Kökenleri [Veditina Kûrahîyê Jêderka Wêjeya Japonî ya Nûjen], 2021), D. T. Suzuki (Zen ve Haiku [Zen û Haîkû], 2017), Alan Watts (Zen Yolu [Rêya Zenê], 2022), Matsuo Bashō (Kuzeye Giden İnce Yol [Tengerêgeha Ber bi Bakur ve], 2020), Oruç Aruoba (Başo/Kelebek Düşleri [Başo/Pêşrewkên Pîrpirîkê], 2020), Roland Barthes (Romanın Hazırlanışı 1 [Amadekirina Romanê 1], 2018) û Harold

Stewart (Ji Haîkûnûsên Japonî Demsîl Bî Demsîl Haîkû, [wer.: Sidîq Gorîcan], 2024) ji bo xebata me bûn wekî berhemên sereke.

Li gel van di beşa duyem de ji xeynî her pênc berhemên haîkû yên bi kurdî yên ku navbirî, me ji hin gotar (Dahûrîna Wergera Kurdî ya Heft Haîkûyên Jack Kerouac li dor Modela Analîza Werger-Navend a Christiane Nordê [Çeliktaş & Ertekin, 2024]), kovar (Nûbihar, LEWerger, Bar Helbest) û berhemên kurdî (Sêxiştîyên Kurmancî Xorasan, [Celîl & Şadkam, 2021], Pandomîm, [Bereh, 2006], Sê Deng [Temo, 2020] û hwd.) jî wekî çavkanî feyde jê wergirtin.

Di serî de ez spasîya xwe şêwirmendê min rêzdar Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş dikim ku ji xeynî pêşniyazên hêja ji bo qedandina tezê bi taybetî ez teşwîq kirim û hêzek mezin da min. Ji bo peydakirina çavkanîyên haîkûyan ji mamosteyê min ê hêja Hîndekar Hacı Yılmaz (Sidîq Gorîcan) re spasdar im. Di wergerandina hin têgihên bîyanî de arîkarîya Dr. Dilawer Zeraq hêjayî pesndayînê ye. Herweha ez spasîya xwe dost û hevala kurdan Erika Ueda ya japon dikim ku derheqê hin têgih û termên wêjeyî yên japonî de ji min re bû arîkar.

Herweha spasîya xwe ji bo mamosteyên hêja Doç. Dr. İlyas Suvağci û Dr. Mehmet Yıldırımçakar dikim ku herdu jî hem derbarê kêmasîyên teza min de nîrxandin, rexne û pêşniyazên xwe ji min teksîr nekirin û hem jî di jûrîya parastina teza min da cih girtin. Ez spasîya xwe hevjinê min Sultan Onan Sabaz dikim ku piştgirîya xwe her tim daye min. Ji dê û bavê xwe re spasdar im ku heqê wan ê li ser min bê dawî ye. Ji bo arîkarîya hevalê hêja Metin Demirağaç spas dikim.

Mazlum SABAZ

Wan 2025

DESTPÊK

Haîkû (j.:俳句), yek ji cureya helbesta japonî ye ku di wêjeya cîhanê de wekî helbesta herî kurt tê zanîn. Di wêjeya japonî de haîkû, wekî form ji *go-shichi-go* (j.: 五七五) ya ku ji risteya yekem pênc, ya duyem heft û ya sêyem jî ji pênc kîteyan (hakû) vesazbûye, hatîye ristandin û herweha wekî cureyeka helbesta kurt ku bi tevahî ji 17 kîteyê û ji sê risteyê pêk tê, tê binavkirin. Ji sê risteya destpêka *tankayê* (waka) ku ji 31 kîte ya nerîta helbesta japonî ye, hatîye dariştin (Suzuki, 2017: 17). Li gor Aruoba (2020: 19), haîkû di wêjeya japonan de lewnekî nivîsîn/stranên gelêrî ya ku hatîye bipêşvexistinkirî ye û di heman demê de forma metna herî kurt a ku tê zanîn, a wêjeya cîhanê ye jî.

Haîkû/hokkû, di sedsala 17an de ji hêla Matsuo Başôyî ve wekî cureya helbesteka serbixwe, hatîye kirin. Masaoka Shiki yê ku di dawîya sedsala 19an de helbesta japonî haîkûyê kiribû parçeyek ji wêjeyê, hem poetîka xwe yê haîkûyî û hem jî poetîka haîkûyê bi awayekî modern destnîşan kiriye. Di destpêka sedsala 20an de, haîkû di helbesta Rojavayê de hate nasîn û bi taybetî jî piştî nîveka sedsala 20an, di wêjeya cîhanê de cih girtîye.

Cureya helbesta japonî haîkû piştî salên 2000î jî di nav helbesta kurdî de xuya dibe, bi zêdebûna haîkûnûsên kurd û berhemên wan re cihê xwe di wêjeya kurdî de digire. Wek gellek welat û zimanan, haîkûyan xwe gihande Kurdistanê û daxilî zimanê kurdî jî bû. Ji sala 2000î û vir ve haîkû bi awayekî forma helbestê tê nivîsîn. Hin ji wan ra hayko, hokko, helbestên mobîl hin sêxiştî dibêjin. Hin kes haîkûyan ne bi forma japonî wek sê riste û hevdeh kîte, lê sê, çar, pênc riste û kîteyên ku naşibin hev û bê kafîyê jî dinivîsin. Îro gellek kes bi her çar zaraveyên kurdî haîkûyan dinivîsin. Berken Bereh, Şemal Akreyî, Dilbirîn Halo, Şehab Akreyî, Xalid Elî Silevanî, Kawa Nemir, Ulku Bîngol û Sidîq Gorîcan hin ji van haîkûnûsan in (Bereh, 2022: 17).

A. Geşedana Têgiha Poetîkayê Di Wêjeya Cîhanê De

Bêjeya *Poetîkayê* navê xwe ji berhema *Peri Poetika/Poetikaya* (Nzk, BZ 344) Arîstotelesî (BZ 384-322) wergirtîye. Ev pirtûk, di eslê xwe de berhema yekem

a teorîya wêjeyê ye (Alan, 2019: 105). Terma poetîkayê ji peyva yewnanî (grekî) *po(i)etikosê* tê. Ev peyv rengdêrek e ku ji lêkera *poiein* hatîye girtin ku tê wateya “çêkirin”, “hilberandin” û “afirandin”ê (Sumer, 1996: 36). Li gel vê, *Poiesisa* ku ji peyva *poieinê* hatîye dariştin, tê wateya ‘afirandin’ê (Karaca, 2013: 14). Li gor Oktay (2005: 17) *poétique* bi fransî *poetic*, bi îngilîzî *poetik*, bi almanî *poetica*, bi îtalî *poetica*, bi latînî û bi yewnanî *poétiké* di şûna terma poetîkayê de tên emilandin. Herweha Şemsettin Sami (1905: 1718), di ferhenga xwe ya bi navê *Kâmûs-î Fransevî* de, peyva *poétique* wekî “fenn-i şîir/zanista helbestê, ilm-i aruz/zanista erûzê” wergerandiye.

Ji xeynî wateya wê ya ferhengî û peyvnasîyê wekî term ‘Poetîka’, bi gelemperî wekî ‘hunera helbestê’ tê fêmkirin û bi berfirehî jî wekî nirxandin û nêzîkatîya estetîkî ya helbestvanekî/ê ji bo hunera helbestê û bi taybetî jî ji bo şêwaza xwe ya hilberandina berhemên tê pejirandin (Türkdoğan, 2011: 179). Poetîka, di bikaranîna xwe ya îroyîn de, ne hunera helbestê bi xwe ye, lê belê teoriyên li ser hunera helbestê ye. Bi gotineka din, poetîka qadeka zanistê ye ku bi mijarên têkildarî helbestê yê wekî awaya helbestê (kêş, beşavend, teşeya nezmê), ji bo helbestê nirxa vê formê, binyada helbestê, rîtm û aheng, zimanê helbestê, naverok (wate, hêma, tema, hunerên edebî), çavkanîya helbestê, estetîka wê û karakterê ferdî yan civakî yê helbestê re mijûl dibe (Okay, 2009: 17-19).

Poetîkaya Arîstoteles, ku di berî zayînê sedsala 4an de hatîye nivîsandin, wekî çavkanîyeka referansa kevnar ji bo têgihîştina têkiliya di navbera felsefe û helbestê de derdikeve pêşberî me. (Yeşilçayır, 2020: 13). Li gor Alan jî (2019: 107), *Poetîka* ango hunera helbestê (poetry/şîir sanatı), ji demên klasîk vir ve bi hîkmetê re her wiha bi zimanê îqna û îfadeyê re têkildar, hatîye dîtin.

Ji pênase, têkilî û ravekirinên cihêreng jî dîyar e ku bikaranîna peyva poetîkayê di xebat û lêkolînên zanista wêjeyê de gelekî berbelav e. Lê belê, her çiqas ji alîyê wateyê ve *Peri Poetika* wekî “li ser hunera helbestê” û *Poetika* wekî “hunera helbestê” bîr wergirandin jî di warê zanistên wêjeyê de derbarê pênase û vegira têgiha poetîkayê de nêrîneka hevpar tune ye. Karaca, sedema vê gengeşî û devjengîyê ji hêla wateyê ve bi wergerandina têgehê ve gire dide û weha dibêje:

“Poetîka, têgiheka ku bi taybetî di wêjeyê de pir caran rastî wê dibin, di nav domayîya dîrokê de ji ber ku di wate û warên curbicur de hatîye bikaranîn, termeka ku hîn jî hin dudilîyan dihewîne. Derbarê çêbûnê teredût a ku wate û vegira termê de, em dikarin bibêjin ku ji berhema Poetîkaya Arîstoyî vir ve peyv, carinan tenê bi wateyeka giştî, wekî ‘afîrandina çalakîyeka hunerî ya ku xwe dispêre teqlîdê’, carinan tenê bi ‘hunera helbestê’, carinan di warê estetîkê de wekî ‘felsefeya ciwankariyê’ û carinan jî wekî ‘edebîtî, tevahîya qaîdeyên ku bi fonksîyon û binyada bêjara wêjeyê re, pêwendîdar’ hatine bikaranîn, bûne sedem. Ji ber vê yekê, heta îro jî terma **poetîkayê**, di warên wekî felsefe, estetîk û şaxên ciyawaz ên hunerên ciwan de, yan jî bi tenê di qada wêjeyê de hin car di wateyeka teng de û hin car jî di wateyeka berfireh de, ji bo armancên cihê tê bikaranîn.” (Karaca, 2013: 14).

Ji xeynî berhema Arîstoteles, di sedsalên cuda de li Rojavayê gelek berhem wekî poetîka hatine weşandin. *Ars Poetikaya* (BZ 65) Horatius (BZ 1), *Poétiqueya* (1561) Jules-César Scaliger, *Abrégé de l’Art Poétiqueya* (1565) Pierre de Ronsard (1524-1585), *Art Poétiqueya* (1674) Boileau (1636-1711), *Poetikaya* Novalis (1772-1801), *Art Poétiqueya* (1929) Paul Claudel (1868-1955), *La Poétique de l’espaceya* (Poetîkaya Şûngehê, 1957) Gaston Bachelard (1884-1962) hin ji van pirtûk in ku nivîskar û helbestvanên xwedîyê berhemana derbarê huner, trajedî, helbest, hunera helbestê û hwd.ê de nêrînên xwe rave dikin.

Di vê pêvajoya dîrokî de, ne tenê nivîskar û helbestvanan, di heman demê de ramanger, teorîsyenên hunerê û felsefevanan jî ji bo armancên curbicur metnên poetîk çêkirin û di vê çarçoveyê de beşdarî geşedana cureyê bûne. (Demir, 2013: 435). Di sedsala 20an de bi taybetî poetîka wekî *şaxekî zanista ku li ser wêje/edebîtîyê lêkolîn dike* û herweha wekî navê *dîsîplîneka zanistî ya ku bi wêjeyê re têkildar* hatîye pênasekirin û bikaranîn (Karaca, 2013: 29-31). Di vê sedsalê de xasma dîroknas û teorîsyenê wêjeyê A. N. Veselovsky (1838-1906) û filozof, sosyolog, dîroknas û rexnegirê wêjeyê Tzvetan Todorov (1939-2017) poetîkayê, bi giştî wekî metodolojî (azînenasî), rêbaza lêkolîna/vekolînên wêjeyê bi kar tînin.

Veselovsky, berhema xwe ya bi navê *Historičeskaya Poetika* (Poetîkaya Dîrokî, Leningrad, 1940) de rêbaz û teorîyê xwe li ser dîroka wêjeyê amaje kiriye. Armanca metoda *Poetîkaya Dîrokî*, dîrokeka zanistî ya wêjeyê çêkirin e. Veselovsky,

li şûna ku li gor teorîyê metnên edebî lêkolîn bike, armanc dike ku li gor metnên edebî teorîyek ava bike. Li gor wî, çêbûna cure û forman bi pêşveçûna ramana estetîkî, pêvajoya civakî û dîrokî ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, pêkhatina cure û formên edebî tenê di çarçoveyeka dîrokî û civakî de dikare bîn destnîşankirin (Karaca, 2013: 29).

Todorov jî di pirtûka xwe ya bi navê *Poetikaya Giriş* (Destpêkek Ji bo Poetîkayê, 2024) de armanc dike ku qanûnên giştî yên ku di paşxana nivîsarên edebî de çêbûne, biçespîne. Li gor Karaca (2013: 31), berhema *Destpêkek Ji bo Poetîkayê* yê T. Todorov ji bo pênasîya terma poetîkayê ku poetîka êdî di sedsala 20an de wekî “dîsîplîneka zanistî ya ku bi wêjeyê re têkildar” hatîye binavkirin, di çaxa me de çavkanîya herî giring tê qebûlkirin. Todorov, di berhema xwe de derbarê xebat û vekolînên li ser wêjeyê de wekî sê nêzîkayîyên nerîtî *projeksiyon* (pêşanî), *şerhkirin*/*şîrovekirin* û *poetîkayê* amaje dike.

Projeksiyon, metnên edebî ji bo felsefe, civaknasî, derûnnasî, dîroknasîyê û herweha ji bo zanistên dîtir re, wekî kereste dinirxîne. Armanca xebatên bi vî rengî ew e ku ji metnên edebî divê bîn destpêkirin da ku zanyarîyên ku ji hêla zanistên derwêjeyê ve tên lêgerîn, bîn bidestxistin. Di rêbaza duyem de ku jê re “şîrovekirin” tê gotin, armanc şayesandin û ravekirina wateya metnên edebî, bi gotineka dî, hewldayîna “binavkirina wateyê” ye (Karaca, 2013: 34-35). Todorov rêbaza sêyem ango poetîkayê weha pênasî dike:

“Objeya poetîkayê, ne berhema edebî bi xwe ye: tiştê ku poetîka jêpîrsînê dike, taybetmendîyên bêjara ciwan a ku herweha jê re bêjara wêjeyê jî tê gotin, e. Ji ber vê yekê ye ku, her berhem wekî derbirîna binyadeka giştî û razber tê pejirandin û berhem tenê yek ji pêkanînên gengaz ên vê binyadê ye. Lewma, poetîka ne bi wêjeya rastîn re lê bi wêjeya gengaz re mijûl dibe; bi gotineka din, ew bi taybetîyeka razber a ku tekîna diyardeya wêjeyê pêk tîne re, bi edebîtîyê re mijûl dibe. Armanca lêkolînê êdî ne ew e ku berhema şênber bi peyvên cihêreng re vegotin, kurteyeka berfireh dayîne; ji niha û pê ve, armanc ew e ku teorîyek li ser fonksîyon û binyada bêjara wêjeyê re çêkin e.” (2024: 37).

Herçendîn ku derheqê pênase, ravekirin, vegir û bikaranîna terma poetîkayê de cudahî hebin jî, petîka hebûna xwe ya di nav qada wêjeyê de parastîye û ji bo hêmanên ku bi wêjeyê re pêwendîdar ên wekî cure, helbestvan, nivîskar, serdem û bizavên edebî, civat û netewan bûye sernaveka sereke. Bi qewlê Karaca (2005: 35), terma poetîkayê bi demê re carinan ji bo cureyeka edebî, carinan ji bo helbestvan an nivîskarekî/ê, carinan ji bo tevgerek, serdemek an civatekê û carinan jî ji bo lêkolîna feraset û taybetmendîyên wêjeya neteweyekê, hatîye bikaranîn.

B. Helbesta Japonî û Poetîkaya Haîkûyê

Di zimanê japonî de ji helbestê re *uta* û ji helbestê/n japonî re jî *yamato-uta* yan jî *waka* tê gotin. Ev bêje di heman awayî de di wateya *stranên japonî* de jî tê bikaranîn. Cureya helbestên *Wakayî* bi guhertoyên ji 5+7 kîteyan, kurtahî, dirêjahîya helbestan an jî biyekbûna van kîteyên ku bi awayekî curbicur çê bûne, pêk tê (Esen, 2019: 62). Bêjeya *shîyê*(şî) jî bi giştî ji bo şeweya helbestên Rojavayî yên japonî tê emilandin. Helbesta japonî ya klasîk, di hemû teşeyên nezmê û cureyên helbestan de xwe dispere kêşa (wezn) kîteyê. Lê belê ev kêşa kîteyê ji serê helbestê heta dawîya wê ne li gor wekhevîya hejmara risteyan, li gor dubarekirina forma bi 5-7êyî tê sazîkirin (Akalin, 1962: 54). Li gel vê, helbesta japonî ya klasîk bi giştî ne li gor serwa (qafîye) û paşserwayê (redîf), li gor aheng û yekeya moraya kîteyê tê rîstandin/xwendin. Ji ber vê yekê ye ku di helbestên japonî de bikaranîna alîterasyon, armonî, muzîkalîte û kirejî gelekî berbelav in.

Di dîroka wêjeya japonî de helbest, bi awayekî formatîf (çêbûyî) û veguherînî werar bûye. Hunera helbesta japonî ya klasîk ji Serdema Nara (710-794), Heian (794-1185), Samûray/Gerdoyî (1185-1868) û heta Serdema Meijîyê (1868-1912) li gor hîma civakî, çandî û jîyîna şert û mercên wî demî teşe girtîye. Teşegirtina helbesta japonî ya klasîk ji tankayê heta rengayê bi forma 5-7-5-7-7ê wekî pîvana kîteyî ya japonî ango hakûyê 31 kîteyê (on) û ji haîkaîyê (renkû) ta hokkûyê (haîkû) jî wekî forma 5-7-5ê hatîye rîstesazîkirin. Her çiqas ev teşeya 5-7-5ê li gel Serdema Modernbûnê (1868-1912) ji alîyê hin helbestvanên japonî ve hatibe guhertin û xirakirin jî, ev qaîde hem di helbesta japonî de hem di helbesta cîhanê de ji alîyê hin haîkûnûsên têvel ve hatîye parastin û domîkirin.

Helbest, di çerxa gerdûn-xweza-mirovî de û di aheng, deng û rengê biyekbûniya “dîmen xêz/nivîsînê” de tevneka (form) otantîk, fesîh, xwerû ya cîhanbînî û têgihîna japonî dinimîne. Hemû heyberên li gerdûnê, xwedîyê şeweya derbirîna resen a xwe ne. Ev şeweya derbirînê di mirovan de û bi taybetî jî di japonan de dibe helbest (Özhan, 2016: 19-20). Jîyîn û jîyara hêmayî (imaginative) ya japonî xwe di helbestan de jî nîşanî dike ku jîyan bixwe mişt metaforîk û alegorîk e.

Di geşedana helbesta japonî de hem ji hêla naverokê ve hem ji hêla teşeyê ve gelek pêker, bandorker bûne. Çand û helbesta çînî ya klasîk (helbestên Han ango Kanshîyê), bawerî û hînwerîyên wekî şintoîzm, taoîzm, konfîçyûzyanîzm, bûdîzm û zen-bûdîzm, helbestên bûdîstî, çîna leşkerî (samûray), derebeg, arîstokrat û pergala împaratorîyê, nêzîkatîya mînimîmalîst, feraseta yûgen-wabî-sabî ango estetîk û cîhanbînîya japonî, nerîta zarkî ya japonî, lêvegera tiştan (return to things) û lêvegera xwezayê (return to nature) di helbesta japonî de hêman û têgihên sereke yên ku tesir lê hatin kirine. Li gel van, wekî mijar û temayan jî werz (demsal), esman û hêmanên wî (wekî tav û heyv), çiya û hevraz, perestgeh û keşişxane, mirov, ajel, riwek û evîn bi awayekî berfireh di helbestan de hatine bikaranîn û nexşandin.

Di nivîsîna helbesta japonî ya nerîtî de helbest pêşî nexşek (dekor) xêz dike û zemînek (zevî) amade dike. Ev dekor exleb tenê ji yek peyvê ku ew jî bi demsalekê re pêwendîdar e, pêk tê. Li nava vê nexş û nîgarê helbestvan hîsek, heyberek an jî rûdanek bi cih dike, helbesta xwe ji xwîner/çavdêran re pêşkêş dike û bi vî awayî helbest diqede. A rast karê helbestvanî xilas dibe û yên xwîner/çavdêran hê nû dest pê dike (Akalm, 1962: 63).

Hestyarî û pêhesîya sirûştê, çavkanî û sûd jêwergirtina feraseta helbesta japonî pêk tîne. *Mono-no-aware* ku hestyarî û dilzîzîya kûr a ji her hêmanên jîyanê re amaje dike, yek ji têgihên herî giring a hest, raman û cîhanbînîya japonan nîşanî dike ku di heman demê de xwe di helbestên japonî de jî xuya dike. Ki no Tsurayukî (872-945) di pêşgotina berhevoka *Kokinshûyê* (905) de derbarê geşedana helbesta japonî de metafora tov-çiqilê bi kar anîye û bi zimanekî xwezayî poetîkaya helbesta japonî weha pênase dike: “Helbesta japonî di tovên xwe de dilê mirovî vedihewîne û wekî çiqilên peyvan ku hingî tu bibêjî bêhed û bêhejmar in, şax vedide. Di jîyanê de gelek

tişt bandor li ser mirovan dike. Dû re mirov dest bi vegotina hîsan ku ji tiştên dîtî û sehkirî çê bûne, dikin.” (Tekmen, 2010: 150)

Têgiha *Kotodamayê*, çi bi devkî çi bi nivîskî, esildanî puxte û gîyana berhemên edebî yên japonî rave dike. Kotodama, wekî “gîyana bêjeyê” (Esen, 2019: 69) û “gîyana zimanî” (Özhan, 2016: 9) tên binavkirin. Li gor bawerîya *kamîyê*, japonan bawer dikin ku çawa ku kamî ango gîyana her tiştî heye, di heman awayî de yên bêje û gotinan jî hene. Di bawerîya kotodamayê de wexta ku her çi were li ser zimanî ango her çi were nivîsandin dê pêk bê. Lewre tiştên ku tên xwestin û vegotin hewce nakin ku bi bêje û hevokên dirêj bînin nivîsandin. Bi gotineka dî feraset û bawerîya kotodamayê di ziman û wêjeya japonî de wekî têgih kurtinî û japonîyê pêname dike.

Li gel kotodamayê, *kenyogen* ku tê wateya hunerên bêjeyî/edebî, ji ber dewlemendiya, pirwateyîtiya têgih û peyvên japonî tê bikaranîn. Di nav kenyogenê de gelek hunerên bêjeyî yên wekî bi peyvî (cînas, alîterasyon), yên bi wateyî (meramveşêr/tewrîye, dijberî/tezad, bîranîn/telmîh) û yên bi mecazî (sparde/îstîare, nixman/kînaye, qelîne/tarîz, xazeya hinartî/mecazê mursel) hene. Di helbesta japonî de bikaranîna hunerên bêjeyî yên wekî *jokotoba*, *kaketoba*, *makurakotobayê* armanca nivîsîna helbest û helbestvanê/i dide me nîşanîkirin. *Jokotoba*, girizgeha helbestê ye ku wekî beşa pêşîya mijara bingehîn tê binavkirin. *Kaketoba*, bikaranîna bêjeyên ku tê gelek wateyan ango tê wateyên hunerên peyvî yên wekî hevûpî (cînas), nixman (kînaye). Ji vê hunera bêjeyî mebest, di helbestê de pêkanîna xwendina duwateyî çêkirin e. Hunera bêjeyî *makurakotoba*, wekî “peyvê/n palgehî” tê binavkirin ku ev bêjeyên bi qalib (mezmûn) wexta ku tên emilandin amaje wateyeka dî didin. Ango di helbestan de hunerên bêjeyî yên wekî sparde (îstîare) tête bikaranîn. Bo nimûne, di japonî de *kusamakura* tê wateya “palgeha ji pûşê” û ew li gel peyva *tabîyê* tê bikaranîn û wateya “rêwîti”yê dide (Esen, 2019: 72).

Haîkû (hokkû) ya ku xasyetên poetîkaya xwe ji cureyên têvel ên helbesta japonî wergirtiye, esas di nav cureya *tankayê* de derdikeve û ji aliyê Matsuo Bashō (Başô, 1644-1694) ve, wekî cureyeka serbixwe tê nivîsîn. Piştî ji hêla Masaoka Shiki (Şîkî, 1867-1902) ve poetîkaya haîkûyê bi awayekî birêkûpêk tê destnîşankirin. Bi wî re hokkû, navê xwe ya nûjen bi haîkûyê tê nasîn.

Aytemür (2021: 11), taybetmendîyên poetîkaya haîkûyê bi giştî weha rêz dike:

1. Bi pîvana kîteya (hakû) 5-7-5ê tê nivîsandin.
2. 2 ji wan beşên asimetrîk bi tevahî ji 3 rêzikan pêk tê. Risteya dawî bi heyirandinê diqede.
3. Kirdeya vegêrê tune ye. Ji şîrove û hestan bêpar û xwerû bûye.
4. Dadbarkirineka zelal û berçav li ser nikare were kirin. Ji xwîneran amaje dike ku şahidîya wê gavê, kêlîyê bike.
5. Balê dikişîne li ser kêlîyê û lê hûr dibe. Li ser kêlî, bûyer û rewşeka ku li sirûştê heyî, mijûl dibe û ji peyameka gerdûnî re ku bi mirovî re tekildar binmetneka wê heye, beralîkirin dike.
6. Divê di jêgirtina mijarê de nêzîkatîyeka mîzahî hebe.
7. Sernav û beşavend nayên bikaranîn.
8. Zimanekî xwerû û hêsan (sivik) ê vegotinê tê bikaranîn.
9. Dema niha tê bikaranîn.
10. Cureyekî helbest ê biserik vekirî, ye.
11. Di rêzika yekem de, Kîgo tê bikaranîn û demsal tê amajekirin.
12. Kirejî “birîna peyv/deng” wekî pêwîstî tê dîtin.

C. Haîkû Di Wêjeya Cîhanê De

Cureya helbesta japonî haîkû di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de di qada wêjeya cîhanê de xasma li Rojavayê (Ewrûpa) hêdî hêdî tê xuyakirin. Di gelek edebiyatên neteweyî de, bi taybetî piştî sedsalên 19 û 20an, nimûneyên haîkûyan xuya bûne (Çeliktaş & Ertekin, 2024: 12). Têkilîya pêşî ya di navbera Japonya û Rojavayê de di sedsala 16an de bi giştî di asta bazirganî û leşkerîyê de dest pê dike. Piştî Serdema Tokugawayê (1603-1868) ango polîtîkaya îzolasyonîst sakokûyê, ev temas di Serdema Meîjîyê (1868-1912) de zêdetir û berfirehtir dibe. Li gel ji bandorgirtina Rojavayê, Japonya di heman demê de di qadên wekî çand, huner, bawerî û wêjeyê de jî danasîna xwe li Rojavayê dike. Bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Duyem ji alîyê Ewrûpayî û Amerîkayîyan ve gelek xebat û lêkolîn li ser civak, çand, huner, bawerî û wêjeya japonî tên kirin.

Bi giştî, danasîn, xebat û lêkolînên li ser cureya helbesta haîkûyê jî di sedsala 20î de çê dibe. Xasma di vê sedsalê de xebat û lêkolînên ku di qada zanîstî de li ser çand û hunera japonî û herweha li ser hînwerî û felsefeya zenê hatine kirin, di heman demê de li ser helbesta haîkû ya japonî jî eleqeyeka zêdetir çê kir. Xebat û berhemên wekî *An Introduction to Zen Buddhism* (Destpêkek Bo Bûdîzma Zenê, 1934), *Zen and Japanese Culture* (Zen û Çanda Japonî, 1957), *Zen and Haîkû* (Zen û Haîkû, 1959) û gelek gotar ên filozof, nivîskar, akademîsyen, ferzane û wergêr ê japonî D.T. Suzukiyî (1870-1966), li Rojavayê danasîna derheqê çanda japonî, zen û haîkûyê de wekî berhemên klasîk û herweha D.T. Suzuki jî wekî kesê otorîte hate qebûl kirin.

Berhema Kenneth Yasûdayê (1914-2002) zanyar û wergêr ê japon-amerîkî ya bi navê *The Japanese Haiku: Its Essential Nature, History, and Possibilities in English, with Selected Examples* (Haîkûya Japonî: Xisleta Wê yên Bingehîn, Dîrokî û Di Îngilîzî De Derfetên Wê, li gel *Nimûneyên Wê yên Bijartî*, 1957) û yên nivîskar Yoshinobu Hakutanî (1935) yê japonî, *Haiku and Modernist Poetics* (Haîkû û Helbesta Modernîst, 2009), û *American Haiku, Eastern Philosophies, and Modernist Poetics* (Haîkûya Amerîkayî, Felsefeyên Rojhilatî û Helbesta Modernîst, 2020) jî wekî xebat û berhemên giring ên ku derbarê haîkûyê de hatine kirin, tê zanîn.

Ji bilî van, berhema nivîskar R.H. Blyth (1898-1964) ê îngilîz a bi navê *Haiku* (1949-1952, 1963-1964) jî li Rojavayê û di wêjeya cîhanê de derheqê naskirina haîkûyê de wekî berhemeka klasîk tête pejirandin. Berhema wî ya bi navê *Haiku*, di sala 1949-1952an de wekî çar berg û piştî di sala 1963-1964an de *History of Haikuyê* (Dîroka Haîkûyê) jî wekî du berg lê zêde dike, bi vî awayî bi tevahî berhemeka bi şeş bergî li ser haîkûyê tê weşandin. Li gel vê, berhema bi navê *Haiku in English* (Haîkû Di Îngilîzî De, 1965) ê japonolog Harold Gould Hendersonî (1889-1974) di warê danasîna cureya helbesta haîkû ya japonî de wekî xebateka giring tê dîtin. *Way of Zena* (Rêya Zenê, 1957) nivîskarê îngilîz-amerîkî Alan Wattsî (1915-1973) jî li gel danasandina zenê, herweha bandora zenê ya ku li ser helbesta haîkûyê hatîyê kirin, rave dike.

Roland Barthesê (1915-1980) filozof, rexnegirê wêjeyê û semîyotîker ku haîkûyê wekî “notgirtina anihayê” pênase dike, ji bo peydabûn û amedekirina romanê rêbaz û nivîsandina haîkûyê di ders û semînerên xwe yên navbera salên

1978-1979an de wekî destpêk pêşnîyaz kiriye. Herweha, Barthes di berhema xwe ya bi navê *L'Empire des signes*ê (Împaratoriya Şanîderan, 1970) de ku ev pirtûka geştnameyî ji gera Japonyayê û bi şêwaza fotoxraf-şîroveyê pêk hatiye û wî Japonyayê di vê berhemê de wekî “împaratoriya îşaretan” bi nav kiriye, cureya haîkûyê li gel hin dûmenan ve (sûret, wêne) li gor şêwaze xwe ya fotoxraf-şîroveyîyê dinirxîne.

Hendrik Doeff (1777-1835) ê holandî wekî yekem kesê Rojavayî tê zanîn ku haîkû (hokkû) nivîsandîye (Verhart, 2016: 1). Li gor Îkuko Suzukiyê (2011: 3), li Ewropayê cara pêşî wêjevanên ku bi haîkûyê re eleqedar bûne, wêjevanên fransî ne. Nemaze helbestvanên sembolîst û empresyonîst bi helbesta haîkûyê re mijûl bûne û helbestvanên nûjen ên japonî jî ji bizav û şêwazên wan bi bandor bûne. Helbestvanên îmajîst ên wekî Ezra Pound, F.S. Flint, T.E. Hulme û Amy Lowell û yên ji Nifşa Beatê (Jack Kerouac, Allen Ginsberg, William S. Burroughs, Gary Snyder, Philip Whalen û hwd.) bi cureya haîkûyê re eleqedar bûne û haîkû nivîsandine.

Di wêjeya cîhanê de ji xeynî helbestvanên fransî, îngilîzî û amerîkî gelek helbestvanên netewên cihê cihê cureya helbesta haîkûyê li gor şêwaza xwe nivîsandine û kirasê wêjeya xwe lê kirine. Bo nimûne nivîskar û helbestvanên wekî W. B. Yeatsê îrlandî, Gabriele D'Annunzioyê îtalî, Joan Alcover, Antonio Machado, Juan Ramón Jiménez, Luis Cernuda û Federico García Lorca'yê îspanyolî, Joan Salvat-Papasseitê katalanî, Czesław Miłoszê polonî, Desanka Maksimovićê sirpî, Rabindranath Thakurê (Tagore) bengalî, Jhinabhai Desai û Ashithayê hindî, José Juan Tablada û Octavio Pazê meksîkî, Jorge Luis Borgesê arjantinî, Richard Wright, James Emanuel û Sonia Sanchezê afro-amerîkî û Oruç Aruobayê tirkî li gor şêwazên xwe mijar û temayê haîkûyê berfirehtir kirine.

Hunera helbesta haîkûyê û haiku no michî ango rêya haîkûyê ne tenê di warê wêjeya cîhanê de xwe da xuyakirin, di heman awayî de di nav hunerên wekî muzîk û sînemayê de jî xwe nîşan kir. Haîkû, xasma ji du cureyên muzîkê yên blues û cazê re harmonîyeka stran-helbestkî çê kir. Herweha haîkû di nav hunera sînemayê de wekî li gel şêwaza kurtefilm-helbestê jî xwe daye nîşanîkirin.

1. NÎHON Û HAÎKÛ

1.1. Nîhon

Di zimanê japonî de navê Japonyayê bi karakterên kanjîyê wekî “日本” tê nivîsandin û wekî *Nîhon* an jî *Nîppon* tê bilêvkirin. Japonan welatê xwe wekî *Nîppon* an jî *Nîhon* bi nav dikan. Ev bêje, ji karakterên çînî (Çînîya Mandarînî) *rî-ben* a ku kê-m-zêde di wateya “Warê ku Roj jê Hiltê” de hatîye bikaranîn, hatîye dariştin (Meyer, 2022: 11). Karakterên “日本” ê tê wateya “Jêderka Rojê” ku bi vî awayî bi navekî berbelavtir di wateya “Welatê ku Roj jê Hiltê” de hatîye emilandin. Navê *Nîpponê*, li Japonyayê bi piranî di qadên resmîyetê de û *Nîhon* jî bi giştî di zimanê axaftin a rojane de tên bikaranîn. Herweha, ala neteweyî ya Japonyayê li gel bawerîya mîtolojîya japonî angî ji wateya *Amaterasûyê* (Xwedawenda Rojê), ji wateya *Nîhonê* jî sûdê wergirtiye.

Di sedsala 7an de terma *Nîhonê* wekî navê Japonyayê hat pejirandin (Hane, 2023: 23). Berî vê sedsalê, *Wa/Wakokû* û *Yamatoyê* li şûna *Nîhonê* dihate bikaranîn. *Wa*, kevintirîn navê Japonyayê ye û ji alîyê çînîyan ve wekî termeka biçûkxister di wateya “qamkurt”ê de (Meyer, 2022: 26) hem ji bo gelê japonan hem ji bo welatê wan hatîye emilandin. Angî, maneya peyva *Wayê* welatê “cûceyan” e (Clements, 2023: 31).

Navê Japonyayê angî *Nîhon*, di sedsala 13an de ji hêla Marco Polo yê geştyar ku di wî çaxî de di bin desthilatdariya Moxolan de xizmet dikira, ve bi demê re wekî navên têvel *Şîpango* yan jî *Zîpango* (Meyer, 2022: 11) û herweha bi awayê *Cîpangu*, *Xîpangu*, *Xîpang*, *Japón* û *Japan* (Clements, 2023: 22) vediguheze zimanên Rojavayê angî alfebeyî latînî.

1.1.1. Erdnîgarî

Japonya yek ji welatê Rojhilatê Asyayê ye ku ji zêdetirî 6000 hezar giravan pêk hatîye. Ji alîyê lêcihbûna xwe ve wekî di nav “Welatên Pasîfîk” angî “Welatên Okyanûs”an de hatîye binavkirin. Herweha welat, di navbeyna Deryaya Japon û Okyanûsa Pasîfîkê (Okyanûsa Mezin) de cih girtiye. Japonya, berî panzdeh milyon sal, bi pêkhatina Deryaya Japonyayê û ji serê Ewrazyayê li gel tehfandina derve

dirûv girtîye. Wan çaxan, erdê wê têra xwe dûz bû, lê bihevghiştina cihê ku di tebeqeyên tektonîk ên pir mezin (Ewrasya, Pasîfîk û Filipîn) de rûniştîye. Linavketina wan tebeqeyan erdê wê hatîye tewandin û ji ber vê tewandinê gelek çîyayên bilind çêbûne (Clements, 2023: 25).

Topografyaya (devernigarî) Japonyayê ji ber vê yekê ye ku erdekî çiyayî û herêmeka bilind e. Herweha ji ber tebeqeyên tektonîk ên livdar jî gelek zêde erdhêj çêdibin. Li Japonyayê zêdetirî pênc sed çiyayên volkanîk hene ku ji wan şêst çiya di serdemên berê de livdar (faal) bûn (Meyer, 2022: 3). Çiyayê Fujî/Fujî-yama (j.:富士山/Fujî-san), yek ji wan çiyayê volkanîk e ku ew, çiyayê herî bilind (3600 m) ê Japonyayê ye. Li gel darê *Sakurayê* (Kulîlkê Gilyazê) Çiyayê Fujî, wekî mîrateya xwezayî yek ji yên herî giring a nîşaneyîya netewî ya Japonyayê ye. Çemê direjtirîn û mezintirîn ê welatî Çemê Shinanoyê (j.:信濃川/Shinano-gawa) ye ku direjahîya wî 367 km ye. Gola Bîwayê (j.:琵琶湖/Biwa-ko) jî gola herî mezin ê Japonyayê ye ku gol di dîrok û wêjeya japonan de xasma di helbest û bîranînên dîroka şeran de gelekî hatîye behskirin û ji ber wê yekê ji bo japonan goleka pir pîroz e.

Japonya ji hêla kişwerê ve di bin bandora îqlimên Okyanûs û Mûsonê de ye. Ji ber vê di kişwera wê de ji serîyek heta serîyeka dinê cihêrengîyeka pir mezin nayê dîtin (Meyer, 2022: 3). Li welêt, zivistan pir zêde bişilî û havînan jî li gor zivistanê zuwa û germ derbas dibe. Çandînîya hêmî û avî çêdibe û birinc li Japonyayê hilberîna herî giring ê çandinîyê ye. Floraya (gulûgiya) Japonyayê ji ber bandora kişwera Mûson û Okyanûsê gelekî dewlemend e. Ji sêyan duyê (2/3) welêt daristan girtiye.

Di deverên bilind ên Japonyayê de darên wekî kuhnar, ladîn; di cihên perav û nizm de jî darên wekî Qaja Japonî, Mangrov, selwî, narewan hene (Koç, 2020: 126). Darê *Momijî* ango Spîndara Japonî, gelekî binavûdeng in. Li wextê payîzan pelên darê *Momijîyê* rengorengo dibin û şoleneke dîmenî û rewnaq çêdike. Her weha darên gilyaz û alûçeyan jî li Japonyayê berbelav in. *Ume* (Kulîlkên Alûçeyê) û *Sakura* (Kulîlkên Gilyazê) her du dar/çêçekên pîroz in ku weke semboleka demsalî ango hatina werza biharê dinimînin. Ji bilî vê *Sakura* wekî kulîlka neteweyî ya Japonyayê tê pejirandin. Ji aliyê faunayê ve jî welat, çeşîd bi çeşîd in û Meymûnê Makaka

Japonî (Meymûnê Berfê), Mişkê Korê Biçûk a Japonî, Seyê Rakun a Japonî, Qurnewêlka (Margîska avê) Mezin a Japonî ajalên xwemalî (endemîk) ne.

1.1.2. Dîrok

Derheqê destpêkirina dîroka Japonyayê ya Pêşî de nêrîneka yekdeng û hevpar tune ye. Ji ber ku derbarê dîroka Japonyayê ya Pêşî de ti qeydên nivîskî nîne (Hane, 2023: 21). Di gel vê du çavkanîyên sereke derheqê dîroka Japonyayê de hin agahî didine me: Ya yekê vegêranên mîtolojîk/efsaneyî yên ku di metnên nivîskî de cih digirin û ya diduyan jî lêkolînên arkeolojîk in.

Gelek berhemên dîrokî yên Çînî hene ku derbarê dîroka Japonyayê de zanyarî didin. Derheqê Japonyayê de zanyarîyên herî kevintir di qeydên çînîyan de di yên wekî *Dîroka Keyîtiya Weîyê* (PZ 297) û *Dîroka Hanedantîya Hanê ya Dereng* (PZ 448) de cih digirin. *Kojikî* (PZ 712) û *Nîhongî* angî *Nîhon Shokî* (PZ 720) her du berhemên dîrokî yên japonan ên berhevkirî ne ku li gor çîroka kozmogonîya van her du pirtûkan, berî her tiştî erd û ezman hê ji hev veneqetîyabûn angî *In* û *Yo* hê yek bûn (Davis, 2022: 16). Piştî weke hêkeka kaotîk ev yekûn (erd û ezman) mezin dibin û ji hev vediqetin. Dawîya dawî jî erd û ezman çêdibin. *Izanagî* (Sedemkarê Mêr) û *Izanamî* (Sedemkara Jin) di Mîtolojîya Aferîş a japonan de du “îlahên semavî” ne. Peywirên wan ji bona “teogonî” (zayîna yezdanan) û “çêbûna welat/giravan” zarok (xweda/xwedawend) çêkirine. Ev her du îlah da ku li rûyê erdê heyînan çêbikin bi “fermana îlahên semavî” li dinyayê hatine hinartin (Anesakî, 2023: 24).

Piştî şandinê, li dinyayê ji dilopên şoravka (xwêdan?) qevda şûr a *Izanagî* giravek (Onokoro) angî li dinyayê yekem parçeyeka ji axê çêdibe. Li wir *Izanagî* û *Izanamî* dizewicin, zarokê wan ê pêşî *Hiro-kû* (Xwedayê Masîyan) tê dinyayê. *Izanamî* wexta welidîna *Kagu-tsuchiyê* (Xwedayê Agirî) ji ber êşa wê ku dişewitîne, nexweş dikeve, dimire û piştî diçe *Welatê Yomîyê* (Welatê Mirîyan). *Izanagî* jî pey dikeve, diçe *Yomîyê* û li wir ew gemar dibe. Da ku xwe ji wê gemarîyê paqij bike, xwe dike di behrê de û di wê heynê de gelek îlah çêdibin: *Susa-no-vo* (Xwedayê Bahozê) ji bêvila wî, *Tsukiyo-mi* (Xwedayê Heyvê) ji çavê wî yê rastê, *Ama-terasu* (Xwedawenda Rojê) ji çavê wî yê çepê diwelidin.

Ama-terasu, figûra navendî ya mîtolojîya Japonan e (Davis, 2022: 11). Gelê japon, di wê bawerîyê de ne ku Ama-terasu piştî şandina nevîyê xwe (Ninigi) li komgiravên Japonyayê, binemala Malbata Împaratorîya Japonan dest pê kiriye. Ji ber vê ye ku di mîtolojîya japonan de Jimmu Tennō (BZ 660 – BZ 585) hem yekem avakarê Japonyê ye û hem jî yekem împaratorê mirov ê japonyayê ye. Bi vî awayî bi dawîbûna derheqê mîtolojîya kozmogonîyê de dîroka efsanewî ya hikûmranîya hanedanî û welatî (Japonya) dest pê dike (Anesakî, 2023: 33).

Li gor xebatên arkeolojîk her çiqas nêzîkî BZ 30.000 sal berê li Japonyayê jêmayîyên mirov ên kevintirîn hatibin dîtin (Clements, 2023: 15) û her weha çanda Japonî ya yekem xwe spartibe Serdema Mezolîtîkê (xasma BZ 14.000î) jî dîroka Japonyayê bi tevahî di navbera şeş serdemên siyasî (jidaî) de tê dabeşkirin: Ji Serdema Prehîstoryayê heta PZ nêzîkî sala 400î, ji sala 400î heta 700î, ji Sala 700î heta 1200î, ji sala 1200î heta 1600î, ji sala 1600î heta nêveka 1850an û ji nêveka 1850an (1868) heta roja me. Meyer, di pirtûka xwe ya bi navê *Dîroka Japonyayê* (Înkilâp, 2022) de bi giştî bi vî awayî dîroka Japonyayê dipole:

1. Japonyaya Kevneşopî (Ji Serdema Prehîstoryayê Heta Sala 1185an)
 - a.) Japonyaya (Serdema) Kevn (PZ heta nêzîkî Sala 400î)
 - b.) Japonyaya (Serdema) Yamatoyê (Nêzîkî 400-700î)
 - c.) Japonyaya (Serdema) Narayê (710-794an)
 - d.) Japonyaya (Serdema) Heianê (794-1185an)
2. Japonyaya Feodal (1185-1868)
 - a.) Japonyaya (Serdema) Kamakurayê (1185-1333an)
 - b.) Japonyaya (Serdema) Ashîkagayê (1333-1603an)
 - c.) Japonyaya (Serdema) Tokugawayê (1603-1868an)
3. Japonyaya Modern (1868-1945)
 - a.) Japonyaya (Serdema) Meijîyê (1868-1912an)
 - b.) Japonyaya (Serdema) Împaratorîyê: Hêza Cîhanê (1912-1922an)
 - c.) Japonyaya (Serdema) Împaratorîyê: Aşitî û Şer (1922-1937an)
 - d.) Japonyaya (Serdema) Împaratorîyê: Şerê Cîhanê yê II. (1937-1945an)

4. Japonyaya Piştî Şerî (Ji Sala 1945an Heta Roja Me)

a.) Japonyaya ku Hatîye Dagirkirin (1945-1952an)

b.) Japonyaya Îroyîn (Ji Sala 1952an û pê ve)

Ev serdemên hanê navên xwe, yan ji navend/paytextên coxrafî yên xwedîhêzên siyasîyan yan jî ji malbat/xanedanên ku bi ser navê împaratorîyê ji bona biryaran xwedîmtîyaz in, standine (Meyer, 2022: 11).

Ji Serdema Prehîstoryayê piştî zayînê heta nêzîkî sala 400î çanda Japonyaya pêşî çêdibe. Herçendî ku li gor mîtolojîya japonî wekî fermî roja avabûna (11ê Sibata BZ 660an) Dewleta Japonyayê (Dewleta Yamatoyê) ji alîyê împaratorê efsanevî Jimmu Tennō ve hatibe avakirin jî ji ber şerên navxweyî esas PZ piştî salên 400î dîroka siyasî ya Japonyayê (Yamato) dest pê dike. Di Serdema Yamatoyê (Nzk 400-700î) de çanda çînê gelekî li ser birêveberî, ekonomî, çandinî, avahîsazî, huner, sinc, perwerde, bawerî, ziman, wêje û hwd. a Japonyayê dibe. Ji alîyê klanên dî ve piştî qelsbûna hikumdarên Yamatoyê, bi giştî di rêveberîya dewletê de ji sedsala 5an ta sedsala 12an çîna arîstokrasîya serayê û çîna leşkerî bibandor in. Hikumdarên Yamatoyê ji ber ku ji malbata împaratorîyê angî ji împarator Jimmuyê tên, ti wextan ti kes têkilî hilweşandina pergala împaratorîyê nekiriye û wekî sembolîk împaratorî hê jî îro li Japonyayê didome.

Bi Serdema Kamakurayê (1185-1333) re li Japonyayê “Vedora Feodalîyê” angî bi qewlê Meyerî (2022: 71), “Vedora Navîn a Japonyayê” dest pê dike û li gel hilweşandina Şogûntîya Tokugawayê (1603-1868an) bi dawî dibe. Di vê vedora feodalîyê de, ku kê-m-zêde heft sed sal dom dike, di desthilatîya dewletê de sîstema Şogunî, çîna Daimyō û Samûrayan hêzdartir dibin. *Şoğgun* (j.:將軍/Fermandarê Artêşan) angî navê wî yê berbelavtir *Şogun*, navnasê ku di vedora feodalîya Japonyayê de ji fermandarî dikin re, tê gotin. Kesên ku bûne Şogun, di *bakufuyan* (j.:幕府/Konê Baregehê) de angî di hikûmeta konê (Clement, 2023: 120) de derbarê şer û rêveberîya dewletê de biryar distandin. Pergala Şogunîyê, bi vî awayî hetanî Serdema Meijîyê, Japonyayê birêve bir. *Bushi* (j.:武士/Pêşmerge) şervanê pergala Şogunî ye ku di heman wextê de çîna Samûrayê pêk tîne.

Samûray/saburau (j.:侍/Ya/yê ku xizmetê dike angî xizmetkar) wekî şovalyeyên di Ewropaya Vedora Navîn de şervanên esilzade û bijarte yên Japonyaya

wî demî bû. Şervanên Samûrayê, ku çîna leşkerî ya bingehîn e, wêrekî û şervanîya xwe ji raman û hunera *Bushîdō*yê digirtin. Bushîdō (j.: 武士/Rêya Şervanîyê) esas felsefeyeka jîyanî ya samûrayan e. Bi vî alîyê ve *Bushîdō*, rêbaza şervanîyê wîrdetir geşedaneka şexsî, riya ronîbûn û kamilbûnê ye (Akman, 2013: 124).

Di Serdema Ashîkagayê (1333-1603) de Şerê Oninê (1467-1477) desthilatîya siyasî ya împaratorîyê qels dike ango otorîteya navendî hêza xwe winda dike. Ji vê bêistiqrarîyê *Daimyō* (j.: 大名/Navê Mezin) yê ku xwedîyê gelek erd û zevîyan in, sîde werdigirin û herêmên xwe dikin di bin kontrolên xwe de. Bi vî xurtbûnê *Daimyō*yan wekî derebegan tev digerin û da ku herêmên xwe firehtir û desthilatên xwe hêzdartir bikine bi hev re şerî dikin. Pevçûnên wana dibe sedema *Serdema Sengokuyê* (Nzk 1454-1603) ku ev serdem wekî “Serdema Dewletên ku Şerî Dikine” (BZ 475-221) ya Çînê tê binavkirin. Ji nîveka sedsala 15an û pê ve axayên şer ên herêmî *Daimyō*, ji ber bidestxistina iqtidarê li nava hev dikevin û welat (Japonya) dikeve li hawira şerê navxweyî ango serdema “dewletên ku şerî dikine” (Hane, 2023: 40).

Vegirtinên Moxolî (1274-1281) û geşt û geştîyarên Rojavayîyan -temasa yekem di sala 1542an de ji alîyê portekîzîyan ve çêdibe- du rûdanên giring ên Serdema Kamakurayê û Ashîkagayê ne. Di vegirtinên Moxolîyan de ku geştîyarê navdar Marco Polo jî tê de ye, hin herêmên Japonyayê tene dagirkirin. Seferên Rojavayîyan jî heta serê Serdema Tokugawayê ango li sala 1638an bi qewirandina portekîzîyan û li sala 1641ê derxistina holandîyan didome.

Bakufuya Tokugawayê ango Şoguntîya Tokugawayê di dîroka Japonyayê de wekî *Serdema Edoyê* jî tê zanîn. Serdema Tokugawa, zêdetirî du sed û pêncî sal (1603-1868) berdewam dike û ji ber polîtîkayên îzolasyonîst ev serdem wekî *Sakoku* (j.: 鎖国/welatê girtî) tê binavkirin. Îstîkrarî, aramî, xebat û lebatên Rojavayîyan (mîsyonertî, mêtinkarî hwd.) esas sedemên polîtîkayên xwe- tecrîdkirinê ne. Li gor Meyer (2022: 105), Japonya heta dûmahîya du û nîv sedsalê dê kêfa xwe ya înzîwaya netewî û aramîyê domandiba.

Bi împaratorîya Mutsuhitoyê (1852-1912) re ku împaratorê 122. e, Serdema Meijîyê (1868-1912) bi gotineka dî *Restorasyona Meijîyê* dest pê dike. Ji ber ku di împaratorîya wî de gelek guherîn û pêşketinên giring di warê siyasî, leşkerî, civakî, perwerdehî, ekonomî hwd. de peyda bûne bêjeya *Meijîyê* (Dewleta/Kesê Ronak)

hatîye bikaranîn. Japonya, di domahîya 45 salî ya serdema Meijîyê de sazîyên xwe yên siyasî, ekonomîk û civakî modern kirin û bû hêzeka cîhanî (Meyer, 2022: 141).

1.1.3. Civak

Niştectih/akincîyên ewil ên Japonyayê di Serdema Paleolîtîk a Serîn (Nzk 50.000-10.000) de hê Japonya ji parzemîna Asyayê veneqetîyayî, hatine. Bi gotineka dî di dawîya Serdema Cemedî (Nzk 14.000-10.000) de ji Asyaya Bakûrî bi qefleyên klanî (babistîn) li Komgiravên Japonyayê xwecihî bûne.

Di nav serdemên prehîstoryaya Japonyayê de ji vê dêmanîbûna mayînde ya ku ji gelek etnîsîte, klan (j.:氏/Uji) û çand ên têvel pêk hatinê re *Serdema Jōmon* (BZ 14.000-300) tê gotin. Hêmanên nijadî yên japonî yên kevn û pircure, jêzayên têkilhev, têkilî hev bûn. Bi vî rengî di serdemên dîrokî de -PZ nêzîkî 400î- wekî nijadî japonan, civakeka homojen ango bi çand û zimanekî hevpar re yek bûye, çê kirin (Meyer, 2022: 22).

Derbarê jêzaya nijada japonan de ji ber agahîyên gelek hindik (Meyer, 2022: 21) lihevkirineka zanîstî tune ye. Di gel vê, koma xwecihî yê herî kevn li Komgirava Japonyayê gelê *Ainuyê* ye. Îhtimal e ku, di serdemên berê de pêşengên grûpeka ku ji nijada spî veqetîya ye (Meyer, 2022: 22). Gelê *Ainuyê* di Serdema Prehîstoryayê de li Komgirava Japonyayê gelekî berbelav bûn. Ainuyan herçendî ku di dîroka Japonyayê de tûşî êrîş û tunekirinê mabin jî îro li Japonyayê bi gelheyeka hindik (Nzk 20.000-25.000) piranî li Girava Hokkaidōyê dijîn.

Berhemên dîrokî yên Çînî wekî *The History of the Wei Kingdom*¹ (PZ 297), *The History of the Later Han Dynasty*² (PZ 448), *Xīn Tángshū*³ (PZ 1060) û yên Japonî *Kojikî* û *Nihongî* jî derbarê niştectihên pêşî yên japonan de hin agahîyan didin. Li gor berhemên dîrokî yên Çînî yekem yek ji rûniştvanên Japonyayê gelê *Emishiyê* (Hovên Canberîyê) ye. Li gor Meyer (2022: 23) *Emishiyan* pêşî li Girava Kyūshūyê rûdiniştin û paşî ber bi bakûrê ango Hokkaidōyê ve hatine koçkirin. Ji ber vê yekê ye dibe ku gelê *Emishiyê* bi Ainuyan re wek yekûdu bûne. Li gel vê, gava ku Çînîyan

¹ Dîroka Keyîtiya Weîyê.

² Dîroka Hanedantîya Hanê yê Derengtir.

³ Pirtûka Tang a Nû.

cara pêşîn (Têkildanîna ewil PZ sala 57an dibe) bi xwecihîyên Girava Japonyayê re dikeve têkilîyê ji bo şayesandina wan bêjeya “Wa”yê bi kar tîne. Çîniyan bêjeya “Wa”yê, ji ber ku niştecihên giravî kesên bejn qut in, bijartine.

Mîtolojî -nemaze mîtolojîya Amatera-suyê-, anîmîzim, bawerî/doktrînen wekî şîntoîzm, konfîçyanîzm û bûdîzmê hem di civakbûna japonan de hem jî çînçînîbûn û dirûvgirtina civakê de roleka gelekî mezin digire. Ev hêmanên bingeîn hema hema civaka japonan derdixîne hole. Herweha veguherîna dîrokî yê serdemî civaka japonan jî diguherîne. Ji serdema prehîstoryayê heta serê Serdema Yamatoyê hem di malbatê de hem di civakê de hêza dayikanî (matriarchal) xuya dibe. Li Japonyayê di serdemê pêşwext de nîşaneyên ku ji civakeka maderşahî yan jî qene ji civakeka binyatdayikî piştrast dike, hene (Hane, 2023: 14). Heta dawîya serdema Heianê ango dûmahîka sedsala 12an jin û mêr ji hev cuda dijîyan û zarokên wana li gel dêya xwe li cem malbata dayikê dijîyan. Mêr/bav rasterast ne endamê malbatê bû, bi gotineka dî ew bi tenê serîlêdana malbata xwe dikir û diçû. Ji ber vê yekê ye ku di malbatê de serkêşîya jinê hebû.

Di Serdema Yamatoyê de bi pejirandina rê û rêzanên sincî yê konfîçyanîzmê û piştre jî di sedsala 12an de geşbûna çîna Samûrayan re li Japonyayê hem di nav malbatê de hem di nav civakê de pergala hiyerarşîk û baviksalarî xurttir dibin. Feraset û hiyerarşîya konfîçyanîzmê bi giştî civaka japonî wekî kesên “serdest” û kesên “binî” ji hev vediqetandin. Civaka Yamatoyê civateka hiyerarşîk, kevneşop û girtî bû. Civak ji *Ujî* yê ku di rêveberîyê de serdest in, ji *be* yan jî *tomo* yê ku di hêla ekonomî û çandîniyê de ji *Ujîyan* re xizmetê dikin, ji burjiwa û xulaman (yatsuko) pêk dihatin (Meyer, 2022: 32).

Di serdema Narayê de *Heijō-kyō* (Naraya îro) û di serdema Heianê de jî *Heian-kyō* (Kyotoya îro) dibin paytextên Japonyayê. Ev bajarên pêşî û mayinde yê Japonyayê, bi xwe re zimreyeka bajarî tîne. Li gel vê, gundîyên ku bi çandina birincê û masîgirîyê debara xwe dikiran, ji împaratorîya navendî ve û bi destê şefên herêmî ve dûçarî bacên giran diman. Di van serdeman de reformên ku derbarê bac û erdên gundîyan de hatin kirin jî di nav gundîyên japonan de ji bêaramî û bêdadîyê re nabe çareserî. Piştî bi qelsbûna otorîteya navendî re xweyî mal û milkên herêmî ji hêla ekonomîk, leşkerî û siyasî ve ber bi serxwebûnê ve diçin. Di gel vê, di heman wextî

de di nav zimreyên seray û arîstokrasîyê de wêje -bi taybetî helbest- li pêş dikeve û bûdîzm bandoreka mezin li ser wan dike. Guherîna civakî di qadên wekî siyasî, leşkerî, çandî, ekonomî, bawerîyê de bi awayekî lezayî pêk dihat.

Di serdemên Kamakura û Ashîkagayê de împaratorên ku di bin bandora bûdîzmê de mane, xwe vedikişînin keşişxaneyan û valahîyeka desthilatîya siyasî çê dibe. Li gel desthilatîya çînên Şogun, Daimyō û Samûrayê ku bi desthilatîya wan re serdema Japonyaya Feodal dest pê dike, xeta çînîbûna civakî ya di nav japonan de bi temamî diyar dibe. Ji alîyekî istîlayên Moxolî û şerên navxweyî, ji alîyekî di jî neteweperestîya olî angî bûdîzmê û xebatên mîsyonerên xirîstîyan û Rojavayîyan, di nav civaka japonan de hestên neteweperestîyê çê kirin. Gundîyan, ji ber zext û zordarîya Daimyōyan berê xwe didin bajarên û ev jî ji hêla hilberîna civakî ve zarar û xesareka mezin derdixîne holê.

Di vederîya (îzolasyon) Serdema Tokugawayê (Edo) de piştî pêkanîna istiqrara siyasî, pergaleka hişk a civakî hate avakirin. Şogunîya Tokugawayê; samûray, gundî, pîşekar û bazîrganên (ango zanyar, gundî û bazîrganên ku xwe dispêre hiyerarşîya konfîçyûzî) ku dikevin di nav rêzandîneka çînî ya hiqûqî de, saz dike. Ji kesên ku derveyî vê senifandîne dimînin re komika “gemar” angî wekî *heramoyî* dihatin binavkirin (Hane, 2023: 14). Gundîyên ku ji cih û warên xwe koç kirî li Edoyê û li bajarokan (qesebe) bi cih bûn. Qesebe, rêyên ku di şogun derbas dibin de da ku bazîrgan, han û beşa xizmetkarîyê ji wan sûde werbigirin, peyda bûn (Meyer, 2022: 107). Çand û jîyana qesebeyî di vê serdemê de li ser civakê gelek bibandor bû. Di nav civakê de nivîsandîna û xwendîna berbelav bû, li Edoyê wî demî kesên xwenda ji nivî bêhtir bûbû. Ji bilî van, di vê serdemê de civaka japon gelek caran bi nêza û xelayê re rû bi rû dimînin.

Bi Restorasyona Meijîyê re piştî hilweşandîna sîstema Bakufu (Şogun) û Daimyōyê, împaratorî car di bi gelê japon re tîkiliya xwe saz kir. Di Serdema Meijîyê de seferberîya nûbûn, guherîn û veguherîna civakî hatê destpêkirin. Bingeha siyasî ya Japonyayê gava ber bi modernbûnê ve diçûya, di jîyana ekonomîk û civakî de jî guherînen senkronîk hate xuyakirin. Jiyana gund, bi tixûbên kevneşopî xwe berdewam kir, lê bajar mezin bûn û cihên ku herî zêde guherînen civakî lê çê bûyî, herêmen bajarî bûn (Meyer, 2022: 157).

Di gel ji holê rakirina sepanên feodal ên Japonyayê, veqetîna çînî ya civakî di Serdema Meijîyê de jî hate parastin û bi tenê navên wan hate guhertin. Zaibatsu, li şûna bazirganên mezin “Daimyōyan” û olîgarşîyê japonî “Genrō” jî li şûna rêveberîya Bakufuyê dikevin dewsa hevdu. Arîstokratên serayê û Daimyōyên berê wekî *kazoku* (esilzade), samûrayên berê yên payebilind wekî *shizoku* (klana samûrayê) û ên mayî jî wekî “avam” ango gelê ji tebeqeya jêr hatin senifandin. Komên heramoyî (derveyî tebeqeyê) herweha wekî “avama nû” hate pênasekirin. Bi vî awayî cudahîyên çînî hate zagonîkirin (Hane, 2023: 117).

Japonya îro ji alîyê çandî û etnîkî ve civakeka homojen e. Îro li Japonyayê nifûsa japonan, %98 e. Yên mayîn xwecihîyên wekî Ainu, Burakumin, Ryukî; Kore, Çîn, Taywan, Filipînî û penaber in. Di nav van penaberan de kurd jî hene ku li gor texmînan ji sala 2024an pê ve li Japonyayê zêdetirî 2000 kurd dijîn û ji nîvê wê zêdetir jî ji ‘eşîra Mahkan in (Aktan, 2025: 44). Piranîya kurdên ku li Japonyayê dijîn, li eyaleta Saîtamayê bajarên Kawaguchî û Warabîyê niştecih bûne. Li gor Aktan (2025: 28), di sala 1990î de yekem car kurdek (Mehmet B.) li Japonyayê akincî bûyê û ji wê salê pê de kurdên ku wekî penaber diçin li Japonyayê tûşî statûya “*Karihōmen*”ê dibin. *Karihōmen*, bêjeyeka japonî ye ku tê wateyên wekî “berdana demkî”, “serbestîya venerînî” (Aktan, 2025: 84). Ev miamele, ji hêla hiqûqî ve ji bo kesên ku îltîca dikin re destûra mafê niştecihbûn û statûya penaberîyê nade, miltecî li gor vê polîtîkayê li Japonyayê tim û tim kirariya “ragirtî”yê dibînin. Ji ber vê yekêye ku ji bo penaberan, penaberên kurd *Karihōmen*, bi qewlê Aktan (2025: 84), wekî “statûya bêstatûtî” û “sîstema nedîyarî”yê ye.

1.1.4. Çand

Çanda japonan, di çaxa me de li dinyayê wekî yek ji çanda herî bibandor derketîye pêş. Ji saya vê tesîr û hêzê Japonya li seranserî cîhanê wekî “sûperhêzeka çandî” tê zanîn. Japonya, ji hêla kevnare, dewlemendî, xwedîlêderketin, aheng û hevsengîya çanda kevnêşopî û çanda nûjen a xwe ve balê dikişîne. Serdemên wekî *Çanda Jōmon*, *Yayoi* û *Kofun*; têgihên wekî *Yamato-damashii* (j.:大和魂, Gîyana Yamatoyê/Japonî) ango *Yamato-gokoro* (j.:大和心, Dilê Yamatoyê/Hişê Japonî)

Nihonjinron (j.:日本人論/Lêkolînên Li Ser Japontîyê) *Wakon Yasai* derbarê çanda japonan de çarçoveyeka giştî didin.

Çanda Jōmonê (BZ 14.000-300) ku esas çanda pêşî ya japonan tê pejirandin (Meyer, 2022: 23), navê xwe ji dirûvên li ser hin amanên wekî seramîk, xarûf, dîzik û xilikê ku piştî encamên xebatên arkeolojîk ên li ser serdema prehîstoryaya Japonyayê hatine kirin, digire. Arkeolog Edward Morse, di sala 1877an de ji bo pênasikirina van cureyên dîzik û xilik ên prehîstoryaya Japonan bêjeya “bişûn benik”ê bi kar anîye (Clement, 2023: 29). Ev nexş û nîgarên sade, prîmîtîf ên ku li ser dîzik ên ji gil (clay) hatîye çêkirin, ji ber şiklê bènîkî di japonî de bêjeya “Jōmon” (j.:縄文/dirûva benik a ji kayê) hatîye bikaranîn.

Mirovên ji çanda Jōmonî, li gel nêçîrvanî, komkerî û masîgirîyê, bi çandîniyê re jî mijûl dibûn. Amûrên darîn, bi awaya *lakeyê* (betankirin) dihat sîqalkirin. Heyberên ji sirûştê diperestî ango anîmîst bûn. Cihwarên giring ên sirûştî navenda perestîna olî bû. Yê mirî bêtabût û bêgor dihatin binaxkirin (Meyer, 2022: 23). Herweha di xaniyên ku nîvê wê çalê de diman û tê de li gel tîfikeka navendî xwe germ dikiran, xwarina xwe dipijandin.



Wêne1: Sofalîn/Seramîkê Jōmonê (BZ 14-8 hezar sal) Mûzeyaya Neteweyî ya Tokyoyê, Japonya (Url 1).

Çanda Yayoi (BZ 300-PZ 300) ku navê xwe ji herêmekê nêzîkî Tokyoyê distîne, ji hêla serdemê ve ji ber bikaranîna metalûrjîyê (hesin û bronz) û ji bona çêkirina amûrên curbicur (şûr, rim, kember, tiştên xeml û kêrsim, eynik, û hwd.)

wekî *Serdema Hesin a Japonyayê* tê binavkirin. Birinca ku ji Çînê hatî, di zevîyên çiltûkan de çandina wê hat destpêkirin û li gel çandina birincê gelek nûjenî yên mayînde di çanda japonan de çê bûn. Li nêzîkî van zevîyan komên ku ji sed malbatan zêdetir derket holê û jîngehên (kuni) mezintir hat avakirin. Herweha dîsan *sake*⁴ ku bi rêya çanda Çînê hatîye, piştî çandina birincê gelekî berbelav dibe.

Serdema Kofunê (300-600) nave xwe ji çanda gor û girên ku ji bona kesên ku ji çîna desthilatê ne ango bi qewlê Meyer (2022: 25) cihên çalkirina rahîb-qralên Japon ên yekem, distîne. Bi awayên çargoşe, gilover, scallop (qalikê şeytanokê bawesîn) û kuna mifteyê bi tevahî çar cureyê Kofunê hene. Di nav van Kofunan de awaya gorên “kuna mifteyê” di çanda japonan de yên herî berbiçav in. Piştî pejirandina bûdîzmê çanda binaxkirina mirîyan tê terikandin û mirî li gor bawerîya bûdîzmê tîr şewitandin. Li şûna van gor û girên mezin, bi bandora bûdîzmê perestgehên bûdîstî tîr avakirin (Clements, 2023: 63).



Wêne 2: Girê Împarator Nintokuyê, Kofuna Daisenê, Osaka, Japonya (Url 2).

Di Serdemên Yamato, Nara û Heianan de ango bi giştî ji sedsala 6an heta sedsala 12an di çanda japonan de li gel tesîra çanda çîn û bûdîzmê, di warên wekî huner, avahîsazî, cil û berg û çanda wêjeyîyê de guherîn û pêşketîyên mezin çê dibin. Bi bandora çanda Çînê re di Serdema Heianê de û piştî serdemê çanda xwecihî û wêjeyê dest bi pêşketinê dike (Hane, 2023: 16).

⁴ Şeraba ku ji birincê tê çekirin. Îro li Japonyayê û li cîhanê wekî “Vexwarina Netewî ya Japonyayê” tête zanîn.

Di qada hunerê de wekî şeweya wêne ya japonî ya klasîk, *Yamato-e* derdikeve. *Yamato-e*, esas ji çanda Xanedaniya Tang (618-907) a Çînê sûdê werdigire û term ji bo ku ji *kara-eyê* ku wekî hunera wêneya modern a Çînê tê zanîn, cihê bê kirin, hatîye emilandin. Ev stîla wêneyî hem wekî *kakemono/kakejiku* (kevalê bibendik), *byōbu* (paravanên ku tê pêçandin) û *shōji* (panel/derî û paceyên kaxiz û bizornax) di avahîyan de û hem jî wekî *e-makimono/emaki* (destnivîsar/tomarên çîrokî yê biresm û xijikirî) di *monogatari* (çîrok) û *wakayên* (helbest) cureyê wêneyî de dihate bikaranîn.

Çanda arîstokrat xwe bi vê formên hunerê da nîşanîkirin û di dêlindêzan de, di edet û karê xwarinan de û di cil û bergan de narinîyeka nû gerîyan (Meyer, 2022: 64). Herweha, ev hunera resimandinê (îlustrasyon) piştî ji şeweya wêneyên ku di serdemên cihê cihê de hatine bikaranîn re dê bibe bingehek. Di Serdema Kamakurayê de *nise-e* (portre), di Serdema Ashikagayê de *sumi-e* (hunera hibrê ya japonî) û di Serdema Edoyê de jî *ukiyo-e* li serdemên xwe di hunera wêneyê de dê derdikevin pêş. Li gel hunera xweşnivîsînê (kalîgrafi) cureyên *yamato-eyê* (bi taybetî *sumi-e*) di çanda Edoyê de ji hêla estetik û hostayîyê ve dê du hêmanên bingeîn ên haîkûyan bibin.



Wêne 3: Yamato-eyek ji Çîroka Genjîyê (Genji Monotagarî), sedsala 11an (Url 3).

Mîmarîya kevneşopî ya japonî, bi giştî di avahîyên wekî *minka* (xanîyê japonî), *chashitsu* (jûra çayê), perestgehên olî yê *jingû/jinja* (şîntoîzm) û *tera* (bûdîzm), niştigeh û hêwirgehên *kyûden* (seray), *teitaku* (koşk) û *jō* (kela) yê

împaratorî, şogun, samûray û daimyōyan de xwe nîşanî dike. Xanîyên minkayê tev ji kereseyên depîn dihate çêkirin. Avahîyên kevneşopî ya japonî, *noka* (xanîyên çewlik), *gyoka* (xanîyên masîgiran), *sanka* (xanîyên çiyayî) û *machiya* (xanîyên bajarî) cureyê minkayê ne.

Ev avahîyên biçûk, ahengdar, sade û yek qat (piranîya machiyayan du qat bûn) bi saya kolekên (stûn) dep, banê wan dihate bilindkirin û zexmkirin. Herweha di van xanîyan de ji bo montekirin û avakirinê bizmar nedihat bikaranîn, li şûna bizmaran *wagoya* ango gihanekên textîn ên ku li nava hev tîn xistin, hatine emilandin.



Wêne 4: Xanîyekî Kevneşopî ya Japonî (minka), Jousou-shi, Japonya (Url 4).

Avahîsazîya *chashitsuyê*⁵ (j.:茶室/"jûra/xanîyê çayê") stîla *sukiya* ya japonî ye ku ji bo vexwarin û seremonîya çayê hatîye avakirin. Ji Çînê di navbera sedsalên 7-8an de piştî hatina çayê (çaya hêşîn) bi bandora şintoîzm û bûdîzmê (xasma zen-bûdîzm), wekî şûnwarên taybet ên rêûresmên fermî û herweha ji bo medîtasyon û *satorîyê* (ronîbûn) wekî xelwetxane hatine emilandin. Çanda zenê bi saya armonîya fikr û raman ên ku ji derve hatî û gerdîşa xwecihî, hunerên di jî bi pêş xist. Di nav van hunerên ku ji Çînê hatî de merasîma çayê (chanoyu), vesazkirina hewş û çîçekan (ikebana) hebûn (Meyer, 2022: 96). Hewşên ziwa (karesansuî yan jî sekitekî) û

⁵ Wekî term, esas piştî Serdema Edoyê tê bikaranîn. Berî serdemê bêjeya "chanoyu zashiki" (ji bo chanoyuyê odeya rûniştinê) dihate bikaranîn.

hewşên bi awayê birk/hewzê, di mîmarîya hewşên japonî de du peyzajên hunerî yên sereke ne. Hewşên ziwa, ji qûm û berhûrikên spî pêk tên û ewana avê sembolîze dikin. Herweha hewşên bihewz jî ji av, pir, dar, kevîran teşe digirin.



Wêne 5: Kevneşopîya Avahîya Çayê ya Japonî (chashitsu) (Url 5).

Avahîyên chashitsuyê, li gel hewşên *rojîyê* (hewşê japonî, rêya şevnemê) û felsefe û estetîka *wabi-sabîyê*, çanda dêlîndêza çayê ya japonî (chanoyu yan jî sadô/chadô, “rêya çayê”) pêk tîne. Dêlîndêza çayê ya ku mohra xwe li ser xwerûtî, cidîbûnî, maxolanî, tenêfî, aramî, bixwekarîbûn û hestên bihendazetî û xwînsarîyê danîye, rewşa şênberbûna estetîka zenê ye (Hane, 2023: 56-57). Li gel van, ev seremonî, yek ji wan mîrateyên herî qedîm û mayînde yên çandî yên Japonyayê tête nîşanîkirin.



Wêne 6: Sadō/chadō, kevneşopîya seremonîya çayê ya japonî (Url 6).

Kîmono (j.:着物/tiştê ku tê wergirtin/cil) ya ku wekî cil û bergê kevneşopî û netewî ya japonan tê zanîn, esas di Serdema Heianê de şiklê xwe yê îro digire û piştî çanda Heianê berbelav dibe. Li gor hin çavkanîyan koka wê ji şeweya cilê *Pao* ya çînîyan tê; li gor hin çavkanîyan jî di sedsala 5an de destpêka têkîlîya çandî ya bi geş a ku di dema navbeyna Çîn û Japonyayê de, ji *Hanfuya* Çînê tesîr digire û bi vî awayî derdikeve holê (Bayburtlu, 2018:60). Bi gelemperî cilê kîmonoyê ji cawa hevrişimê tê çêkirin. Hem ji alîyê jinan ve û hem jî ji alîyê mêran ve tê lixwekirin. Ji cilekî wirdetir di heman demê de kîmono li gel dirûv û rengê xwe yê teşîd teşîd û rengorengo wekî semboleka çandî di civaka japonan de cih digire.

Kîmono, kirasekî biberstûk, mildirêj, bişiklê Tyê û hilû/dûz a ku heta dirêjî gozekê dibe, ye. Bi şûtikeka dirêj ku wekî *obi* tê binavkirin, ji piştê re tê girêdan. Bi piranî bi filal/sandalên text wekî *geta* yan jî *zori* tê binavkirin, û goreyê *tabîyê* re tên wergirtin (Bayburtlu, 2018: 57).

Di çanda cil û bergên japonan de bi giştî du cureyên cilan hene ku *wafuku* (cilên japonî) cilên kevneşopî û netewî tê de ne û *yōfuku* (cilên Rojavayî) jî cil û bergên biyanî û modern temsîl dikin. Kîmono jî wekî yek ji cilên wafukuyê tê nîşanîkirin.



Wêne 7 : Di salên 1870yî de Jineka Japonî ya bi Kîmonoyî (Url 7).

Avahîyên mîmarî *kyūden* (seray) û *jō* (kela) bi taybetî piştî avakirina bajarên mezin ên wekî Heian-kyō, Edo û bi derketina, hilbûna çîna leşkerî ango şogun û samûrayan zêde dibin. Bi gotineka dî di serdemên şoguntî ya Japonyaya feodal de ji bona niştîngeha malbata împaratorî; ewlehî, xweparastin, şêwirgeh, hêwirgeh û baregeha şogun û samûrayan hatine avakirin. Qesra Kyōto ya Împaratorî (Kyōto-gosho) û Qesra Tokyo ya Împaratorî (Kōkyo) du serayên herî giring ên Japonyayê ne. Li gel vê, Kinkakujî (Koşka Zêr) û Ginkakujî (Koşka Zîv) jî du avahîyên mîmarî yên giring ên ji çanda şogunîyê ne.



Wêne 8: Kōkyo (Qesra Tokyo ya Împaratorî), Tokyo, Japonya (Url 8).

Çîna leşkerî ya samûrayê, di nav maweyeka dirêj a zêdetirî hezar salî de ji bilî hêla xwe yê siyasî û şerwanîyê li derdora xwe çandeka samûrayî jî didirûvîne. Bushiyan (şervan) pêşî wekî hizmetkarên leşkerî (samûray) vatinîya xwe bi cih dianîn. Piştî di sedsala 12an de wekî qehremanên leşkerî derdikevin holê (Meyer, 2022: 75) û da ku piştî dîlgirtinê ji aliyê dijminan ve êşkence û serjêkirin neyên kirin, rêbaza *seppuku* (xwekuştin) yan jî navê hê berbelavtir *harakirîyê* (zik dirandin) dikiran.⁶

Samûrayan wekî cil û bergên şerî; zirxên *ō-yoroi*, *men-yoroi*, *dō-maru*, *haraate*, *haramakî* û *kabutoyê* (xûde) li xwe dikirin. *Tachî* (şûrên dirêj), *katana*, *ōdachi* (şûrê mezin), *wakizashi*, *nagamakî*, *tantō* (kêrê kin), *naginata* (kêrê birot) cureyên şûrên japonî (*nihontō*) ên herî navdar in ku ji aliyê samûrayan ve dihate bikaranîn. Herweha, wekî alavên şerî *yumî* (kevan), *ya* (tîr), *yarî* (rim) û *tanegashima* (çek) jî dihate emilandin. Li gel van, *jujutsu*, *kenjutsu* û *naginatajutsu* wekî hunerê lêkdanê yê japonî (*budō/bugyō*) tê zanîn ku ev hunerên lêkdanê jî ji nav samûrayan derketine holê. Ji xeynî hunerên lêkdanê, gulaşa Sumō yan jî Ōzumōyê di nav çanda kevneşopîya japonan de wekî lîstîkeka werzîşê û di heman awayî de werzîşa netewî ya japonî tê zanîn.



Wêne 9: Bi cil û bergên xwe yê gerdîşî samûrayek (Url 9).

⁶ Ev şewaza xwekuştinê di Şerê Cihanê yê duyem de ji aliyê şervanên pilot ên japonî ve xwe vediguherîne *kamikazeyê* (Bayê Xwedayî).

Bi tesîra şîntoîzm û bûdîzmê mîmarîyên resen ên perestgehên herî giring ên çanda japonî hatine avakirin. Mabedên şîntoîst jîngû/jînja, cihê *kamîyan* (yezdan) in û ji ber vê yekê ye ku esas ne wekî perestgeh, wekî serdangeh ango cihên ku tiştên pîroz tîne veşartin, tîne ziyaretkirin. Îse Jîngû, Izumo-taisha, Atsuta-jîngû perestgehên şîntoîst ên herî giring û navdar in. Perestgeha Îseyê, li ser navê Amaterasuyê hatîye çêkirin. Bi pêjirandina bûdîzmê re ji sedsala 6an pê ve, perestgehên ku li gor bawerî, raman, tema û hêmanên bûdîzmê teşe girtine, tîne avakirin. Piranîya avahîyên perestgeh ên bûdîstî (-dera/tera) li cem perestgehên şîntoîst hatine çêkirin û gelek caran ji ber şibandina hev bi hêsanî ji hevdu nayên veqetandin. Bi giştî mîmarîyê her du perestgehan ji darîne rengê sor (hindik bin jî yê ji kevîr û libîn çêkirî jî hene) û herweha ji banê hevkerîti (simetrîk) û bigoşe hatine avakirin.

Pagoda (j.: tō/buttō) cihê avahîyên bûdîstî ne ku piranî ji awaya barûyê (qûle) depîni û pîrqaî pêk hatine. Shitennō-jî, (çêkirin: sedsala 6an) kevintirîn perestgeha bûdîst ê Japonyayê ye. Herweha Hōkō-jî ango Asuka-dera jî yek ji kevintirîn perestgeha bûdîstî yê Japonyayê ye ku li cîhanê hîna jî avahîya herî kevin a bi darîni û li ser pîyan e (Meyer, 2022: 39). Ji bilî van Sensojî, Kiyomizu-dera, Tojî, Enryaku-jî, Hase-dera jî ji hêla stîl û hunera mîmarîyê ve yek ji girîngtirîn perestgeh û manastir ên Japonyayê ne.

Ji aliyekî di ve çanda bûdîzmê di hunerên destkarî û peykertraşîyê de jî xwe nîşanî dike. Di nav hunerên destkarîyê de piranî nexş û nîgarên li ser seramîkan, şêwandina peykerokên figûrî yêni olî û alavên çayê (çaydank, qedeha çayê hwd.) dihatin çêkirin. Di peykertraşîyê de jî peykerên mezin ên Bûdayê (Bodhisattva) ku ji wan re bi japonî “Daibutsu” jî tê gotin, gelekî berbelavbûn. Asuka Daibutsu (Peykerê Bûda yê herî kevin ê Japonyayê ye), Nara Daibutsu, Kamakura Daibutsu, Ushiku Daibutsu (Li Japonyayê mezintirîn peykerê Bûdayê yê) û Kamagaya Daibutsu yek ji wan girîngtirîn peykerên Bûda yêni Japonyayê ne.



Wêne 10: Perestgeha Shitenno-jîyê, Kevintirîn perestgeha bûdîst ê Japonyayê, Osaka (Url 10).

Sumi-e (j.: 墨絵/wêneya hibrê) bi rêya keşîşên zen-bûdîst ên ku ji *Lavîya* (hunera gonîkirin a bi firçeyî) Çînê sûde wergirtine, di sedsala 14an de ango di Serdema Ashikagayê de tê anîn li Japonyayê. Di hunera şêwaza sumi-eyê de esas bi felsefeya zen-bûdîzm û yek derba firçeya hibirkirî re pûxtiya xweza/gerdûnê dîtî û xwe bi wan re biyekbûn heye. Şêwekarên Ashikagayê ku bi hûrgilî li ser têgihên hunera Songê⁷ hûr bûne, li gel şeweya *sumi-eyê* li gîyana xwezayê bi çendek derbeya firçe ya bi qewî û wêrek re xwestin veguhezînin. Şêwekaran, di van wêneyan de detayên biçûk ji holê rakirin; mirov û berhemên wan anîn halekî negiring û ewana kirin parçeyek ji hawira sirûştê (Meyer, 2022: 94).

Ji alîyekî dî ve di sumi-eyan de armanc di xwerûtî û kûrahîya xweza/gerdûnê de rêwîtiyeka estetîkî û hişî çê kirine. Lewma menzereyên tevayîya sumi-eyan gelekî fesîh, sade, ahengdar, narîn û bêqisur in. Felsefeya teknîka wê; aheng û hevsengîya kamil a ku bi her du hêzên dijber ên gerdûnê û dijrabertîya ronî û sîyê re derketîye holê, ye (Cançat, 2023: 9). Herweha hunera wêneya hibrê, bi xweşnivîsîn û helbestên japonî (waka, haîkû hwd.) re jî hevgerîyeka bi şewaya wêne-helbestê çê dike. Geşedarî û dînamîzma wênesazên *Sumie* û xetkêşên xweşnivîsînê (kalîgrafi) di lêxistina şixulandina firçe ya wêrek û xurt de û di armonî û tevgera derbeya firçeyan de tîr xuyakirin (Hane, 2023: 57).

⁷ Xanedaneka çînî ye ku di sedsala 10-13an de li Çînê desthilatî kiriye.

Hunermendên sumi-eyê wekî alav *fude* (firçeyên taybet), *sumi* (darika hibrê), *suzuri* (kûçê hibrê), *washi* (kaxizên mijok) ku piranîya van kaxizan ji birincê tîn çêkirin, û avê bi kar tînin. Wekî tema jî ji xwezayê; çîya, çûk, dar, kulîlk û dîmenên curbicur tîn jêgirtin. Josetsu (m. 1496), Shobun (1414-1465) û Sesshu (1420-1506), Kanō Masanobû (1434-1530) û kûrê wî Kanō Motonobû (1476-1559) kesên herî navdar ên wênesaz û xetkêşên sumi-eyê ne.



Wêne 11 : Çar Demsal (Payîz û Zivistan), 1560, Kanō Motonobû (Url 11).

Di rewşa îzolasyona Serdema Edoyê de hin pêşketinên hunerî û çandî derdikevin holê. Geşedanîya çandî ya herî giring, çanda qesabeyî/bajarîyê bû (Hane, 2023: 84). Bajarîyên (chonîn) ku wekî bajarên mezin ên li Edo, Osaka û Kyotoyê niştecih bûne, serwerê çanda Tokugawayê bûn (Meyer, 2022: 117).

Ukiyo-e (j.:浮世絵, wêneyên cîhana kêfperest/nehs) yek ji wan pêşketinên çandî û hunerî ye ku ji Serdema Edoyê hetanî dawîya Meijîyê, ji ber bikaranîna temayên xwe yên berfireh bandoreka mezin li ser şano, muzîk, wêjeya klasîk, helbest û herweha li ser fîgur û temayên wêne yên malbata împaratorî û olî dike. Ev hunera çapekolan xasma di nav çanda bajarîyan de belav dibe. Ukiyo-e hunereka wêneyî ya ku bi teknîka çapkirina/tepkirina axşebê tê kirin, e ango hunera qaliba darîn e. Bikaranîna çapekolanên depîn li Japonyayê di navbeyna wêne û metnê de pêwendîyeka nêz çê kir (Clements, 2023: 169). Hunerên wêne yên wekî Nishiki-e, Doro-e, Garasu-e, Dako-e jî yek ji wan cureyên ukiyo-eyê tîn hesibandin. Herweha

Nikuhitsu-ga formeka wêneyî ya japonî ye ku ew jî ji şêwazeka hunera ukiyo-eyê tê dîtî û cureyê wê yê bi çêkirina firçeyê jî hene.

Çawa ku di hunera wêne ya japonî de yamato-e wêneyên klasîk/kevneşopî ê Japonyayê tê nimandin, ukiyo-e jî herwisa wêneyên modern ê Japonyayê temsîl dike. Lê belê ukiyo-e, rêbaza yamato-eyê jî bi kar tîne û li gel dîmenên sirûştê danên jîyana rojane diresmîne. Ji bilî van, hunera ukiyo-e bi sumi-eyê re di nav çand û civaka japonan de wekî hunereka jîyanî û jîyaneka mînimalist xwe da nîşanîkirin. Moronobu (1618-1694), Harunobu (1725-1770), Utamaro (1753-1806), Sharaku (m. 1801), Hokusai (1760-1849) û Hiroshige (1797-1858) li cîhanê nexşebendên herî binavûdeng ên hunera ukiyo-yê ne (Hane, 2023: 86). Bi taybetî li gel danûstandinên çandî yê di Serdema Restorasyona Meijîyê de bizava japonîzmê li Rojavayê (Ewrûpa) belav dibe û di serî de hunera ukiyo-yê bandoreka mezin li ser hunera wêne ya Rojavayê dike. Bo nimûne, tabloya Vincent van Gogh a bi navê *Portreya Père Tanguyê* (1887) bi tesîra ukiyo-eyê hatîye xêzkirin. Di heman awayî de ukiyo-e li ser bizava empresyonîzmê ku di qada wêne û wêjeyê (helbest) de bi bandor e, jî bandora xwe nîşanî kir.



Wêne 12: Pêla Mezin a li Kanagawayê, ukiyo-eya herî navdar a Hokusaiyê, (ç.1829-1832) (Url 12).

Hunera muzîkê û amûrên muzîkê wekî mîrateyên kultûrî di civak û çanda japonan de xwedî cihekî taybet digirin. Ji amûrên muzîk ên ku ji Serdema Yayoîyê hatîne mêjûkirin jî xuya dibe ku çanda muzîka japonî bê ka çiqas kevnar e. Hunera

muzîkê di dîroka Japonyayê de wekî muzîka kevneşopî ya japonî di Serdema Heianê de geş dibe û di Serdema Edoyê de digihije lûtkeya hunera xwe.

Ongaku (j.:音楽, dengê bikêf/muzîk) ji alîyê newa û şeweyê ve di xwe de hem muzîka kevneşopî ya japonî ango *hōgakuyê* (j.:邦楽) û hem jî muzîka nûjen a japonî (J-Pop, J-Rock û hwd) dihevine. Di nav muzîka kevneşopî ya japonan de *Gagaku* (j.:雅楽/muzîka narîn) wekî muzîka japonî ya klasîk ango “muzîka qesrê” , *shōmyō* (j.:声明) jî wekî qesîdeya bûdîst a japonî tînin binavkirin. *Gagaku*, cureya herî kevn a muzîka japonî tê pejiwandin û bi şanoyên japonî yên wekî *noh* û *kabukîyê* re jî tê icrakerin. Newa û ahenga muzîka japonî ya klasîk ji notayên matematîkî wêdetir xwe dispêre bêhnvedana, navberdayîna henaseya mirovan. *Biwa* (ûd) jî gava di vegotinên çîrokan û xwendinên helbestên lîrîk de dihat bikaranîn. *Taiko* (dahol), *koto* (sazê jîdar), *shamisen* (sazê sê jîdar) û *shakuhachi* (bilûr) amûrên muzîka japonî yên sereke ne.

Noh (Nō), Kabûkî, Rakûgo û Bunrakû şanoyên kevneşopî yên japonî ne ku bi teşe û lîstîkên xwe yên resen ve yek ji herî giring ên hêmanên çanda japonan e. Şanoya *Nohê* di sedsala 12an de di cureya dramayê de û di şahînetên şîntoyî de xwe wekî lîstîkên gelî nîşanî kir û bi pêş ket (Hane, 2023:57). Lîstîk û şiyana *Nohê*, hestê yûgen ango tiştên ku di bin rûxsaran de veşartî, amaje dike. *Kabûkî* ya ku di sedsala 17an de derdikeve, bi senteza stran, dans û helbestan re tê sahne kirin. *Rakûgo*, yek ji cureya komedî ya şanoya kevneşopî ya japonî ye. *Rakugoka* ango çîrokbêj di sahneyekî (*Kōza*) de bi tenê bi awayekî rûnîştî, çîroka xwe ya komîk vedibêje û lîstîka xwe dilîze. *Bunrakû* jî wekî awayê lîstîka kûkla ya kevneşopîya japonî tê zanîn.

Çanda japonî, di Serdema Meijîyê de bi awayekî giştî û berfireh li gel hevbandorîyê bala Rojavayîyan (xasma Ewropa) dikişîne û bi taybetî jî ji hêla hunerên ciwankariyê ve bandoreka mezin lê dike. Terma *Japonisme* ango *Japonîzm* ku di encama wê bandorê de derketîye, di nav hunera Rojava de ji bo bandora çand û hunera japonî bi piranî jî bandora li ser huner/bizava empresyonîzmê kiriye were pênasakerin, hatîye bikaranîn. Japonîzm, li Rojavayê di pêşketina feraseta huner a

modern de rola katalîzorê dilîze; bi ser de jî ji empresyonîzm û piştîre jî ji bona kûbîzm û art nouveau re dibe îlham (Martin & Koda, 1994: 73).

Li Japonyayê heta Serdema Meijîyê wekî salname, *Salnameya Roj-Heyv a Çînî* dihat bikaranîn. Bi Restorasyona Meijîyê re di sala 1873an de derbasî Salnameya Mîladî dibe. Li gel salnameya mîladîyê, *nengō* yan jî *gengō* ya ku wekî “Navê Serdem a Japonî” tê zanîn, jî tê emilandin. Di pergela salnameya nengōyê de salên hikumranîya împaratorên Japonyayê tê tespîtkirin.

Di çanda japonan de gelek pîrozbahî û cejnên olî, gelêrî û netewî/fermî yê cihêreng tên pîrozkirin. Di salnameya wan de heft cejnên netewî (kokumin no shukujitsu) hene. *Ganjitsu* (Sersal) ku ji 28ê Kanûna Pêşîn heta 5ê Kanûna Paşîn didome, hefteyek tên pîrozkirin. *Seijin no Hî* (Roja Gihiştî) li roja 15ê Kanûna Paşînê ji bona ciwanên ku temenê wan gihiştîye bîstê wekî cejneke tê lidarxistin. Rojên her du ekînoksê jî wekî rojên pîroz tên pejirandin û di rojên ekînoksê (*Shunbun no Hî*) de betlane tên kirin. Di Ekînoksa Biharê de 21ê Adarê wekî destpêka biharê; di Ekînoksa Payîzê de jî 24ê Îlonê wekî destpêka payîzê têne pîrozkirin. Herweha, *Bunka no Hî* wekî “Roja Çandê” 3yê Çirîya Paşînê û *Kinro Kansha no Hî* jî wekî “Roja Spasdarî ya Xebatkaran” têne pîrozkirin. Li gel van, *Kenkoku Kinen no Hî* (Roja Damezrandina Neteweyî) her sal 11ê sibatê pîrozbahîya avabûna Japonya/Yamatoyê têne kirin. Roja damezrandina neteweyî ya Japonyayê xwe dispêre 11ê Sibata BZ 600î ku ev, dîroka hem avabûna Dewleta Yamatoyê ye û hem jî derketina text a împaratorê yekem a Japonyayê Jinmu Tennō ye.

Ji bilî van rojan, *Gōruden-Wîku* (Heftêya Zêrîn) ku tê de ji pêncan zêdetir rojên taybet hene, li werzê biharê ji 29ê nîsanê heta 5ê gulanê têne pîrozkirin. *Sakura Maturî* (Mîhrîcana Çîçekê Gilyazê), *Tanabata Maturî* (Mîhrîcana Stêrkan), *Hatsumode* (Serdana Sersalê), *Gion Maturî*, *Nebuta Maturî*, *Obon Maturî* û gelek mîhrîcanên di li Japonyayê wekî çalakîyên navdar ên kevneşopî, rîtuêl û çandî bi awayekî bicoş tên pîrozkirin. *Kimigayo* (j.: 君が代/Desthilatîya Te) wekî sirûda neteweyî ya Japonyayê tê zanîn. Sirûda neteweyî, helbesta waka ya şeş risteyî hatîye wergirtin û li cîhanê di nav sirûdên neteweyî yê herî kurt de tê qebûlkirin.

1.1.5. Dîn û Bawerî

Dîn, mezheb û bawerîya felsefeyî di dîroka japonayê de di teşegirtina çand û şarîstanîya japonan de bandoreka mezin çê kirine. Di vê teşegirtinê de wekî terzeka jîyînê gelek dîn û mezheb di civaka japonan de cih girtine. Bi sedan salan ji bûdîzmê heta xirîstîyanî kêr-zêde her cureyê dînî têketîye Japonayê (Akalin, 1962: 25).

Şintoîzm, taoîzm, konfûçyanîzm, bûdîzm û zen-bûdîzm wekî bawerîyên dînî, felsefî, exlaqî, civakî û “rêyên ronîbûn” ên sereke yên civaka japonan in ku di dîrokê de ji hev bandor girtine. Herçendîn ku di hin serdemên dîrokî yê Japonayê de konfûçyanîzm wekî dîn/doktrînê serdest be jî, bi giştî şintoîzm û bûdîzm li Japonayê di nav civaka japonan de wekî du dînen serdest derketine pêş.

Bi piranî şintoîzm di qada siyaseta dewletê de, konfûçyanîzm di warê exlaqî de û bûdîzm jî di qada dînî de xwe nîşanî kirine. Ev cihêti bi awayekî têr û pak di hişê japonan de cih digire û heta roja me ya îro jî berdewam dike (Şenavcu, 2016: 55). Ev bawerîyên dînî ne tenê di warê rîtuêl, siyaseta, dînî û exlaqî de herweha di huner, felsefe û wêjeya japonan de jî xwe xuya kirine.

1.1.5.1. Şintoîzm

Şinto yan jî şintoîzm yek ji kevintirîn dînê cîhanê ye ku dînê Japonayê ya neteweyî û ya cihî ye. Herweha şintoîzm ji Serdema Meijiyê ta piştî Şerê Cîhanê yê Duyem (1946) wekî dînê resmî yê Japonayê bû. Dînê şintoyî, ji aliyê japonên pêşî yên ku ji herêmên dîtir ên Asyayê koçberî giravan kirine, ve hatîye li Japonayê (Meyer, 2022: 33).

Bêjeya şintoyê ji du karakterên çînî angokanjiyê “shîn” û “tō”yê pêk hatîye ku shîn tê wateya *xwedayan* an jî *gîyanan* û peyva tō jî tê wateya *rêyê*. Her du bi hev re angok shîntō (şintō) wekî termeka dînî di wateya “Rêya Xwedayan” an jî “Rêya Gîyanan” de tê bikaranîn. *Kamî no Mîçî* (Rêya Kamîyan) di japonî de beranberî bêjeya şintoyê tê ku ew jî di wateya *Rêya Xwedayan/Gîyanan* de tê emilandin. Avakarekê yê ku tê zanîn e şintoîzmê tune ye (Şenavcu, 2021: 263). *Kojîkî û Nîhongî* ya ku kevintirîn metnên nivîskî yên japonan in û herweha tê de hem mîtolojîya japonî û hem destana şintoîzmê hatîye vegotin, wekî du pirtûkên pîroz ên sereke yên şintoîzmê tên pejirandin.

Amaterasu (Xwedawenda Rojê), *Tsukî-yomî* (Xweda/xwedawenda Heyvê) û *Susa-no-ono* (Xwedayê Erdê/Bahozê) kamîyên herî binavûdeng ên şintoîzmê ne. Ji perestgehên şintoîzmê re “jînja” yan jî “jînsa” tê gotin ku li Japonyayê navenda dînî ya şintoyê bajarê Îseyê ye. Perestgeha Îse/Jîngû yê ango *Amaterasu Jînja* perestgeha herî giring a şintoîzmê ye. Şintoya Dewletê, Şintoya Mabadê, Şintoya Mezhebê, Şintoya Gel û Şintoya Malê wekî cure/mezhebên şintoîzmê ne ku li gor cih, kes û sazîyan hatine senifandin.

Şintoîzm wekî sîstemeka bawerîyê xwe dispere xweza û kulta bav-kalikîyê (ancestor cult). Ev bawerî, li gel derbarê awaya bawerîya îlahên qebîleyan (êl) de tê pêwendkirin û li nêrîneka anîmîstîk îfade dike ji bo sehkirin û fikirina dinyayê (Anesakî, 2023: 15). Ji alîyekî dîtir ve şintoîzm, bawerîya anîmatîzmê yan jî xwezaperestîyeka prîmîtîf (xwerû) e ku herweha bawerîya xwe hebûna gîyanên ku li sirûştê kê-m-zêde dişibin rihê mirovan, tîne (Akalın, 1962: 27). Li gel van şintoîzm bi nêrîneka panpsîşîk amaje dike ku *kamîyên* her tiştî pêkan e, heye.

Li gel pêkanîna esasê hêmanên bawerîya şintoîzmê *Kamî*, têgiha herî bingehîn e şintoîzmê ye ku sîstema bawerîya xweza û bav-kalikîyê di xwe de kom dike. *Kamî* di zimanê japonî de tê wateyên wekî “Hebûnên arişî (manewî), deresirûştî (transendental), yên jor, bala (supreme), hêzên serdest, heyînên pîroz, gîyan” û herweha wekî navekî gelemper di wateyên cin, firîşte, gîyan, xweda/yan ên ku hebûna wan nayên xuyakirin de tê bikaranîn (Şenavcu, 2022: 77). Li gor vê bawerîyê ji xeynî kamîyên mirov, xweda û xwedawendan, li xwezayê kamîyên her tişt û heyberan jî hene. Yanû di şintoîzmê de her xweda/yan kamî ne, lê belê her kamî ne xweda ne (Şenavcu, 2022: 77). Ji ber vê yekê ye ku şintoîzm ji alîyekî ve dîneka polîteîst (pirxwedayî) e. Di bawerîya şintoyê de hebûnên kamîyên wekî hêrsok, baş û nebaş jî bi cih digirin.

Li gor bawerîyê, xwedîyê dinyaya xwezayîyê xweda û gîyan in (Hane, 2023: 31) û bi vê nêzîkatîya anîmîstîk rihê her tiştî heye. Lewma japonan bi vê hestiyarî re rêzgirtineka mezin ji xweza û heyberên wê re digirin. Heyîn û heyberên wekî roj, heyv, bahoz, eynik, şûr, xişir, behr, çîya, av, sûlav, zinar, dar, meymûn, ask, qijik, kûsî, kevok, beq û gelek tiştên li xwezayê hurmet tên nîşanîkirin û tên homandin. Herçendî ku şinto ne xwedîyê kanûnên sincî û felsefeyê bê (Meyer, 2022: 33) jî

kirinên ayînî yên besît hene. Têgihên wekî paqijî, li hemberî xwezayê hestiyarî û hesta spehîtiyê, ji her tiştên xwezayê re rêzgirtin, çêbûnîya lihevhatî, xwerûtî, aramî û hedarî esasên bawerîya şintoîzmê ne ku ewana herweha feraseta exlaqê, awayên îbadetê û jiyînê jî pêk tînin.

1.1.5.2. Taoîzm

Bawerîya taoîzm ango daoîzmê, di sedsala BZ 6an de di Çîna Kevn de derketîye û ji aliyê Lao Tzuyê (m. 601) zana û ramanger ve hatîye damezrandin. Pirtûka wî ya bi navê *Tao Te Ching* (Dao De Jîng, “Klâsîkên Rê û Dilpakîyê”) qaîde û doktrînen taoîzmê pêk tîne. Bi Lao Tzuyê re Lieh-tzu/Liezî (BZ nêzîkî 398) û Zhuangzî (BZ 369-298) jî du ferzaneyên avakar ên taoîzmê ne ku metnên wan -navê berhemên ji navê danerên pirtûkan tên- jî wekî kitêbên pîroz ên taoîzmê tên pejirandin. Daoîzm, yek ji dînen çînê yê gerdîşî ye ku di xwe de gelek bawerîyên herêmî yên gelî vestrândîye (Özkan, 2022: 245). Taoîzm di Serdema Narayê de di nav sîstema bawerîyên japonî de cihê xwe girtîye (Esen, 2019: 84).

Bawerîya Taoîzmê bi tiştên razber, derasayîyê re mijûl nabe. Ew esasên xwe yên bawerîyê bi piranî li ser têkilîya mirov-xweza, mirov-gerdûn û xweza-gerdûnê ava kiriye. Bêjeya *Tao/Daoyê* di gelek wateyên curbicur de ango wekî wateyên di “rê, rêbaz, meşandin, herîkîn, hêl, axaftin, kanûn, sirûşt” de tê bikaranîn. *Dao, Wu-Wei, Yîng û Yang, Te, Tzu-jan, Shen/Shîn*, wekî têgihên sereke yên hîmên taoîzmê ne.

Dao, wekî maka ku tevahîya gerdûnê jê zayî ye, lê hebûn û navê wê/wî tune ye. *Dao* navekî demdemî ye. Berî her tiştî *Tao* (*Dao*) hebû: “proses”a şênber û dinyaya nayê terîfkirin, e (Watts, 2022: 31). Hemû kaînat tê de peyda dibin û vala dibin. Ji ber vê yekê valahî ye, binyada pêşî ye. Her tişt ji *Tao/Daoyê* çê dibe, li gor rêgeza zivirînîyê her tişt lê vedigere û car dî her tişt jê çê dibe.

Wu-Wei, wateyên wekî di “tebat, bêhewl û bêliv” de tê bikaranîn ku pratîk/îbadeta giringtirîn a taoîzmê ye. Li gor Wattsî (2022: 35), tenê hişê ku bi hunera xwerû û narîn a “wu-weîyê” re sependin bike, dikare xwe bigihîne *Taoyê*. Tetbîqkirina hişî di rewşa xwe ya xwezayî de “dîtina lêhûrbînîyê” (focal vision) winda dike û “dîtina derdorî” (Watts, 2022:36) ya hişî derdikeve holê. Ji nişka ve

dîtin û têgihîştina biyekûnîya mezin a ku her tişt bi hemû tiştî re têkildar e, sepandina hişê xwezayî ye ku di heman demê de kirina wu-wêîyê ye. Bi kurtasî wu-wêî bi xwezayê re bêtekilbûna mirovî ye ku bi xwezayê re aheng û lihevkarîna mirovî îfade dike.

Yîng û Yang a ku li gor prensîba yekîtiya dijraberîyê tevdiger e, guherîn û veguherîn, liv û tevger di hêmana yekîtiya Dao/Taoyê de peyda dibin. Herçendî ku di pênasîkirina têgiha “Te”yê de devjengî hebê jî, wekî xwezayî ango di xwezayîya xwe de bi xwe xwe, bêzorî kêrhatîn û jêhatîn ye. Bi gotineka dî ji xûypakî û fazîleta hişî re di zimanê çînî de “te” tê gotin (Güngören, 2020: 34).

Tzu-jan (Zîran), yek ji têgiheka bingeîn a taoîzmê ye ku bi giştî tê wateya wekî “jixweberîti” (spontaneity), “jixweber” (spontane) an jî xwe bi xwe (oneself). Di tzu-janê de mebest, pêkanîna herîkandin a xwezayî ya hişî ye. Bi awaya xebitandina vê xwezayîya hişê (tzu-jan) re, rastîya şênber û herweha wê rastîya ku têrbêjeyek ji bo wê nemimkun e, pûxte û herîkîna jîyanê têgihîştin e, fêhmîkirin e (Güngören, 2020: 38). *Shen/Shîn*, wekî enerjî/gîyan tê pênasîkirin ku li her derê xwezayê û di her heyînan de tê xuyakirin. Shen, hêza ku tiştên fîzîkî (şênber) dixê tevgerê û di heman wextî de wekî made û enerjîyê hevdû diguherînin û vediguherînin.

1.1.5.3. Konfiçyanîzm

Bi taoîzmê re konfiçyanîzm, wekî du dînen mezin, herêmî û neteweyî yên Çînê tê zanîn. Herweha wekî “rûîzm” jî tê binavkirin. Konfiçyanîzm li Çînê li gel taoîzm û bûdîzm *San Kîao* ango “Sê Dîne” pêk tîne. Li Çînê ji Serdema Wû-tîyê (BZ 140-87) heta sala 1912ê konfiçyûsparêzî wekî dîne resmî hatîye nasîn.

Di *Ferhenga Felsefeyê* ya Alî Gurdilî de konfiçyûsparêzî û konfiçyûs weha tê pênasîkirin:

“Konfiçyûsparezî, li welatê Çînê sistemeke ehlaqî û felsefî ye û di wateya dibistana perwerdekar û hînwerîyên Konfiçyûs de tê bikaranîn. Di destpêkê de, ji hînwerîyên Konfiçyûs dest pê kirine û piştî jî, berfireh bûye. Ev dibistan, giranîya xwe dide ehlaq û emelên baş. Ehlaqên konfiçparêz, sistemeke tîkel e û ji ramanên

civakî, ehlaqî, felsefî û dînî pêk tê û li ser kultur û dîroka Asyaya Rojhilatê, xwedîyê bandûreke mezin e. Konfiçyûs (BZ 551-479), filozofekî çînî ye û navê wî yê rastîn *K'ung-futzu*” yan jî *Kongfuzî* ye. (...) *Piştî mirina wî notên wî yên dersan û yên rêwîtiyên wî, têne berhevkirin. Bi demê re dibe îdolekî neteweya çînî. Berhemên wî, di dibistanan de weke pirtûkên dersan hatine xwendandin. Di jiyana xwe de giringîyê daye du tiştan: ‘Jen û Yî’ ango ‘dostanî û edaletê’” (2021: 239).*

Sishū Wǔjīng (Çar Pirtûk û Pênc Klâsik) û *Lun Yu* (Axivîn/ Ên Bijarte) di tradîsyona bawerîya konfiçyanîzmê de wekî berhemên pîroz tên pejirandin. *Sishū Wǔjīng*, ji metnên çînî yên klâsik ên ku esasên bawerîya konfiçyûsparêzîyê nîşanî dike, pêk tê û *Lun Yu* jî ji axaftinên doktrînî yên Kongzîyê (Konfiçyûs) îhtîwa dike ku ji hêla şagirdên wî ve hatine nivîsandin û berhevkirin. *Perestgeha Daesongjeonê* (Perestgeha Konfiçyûsê), *Perestgehên Împaratorîyê* û *Perestgeha Asmanî* (Çang-Tî) yan jî navê wê yê dîtir *Perestgeha Bihûştê* (Tiāntán) ku di navbera salên 1406-1420î de li ser navê Yezdanê Asîmanê (Çang-Tî) hatîye avakirin, îbadetgehên navdartirîn ên dînê konfiçyanîzmê ne.

T'ien, *Tao*, *Taî Chî* (Çî), *Yî Çîng*, *Yîng* û *Yang* di termînolojîya sîstema bawerîya konfiçyanîzmê de têgihên dînî yên sereke ne. *T'ien* Yezdan an jî Yezdanê Asîmanê ye ku her tişt di bin rêveberîya wî de tên birevebirin. *T'ien*, *Hebûna Mezin*, binyada pergala exlaqî û hêza ku sirûştê saz kiriye, ye (Güç, 2001: 56). *Taî Çî*, tê wateyên wekî “Heqîqeta Mezin” û “Hîma Afirîner” ku li gor *Taî Çîyê*, gerdûn her tim di nav guherîn û veguherînê de ye. *Yî Çîng* (Pirtûka Guherîn û Veguherînan), berhemeka nêzîkî pênc hezar salî ye û herweha yek ji kevintirîn nivîsarê klasîkên çînî ye. *Yî Çîng*, merhele û pêvajo gerdûn/xweza ya ku her daîm di nav çerxeka guherîn û veguherînê de ye, rave dike. Li gel ji nû ve şiroveya Konfiçyûsê, metn û têgiha *Yî Çîngê* di nav sîstema bawerîya konfiçyûsparêzîyê de cih digire. Li gor ramana hînwerîya *Yîng û Yangê* hemû tiştên (bûyer, tevger, pêhatî) ku di gerdûnê de hene, xwe dispêrin du prensîbên dijber ku yek (yang) çalak (aktîf) û nêr e, û a din (yîng) jî neçalak (pasîf) û mê ye. Hemû rûdan jî, bi rêya lihevhatina wan du hêzên dijber dertêne holê (Gurdilî, 2021: 405).

Konfiçyanîzma sincparêz û rêzikparêz, esas giringîya xwe daye li ser têkilîya mirovan û rêveberîya welat/împaratorîyan. Li Çînê pêşî wekî dînê burokrat, rayedar, zana, edîb û malbata împaratorîyê derdikeve. Di sedsalên 3 û 4an de ev pergala dînî

ya hîyerarşik, bi saya zanayê Baekjeyî (Kore) Wanî, li gel danasîna sîstema nivîsa çînî û hin berhemên ku hînwerîyên konfiçyûsê tê de hebûn, cara pêşî bi awayekî berfireh sîstema bawerîya konfiçyanîzmê têkete li Japonyayê. Piştî wê, ji aliyê çîna serdest a japonan ve ev hîyerarşî û têgihên exlakî yê konfiçyûsî hate pejirandin (Hane, 2023: 32).

Herçendî ku konfiçyanîzm di Serdema Yamatoyê de di nav rêveberîya împaratorîya japonî de belav bibe jî, esas di Serdema Tokugawayê de di nav çîna serdest (şogun) û samûrayan de wekî bawerî û feraseta birêveberî, fazîlet, exlaq û ji çîna serdestê re rêzgirtin, cih digire. Konfiçyûs (j.:Koshî), ji ber ku xwe disperand kevneşop, exlaqparêzî û malbatperestîyê, bi dîne netewî ya japonî şîntoyê re ku ji malbatê re hezkirin û ji rabirdûyê re rêzgirtinê ferman dikira, jî li hev dikira. Konfiçyanîzm piştî di ser çand û helbesta klâsîk a japonî de bandoreka zehf giring çê kir (Akalın, 1962: 35-36).

1.1.5.4. Bûdîzm

Bûdîzm sîstemeka felsefî û dînî ye ku ji aliyê Bûddhayê (BZ 563-483) ve li Hindistanê hatîye sazandin. Navê wî yê rastûn Sîddhartha Gautama ye. Bûddha di zimanê sanskrîtî tê wateya “kesê ku ronî, serwext û hişyar bûye” ku wekî nasnav ji terefê peyrewên wî ve hatîye dayîn. Li gel vê, Bûda wekî Sakyamunî jî tê zanîn.

*Pîta*ka, di bûdîzmê de ji metnên pîroz re tê gotin ku *Sutta-Pîta*ka (Pirtûka Ponîjînê), *Vinaya-Pîta*ka (Pirtûka Dîsîplînê) û *Abhidhamma-Pîta*ka (Pirtûka Felefeyê) wekî sê celeb hatine dabeşkirin. Ev her sê metnên pîroz di zimanê Palîyî de wekî *Tripitaka* (Sê Selik) hatîye binavkirin. Ji xeynî van *Jatakayên* ku tê de wêjeya Bûdayê di hundirîne, jî di bawerîya bûdîzmê de berhemeka xwedî biqîmet e.

Di esasên bawerîya bûdîzmê de sê têgih giring in. Ev sê tişt Trîratna (Sê Cewher): *Bûdaya* efendî ku afirînerê cîhanê ye. Gel xwe dispêrin Bûdayê. *Dharma* kanûna dîne Bûdayê ye ku ew ezêlî û ebedî ye. Di heman demê de ev dinya/gerdûn li gor Dharmayê yan jî li gor qaîdeyên rastîyê tê birêvebirin. *Sangha*, rêxistina ruhban a cimaeta bûdîstan e (Mohapatra, 1990: 157). Ev “sêcare”ya pîroz ango Bûda, Dharma û Sangha wekî amentûya bûdîzmê rojê çar dana (sibehî, nîvro, piştî nîvro û êvarî) ji

alîyê bûdîstan ve li ser navê wan silav tî dayîn, dia tî kirin û medîtasyon tê çêkirin.

Hemû awayên bûdîzmê, di navbera nûkên dawênpîs (lecherous) û çileperêz û melayket (deva) û ehrîmen (petra) de li Rêya Hevsengîyê (Madhyamāpratîpada) dipejirînin û angaşt dikin ku ji “hişyarbûna” mezin re an jî ji bûdatîyê re tenê di rewşa mirovî de dikarin bîn gihîştin (Watts, 2022: 48). Wekî ku di dînen resen ên Hîndî de heyîn têgihên *Karma*, *Nîrvana*, *Reenkarnasyon*, *Yoga*, *Samadhî* (medîtasyon) jî di nav termên sîstema bawerîya bûdîzmê de cih digirin.

Li gor bawerîya *Karmayê*, kiryarên rabirdûya mirovî li ser kirinên wê/wî yê li dema niha bandorker û diyarker in û di heman awayî de kiryarên wê/wî yê li dema niha, li paşerojê wê bibin sedema kiryarên wê/wî. Yanê qedera mirovî ne di destê Xwedê de ye; çarenivîsa mirovî li gor vîna wê/wî tê diyarkirin û bi vî awayî heta gihîştina Nîrvanayê ev didome. *Nîrvana*, di wateyên curbicur ên wekî “bêhn berdan, pifkirin, tunebûn, vemirîn, hedarîn” de tê bikaranîn ku li gor Bûdayê felat û rizgarîya nihaî (talî) û rewşa hişyarîya xwerû ye. Bi gotineka dî Nîrvana, “ronîbûn û aramîya mutleq” îfade dike. Kirasguhertin ango *Reenkarnasyon*, ji nû ve bûna gîyanê di laş/heyberekî/ê de rave dike. *Yoga* û *medîtasyon* (samadhî) jî du pratîkên (rituel) bûdîzmê ne ku yoga tîrbûn û lêhûrbûna hem laşî û hem hiş/gîyanê dike û herweha *samadhî* zêdetir li ser hişê mirovî pratîk/tişteteknekin dike.

Bûda behsa Xweda nekir, lewre wî felatî û rizgarî girêdayê zanista exlaq û sinca pak dikir. Di gel vê bawerîya bi guneh û kirasguherîna gîyanê jî hatîye pejirandin. Li gor vê nêrînê ketina gîyana mirovî di gewdeyeke nû de, ne bi lavayîya ji xwedayan û serjêkirina qurbanan pêkan dibû, ew bi bêgunehî û reftara qenc guncaw dibû. Li gor Bûda, çar hêmanên bingehîn ên rastîyê hene, ew jî ev in:

“*Rastîya kişandina êşê (Hemû heyberên ku mirovan bi xwe ve girêdidin tev çavkanîyên êşê ne), rastîya daxwazê (Êş, ji daxwaza mirovî peyda dibe), rastîya tunekirina êşê (Êş, bi tenê destjêkişandina her cureyê daxwazan, dikare tune bibe) û heşt rêyên rast ên ku êşê tune dikin. Ew her heşt rêyên rast jî ev in:*

Bawerîya saf û xwerû, vîna xwerû, gotina xwerû, kiryara xwerû, amûrên aborîyê yê xwerû, hişê xwerû, ramana xwerû û qencîya xwerû. Ji van rastîyan jî, beşek ji wan erênî û beşek jî neyênî ye, ev her dubeş rê û rêzikên fezîletê nîşan didin. Beşa neyînî ku ji qedexeyan pêk tê ev e:

Nekujin, malê kesekî din nedizin, bi çavên xerab li namûsa kesekê din nenêrin, derewan nekin, sermest nebin. Beşa erênî jî ev e:

Tevlî êşên mirovên din bibin, li ser êş û janên mirovên din biramin, kêf û êşên mirovan parve bikin, xêrxwaz bin, diloan bin, kirinên li we hatî kirin bibexşin, kîndar nebin û ji moravn re qencîxwaz û merd bin.

Li gor Bûda di gerdûnê de ne daring û ne jî gîyan cawîdane namînin, ne teşe ne jî zat heye, her tişt demdemî ye. Di gerdûnê de tenê bûyer hene, ew jî demdemî tîr rex hev bi şanikekê derew û betal dunyayeke derew û vala diafirînin (Ocek, 2022: 158-159).

Hînayana (Theravada) û *Mahayana* du mezheb/ekolên mezin ên bûdîzmê ne ku hînayana şopdarê kevneperestîya bûdîzmê ye û hebûna xwedê înkâr dike. Di gel wê ekola mahayanayê, pêşveçûnker, lihevhatinker û alemgiştî ye (Mohapatra, 1990: 153). Bûdîzma hînanayê li Asyaya Başûrî; li welatên wekî Srî Lanka, Tayland, Laos, Kamboçya, Vîetnam, Bûrma (Myanmar) belav bûye û herweha bûdîzma mahayanayê li Asyaya Rojhilatî; Tîbet, Taywan, Moxolistan, Vîetnam, Çîn, Kore û Japonyayê berbelav bûye.

Bûdîzm, di nîveka sedsala 6an de li ser Çîn û Koreyê (Paekche) derbasî Japonyayê bûye. Bûddhîzma ku ji Hindistanê li Çînê û ji Çînê derbasî Koreyê bûyî, ji aliyê keşîşên koreyî ve bi awaya Bûddhîzma Mahayanayê hatiye li Japonyayê (Akalin, 1962: 29). Bûdîzm, li Japonyayê bi bawerîyên dînî û felsefî ango şîntoîzm, taoîzm û konfîçyanîzmê re Bûdîzma Zenê çê kirin. Li Japonyayê, bûdîzma ku di bin siha konfîçyanîzmê de nemayî, li gel konfîçyanîzm û şîntoîzma ku gerdîşa manewî ya Japonyayê pêk anîyê, xwe dan nîşanîkirin û dawîya dawî ji şîntoîzmê bandor girt. Tevî ku vê bandorgirtinê, kevneşopeka ciyawaz a bûdîzmê (Bûdîzma Zenê) çê kir (Aydın, 2013: 55).

1.1.5.4.1. Zen Bûdîzm/Bûdîzma Zenê

Zen bûdîzm ango Zen, yek ji dibistana bûdîzma mahayanayê (ekola bûdîzma bakûrî) ye. Li gor dîroka kevneşopîya zenê, derketina dibistana zena Çînê ji *Bodhî Dharma* (440-528) yê keşîşê bûdîst î hîndî ku di sala 520an de hatina wî ya ji Hindistanê li Çînê wekî destpêk dide destpêkirin (Güngören, 2020: 124). Chan bûdîzma çînî paşî ku derbasî li Japonyayê dibe wekî “bûdîzma japonî” ango navê wî ye berbelavtir wekî “zen bûdîzm” tê binavkirin. Li Japonyayê di pêşveçûna bûdîzmê de bûdîzma çînî (Chan bûdîzm) esas rolê dilîze (Aydın, 2013: 54).

Bûdîzm herçendî ku di destpêka sedsala 6an de ji hêla keşîş, geştyar û bazirganan ve li Japonyayê belav bibe jî danasîna wî ya resmî di sala 538an de ji alîyê revebirekî Paekçeyî (j.: Kudara) ku wekî Kralîya Koreyî jî tê zanîn ve ji împaratorê japon a vî demî Kimmeîyê (531-571) re ku bi rêya diyarîkirina peykereka rewnak a Bûdayê û hin metnên pîroz ên bûdîzmê çê dibe. Lê belê, ji ber ku esas pêşengîya berbelavbûna bûdîzmê Prens Şôtokû (574-622) kiriye, ew wekî damezrînerê bûdîzma japonî hatiye wesfandin (Şenavcu, 2016: 47).

Li Japonyayê piştî danasîn û belavbûna bûdîzmê gelek ekol, mezheb û terîqetên bûdîst derketin holê. Hin ji wan ji Çînê bi rêya keşîşên çînî ve hatin li Japonyayê û hin ji wan jî ji ber cûdabûna fêhmkirin û sepandinên bûdîzmê li Japonyayê bi xwe di nav keşîşên japonî de peyda dibin. Di Serdema Narayê de terîqet/mezhebên bûdîst Hosso, Rîtsû, Kegon, Sanron, Cômîtsû û Kûşa bi destê keşîşên çînî ve tên anîn li Japonyayê. Di Serdema Heîanê de sê mezheb ango Şîngon (Shîngon), Tendaî û Cûdo (Jodo) yê giring derdikevin ku her du mezhebên pêşî ji Çînê tên anîn, ê dawîn jî wekî mezhebeka bûdîst a japonî li Japonyayê hatiye avakirin. Herweha di Serdema Kamakûrayê de du mezheb/ekol derdikevin li pêş. Ewana, Nîchîren (Nîçîren) û Zen bûdîzm in (Şenavcu, 2016: 47).

Ji xeynî vê, çendek ekol û şaxên mezheba zenê jî di vê serdemê de ji Çînê tên anîn. Bûdîzm û zena ku di Serdema Nara û Heîanê de bi tenê di nav çînên aristokrat û împaratoriya japonî de belav bûyî, di Serdema Kamakûrayê de bi saya ekol û şaxên mezheba zenê di nav samûray û civaka japonî de berbelavtir dibin. Ekola *Rînzaîyê* ji

alîyê Êîsaî (1141-1215) ve, ekola Sôtôyê ji alîyê Dôgen (1200-1253) ve û ya Ôbakûyê jî ji hêla Îngen (1592-1673) ve tên anîn li Japonyayê.

Bêjeya “Zenê” di zimanê japonî de beramberî peyva “Ch’an” (Çen)a çînî ye ku bêjeya *Ch’anê* jî eslê xwe ji “dhyana”ya sanskîrîtî tê û di wateya *medîtasyonê* de tê bikaranîn. Herweha zen, tê wateya “ponijînê” ku ji “Dhayana”ya sanskîrîtî hatiye dariştin (Akalin, 1962: 34). Zen, piranîya bileksê mezheb û ekolên bûdîzmê hin esas û pratîkên bûdîzmê napejirîne. Bi rêya îman pêanîna Bûda û Bodhîsatvayan felatî û xilasîyê weaz nake (Hane, 2023:34), zena ku xwe ji hînwerîyên dînî dûr dike, ronîbûnê pê tecrûbeyeka hundirî ya ji nişka ve bûyî ravedike (Meyer, 2022: 80). Di heman awayî de ew, li pêşberî *sutra* (metnên pîroz ên bûdîzmê) û *mantrayan* (gotinên pîroz) e. Di zenê de wekî ku pirtûkên pîroz neyî di heman awayî de dogma jî tune ne. Herweha rêûresmên qebûl (pêrgîn) ên bi bandorker, merasîmên mişt ên bi remzan, çendek diayên ku tijî bi sir, gotinên bitilsim û her wekî dî jî tune ne. Zen, der heqê pejirandina bawerîyekê û pê dan bawerkirina bawerîyekê de bi tu awayî, tu carî zorê pê nade telepkar û şopînerên xwe (Güngören, 2020: 24).

Zen-bûdîzm di *Ferhenga Felsefeyê* de weha hatîye pênasekirin:

“Zen-bûdîzm, *medîtasyon* û *daketina kûrahîya gîyanî, mîna rê û rêgehên gihêjtina Nîrvanayê dibîne û bi vê yekê dixwaze ku mirov dakevin kûrahîyê, jê derbas bibin û xwe bigihînin rastîtiya herî raser yan bilind. Zen-bûdîzm, sentezeke bûdîzma çînî û felsefeya xwezayê ya taoparêz e û li Japonyayê, beşeke ekola ch’an yan jî zen e. Bûdîstên zenî, li dijî felsefe û hînwerîyên aqilane ne û pêgirêdayîna rêzikên mitleq ên naguhêr, rê li ber gihêjtina wateya kûr digirin, ku li her cih û demê derbasdar e. Heke em bala xwe zêde serê xwe bi wan biêşînin, em ê ji rastîtiya dûr bibin. Pêdivî pê heye ku em berê xwe bidin rastîtiya jîyana rût û xwe ji mantiqê, dûr bikin. Dema ev yek pêk were, em ê wê demê rast li rastîtiyê werin ku bi tu hevok û gotinan nayê gotin.” (Gurdilî, 2021: 413)*

Zen derbarê nîşanîbûn û lêgerîna rastî de rêyeka efsûnî, tevlihev, nerasterast û têgihîştineka dijwar, teng û girtî pêşkeş nake. Şeweya fêrkirina zenê jî bînavgîn e, ji ber ku rasterast û bîaşkerahî rastîyê nîşanî dike û bi sembolîzmê re mijûl nabe

(Watts, 2022: 99). Avakarê zenê Bodhîdharma, zenê bi tevî çar hevokê re weha xulasa dike:

Li derveyî hînwerîyê, li derveyî gerdişê

Li ser bêje û gotinan nehatîye sazîkirin

Rasterast li hişê mirovî nîşan dike

Dîtina xwezaya xwe ya kesî û gihiştina Bûdatîyê (Watts, 2022: 110)

Li gor D. T. Suzuki (1949: 1), di rastîya xwe de zen, hunera dîtina hebûna xwe ya hundirîn ya xwezayî ye û ew, rêya ku ji êsîrbûnê ber bi azadîyê ve dibe, nîşan dike. Xwerûtî, resenî, xwezayî, xwezayîtî, pêhesî, dilbêjî, xweşî, aramî, lixwevarqilîn, hayjêbûn, nîşanîkirin, rûtdîtî, kûrdîtî û dûrdîtîniya hişî, hestiyarî, bûdayetî, hêmanên sereke yên zenê ne. Armanca zenê ya herî giring ew e ku di *liha* û *nihayê* de ji nişka ve şiyarbûn û pê re jî di *hişê alemdîtî* ango *hişê kozmîk* de jîyîn, li “tevlîbûna derêhişîya mezin”, “têgihiştina hişê derehişîyê” (Suzuki, 1949: 16-18), peydabûna “binhişîya pevrayî”, xwedîbûna “derehişîya kozmîk” (Suzuki, 2017: 55) û “pêhesîya derehişîyê” ye (Suzuki, 2017: 71). Zen, di fêmkirina dinyayê de serwextbûnêka yekcar û bînavgîn amaje dike (Fromm, 2023: 75). Zen, jîyarek e, ne sîstemêka ramanî ye (Watts, 2020: 41) û tekûzîya zenê, bi awayekî xwerû û kamil mirovbûn e (Watts, 2022: 192).

Psîkanalîstê navdar Erich Fromm di berhema xwe ya bi navê *Psîkanalîz û Zen-Bûdîzmê* de berawirdinek derbarê psîkanalîz û bûdîzma zenê de dike û di alîyên wan ên hevpar de weha dibêje: “Zen jî, psîkanalîz jî berî her tiştî ne sîstemên exlaqî ne. Armanca zenê, hedefa tevgera etîkê dibore, ya psîkanalîzê jî welê ye. Di her duyan de hêmaneka dî ya hevpar, israra ku ji her cureyên otorîteyê, serxwebûn e.” (Fromm, 2023: 67-68).

Bûdîstên zenê, ji bo ku şagirtê xwe bigihijîne xwe(d)risteya Bûda û Bûdatîyê wekî pratîk, rêgez, rê û rêbaz têgihên *zazen*, *prajna*, *mondo*, *koan* û *satorîyê*, bi kar tînin. *Zazen*, di kevneşopîya bûdîzma zenê de wekî pratîk û dîsîplîneka medîtatîf tê zanîn. Bêje, ji “zuò chán”a çînî wekî “zazen” derbasî zimanê japonî dibe û di wateya “rûniştandinê” de tê bikaranîn. Herweha di zimanê japonî de wekî term ji vê pratîkê re *meisō* jî tê gotin. Herçiqas *zazen* ji hêla wate û rêbazê ve dibistan bi dibistan cihê

hebe jî yek ji medîtasyona bûdistî tê binavkirin ku bi giştî bi pozîsyona rûniştina lotusê angî bi çarmêrkî bi awayekî bêdeng tê kirin.

Zazen, di *Zendōyan* (jûrên mezin an jî her derê ku zazen tê kirin) de li ser *zafûyan* (balîfê gilover ê biçûk) ku bi awaya lotusî angî çaç danî tê rûniştin û bi çavên niv vekirî, tê sepandin. Piştî rûniştandinê, medîtasyona meşê *Kînhîn* jî tê kirin. Rûniştina zazenê ji ber ku dişibe rûniştina beqê, hunermendên zenê gelek caran figura beqê di hunerên wekî xêzkirin (sûmîye) û helbestan de bi kar anîne. Li gel van, bi karên hewşeyê re mijûlbûn, merasîmê çayê (cha-no-yu), flût lêxistin, resim (sûmîye) çêkirin, tûrvanî û xebatên wekî hunera jîû-jutsû (hunera şerî) jî di nav pratîkên zazenê de tên emilandin (Güngören, 2020: 167).

Pratîka zazenê, ji “tenê rûniştandinê” wêdetir li gel venêrîna henaseyê, lê hûrbûn û lê kûrbûna hişî amaje dike. Zazen, ne ramîn e; fikrîna nefikîrîne ye û bi vî awayî yekcar vekirina hişî ye. Di pratîka zenê de ji dinyayê re fikirîneka şênber, xwerû û jidil hewce ye. Divê mirov bi hişekî ku qet nafikire -angî pê sembol nayên çêkirin- lê (dinya) binêre. Ew (zazen) bi hêsanî, jêhaydarbûnîyeka bêdeng û bêşîrove ya her tiştên ku anîha û liha, ye (Watts, 2022: 185).

Prajna bêjeyeka sanskîrîtî ye ku tê wateyên wekî “zanayî”, “feraset”, “pêhesî” û “zelalîya têgihiştinê”. *Prajna*, zanîna jêbihûrî ya deresehekîyê ye (Suzuki, 2021: 93). Ew, piştî geremol û şelotîya hişê di nav zelalî ya aramî û hedarîya hişî de derdikeve hole. Wexta ku zazen tê kirin, kûrbînî û pêhesî (*prajna*) bi xwe xwe derdikeve (Güngören, 2020: 153). Bi hişekî vekirî û zelal re *prajna* êdî her tiştên heyber û şênber di xwezayîya xwe de li gel *welêyîya xwe*, “weke xwe” tê dîtin. Ev zanîn û tecrûbe, *pêhesî* ya ku Spînoza wekî asta herî bilind a zanînê bi nav kiriye, ye (Fromm, 2023: 78).

Mondo û *koan* du azîneyên bûdîzma zenê ne ku ji hêla honasên zenê ve da ku şagirtên zenê xwedî hişmendîyê zenê bibin, tên pirsîn û tetbîkkirin. *Mondo*, ji anekdot û serpêhatîyên hostayên zenê pêk tên ku bi awaya “pîrs-bersiv”ê tê çêkirin. *Mondo* (çînî:wen-ta) angî “pîrs-bersiv”a ku rêbaza perwerdehiya karakterîstîk a zenê ye, hin caran jî tê angaştin ku bi awayekî sist û sivik wekî mînaka pêşî ya “çîrokên zenê” tê binavkirin. Piranîya lîteratûra zenê ku gelek ji van anekdotên balkêş û

metelhişt in, pêk tê û armanca wan her tim di hişê kesên ku pirsan dipirsin de bi şiklekî hayjêbûniya kêlîyê çêkirin an jî kûrahiya kûrbîniya wan taqî kirin e (Watts, 2022: 110). Ji alîyêkî dî ve di diyaloga mondoyê de, hostayê zenê dike ku ji bo şagirt û keşîşan ji rastîya zenê re çavan vebike (Güngören, 2020: 111). Di kelepûra mondoyê de çendek anekdotên binavûdeng hene ku hin ji wan ev in:

Keşîşek ji bo ku têbigihije rastîya zenê li gor rêya zenê dixwaze ji Joshûyê (Chao-chou, 778-897) perwerdeyê werbigire. Honas jê dipirse: “Te taştêya xwe xwarîye yan na?” Joshû wextê ku bersiva “belê hoste, min xwarîye.” dibihîze, bersiva xwe weha dide: “Heke welê be, here firaxên xwe bişo.” Tê vegêrîn ku li ser vê gotinê hişê keşîşî ji rastîya zenê re vebûye (Suzuki, 2021: 80).

(...)

Ma-tsû dipirse: “hosta, tu çi dikî?”

Hûaî-jang dibersivîne: “Ji bo eynikê wê (karo) hilû dikim.”

Ma-tsû: “Gelo bi hilûkirina kuçekî re eynikek çawa tê çêkirin?”

Hûaî-jang: “Di rûniştandina medîtasyonê de Bûdayek çawa tê çêkirin?” (Watts, 2022: 120).

Rojekî şagirtêk ji hostayê zenê dipirse: “Ez ê ji ku derê re têkevim rêya ku diçe rastîyê?” Hostayê zenê: “Tu şûrîniya ku li robara han a ji dûr ve diherike, dibihîzî?” Hosta, piştî ku gotina “belê.”yê lê tê bersivandin, weha bersiv dide: “a ha tu dikarî ji wir têkevî.” (Güngören, 2020: 180).

Koan, di japonî de bilêvkirina peyva "gōng'àn" a çînî ye ku tê wateya “belge/rûdanên ku ji gel re vekirî”. Wekî terma zenê jî ji diyalog, anekdot û pirsên ku bi mantiq û muhakemeyê re nayên bersivandin, re tê gotin. Herweha koan, yek ji teknîka medîtasyon û perwerdeya zenê ye. Koan, rêbaza ji alîyê hostayên zenê ve wekî peywîrek ji bo şagirtên şopdarê rêya zenê dayîn e û herweha bersivên ku ji alîyê şagirtan ve hatine dîtin ji venêrîna hostayê derbaskirin e. Jê mebest ew e ku şagirt dahûrandineka kûr li ser wateya mondoyan bikin (Güngören, 2020: 181). Koan, ji alîyê D.T. Sûzîkîyî ve wekî “Tevlîhevîyên pêşeroj û paşerojê” tê binavkirin (Suzuki, 2021: 96). Wexta ku “bigirûgirîfta zenê” ango “tengejeya zenê” tê çêkirin ji bo pêderxistina pirsê ji şagirtan tê xwestin ku aqil û mantiq neyê şixulandin. Ji ber ku li

gor perwerdeya koanê, ji bo pêderxistinê tekane rê bikaranîna pêhesî ye ku ev rê hişê mirovî ji nîhilîzm û dûalîzmê xilas dike û hişî ber bi satorîyê ve vedike. Bo nimûne:

Şagirtêk, der heqê nêrîna xwezaya Bûda ya ku di her afirandî de hestiyarî heyî de dixwaze bike mijara gengeşîyê û ji Chao-choûyê (Joshû, 778-897) dipirse: “Gelo di kuçikan de jî xwezaya Bûdayî heye?” Chao-choû, bersiva “Mû (çînî: Wû)”yê dide ku bêjeya Wûyê di wateyên wekî “hiç, na, nexêr, neyînî, bêmane” yan jî “ne yek ji wan jî” (Watts, 2022: 195) de te bikaranîn. Esildanî bi vê bersivê re Joshû, ji şagirtê xwe re dibêje ku pîrsa te badîhewa û beradayî ye, ji ber ku di her heyberan de jixwe xwezaya Bûdayî heye. Çend mînakên din:

“Berî ku tu ji dê û bavê xwe çênebûyî, gelo rûyê te yê rastîn çawa bû?”

(Dajîan Hûîneng, 638-713)

“Dengê her du destan çepik e. Gelo dengê yek destî çawa ye?”

(Hakûîn Ekakû, 1686-1769)

Di zenê de satorî, pêkhatina xwezaya Bûdayî ye. Armanca zenê ya dawînî satorîya ku jê re tecrûbeya ronîbûnê tê gotin, e (Fromm, 2023: 57). Di vê tecrûbeya ronîbûnê de yekcarî hişyarbûna hiş a zelal û xwerû heye. Ji vê hişyarbûn an jî vekirina çavê sêyem re di zimanê gelêrî de wekî satorî tê binavkirin (Sûzîkî, 2021: 61).

Pêkhatina şiyarbûnê ango satorî (Watts, 2022: 183), di çerxa zayîn-mirînê (samsara) de “zanetîya resen” a mirovî çê dike. Ev kespa hişyarbûn û ronîbûnê ne rewşeka derasayî û li derekî derîsirûştî ye, berevajîyê wê ew aîdî vê dinyayê ye. Satorî, ne rewşeka anormal a derûnê ye; ew ne rewşeka trans a ku berrahîyê tune dike jî ye. Herweha, ew ne halekî ruhî ya narsîstî wekî ku di hin şanîdanîya dînî de tê xuyakirin, e. Bereksê wê satorî, rewşeka pir bi normal a gîyanê ye (Fromm, 2023: 57).

Satorî ya ku bi tevahîya jîyanê re eleqedar dibe (Güngören, 2020: 190), di hişê mirovan de veguherîneka yekcar û mayînde amaje dike. Suzuki, ji bo pênasakirin, ravekirin û têgihiştina Satorîyê, bi tevahî heşt taybetmendîyên wê yên sereke weha bi rêz dike: “Dûrî aqilî, kûrbînîya ku xwe dispêre pêhesîyê, mitleqbûna

wê ya nîqas li ser nayê kirin, erênîti, hesta bihurtîniya (transandantal) derî têgihînê, bêkesîti angosê (objektîfî), hesta coşdarîyê û ji nişka ve bûyîn.” (Suzuki, 2021: 99-107)

1.1.6. Ziman û Nivîs

Zimanê japonî (j.: 日本語, Nihongo), li gel zimanên Ryūkyūyê di nav malbata zimanên japonî de cih digire û di nav pênc malbatên zimanan de bi giştî wekî zimanekî Êrâl-Altayî tê pejirandin. Zimanên japonîk ji gelek zaravayan pêk tên ku diyalektên wekî To-Hoku, Kan-To, Kan-Sai, Sî-Koku, Kîusû, Kagoshîma, Nagasakî, (Akalin, 1962: 45) çendîn zaravayên japonî ne û herweha diyalektên wekî Amamî, Yoron, Okinawayî, Miyako, Yonagunî hwd. jî di nav zimanên Ryūkyūyê de cih digirin. Îro li gor nêrîna ku herî zêde hatiye qebûl kirin, zaravayên zimanên japonî yê pêşî 5 hezar sal berê ji zimanê koreyî hatine dariştin.

Li gel vê, bi giştî jêderka zimanê japonî dibe ku xwe bispêre koçerên Yayoi yê ku di serê hezarsala BZ 1ê de ji Nîvgirava Koreyê hatine (Hanihara, 1991: 106). Ji aliyê zimanzanên japonî ve japonî wekî dîrokî, ji Japonîya Kevn (Heta sedsala 8.), Japonîya Kevn a Serdema Dereng (ss 9-11an), Japonîya Navîn (ss 12-16an) û Japonîya Modern (piştî ss 17an) hatiye polîkirin. Hetanî PZ sedsala 4an tenê zimanê devkî li serdestê zimanê japonî bû. Berîya salên pêşîn ên ku hê sîstema xwendin û nivîsa Çînî neketî li Japonyayê, tenê nerîta devkî serdest bû (Hane, 2023: 30).

Zimanê japonî, wekî nivîs *Kanjîya* logografîk, *Kana* û *Hîriganaya* syllabîk tev sê cureya sîstema nivîs a japonîya modern bi kar tîne. Li gel vê, ji bo latînîkirina zimanê japonî herweha alfabeya latînî *Rōmaji* jî tê emilandin. Kanjî (j.: 漢字 /karakterên çînî) bêjeyeka japonî ye ku ji lêanîna “hànzì” ya ku di Çînîya Mandarînî de tê wateya “karakterên çînî”, hatiye çekirin. Di rastîya xwe de alfabeyeka Çînî tune ye û sîstema nivîsa çînî pêşî ji hêma û şiklên pîktogramî teşe digire û piştê biyekbûna pîktografî û îdeografîyê xwe vediguherîne sîstema nivîsa logografîyê. Ji ber vê yekê ye ku zimanê çînî wekî zimanê nivîskî xwedîyê sîstema nivîsa logografîyê ye.

Kanjî ji Çînê di sedsala PZ 5an de bi rêya metnên olî yên bûdîstî û konfûçyûsî hatîye li Komgirava Japonyayê. Ji ber ku karakterên sîstema nivîsa kanjîyê ji alîyê semantîkî ve tên fêmkirin, her karakter xwedî wate/bêjeyek in. *Kanjî* tîpên (karakter) çînî yên fermî ne ku ji bo wateyên wan tên bikaranîn. Herweha *kana* ya ku du cureyê wê heye ji bêjeyên çînî yên dengên ku dişibine hev bi kar tên (Meyer, 2022: 55). Lewra di sîstema nivîsa kanjîyê de nêzikî 50 hezar karakter hene. Îro li perwerdehiya Japonyayê Jōyō kanjîyê, wekî karakterên kanjîyê ji bo hînîkirinê tê bikaranîn.

Kanaya syllabîk sîstemeka nivîs a kîtenivîsî ye ku di sîstema nivîsa japonî de ji bo nîşanîkirina mora û kîteyên fonolojîya japonî tê emilandin. Li gel vê kanaya modern sîstema nivîsa xwe di sedsala 7an de ji sîstema *Man'yōganayê* ku yekem kanaya ji bo nimandina fonetîka zimanê japonî hatîye bikaranîn, werdigire. Nivîsa Kana wekî Katakana û Hiragana tê dabeşkirin û ev her du sîstema nivîsî ya resen a japonî ji karakterên kanjîyê hatine sêdwergirtin. Hiragana û Katakana ji alfabeyeka bi yek tîp/dengî wêdetir wekî alfabeyeka mora/kîteyî tên binavkirin.

Li Japonyayê kîtealfabeya ku herî zêde tê bikaranîn, Hiragana ye. Nivîsa Hiraganayê yek ji sîstema kîtenivîsî ya kanayê ye ku wekî sîstema nivîsê ya japonîya modernkirinê tê pênasekirin. Bi taybetî di şûna nivîsandin/xêzkirina karakterên kanjî yên bi zehmet de tê emilandin. Herweha ji bona nivîsandina daçek, gihanek, qertaf û bêjeyên resen ên japonî jî tê bikaranîn.

Hiragana, di serdemên pêşî ya japonyayê de zêdetir di nav jinan de berbelav bûbû. Sîstema nivîsa Hiraganayê bi tevî ji 46 karakter/kîteyan pêk tê. Ji wan pêncê wê (あ/a, い/i, う/u, え/e, お/o) karakter/tîpên dengdêr in û ji xeynî karakter/tîpa “ん /n”yê karakterên dîtir ji kîteyên ku dawîya her yek ji wan bi karakter/tîpên dengdêr xilas dibin, pêk hatine. Bo nimûne: ま/ma, み/mi, む/mu, め/me, も/mo. Her karakter wekî fonetîk kîteyekî temsîl dike.

Katakana jî wekî Hiraganayê bi tevahî ji 46 karakter/kîteyan pêk tê û ji alîyê rêzikên rêzimanî ve hema hema hemû taybetmendiyên Hiraganayê werdigire. Sîstema nivîsa Katakanayê pêşî di nav keşişên japonî de dihate emilandin. Katakana, li Japonyayê li gel guherînên zimanî di sîstema nivîsa japonî de ji bona şanîkirina

gairaigoyan (peyvên bi deyn) ango bêjeyên biyanî yên ku ji derveyê welêt hatine, tê bikaranîn.

Rōmajî ya ku ji alfabeya latînî pêk tê, ji bo romanîzasyona (latînîkirin) zimanê japonî hatîye çêkirin. Li gel vê bi giştî ji bo kurtkirina bêjeyên japonî jî tê bikaranîn. Romanîzasyona *Hepburn*, *Nihon-shikî* û *Kunrei-shikî* sê teşîd sîstema romanîzasyona japonî ne ku di nav van sîstema romanîzasyonê de wekî yê herî berbelav tê emilandin, romanîzasyona Hepburnê⁸ ye. Li gel van, di hevokeka japonî de her sê sîstem a nivîsînê (kanjî, hîragana/katakana û rōmajî) jî bi hev re dikare peyda bibe.

Zimanê japonî ji hêla bastûra rêzimanî ve zimanekî fonetîk, pîrkîteyî, pêvekî (paşqertaf), kirbdar, tondanî (teşedengî), sentetîk û mora-demkî (mora-timed) ye. Nav li gor, hejmar, zayend û nasyarîyê (article) nayên tewandin. Lêker li gor dem, hevalnav û dangan tên tewandin, lêbelê li gor kesan nayên tewandin. Di japonî de dema borî û dema niha wekî du demên bingehîn hene ku demên wekî bê jî li gor hokerên demkî tê kişandin, fêmkirin. Herweha ji alîyê hevoksazîyê (sentaks) ve jî hevok bi awayê biker-bireser-lêkerê tê sazkirin û hevok li gor mijar-şîrovevîyê tên fêmkirin. Daçek, di dawîya hevokan de ji bona pirs pirsînê û derbirina bandora hestan tên bikaranîn. Wekî morfolojîk (teşenasîyî) zimanê japonî nav, lêker, lêkernav, lêkerhevalnav û hevalnav bi tevahî di pênc cureyê bingehîn ên bêjeyan de tê senifandin. Li gel vê, japonî ji hêla gencîneya bêjeyan ve wekî bêjeyên herêmî, bêjeyên sîno/çînî-japonî, bêjeyên bi deyn standî û îfadeyên deng lasayî (texlîdî) tevî ji çar tebeqeyên bêjeyê pêk tê. Her tebeqe bi taybetmendîyên fonolojîk û semantîkê (wateyî) re têkildar in.

Japonîya nivîskî hem wekî tîkî (vertical) û hem wekî berwarî (horizontal) bi du awayan jî tên nivîsandin. Awaya nivîsa tîkî wekî sîtîla nivîsa nerîtî jî tê zanîn. Ev sîtîla nivîsê ji jor ber bi jêrê ve tê nivîsandin û ji rastê ber bi çepê ve jî tê xwendin. Bi piranî metnên edebî û rojnameyan bi awaya nivîsa tîkî tên nivîsandin. Li gel vê, awayê berwarî piştî Şerê Cîhanê yê Duyem berbelav dibe û ew jî ji milê çepê ber bi

⁸ Romanîzasyona Hepburnê, di sala 1887an de ji alîyê James Curtis Hepburn (1815-1911) ê Amerîkî ve ji bo amadekirina ferhengê japonî-îngilîzî hatîye dahêrandin.

milê rastê ve tê nivîsandin û di heman awayî jî tên xwendin. Stîla nivîsa berwarî bi gelemperî di nîşane û malperên internet û hwd.an de tên bikaranîn.

1.1.7. Wêje

Nivîsar û berhemên nivîskî yên pêşî yên japonî ji xeynî nivîstekî kevintirîn ku di sala PZ nêzîkî 440an de li ser şûrekî hatîye nivîsandin, di Dewra Narayê de bi çînîya kevnar an jî bi nivîsa *kanbunê* (nivîsa edebî ya çînî) hatine nivîsandin. Bi giştî di naveroka nivîsar û berhemên pêşî de mijarên wekî listeya navên împaratorên Japonyayê, bûyerên dîrokî, vegêranên efsanewî û mîtolojîk, çîrokên gelêrî, helbestên rêûresmî, şahînetî, destanî, şînî, olî, lîrîk û sirûştî bi cih girtine.

Kataribeyan (çîrokbêj/medah) nerîta zargotin a japonî di veguheztina nivîsî de roleka mezin dilîzin. Di çaxên nivîsî tunebûnê de helbestên ku bi nerîta zarkî hatine gotin, bi saya medahên ku kataribe tê binavkirin, helbest hatine jiberkirin û ji nîfşê dahatû re hatine neqilkirin. Bi vî awayî tê pejirandin ku bi rêya kataribeyan helbestên gelêrî gihîştine serdema nivîsê (Esen, 2019: 94).

Kojikî (712), *Nihongî* (720) *Kaifūsō* (751) û *Man'yōshū* (759) yekem berhemên nivîskî yên dîrokî û edebî yên japonî ne ku di Serdema Narayê de hatine berhevkirin û nivîsandin. *Kojikî*⁹ (j.:古事記/Qeydên Derbarê Meseleyên Qedîm) kevintirîn berhemê nivîskî ya japonyayê ye. Bi daxwaza Şahbanû Genmeiyê û bi alîkarîya Hieda no Areyê, ji alîyê Ō no Yasumaroyê ve di navbera salên 711-712an de bi tevahî wekî sê berg hatîye berhevkirin, sererastkirin û nivîsandin. Berhem bi teşeyê nezmê, bi giştî çînî û sistema nivîsa man'yōganayê (japonîya kevn) hatîye nivîsandin. Di *Kojikî* de ji xeynî qeydên dîrokî û mîfîk, nêzîkî 500 kilam/stranên helbestkî yên kevnare jî hene. Ji hin van stranan jî *tankayê* ku yek ji teşeyê nezmê yê japonîya kevn tê binavkirin, pêk tên. Hunera edebî *Makurakotoba* (bêjeyên palkî/epîtet) di van tankayan de hatîye bikaranîn.

Ji alîyê naveroka xwe ve ku tê de bi piranî vegêranên mîfîk û efsaneyî bi gotineka dî kala kozmogonî, jîyana Ama-terasu (Xwedawenda Rojê) û împaratorê yekem Jinmu, afirandina yezdanên mîtolojîk, mirov û komgirava Japonyayê û hwd.

⁹ Herweha wekî navê *Furukotofumi* jî tê zanîn.

dike, hene. Ji ber van mijarên giring ji alîyê japonan ve esas wekî kitêbeka dîrokî ya japonyayê tê pejirandin. Herweha Kojikî, yek jê metnên pîroz ên şîntoîzmê ye.

Berhema *Nîhongî* (j.:日本紀) anga *Nîhonshokîyê* (j.:日本書紀/Weqayînameyên Japonyayê) wekî berdewam û şîroveya Kojîkîyê ye. Ji alîyê komê zanayên qesra împaratorîyê ve bi çînî hatîye nivîsandin. Ew jî wekî Kojîkîyê bi vegêranên mîtolojîk dest pê dike, bes di dawîya xwe de *Nîhongî* zêdetir li ser qewîmînên dîrokî ya fermî ya Japonyayê disekine anga hê bêhtir li ser dîroka rasteqîn hûr dibe. Her du pirtûkên dîrokî (Kojîkî û *Nîhongî*) jî agahîyên ku ji çavkanîyên Çîn û Koreyê yê hatine berhevkirî, dihundirîne (Hane, 2023: 32).

Kaifūsō (j.:懷風藻, Florilegiuma/Heleza Avî ya Hewayên Giranbuha) berhevokeka ku ji hêla şêst û çar helbestvanan ve bi şeweya *kanshîyî* (helbesta edebî ya Sînîtîk/Çînî) hatîye nivîsîn. Di nav van helbestvanan de împaratorên japonî jî helbest nivîsandine. Antolojî, li gel pêşgotinek 120 helbestên ku bi çînî hatine nivîsandin, pêk tê (Meyer, 2022: 54). Piranîya helbestan, ji bona mîhrîcanên demsalî, gerên împaratorîyê û mêvanên ji derveyê welatî (Sîlla/Kore) hatin re, wekî helbestên mazûvanî, keyf û şahîyê hatine nivîsandin.

Man'yōshū, berhevoka herî kevn a helbestên japonî ne ku antolojî di warê wêje û helbesta japonî de wekî berhemeka afîrîner, mezin a yekem (Hane, 2023: 34) a Japonyayê û di dîroka wêjeya cîhanê de jî wekî yek ji berhemên giringtirîn tê qebûlkirin (Esen, 2019: 23). Li gel nezanîna jikûderê hatina binyata bêje ya *Man'yōshūyê* wekî wate “Destegula Deh Hezar Perr” yan jî “Destegula Deh Hezar Çax” tê binavkirin.

Berhem bi tevahî ji 4516 helbest û 20 bergan pêk tê. Di berhevokê de nêzîkî 450 helbestvan ku navên wan an hatîye nîşekirin an jî hatine texmînkirin, derbas dibin. Gundîyên bînav, esîlzade û împaratorên serayê di nav helbestvanên ku helbest nivîsandine de, tên hejmartin. Herweha helbestên antolojîyê ji 5/1ê wê ji alîyê helbestvanên jin ve hatine nivîsandin (Nakanishi, 2015: 12).

Helbestên *Man'yōshūyê*, di nav maweya 400 salan de şamil bûne bi gotineka dî di berhevokê de dîroka nivîsandina helbesta herî kevn salên 340î û ya herî dawî jî

sala 759an hatine diyarkirin. Ev mawe, di dîroka Japonyayê de bergî Serdemên Kofûn, Asuka û Narayê tê. Di dewrên nivîs tuneşî de helbest û çîrokên ku aîdî nerîta zarkî ji hêla çîrokbejên *kataribeyan* ve dihatin jiberkirin û vegêrîn. Bi saya kataribeyan gelek helbestên japonî hatine parastin, piştî hatina nivîsê ji aliyê berhevkarên ve hatine nivîsîn û gelek ji wan helbestên ku derbasî nivîsî bûne di antolojîya Man'yōshūyê de cih girtine. Her çiqas derbarê berhevkirina antolojîyê de behsa gelek berhevkarên û li gel vê nêrînê cihê cihê hatibin kirin jî helbestvan Ōtomo no Yakamochi (718?-785) wekî berhevkare ku şiklê dawîn daye berhevokê, tê pêjirandin (Esen, 2019: 55).

Ji hêla cureya helbestê ve Man'yōshū antolojîyeka *wakayê* ye. Helbesta cureya *wakayê* wekî yekeya pîvana kîteyan, bi awaya 5+7 tê ristin. Wakayên berhevokê ji aliyê teşe, naverok û mijaran ve wekî ji *tanka* û *hanka* (4183? helbest), *chōka* (265 helbest), *sedōka* (62 helbest), *kanshū* (4 helbest), *tanrenga* (1 helbest) û bussokusekikataiyê (1 helbest) pêk hatîye. Ev cureyên helbesta *wakayê* li gor forma kîtekirina 5 û 7an; direjahî, kurtayî û bi yekbûna wan bi çeşîd bûne. Li gel van, herweha di antolojîyê de stranên gelêrî yê kevn ên japonî ku bi hejmara kîte ya *wakayê* hatîye nivîsandin û bi awayê stranî hatine gotin ango *kayō* jî cih digirin (Esen, 2019: 62).

Herçendî ku ji layê naverokê ve banê tema û mijarên Man'yōshūyê gelekî berfireh, pirreng û curbicur bin jî; mirin, xizanî, evîna bextreş û dîlşikandî, zêmar, dilsozî, kerba welatî, pesna welêt, qerf, ji xelkê re şîret, rêwîtiya behrê, hestên romantîk ên di têkîliya jin û mêran de, spehîtiya siruştê, şayesandîna dîmenên xwezayê, şop û bandora xwezayê li ser hestan, tesîra çerxa demsalê li ser hestê mirovan, fanîtî, geşt û rêwîti, bêwateyî, pesna araqê, çîrokên efsanewî, politîka, kar û barên dewletê, şahî, pîrozbahî, bawerî, jîyana esîlzadeyan wekî mijar û temayên sereke yê antolojîyê ne. Têgiha *Kotodamayê* ango “gîyana bêjeyê” li serdestê kakil û puxteya muhtewaya berhemê ye. Heke em li ser naveroka antolojîyê hûr bibin bawerîya “gîyana bêjeyê” (kotodama) gengaze ku puxteya Man'yōshūyê pêk anîye (Esen, 2019: 69).

Vedora Heianê (sedsalên 8-12an) di dîroka wêjeya japonî de wekî serdema wêjeya klasîk tê binavkirin ku di vê serdemê de ji hêla cureyên wêjeyê ve

dewlemendî, pircureyî û geşbînî çê dibe. Ji xeynî helbestan (tanka/waka) *nîkkî* (rojnivîsk/bîrewerî), *zuîhîtsu* (ceribîn), *monogatari* (çîrok) di serdema wêjeya klasîk de wekî cureyên edebî derdikevin pêş.

Berhevoka *Kokin Wakashûyê* (905) ango navê wî yê berbelavtir *Kokinshû* (Koleksiyona Helbestên Nûjen û Kevn) di nav berhemên wêjeya Heianê de cihekî giring digire. Antolojî, li gel pêşgotineka pexşanî ya bi navê *Tosa Nîkkî* (Rojnivîska Tosayê), ji 1100 helbestên tankayê pêk tê. Bi fermana împarator Daigoyê, ji aliyê serkêşîya nivîskar, xweşnûs û helbestvan Ki no Tsurayukî (872-945) ve hatîye berhevkirin.

Nîkkî yên ku wekî cureyeka wêjeyî cara pêşî di vê serdemê de hatine nivîsandin, bi taybetî di nav jinan de, di nav qesra împaratorîyê de eleqeyeka mezin dibîne. *Nîkkî*, li gel taybetmendîyê wî yê roj bi roj nivîsînê wesfên helbest, bîrewerî, name, geştna û çîrokan jî li xwe dikirin. *Kagerô Nîkkî* (974)¹⁰ yek ji wan berhemê cureya rojnivîskê ye ku ji aliyê jineka bi navê Fujîwara no Mîchîtsuna no Haha ango Dayika Mîchîtsunayê (Nzk 935-995) ve bi şeweya pexşan-helbestkî (waka) hatîye nivîsandin. Berhem, çîrokên evînî û bûyerên curbicur ên ku belavî bîst salan bûne (954-974), qeyd dike (Meyer, 2022: 66). Li gel vê, *Sarashîna Nîkkî* (Rojnivîska Sarashînayê) jî yek ji herî navdar ê cureya wêjeyî ya rojnivîskê ye ku nêzîkî di sala 1059an de ji aliyê nivîskar Xanima Sarashînayê (Sugawara Takasue no Musume) vê hatîye nivîsandin. Ev berhema pexşan-helbestkî ji ber ku xwedî taybetîyên cureya geştnameyê tê de dihevine, wekî yek jê ji cureya geştna yên yekem tê zanîn. Herweha rojnivîska Xanima (Murasakî) Shîkîbûyê ku wekî berbûka Qesra Heianê tê zanîn, a bi navê *Murasakî Shîkîbû Nîkkî* (1008-1010) jî di Serdema Wêjeya Heianê ya Japonan de yek ji giringtirîn ên di nav berhemên cureya nîkkîyê de tê qebûlkirin. Di naveroka berhemê de çîrokên kurt, helbestên waka û nameyeka direj ku beşek bi hev re name nivîsandin e, cih digirin.

Wekî cureyeka ceribînî *zuîhîtsu* jî di Dewra Wêjeya Heianê de derdikeve û ev cure bi awayekî serkeftî nimuneyên xwe di Serdema Edoyê de dide. *Zuîhîtsu*, bi giştî

¹⁰ Berhem, li gor japonolog Jacqueline Pigeot wekî xwejişîngariya (otobîyografi) pêşî ya ji hêla nivîskareka jin ve hatîye nivîsîn, tê pejirandin. Ji bo agahîyên berfirehtir Pigeot, Jacqueline. “*Ji Kagerô no Nîkkîyê Heta Genjî Monogatari'yê*”. Kovara Xebatên Cîpango-Fransî, Berg 3., 2014.

nivîsên şexsî, ponijînî ne ku xwe dispêre çavderîyên bûyer û dîmenên rojane. Herweha ji ber şêweya xwe ya nivîsînê wekî *Balgihname* ango *Pirtûka Berserî* jî tên binavkirin. *Makura no Sôshî* (Pirtûka Berserî) ya ku ji alîyê nivîskara jin Seî Shōnagonê ve (966-1017 an jî 1025) di sala 1002an de hatîye temamkirin, yek ji herî giring cureya zuîhîtsuyê tê pejirandin. Makura no Sôshî, bi şêwaza helbestkî û wekî cureya cerîbînî hatîye nivîsîn. Nivîskar Seî Shōnagon ku sitîya seraya împaratorîyê bû, di berhemê de bi giştî derbarê bûyerên ku li seraya împaratorîyê qewîmîn e de çavderîyên xwe bi ramanên xwe yê resen nivîsîye. Li gel vê, hin anekdot, helbest û derheqê hin kesan de nêrînên wê jî di pirtûkê de hene.

Monotagarî ya ku hîmê xwe ji kevneşopîya zargotînî ya japonî wergirtîye, cureya vegêranî û honaka edebî ya gerdîşî ya navdartirîn a wêjeya japonî ye. Ev cureya honakî, di nav xanimên seraya împaratorîyê de geş dibe. Monotagarî, her çendîn ku ji hêla naverokê ve wekî cureya çîrokê bê binavkirin jî hin mînakên wê xwedî taybetîyên cureyên wekî destan, çîrvanok û roman in. Bi giştî li gel bi awayê pexşanî, herweha bi *uta monotagarî* (çîrokên menzûm) ya ku bincureyeka monotagarîyê ye, jî tên nivîsîn. Çîrokên ku di monogatarîyan de hatine vegotin, bi şêweyên wêneyî *yamato-e* û *emakî* re dihatin şayesandin. Bûyerên dîrokî û awarte, şer û pevçûnên di navbera klanên japonî de, entrîka û jîyana rojane yê qesra împaratorîyê, evîn, hîsgirî û hestgerîya kûr a ku li ser her hêmanên jîyanê mijar û temayên sereke yê cureya monogatarîyan in.

Di navbeyna sedsalên 10 û 11an de gelek berhemên monogatarîyî hatine nivîsîn. *Taketorî Monogatarî* (Çîrokên Komkirina Bambûyan), *Îse Monogatarî* (Çîrokên Îseyî), *Utsubo Monogatarî* (Çîroka Dara Xuloleyê) û *Genjî Monogatarî* (Çîroka Genjîyî) berhemên herî binavûdeng ên cureya monogatarîyê yê wêjeya japonî ya klasîk in.

Taketorî Monogatarî (Çîrokên Komkirina Bambûyan) ya ku di serê sedsala 10an de ji alîyê nivîskarekî/a nenas ve hatîye nivîsandin, di wêjeya japonî de wekî cureya monogatarî berhema herî kevn a ku gihîştîye heta roja îro, tê pejirandin. Çîrok, ji wêjeya japonî ya gelêrî hêmanên wekî derasayî sûdê werdigire û herweha ji ber navê lehenga çîrokê berhem wekî *Kaguya-hime no Monogatarî* (Çîroka Keçmîra Kaguya-hîmeyê) jî tê zanîn. Kaguya-hîme, ji heyvê tê û wekî pitik di nav darekî

bambû ya belek de tê vedîtin. Piştî, serpêhatîya wê ji keçeka biçûk ber bi veguherîna keçeka bedew û evîndarîya wê ve tê vegêrîn.

Îse *Monogatarî* (Nzk 980yî), koleksiyoneka bi menzûm çîrokî (uta monogatarî) ye ku der heqê nivîskarê/a berhemê de nêrîneka hevpar tune ye. Berhem, bi tevahî ji 125 beş û 209 helbestan (waka) pêk hatîye. *Utsubo Monogatarî* (1970-1983), yekem berhema dirêj a honakî ya japonan e û herweha wekî yek ji romanên kevintirîn ên cîhanê tê qebûlîkirin. Nivîskarê/a berhemê nayê zanîn. Roman, ji du rêzebûyerên mezin ve hatîye honandin. Berhem ji 20 beşan pêk hatîye û tê de 986 helbestên tankayê hene.

Genjî Monogatarî, li gel yek ji şakara wêjeya japonî, di heman demê de berhem yek ji klasîkên wêjeya cîhanê ye. Berhem, ji aliyê nivîskara jin a ku li seraya Heianê nedîmeya keybanûyê kiribû, Murasakî Shikibû (973/978-1014/1031) ve di destpêka sedsala 11an de ango nêzîkî di 1010an de hatîye nivîsîn. Di roja me ya îroyîn de Murasakî wekî nivîskara *Çîroka Genjîyî* ya ku di sedsala 11an de hatîye nivîsandin, wekî yekem romannûsa jin a cîhanê tê bîranîn (Clements, 2023: 85). Herweha *Genjî Monogatarî* jî, wekî yekem romana cîhanê tê pêjirandin. Tiştê ku berhemê kiriye klasîk, bandora estetîka giştî ya ku ji hêla şewaza xweşik û narîn a helbestkî ya nivîskarê ve hatîye afirandin e.

Çîroka *Genjîyî*, ji berhemeka pexşanî wîrdetir, berhemeka helbestkî ye (Hane, 2023: 34). Mijara çîrokê, li derûdora serlehengê çîrokê *Hîkarû Genjîyê* (*Genjîyê Birqok*) ango navê wî yê berbelavtir *Mîrza Genjîyê* diqewime. Berhem li ser jîyana romantîk a *Genjîyî*, serpêhatîyên wî yên evîndarîyê, jîyana rojane û herweha li ser çanda keyf û şahî, feraseta exlaq, cil û bergên civaka arîstokrat a wî serdemê hatîye honandin. Li gel vê, di romanê de *Shikibû* wekî tema têgiha *mono-no-awareeyê* ango hestiyarî û dîlîzîyîya kûr a ji her tiştê jîyanê re, bi kar anîye da ku ji bona her kesî û her tiştî re fanîtî û nediyarîya jîyanê ravebike. Berhema *Genjî Monogatarîyê* bi tevahî ji 54 beşan û 800 helbestan (waka) pêk tê.

Di wêjeya japonî ya vedora navîn (sedsalên 12-16an) de¹¹ wêje, bi gelemperî li gel hîlbûna çîna leşkerî û olî, xasma di nav samûray û keşişan de şax vedide. Di wêjeya vê serdemê de bincureyeka monotagarî *gûnkî monogatarî* (Çîrokên Şerî), çîrokên kurt û biresm *otogî-zōshî*, ceribînên keşiş ên bûdîst û yek ji teşeya nezmê ya helbesta japonî *renga/renka* bi awayekî berbelav tîr nivîsandin. Helbesta vê serdemê (Kamakura) lasaker, dîdaktîk û li gor helbestên berê pir qels in. Jîyana huner û wêjeyê, li gor vegotina hemû hest û ramanên civakeka mîlîtarîst mînakeka baş teşkîl dike (Akalın, 1962: 20). Herweha di helbesta japonî de bi helbestkarên herî hindik re û li gel helbestên herî bê wesf ên dewra helbestê dibe ku ev serdem (Muramachî/Ashîkaga) be (Akalın, 1962: 22).

Heike Monogatarî (Nzk 1220î) berhema herî navdar ên çîrokên şerî yê japonan e. Bi rêya çîrokbêjên keşiş ên ku bi xwedîyê amûrên ûdê (Biwa hōshî) ne, hatine vegêrîn, ji alîyê esîlzadeyekî serayê ve hatîye berhevkirin/nivîsîn. Çîroka Heikeyê bi şewaza xwe ya destanî, pevçûn û têkoşîna du êlên japon *Taira* (Heike) û *Minamotoyê* vedibêje. Jîyîn û felsefeyên samûrayî û bûdîstî, her du temayên bingehîn ên berhemê pêk tîne.

Otogî-zōshî, cureyeka çîrokî ye ku ji hêla xwe ya pexşana kurt ve û herweha çîrokên ku hatine vegêrîn li gel îlustrasyonan di wêjeya vedora navîn a japonî de berbelav bû. Çîrokên otogî-zōshîyê anonîm in û bi piranî di nav çîna aristokrat, rahîbên bûdîst û şervanan (samûray) de hatine nivîsandin. Ceribînên (Zuîhîtsu) keşişan jî, nivîsên giring ên wêjeyî yê wê dewrê ne. Kamo no Chōmei (1155-1216), bi şair-keşiş Saigyō (1118-1190) re hem yek ji nûnerê wê cureyê hem jî nûnerê “wêjeya munzewîyê” (sōan būngakū) ye. *Hōjōki* (1212) yek ji pirtûka cureya ceribînî ye ku ji alîyê nivîskar, helbestvan û keşiş Kamo no Chōmeiyê ve hatîye nivîsîn. Helbesta pevgîredayî *renga*, di vê serdemê de derdikeve ku wekî pîvana kîte/morayan û li gor rêzandinê wekî teşeya nezmê pêşî sê riste 5-7-5 û dûre du riste 7-7 di nav hostayên rengayan de hatine “lêckirin” û nivîsandin. Lîo Sōgî yan jî Inō Sōgî (1421-1502), hostayê herî mezin ê cureya rengayê tê pejirandin ku *Minase*

¹¹ Ev vedor di heman awayî de wekî Serdemên Kamakura (1185-1333) û Ashîkagayê (1333-1603) [Muramachî (1338–1573) û Azuchî-Momoyama (1574–1600)] tê zanîn.

sangin hyakuin (Li Mînaseyê Sê Şair, 1488) û *Yuyama sangin hyakuin* (Li Yuyamayê Sê Şair, 1491) du berhemên wî yên navdartirîn in.

Helbest û pexşan di wêjeya Vedora Tokugawayê ango wêjeya Dewra Edoyê (1603-1868) de di nav xwendeyên qesebeyîyan de belavtir dibe. Wêjeya Dewra Edoyê, bi pîrbûna girseya xwîneran û bi saya nivîskar/helbestvanên ku dengê xwe ji civakekî mezintir re zêdetir gihîştine, di serî de bû malê gelê çîna navîn (Akalin, 1962: 23). *Kana-zōshî* cureyeka pexşanî yê ku di Serdema wêjeya Edoyê de ji bo pênasekirina pirtûkên japonî hatiye binavkirin. Wekî term ji ber bikaranîna karakterên kanayê di wateya “pirtûkên ku bi kanayê hatine nivîsîn” de hatiye bikaranîn. Ev cure ji hêla naverok û mijaran ve gelekî biçêşn in ku çîrok, nivîsên olî, nivîsên rexneyî, ceribîn, kronîkên eskerî, rênîşeyên geştê û hwd. wekî cureyên sereke ne. Suzuki Shōsan (1579-1655) û Asai Ryōi (1612-1691) di nav nivîskarên kana-zōshî yên navdar de cih digirin.

Ukiyo monogatari (Çîrokên Dinyaya Soberîkirî, 1661) romana Ryōi ya herî navdar e ku herweha berhem mînaka herî binavûdeng a cureya kana-zōshîyê ye. Li gel vê, *Ukiyo-zōshî* ku ji kana-zōshîyê hatiye dariştin, di wêjeya vê vedora de derdikeve û wekî yekem mînaka popûler a cureya honakî ya japonî tê binavkirin. Ev cure tê wateya “Pirtûkên Dinyaya Soberîkirî” ku ji bona kêf û şahîni hatine nivîsîn. Bi giştî pirtûkên ukiyo-zōshîyê bi wêne û îlustrasyonên ukiyo-eyê re pêk dihatin. Helbestvanê japon Ihara Saikaku (1642-1693) avakare cureya pexşana ukiyo-zōshîyê ye.

Di vê serdemê de, di qada helbestê de yek ji geşedana herî giring di formên cureya rengayê de çê bû. Di gel *ushîn renga* (rengaya giran) ya ku kevneşopîya helbesta serayê didomand, stîla *mushîn renga* yan jî *haikaî* (rengaya qerfî) di nav gel de gelekî berbelav bû. Helbestên haikaîyê ku wekî *renkû* (risteyên pevgirêdayî) yan jî *haikaî no renga* (risteyên pevgirêdayî yên qerfî) jî tê zanîn, xwe dispêrin helbestên ku li hawirdorê mijar û temayeka hevpar û bi tevkarîya helbestvan ên ku hejmara wan du yan jî ji didoyê -teşeya tanrenga tê gotin- zêdetir. Birrek helbestvan li gor şêwaza lihevvegerandinê bi gotineka di wekî bersivdayînê paşpêşîya (peyvbazî) bêjeyan dikiran û ji bo keyfê û henekê helbestên haikaîyan bi awayekî melodîk diristandin.

Hokkûya sêrêzî ya ku ji destpêk û vebûyîna haîkaîyê (haîkaî no renga) re dihate gotin, piştî ji hêla naverokê ve tê guhertin ango dev ji mijar û temayên keyf û qerfîyê tîr berdan û renekî giran û dîlîz lê tê kirin û bi awayekî dibe helbesteka serbixwe. Li gel Yamazaki Sōkan (1465-1553) Matsunaga Teitokû (1570-1653) û Nishiyama Sōin (1605-1682) di nav helbesta japonî de yek ji hostayên haîkaî no renga ango haîkaî yê di herî giring de cih digirin. Li gel van, Matsuo Bashō (1644-1694), Uejima Onitsura (1661-1738), Yosa Buson (1716-1784) û Kobayashî Issa (1763-1828) mezintirîn hostayê helbestên hokkûyê yê li Serdema Wêjeya Edoyê ne. Helbestvan û rexnegirê wêjeyê Shiki (1867-1902), *waka* û *hokkûyê* ku her yek jê teşeyên nezmê yê helbesta japonî ya klâsîkê ne, kirasê moderbûnê li wan kir: *wakayê* veguherande *tankayê* û *hokkûyê* jî veguherande *haîkûyê*.

1.2. Haîkû

1.2.1. Geşedana Dîrokî ya Haîkûyê

Helbesta japonî ji sedsala 7an pê ve (Suzuki Î., 2011: 12) ji hêla teşeyê ve ber bi kurtbûnê ve çûye. Helbesta japonî ya klasîk ku esas li ser teşeya nezmê bi kîteyî 5+7ê hatîye rîstandin, bi vî awayê re gelek helbestên teşeyî û cureyî yê curbicur çê kir. Hin ji wan wekî *naga-uta*,¹² *bussokusekîkatai*,¹³ *choka*,¹⁴ *hanka*,¹⁵ *sedoka*¹⁶ bi demê re nehatin bikaranîn û winda bûn, hin ji wan piştî wekî cure û teşeyên helbestê yê nû *dodoitsu*,¹⁷ *renga* (renka) derketin. Herweha helbestên wekî *senryū*¹⁸ û *hokkûyê* jî di nav cureya *haîkaîyê* de derketin. R.H. Blyth (1965: 4) geşedana

¹² Kevintirîn teşeya nezmê a helbesta japonî ya klasîk e ku tê wateya “helbest/stranên dirêj”. Li gor risteyên bi 5 û 7eyî û direjahîya wê bi awayekî bêsinor hatîye sazîkirin.

¹³ Cureya helbesta ku li bajarê Narayê, li Perestgeha Yakushîyê li ser bîrhatêya şopa pîyê Bûdayê (tê bawerkirin ku Bûda şopa pîyê xwe li wê derê hêlîştîye) hatîye neqşîkirin. Bi teşeya kîterêza 5+7+5+7+7+7ê hatîye rîstîn.

¹⁴ Helbestên dirêj in û ji hêla naverokê ve behsa mijarên resmî-gelemperî dike. Li gel vê, wekî helbestên şînî ango zêmarî jî tê zanîn. Berê li ser gora kesekê/î dihatina xwendin. Bi awaya 5+7+5+7+5+7...ê didome û 7+7ê bi dawî dibe.


¹⁵ Li gor chokayê(çoka) helbestên kurt in ku ji 5 riste û 31 kîteyê (5+7+5+7+7) pêk tê. Bi dû chokayê wekî dîsgotin (neqarat) ango helbest/strana dijber hatine nivîsandin/strandin.

¹⁶ Bi teşeya 5+7+7/5+7+7ê bi tevahî ji 6 riste û 38 kîteyê pêk tê. Wekî cota “katauta” 5+7+7ê jî tê binavîkirin ku wateya her sê risteyên pêşî, bi peyvên cihê cihê re dişa di her sê risteyên dawî de tê dayîn.

¹⁷ Bi teşeya kîterêza 7+7+7+5ê ji 26 kîte û çar riste ango ji çarîne pêk tê.

¹⁸ Helbesteka rexneyî (satîrîk) û tevzker e ku ew jî wekî helbesta hokkûyê ji beşa vekirinê û ji 3 riste û 17 kîteyê (5+7+5) pêk hatîye. Ev cureya helbestê navê xwe ji helbestvanê japonî Karaî Senryūyê (Karaî Hachîemon, 1718-1790) wergirtîye.

dîrokî ya haîkûyê ji alîyê peydabûn, bandorgirtin û teşegirtinê ve bi diyagramê re weha şematîze dike:



Herçendî ku pêşanimûneyên (prototîp) haîkûyê, hokkû cara pêşî di Serdema Kamakûrayê de ango di sedsala 13an de ji cureyên din veqetîyabin jî di dawîya sedsala 14an de ji nav tankayê derdikeve (Akalin, 1962: 53) û hokkû esas wekî cureyeka serbixwe ya helbestî ji sedsala 16an û pê de xasma di sedsala 17an de di nav helbesta japonî de bi cih dibe. Di sedsala 17an de cureya helbesta zincîrekirî (linked verse/linked poetry) ango renga wekî cureyeka helbesta hevpar (kolektîf) ji helbesta tankayê (waka), di nav haîjînan (helbestvanên japonî) de bi awayekî lecî peyda dibe.

Di sedsalên 14-15an de di navbeyna çîna leşkerî (samûray) de ya ku ji feodalîzma japonî derketîye, dostanî û hevaltîya huner û gîyanî ku wekî berdewamîya hevaltîya çekdarîyê tê hesibandin, teşeya nezmê ya bi hevrayî

(kolektîf) ango *renkayê* (renga) çê kirin (Akalin, 1962: 53). Ev sepandina helbesta pevreyî bi demê re bi şêwaz û hostatîya haîkûnivîsan ji hêla hunera edebî ve geştir dibe û li gel hêmanên wekî kurtbûn, fesîhbûn, xwerûbûn û nîşankirinê jî bi kamil dibe. Derheqê peydabûna haîkûyê de ku ji bo japonan navê derbirîn, dembihêrk û berê xwe dana sirûştê bûbû, Berken Bereh (2017: 4) weha dibêje:

“Di nav japonan de nivîsandina Haîkûyên serkeftî yek ji nîşaneyên maqûlîyê bû. Ji ber vê çendê di pergala gerdoyî ku sêsed sal domand û her şerê derebegitîyê bû, li Japonyayê her şervanê bi navûdeng diviyabû nivîskarek baş ê haykoyê jî be. Kesên ku roj tim di qada şer de mêr dikuştin bi êvarê re hildikişîyan qesrên xwe û li wir baxçe temaşe dikirin û guh didan şîreşîra avê, dengê ba, berf, baran û temaşeyî heyv û esmên û stêrkan dikirin û diketin medîtasyonê. Roja din ew sê ristên jiber kiribûn dixwendin. Bi salan re ev jîyana bi sirûştê re lihevhatî û aram kir ku helbesta haykoyî bibe gencîneyeka balkêş a japonan.”

Li pêşberî ushîn renga (rengaya giran) ya ku kevneşopîya helbesta serayê didomand, stîla mushîn renga yan jî haîkaî (rengaya qerfî) di nav gel de gelekî berbelav bû. Di dembihêrk û lihevvegerandina rengayê de haîjînek ku divê kesekî/ne pispor û hostayê rengayê be, pêşî wekî qaîdeya rengayê bi teşeya 5+7+5ê ji haîkaî no hokkûya vekirina haîkaîyê ango haîkaî no rengayê, dest bi vekirina rengayê dike. Ev benda (kû) ewil ji hêla naverokê ve wekî mijarên keyfî, qerfî, tevzî û henekî dihundirînîn ku haîkaî no renga wekî wateya risteyên pevgerîdayî yên qerfî tê binavkirin. Dû re haîjînek li gor gîyana mijarê, bi teşeya 7+7ê bersiv dide. Ya/yê sêyem hokkûyek dî lê zêde dike, ya/yê çarem jî bersiva wê/wî dîsa bi forma 7+7ê dide û bi vî awayî cureya helbesta rengayê bêsînor didome.

Di Serdema Edoyê de renga di nav gel de berbelavtir û ji hêla naverok û cureyê ve berfirehtir bû. *Kasena* bi 36 bendî ku yek ji teşeya rengayê ye û bêjeyên firûmaye û çêrên pîs (argo) lê hatîbû zêdekirin, di vî serdemê de binavûdeng bû. Ev teşeya rengayî herweha wekî haîkaî no renga ango haîkaîyê hate binavkirin. Matsuo Bashō di heman demê de hokkûyê wekî cureyeka serbixwe vediketîne; ji şêweya qerfî, argoyî û keyfî rizgar dike û kirasê hunerî lê dike. Bi sedansalan re ev dûberekî çî qas zêdetir xuyabû, di Serdema Meîjîyê de *hokkû* navê *haîkaî no hokkûyê*; piştî jî

di destpêka sed sala 20an de Masaoka Shîkî ji navê haîkaî no hokkûyê ku tê wateya helbesta yarî, şayê, *haîkûyê* darişt (Aytemür, 2021: 8).

Îkuko Suzuki (2011: 22) haîkûyê ji alîyê serdem, jêzabûna cureyê û helbestvanan ve û herweha ji geşedana wê ya dîrokî û formatîvî ve weha disenîfîne:

Heyam	Cureyên Helbestê	Helbestvan
ss. 7an	Chouka Kaeshî-uta (bi şêweya tankayê)	Kakinomoto Hitomaro (?-?)
ss. 13an	Renga	Sougî (1421-1502) Shouhaku (1443-1527) Souhou (1448-1532)
ss. 15an	Haîkaî-renga	Yamazaki Soukan (?-1540?) Arakida Moritake (1473-1549)
ss. 16an	Danrin-haîkaî Teîmon-haîkaî	Matsunaga Teitoku (1572-1653) Nishiyama Souin (1605-1682)
ss. 17-18an	Haîkaî (bi şêweya rengayê) Hokkû	Matsuo Bashō (1644-1694) Yosa Bûson (1716-1783)
Dawîya ss. 18an Destpêka ss. 19an	Tsukînamî haîkû	
ss. 19an	Haîkû	Masaoka Shiki (1867-1902)

Matsuo Bashō (1644-1694), Bûson Yosa (1716-1784) Kobayashî Issa (1763-1828) û Masaoka Shiki (1867-1902) mezintirîn hostayê helbestên haîkûyê ne ku wekî “Çarmendê Mezin” tên binavkirin. Helbestvanê ku yekem ekola mezin a haîkûyê avakirî, Matsuo Bashō ye (Akalin, 1962: 307). Joso, Etsu-Jin, Hoşushi, Sampu, Kyoral, Ransetsu, Kyoroku, Kikaku, Yaha û Shiko wekî deh helbestvan ên şagirtê Başôyî tên zanîn û herweha Ensui, Torin, Mokudo, Shado, Shara, Urit-Su, Yaso, Îzen, Sora, Sanojo, Senna, Boncho, Bunson, Otsuyu, Shoha jî kesên wekî peyrewên ekola Başôyî tên pejirandin.

Ekola mezin a duyem a haîkûyê ji alîyê Buson Taniguchî (Yosa) ve hatîye damezrandin. Wênexêzîya wî hem li ser şewaza haîkûyên wî hem li ser ekola wî

bibandor dibe. Nêrîna Busonî, hem nêrîna helbestvanî û hem jî ya wênesazîyê ye (Suzuki Î., 2011: 20). Lewre, di şêwaza haîkûyên wî de ji lîrîzma Başôyî wirdetir şayesandin, hêza nîgaşê û sêbjektîvîzîm li serdest in (Asou, 1956: 14). Şagirtê mezintirîn ê Busonî, Masaoka Shiki ye û li gel vê Kobayashî Issa, li gel şêwaza xwe yê hûmanîstîk di haîkûyê de rêya Başôyî şopand.

1.2.1.1. Matsuo Bashô û Haîkû

Matsuo Bashô (Başô), hostayê herî mezin ê helbesta haîkaîyê û helbestvanên haîkûyê ye. Herweha ew, rexnegirê helbestên japonî (haîkaî, renga), haîkaîşîyê (hosta û mamostayê helbesta haîkaîyê) civînên pêşbirk ên şagirtê haîkaî û hokkûyê, helbestvanê gerok (gînko) û nîgarxêzê haîgayê ye. Navê wî yê rastîn Matsuo Kinsaku (松尾 金作) ye ku Bashô (芭蕉), haîgöyê (mehles) wî yê herî navdar e.

Mûnefûsa, Sôbô û Tôsê/Tosei mehlesên wî yên berî bernavka Bashôyê ne. Başô, di sala 1644an de li eyaleta Igayê (îro wekî eyaleta Mîeyê tê zanîn), nêzîkî li bajarê Uenoyê hatîye dinyayê. Bavê wî Yozaemon, di bin xizmeta malbata Todoyê de ku malbat ji binemalî ve li bajarê Uenoyê desthilat bûn, samûrayek bû. Du birayê mezin, yek xwişka mezin û du xwişkên biçûk ê Başôyê hebûn. Di wexta zaroktîyê de navê wî Kinsaku bû, heya mezinbûnê bi demekî wekî Toşîçîro û Çûemon jî dihatê banîkirin (Yuasa, 2020: 21). Ew hê di zaroktîya xwe (neh salî) de wekî bavê xwe xizmetkarîya binemala Todoyê dike.

Bavê wî di sala 1655an de dimire. Başô, hem ders dida mîrza Yoşîtadayê hem jî pê re hevaltîya edebî (helbest) dikira. Bi hev re gelek caran tevlî civîn û dîwanên helbestî (renga) bûne. Di sala 1666an de hevalê wî prens Sengînî (Yoşîtada) di bîst û pênc salî ya xwe de dimire. Başô ji mirina hevalê xwe gelekî bi tesir dibe, piştî jî xizmetkarîyê efûbûna (azadî) xwe dixwaze. Wextê ku destûr nayê dayîn, direve û berê xwe dide bajarê Kyotoyê.

Piştî pênc sal li mayîna Kyotoyê -li wir bi jineka ku navê Cûteînî ye, re têkilîya evînîyê dike, lê zêdetirê wê nayê zanîn- di sala 1671ê de vedigere bajarê xwe. Di sala 1672an de destegula xwe ya yekem *Kaî Oîyê* (Lîstîka Dircê) teslîmê Perestgeha Tenmanê dike û berhem wekî cotên hokkûyan hatîyê sazîkirin (Yuasa,

2020: 25). Başô di heman salê de diçe navenda desthiltdariya Tokûgawayê ango Edoyê (Tokyo) û li wir bi cih dibe. Li Edoyê gelek hosta û şagirt li derûdora wî kom dibin, her ku diçe navdariya wî belavtir dibe. Di sala 1680î de yek ji hezkirî û şagirtê wî Sanpû ku herweha bazirgan e, jê re li herêma Fûkagawayê nêzîkî Çemê Sûmîdayê kepirek (qulûbe) dide çêkirin. Li heman sal xwendekarek dî jê re şitla *Bashôyê* dîyarî dike. Bashô, ji cureya mûzekê re tê gotin ku ew wekî *dara mûza japonî* jî tê binavkirin û kulîlk dide lê bes dareka bêfêkî ye. Ew, ji vê dara mûzê bi bandor dibe, pê re pêwendîyeka bihês û dilşoşî çê dike. Pêşî navê qulûbeyê xwe dike *Bashô-an* (cihê înzîwaya bimûz) û paşê jî vî navî ango *Bashôyê* (Belgê Mûzê) wekî mehles bi kar tîne (Aruoba, 2020: 168). Li qewlê Aruobayî (2020: 84) piştî bicihbûnê, edî li gel sazkirina şewaze xwe ya bi navê *Şofû* (şewaza mûzê) û dibistana xwe (ekola Başôyî) dibe “hostayekî mezin”.

Di sala 1682an de li Edoyê şewateka mezin derdikeve û di wê şewatê de qulûbeyê Başôyî jî dişewite û ev karesat gelekî lê bandor dike. Bi dibistana xwe ya Başôyî û 110 helbestvanen re (Aruoba, 2020: 167) berhevoka *Minashî gurîyê* (Şembelotên Qermîçî) di sala 1683an de diweşîne. Li heman salê dêya wî dimire. Başô bi şagirtê xwe Çîrî re di havîna 1684an de dest bi geşt û gerê ku ji pênc geştên mezin¹⁹ a wî ya yekem e, dike. Di gerê de geştnameya xwe ya yekem a bi navê *Nozarashî Kikôyê* (Notên Qerqodê Bêgor) dinivîse. Berhem ji *haîbûnan* ango ji haîkûyên pexşanî pêk tê û di naveroka haîbûnan de hestê dilsotînerî serdest e. Di sala

¹⁹ Başô di dawîya her çar geştên xwe ya mezin û ên din de çar berhemên navdar ên geştnameyî û heft guldesteyên wî yên mezin ku guldesteyên wî wekî *Bashô Shichibu Shû* tên binavkirin, dinivîsîne. Berhemên wî yên geştnameyî û guldesteyî ev in:

Geştname:

- *Kaşîma kîko* (Ziyareta Li Perestgeha Kaşîmayê, 1687)
- *Oî no Kobumî* (Notên Çente yê Di Rêwîtiyê De Hincirî, 1687-1688)
- *Saraşîna kîko* (Ziyareta Li Gundê Saraşînayê, 1689)
- *Okû no Hosomîchî* (Tengerêgeha Ber bi Bakur ve, 1689-1694)

Guldeste:

- *Fuyû no Hî* (Rojên Zivistanê, 1684)
- *Harû no Hî* (Rojên Biharê, 1686)
- *Arano* (Beyaban, 1689)
- *Hîsago* (Kulindê Avî, 1690)
- *Sarû Mîno* (Berbaranka Meymûnê, 1691)
- *Sumîdawara* (Çîwalê Komirê, 1694)
- *Zokû Sarû Mîno* (Dûmahîya Berbaranka Meymûnê, 1699). Ev berhevok piştî mirina wî pênc sal dî re tê weşandin.

1686an de haîkûya (hokkû) xwe ya navdartirîn “古池や蛙飛びこむ水の音/*furû ike ya kawazû tobîkomû mîzû no oto*” yê dinivîsîne.

Berhema wî ya bi navê *Oku no Hosomîchîyê* (Rêya Teng a Ber Bi Bakûrî Ve) “rojnivîskên geştyarî” yên herî navdar e. Berhem, yek ji klasîkên wêjeya japonî ye ku Başô di vê berhemê de di nivîsîna haîbûnan de hostatîya xwe nîşanî dîke û çîrokên haîkûyê dikemilîne. Oku no Hosomîchî, ji hêla çeşitdarîya mijar û temayan ve û herweha ji alîyê hevsengîya yekgirî û hevgirîyê ve helbestên haîkûyê û çîrokên wê li hev temam dîke. Bi qewlê Yuasayê (2020: 43), pexşan û haîkû tê de weke du eynîkê di nav hev de xuya dibin û dîteyîsin. Başô, tê gumankirin ku ji nexweşîna zîkêşîyê ango ji dîzanterîyê (Yuasa, 2020: 51) li Osakayê di 12ê Cotmeha 1694an de jîyana xwe ji dest dide.

Başô di pêkanîna şêwaza helbestên (renga, haîkaî, hokkû/haîkû) xwe de û di kamilbûna feraset û cîhanbînîya xwe de ji kesên wekî Saigyô (1118-1190), Sôgî (1421-1502), Sesshû (1421-1506), Rikyû (1521-1591), Teitoku (1572-1653), Souîn (1605-1682) û Bûcchôyî (1643-1715) sûdê werdigire. Li gel wan kesan, sirûştaya Japonyayê, rewşa siyasiya wê demê, guherîna jîyîna civatê, çanda wabî-sabîyê û bawerîya bûdîzma zenê li ser haîkûyên Başôyî bi bandor dibin. Başô herçendî ku ne kesekî keşîş ê bûdîstî bûya jî, bi dil û can girêdayî *zenekê* bû (Suzuki, 2021: 120).



Wêne 13: Portreya Başôyî ya ku ji hêla Katsushika Hokusai (1760-1849) ve hatiye çêkirin (Url 13).

Cureya helbesta japonî haîkû, bi Başô re tê bibîranîn û bi wî re tê wekhevîkirin. Sedema ku Matsuo Bashô ewqas bi haîkû re hatîye wekhevîkirin ew e ku ew yekem helbestvan e ku haîkûyê (hokkû) wekî cureya helbesteka serbixwe nirxandîye (Aytemür, 2021: 8). Di helbesta japonî ya klasîk de xasma hokkû ya ku risteya vekirina haîkaî no rengayê bû, berî Başôyî tenê pêlîstok û keyfjêgirtina peyvan bû. Haîkûya ku pêşîya Başôyî tenê “paşpêşî/peyvbazîya gotinên ku bi tu awayî têkilîya wê ji jîyanê rê tune yî” bû (Suzuki, 2017: 77). Tiştê ku Başôyî di ziman û helbestê (hokkû) de kirî, li gor Aruoba (2020: 48), tevgerêka şoreşî ye. Ji ber ku şoreşgerî, hilweşandina tiştekî “kevn” e û li şûna wê/wî tiştekî “nû” lê bicihxistin e.

Wekî şoreş û nûbûnî, Başô haîkûyê kir nav gel ango wî haîkûyê kir hem helbesteka jirêzê û hem helbesteka hunerî. Gotinên zêde û bêjeyên bixemil, bi şewaza wî re di hokkûyan (haîkû) de hate avêtin. Bashô haîkûyên xwe, bi zimanê japonî yê herî xwerûyî nivîsandîye, wekî tabîî ji zimanekî edebî û “berz û xemilandî” xwe dûr kiriye û bi vî awayî, şewazeka ku mirovên ji rêzê jî dikarin bibin helbestvan (haîkûnûs), afirandîye (Watts, 2022: 216). Li gel vê, yek ji nûjenî ya ku wî kirî, her tiştî xiste mijara haîkûyê. Bi qewlê wî, “Tu mijarek tune ye ku ji bo hokkûyê nebe guncav.” (Yasuda, 2011: 19).

Başô, ji alîyê ontolojîk û fenomenolojîk ve ji nêzîkî haîkûyê dibûya. Haîkû, ji bo Başô derbirîna kêlîka helbestkî (poesîe) ya kelecana hebûnî ye. Ew, li parçeyê hûr dibe, pê re jî tevahîyê nîşanî dike. Li gor Başôyî haîkû, li gel hebûnê şewaza honraweyî ya vezilandin û vekişandina kêlîyê ye (Özhan, 2016: 92). Wî, di kûrbûn/bîn, hûrbûn/bînîya tiştan de gûrbûnîya rindîyê, xweşikîyê didîta û di heman demê pêdihesîya. Başô, hîs dîkir ku jîyan têra xwe ne kûr e, ne domdar e û wî dixwest ku ji her liv û tevgerê re, ji her kêlîyê re qedr û qîmet a ku di hemûçkan de wekî potensiyel heyî, bide. Wî dixwest jîyana biçûk a ku em pê re dijîn, bibe jîyaneka mezintir. Bi vî awayî her kulîlk bihar, her êşek birû (birth pang) û her mirovek dê bûbaya helbesteka haîkûyê (Blyth, 1965: 329).

1.2.1.2. Masaoka Shîkî û Haîkû

Masaoka Tsunenori angu navê wî yê berbelavtir Masaoka Shîkî (Şîkî)²⁰, wekî yek ji çar helbestvanên herî mezin ên haîkûyê tê pejirandin. Li gel haîkûnûsîya xwe, Şîkî di heman awayî de wekî nivîskar û rexnegirê wêjeyê jî tê zanîn. Bi taybetî, di nav rexnegirîya wêjeya japonî de xebatên xwe li ser cureya haîkûyê kiriye. Di nivîs û gotarên xwe de bi piranî derbarê helbesta haîkûyê de teorîyên xwe poncîn dike ku bi vî awayî poetîka xwe ya haîkûyê di qada wêjeyê de ava bike. Şîkî, di vejandin û nûkirina *waka* û *haîkaî* ya ku her du jî helbesta nerîtî ya japonî ne, de û herweha li Rojavayê di danasîna haîkûyê de roleka mezin dilîze.

Masaoka Şîkî, di sala 1867an de li eyaleta Iyoyê (Îro navê wî eyaleta Ehîmeyê ye) li bajarê Matsuyama ya Japonyayê di nav malbateka samûrayî de hatîye dinê. Ji bo xwendina dibistanê di sala 1883an de diçe li Tokyoyê. Di 18 salîya xwe de angû di sala 1885an de dest bi nivîsandina helbestan dike. Du sal (1890-1892) li Zanîngeha Împaratorî ya Tokyoyê dixwîne û paşê dev jê berdide. Şîkî, di sala 1892an de di rojnameya *Shou-Nîpponê* (Nihon) de ku ev rojname şaxeka rojnameya Nîpponê (1888-1914) ye, dest bi nivîsînê dike û ji bo nêrîn û dozîne xwe ya reforma haîkûyê berhema bi navê *Dassai Shooku Haîwayê* (Ji Şikefta Seyê Avî Li Ser Haîkûyan Axaftin) wekî rêzenivîsî diweşîne. Di heman salê de wekî berpirsyarê helbestên haîkûyê di rojnameyê de dest bi edîtorîyê dike. Rojnameya *Shou-Nîpponê* piştî edîtorîya wî, di demekî kurt de ji ber Şerê Japonya-Çîn ê Yekem (1894-1895) tê girtin.

Şîkî, li gel gelek gotarên xwe yê li ser haîkûyê di nivîsara xwe ya bi navê *Waga Haîkûyê* (Haîkûya Min, 1896) de poetîkaya xwe ya haîkûyê amaje dike. Di Kovara *Hototogîsûyê*²¹ de ku kovar di sala 1897an de ji alîyê Yanagihara Kyokudôyê ve hatîye avakirin, piştî nûçegihanîya şerî wekî sernivîskarê haîkûyê derheqê haîkûyan de nivîsê xwe didomîne. Kesên ku di *Hototogîsûyê* de dinivîsandin wekî “ekola haîkû ya Nîppon” ê Şîkîyê hatin binavkirin. Di kovarê de bi haîkûyê re tanka û haîbûn jî dihatina nivîsandin.

²⁰ Shîkî, haigō angû mehlesa wî ye ku li gor nivîsandina karakterê çînî (kanjî), beranberî hevwatera peyva japonî *hototogîsûyê* (pepûk) ye. Herweha wekî bi navê Masaoka Noboruyê jî tê zanîn.

²¹ Ev kovar, kar û xebatên xwe bi giştî li ser haîkûyên modern dike û herweha kovar aniha li Japonyayê wekî kovara haîkûyê ya bi herî temendirêj û navdar tête zanîn.

Di gotara xwe ya bi navê *Jojîbûnê* (vegêrîn) de ku gotar di sala 1900î de di rojnameya Nîpponê de derketîye, Masaoka Şîkî ji bo pênasekirina teorîya xwe ya derheqê haîkûyê de terma *shaseîyê* (ji xwezayê şayesandin/ ji jîyanê pêşnûma) derpêş kir. Şîkî, bi şêwaza xwe yê bi navê *shaseîbûnê* (metnê rengvedanker) ango bi rêbaza *sketchê* (şaseî) gotar, cerîbîn û haîkûyên xwe nivîsand û bi vî awayî li gel metoda *sketchê* (şaseî) pêşîkêşîya nivîsandina haîkûyên modern kir. Masaoka Şîkî di 34 salîya xwe de di sala 1902an de ji ber êşa ziravê jîyana xwe ji dest dide.

Helbestên kurtteşeyîya nerîtî ya japonî ango helbestên wekî hokkû (haîkû) û haîkaî (haîkaî-renkû) ya ku heta di Serdema Meîjîyê de hatibûn jibîrkirin, bêqîmetkirin, ji alîyê rexnegir Şîkîyî ve hatîye vejandin, nûjenkirin û xasma haîkû ji hêla wî ve wekî hêjayî parçeyeka wêjeyê hate dîtin. Bi reforma haîkûya Şîkîyê re haîkû wekî hunerek rabû ser xwe (Suzuki Î., 2011: 25). Di berhema xwe ya bi navê *Haîkaî Taîyouyê* (Qaydeyên Haîkaîyê, 1896) û beşa wî ya “Pîvera Haîkûyê” de Şîkî poetîkaya haîkûya xwe weha rave dike:

“Haîkû, parçeyek ji wêjeyê ye. Wêje, parçeyek ji ciwankarîyê ye. Ji ber vê yekê, pîvanên estetîkê pîvanên wêjeyê ne. Pîvanên wêjeyê pîvanên haîkûyê ne. Bi kurtasî divê wêne, peyker, muzîk, şano, helbest û roman jî bi heman pîvanan bîn nirxandin û rexnekirin.” (Karatani, 2021: 24)

Di vê gotara xwe de Şîkî çarçoveya haîkûyê diyar dike û di vir de haîkû cara yekem wekî cure tê qebûlkirin (Karatani, 2021: 2). Her çiqas Şîkî, Başôyî ji ber sêbjektîvîstîya wî ya pir, rexne bike (Suzuki, 2017: 42) û haîkaî-renkûyê nepejirîne jî li gor Karatanî (2021: 206), hewildana wî tişta wekî ku Başôyî di haîkaîyê de “ji nû ve vejandinê” kirî -ku wî li şûna rengayê “tiştên xasyetê haîkaîyî” pêşnîyaz kiribû- Şîkî jî heman tiştî “tiştên xasyetê haîkaîyî” di vejandina haîkaîyê de kiribû. Li gel vê, Şîkî ji bo hokkûya modern di destpêka sedsala 20an de ji navê *haîkaî-no-hokkûyê* haîkûyê ango “helbesta şayê” (Aruoba, 2020: 167) îcat kiribû.

Di haîkûyên modern de Şîkî rêgeza “tsukinamî”yê ango bêje û derbirînên vetûrî (klîşe) ji holê rakir. Herweha di her haîkûyê de şertê *kîgoyê* nekir mecbûrî; mijar û temayên haîkûyê berfirehtir kir. Pîvana kîterêzîya 5-7-5ê di haîkûyên modern de xira kir û li gor ristesazîyên curbicur jî haîkû nivîsand. Metoda *sketchê* (şaseî), di

nivîsandina haîkûyan de lê zêde kir û li gel hêmanên bingehîn ên haîkûyê kîgo, kirejî û torîawaseyê şêwaza xwe ya şaseîyê jî wekî yek ji rêbazên sereke yên haîkûyê ji bo haîkûyên nûjen bi kar anî.

1.2.2. Taybetîyên Wê yên Teşeyî

Ji ta zemanê herî kevin a Japonyayê ve kîteyên 5 û 7ê ku binyada hemû formên helbesta japonî ye, bi awayekî veguherînî hatîye bikaranîn (Blyth, 1965: 372). Heçî helbesta japonî ye, wekî teşeyî rasterast helbesta kêşa kîteya 5-7-5-7-eyî ya 31 kîteyî tê hişê mirovî (Özhan, 2016: 92). Helbesta japonî ya gerdişî jî ji 31 kîteyan (misohito-moji) pêk hatîye û ji alîyê ristesazîya teşeya nezmê ve xwe dispêre pîvana hakû ya 5-7-5-7-7ê. Cureya helbesta japonî ya klasîk *waka* li gor vê pîvanê derketîye holê.

yû sareba

nobe no akikaze

mi ni shimite

ugura naku nari

fukakusa no sato

wexta dibû êvar

ji çolteran bayê payîzê

hinavê min diqefiland

sûsik bi hev de digirîyan

di nav gîyayên gundî de

Fujiwara Şunzei (1114-1204), (Aruoba, 2020: 29) (ji tirkî: Mazlum Sabaz)

Di vê mînakê de xuya dibe ku *waka* wekî du beş (bend/kû) û lê di nav yek bitûnîyê de ango 5-7-5/7-7ê pêk hatîye. Benda serî (5-7-5) wekî *Kami no ku* û ya binî jî wekî *Shimo no kuyê* (7-7) tên binavkirin. Paşê bi demê re şêwaza wakayê vediguhere; beşa didoyê 7/7 ji hêla helbestvanek dî ve ji beşa ewilî re wekî helbesta bersivdayînê ango bi awayekî leckirinê hatîye gotin, nivîsandin. Bi vî şiklî ji benda pêşî 5-7-5ê re *hokkû*, ji ya paşî 7-7ê re jî *matsukû* yan jî benda bersivê *wakikû* hatîye gotin. Ev şêwaza danberhevê piştî pêşîkêşîya rengayê (şîra pevgerîdayî) dike û ji benda pêşî ya rengayê ango haîkaî no rengayê jî *hokkû* (haîkû) wekî beşeka serbixwe vediqete. Bo nimûne, ji haîjînên Mitsune û Tsurayukiya “lecek”:

okuyama ni

fune kogu oto no

kikuyuru wa

di nav çiyayan de

dengê zîqîna sekanê

gelo çawa dibe?

nareru konomi ya
umi wataru ramu

fêkî gihiştine ya
li çiqilan dikevin

(Aruoba, 2020: 29)

(ji tirkî: Mazlum Sabaz)

Helbesta japonî, ji hêla bilêvkirin û danganîyê (fonetîk) ve jî li gor kêtekirin (syllabification) û moraya japonî *onê*²²(j.:音) tê xwendin. Kîteyeka japonî ku ji dengdêrekî kurt û dawîya wê vekirî pêk were, wekî *onek* (kîte) tê hesibandin. Dengên dirêj bergî du yekeya *onê* (kîte) tên. Di dawîya kîteyê de ger ku nedengdêra nyê û cot nedengdêr hebin ew jî wekî yek yekeya “on”ê tê jimartin. Helbesta japonî ya nerîtî haîkûya 5-7-5 kîteyî (on) jî ji alîyê teşeya nezmê ve li gor pîvana kêtesazkirina japonî hakûyê hatîyê ristesazkirin.


Di zimanê japonî de bêje tê wateya “deng”î û piranîya peyvên xwerû yên japonî ji kîteyên ku yekyekeyî (on) pêk tên. Li gel vê, kîteyên ku ji piryekeyî pêk hatine, bi giştî ji sîno-japonî ne. Bo nimûne: Navê bajarê Ōsakayê (おおさか) bi tevahî ji sê kîteyan ango O-sa-kayê pêk tê. Lê belê ji çar *onê*/moraeyê²³ (Oo-sa-ka) pêk hatîye. Ji ber ku kîteya “Ō”yê dengdêrekî dirêj e. Herweha bêjeya “Nippon wa”yê ku tê wateya “gelê japon”î, ji pênc *onê* (kîte) pêk hatîye û bi vî awayî tê kêtekirin: *Ni + p + po + n + wa*.

Her çiqas haîkûyên modern di zimanê japonî de li gor alfabeya kêtenivîsîya kanayê (hîragana) ji çepê ber bi rastê ve bi awayekî berwarî wekî yek rîsteyê bîn ristesazkirin û nivîsandin jî di rastîya xwe de haîkûyên berê li ser kaxizên japonî (washî) tanzakûyan, dep û kevîran ji jor ve ber bi jêr ve ango bi yek stûnî dihatina nivîsandin, xêzkirin û kolandin. Haîkûyên japonî, wexta ku ji bona zimanên biyanî hatin latînîzekirin û wergerandin da ku aheng û şewaza helbestê li gor hest û zimanekî helbestkî û herweha teşeyeka helbestkî bîn ristesazkirin, li gel çarînan piranîya wan bi teşeya sêxiştî/sêrêzî hatin rîstandin. Haîkû ya ku di japonî de wekî wezna 5.7.5ê ango yên ji 17 tîpan (kîte) pêk hatî, wekî helbesteka yek rîste tê

²² On, di zimanê japonî de ji bona xwendina helbestên japonî, ji yekedenga (fonem) fonetîka helbesta japonî re tê gotin.

²³ ji pirhejmarîya morayê re tê gotin.

nivîsandin. Lê bes, haîkû ya ku di welatên din de hatî îdraqkirin, bi awayekî sê risteyî hatîye veqetandin û nivîsîn (Suzuki Î., 2011: 26).



Wêne 14: Sê tanzakû û sê haîkûyên ji kalîgrafiya Başôyî. (a yekem haîkûya wî ya navdartirîn ‘lîça kevgirtî’ [Furu ike ya] ye) (Url 14).

古池や蛙飛び込む水の音 (Furuike ya Kawazutobikomu Mizunooto) (Matsuo Başô)

Fu-ru-i-ke ya
Ka-wa-zu to-bi-ko-mu
Mi-zu no o-to

The old pond;
A frog jumps in,—
the sound of the water.

golava kevgirtî
beqê çipp xwe di navê da
şipp pêjna avê

(Matsuo Başô)

(wer.: Blyth, 1965: 277)

(wer.: Gorîcan, 2024: 22)

Axaftina zimanê japonî li gor awaya lêhatî ya henaseya 5 û 7eyî tê peyîvin (Yerli, 2020: 53). Haîkû jî ji hevdeh kîte (hilm) û sê risteyan (henase) pêk tê. Li gor hin şîrovekeran haîkû yek “henase” ye (Aruoba, 2020: 28). Sîmetrîka forma 5-7-5î (haîkû) heye ku wekî herikîn, vekêşan û medcezirê dişibe pêlan (Blyth, 1965: 373). Haîkû ji hêla xwendinê ve biaheng e ku di wexta xwendinê de di her nefes standin û dayînê de wateya harmonîya zimanê japonî jî dide. Ji ber ku di rîtmîka japonî de wekî remzî bêhn girtin jîyan e, bêhn berdan mirin e (Özhan, 2016: 11). Di vê muzîkalîteyê

de pêwendî û hevsengîyek di navbera hêmanên haîkûyê de çê dibe û ev pêwendîya hêmanên haîkûyê, di heman demê de pêwandîya derbirîna melodîyekê (Blyth, 1965: 357) pêk tîne.

Di teşegirtina haîkûyê de yek ji tiştên ku herî balê dikişîne kurtayî ye. Li gor kelepuşîna mînimîalist a japonan, kurtayî wekî gîyana jîrayîyê ye (Blyth, 1965: 357) ku di heman demê de di haîkûyan de armanca bikaranîna vê helbestên xweşik, sade û fesih çêkirin e. Li gor Bereh (2017: 5) jî, helbesta haîkûyê ya herî hatî parzûnkirî ye û li gel vê, ew sedema kurtayîya haîkûyê, weha rave dike:

“Zêde nebêje. Kûr bifikire, dûr bifikire û baş bifikire û bibêj hew. Mîna peykertiraşek zêdehiyên kevîrî bavêje, heta te ya peykerê herî xweşik û sade çê kir. Ev bisînorkirin, her wisa hêzdarîyekê jî dide mirovî. Helbestvanê Haîkû, ji hezar çavênîyên xwe yê ‘kêlikê’ dineqîne û tenê sê ristan jê dinivîse. Bi vî awayî ‘helbesteke fesîh û sade’ diafirîne.”

Derbarê kurtbûnîya wê de Barthes (2018: 63), haîkûyê weha pênase dike: *“Awaya nimûne ya notgirtina nihayê=kiryara herî biçûk a hevokçêkirinê, teşeya ultra-kurt; atoma hevokê ya ku hêmanekî pir kurt a jîyana “rastî”, niha û hevkêlikê not digire (ku îşaret dike, sînor dike, berze dike: famayek -navdarîyek- dide), ye.”*

Herçendî ku di haîkûyên modern de sernav û ji bo hin kesan re wekî haîkûography²⁴ (haîkûyên kurtejiyanî) hatibin nivîsandin jî esas di haîkûyên klasîk de sernav tune ye û beşavend, paşserwa, xalbendî nayên bikaranîn, tişt bi tîpên mezin dest pê nakin û xal li dawîya wan nayên dayîn. Tenê bûyîneka domdar heye (Blyth, 1965: 360). Di her sê risteyan de kompozîsyona pêhesîyê, dîmena kêlikê û guhveçînê heye. Bi gelemperî di rista ewil de divê bersiva “çî”, di ya duduyê de bersiva “li ku” û di ya sisê de jî “kengê” bê dayîn (Bereh, 2017: 5).

Ji xeynî xasyetên wê yê helbestî haîkû wekî metneka pexşanî jî tê binavkirin. Li gel vê, li gor Aruoba (2020: 19) haîkû ne ‘nezim’ e û ne jî ‘pexşan’ e. Haîkû, pexşanek e ku xwedî taybetîyên helbestê wergirtîye; teşeyeka helbestî ye ku

²⁴ Bo nimûneyan: Sonia Sanchez, *Şiir Şarkî Haiku (Seçilmiş şiirler)*, (2021), r. 161.

bi taybetîyên pexşanê hatîye nivîsandin. Derheqê metna haîkûyê de Gorîcanî jî nêrînên xwe weha rave dike:

*“Her çi qas mîna cureyekî helbestê bê dîtî jî esildanî haîkû ne tenê helbest e, her wisa metneke pexşanî ye jî. Erê, bi şêl û şemala xwe ve bi rengê helbestê dide, bes ew çend ji pexşanê jî dûr nîne, lewra ne pêwîst e ku teqez qafîye hebe û belaxeta gotinê ew qas li pêş be. Haîkû gotineke kin û sade ye ku bi yek bêhn û nefesê ji dev dertê der û merema xwe îşaret dike. Heke ku asonansek lê hebe û ahenga dengên li peyvan were barkirin, ev herka metna haîkûyê hêsatir û ji guhan ra xweştir dike. Yanê, heke ku weha bê gotin ne xelet e: Haîkû deqeke pexşanî ye ku xasyeteki helbestê lê heye û her wisa vegotîneke helbestî ye ku taybetîyên pexşanê qet jê kêr nîn in.”*²⁵

Şêwaza haîbûnê, metneke haîkûyî ye ku bi awayekî pexşan-helbestkî tê nivîsandin. Ev metna çîrok-haîkûyî di eslê xwe de ji helbestvanên haîkûyê ango haîjînên gerok (gînko) ve wekî rojnivîskên geştî hatine nivîsandin. Di van geştnameyokan de haîjîn di wextê gerê de ji her notan re ango li gor hestgermî û çavderîyê xwe yê li ser sirûşt, derûdor, civak, mirov, ajal, riwek û hwd.ê re haîkûyek dinivîsand û bi vî awayî haîkûya çîrokê, çîroka haîkûyê haîbûn çê dibû. Di warê haîbûnan de nimûneyên Başôyî, yê herî serkeftî tê dîtî.

Li roja rojbûna Bûdayê ez li Narayê bûm. Min li vir zayîna karxezalekê dît. Bi vê rasthatinê re ecêbmayî, min weha nivîsand:

*diheyirîm çi hikmet e
di rojbûna Bûdayê de
zayîna vê karxezalê?*

(Matsuo Başô, 2020: 103) (ji tirkî: Mazlum Sabaz)

Gava me hidûd di pişt xwe ve hişt û em jê derbas bûn, baranê lê kir. me dît ku çîya jî tev di nav mij û pelewran da winda bûbûn.

*çîyayê fujî
-esil ku ket nav mijê,*

²⁵ Sîdîq Gorîcan, *Gûstêrikên Veşarî*, destenota 10an, (berhema neçapkirî).

Ji xeynê vê, helbestên haîkûyê bi hunera resmê re jî tên destekkirin. Haîkû di heman demê de li ser kaxiza washîyê ji alîyê haîjînan ve wekî xweşnivîs (kalîgrafî) tên xêzkirin. Ji haîkaî/haîkûya ku tên resimkirin re *haîga* tê gotin. Haîgaya biresimnivîs, taybetmendîyeka zimanê japonî ye ku bi qewlê Aruobayî (2020: 66) japonî bi ‘qelemê’ nayê ‘nivîs’andin; bi ‘firçeyê’ tê xêzkirin. Bi gotineka di kalîgrafî û îlustrasyon, haîgayê pêk tîne. Haîgayên ku ji hêla haîkûnûsan ve tên xêzkirin, di heman demê de xasyetên haîkûyan jî teswîr dike. Baço jî di navê da, gelek haîkûnûs di heman wextî da resam bûne û li gel metnê, pirr caran haîkûyên xwe xêz jî kirine. Di van xêzan da pîvaneya sereke ya haîkûyê ku sadebûn e, tê parastin. Lewma jî detayên resmê hindik in û rengkarî kêr e. Axir bi vî awayî, haîkû, li gel xêza xwe ve ji feraseta xwîner û bîneran ra tê hiştin.²⁶



Wêne 15: Haîgaya “beqê” yê Başôyî (Url 15).

²⁶ Sidîq Gorîcan, *Gûstêrikên Veşarî*, destenota 38an, (berhema neçapkirî).



Wêne 16: Ji Yosa Busonî haîgaya hototogîsûyê (Pepûk). (Url 16).

1.2.3. Taybetîyên Wê yên Naverokî

Tevî ku kurtbûnîya xwe haîkû, ji hêla mijar û temayan ve helbesteka gelekî berfireh e. Berfirehîya wê ya naverokî xasma piştî reforma Şîkîyê zêdetir dibe. Lê belê, hem di haîkûyên klasîk de hem di haîkûyên modern de demsal û sirûşt wekî mijar û temayên bingehîn hatine parastin. Henderson (1990: 14) haîkûya klasîk a Japonî bi çar xasyetên wê yên bingehîn ve pênase dike: 1) Ji 17 kîteyan pêk tê û wekî 3 rêzik (5-7-5) tê honandin. 2) Ji rewşên mirovî bêtir rewşên siruştî pêşkêşî xwînerên xwe dike. 3) Derbarê bûyereke kifşe ye, an ku rewşê bi awayekî gelemperî nîşan nade. 4) Behsa bûyereke dema niha dike, an ku bûyereke rabirdû pênase nake. Ji bilî temayên siruştî, di nav demê re hestên mirovî yên têkildarî tevgera jiyana bajêr û nakokiyên din ên civakî jî bûne mijarên haîkûyan (Çeliktaş & Ertekin, 2024: 12-13).

Li gel demsal û sirûşt, zen, wabî-sabî, satorî, ma (fekirin/vekirina kêlîk-navbera zeman-mekanê), tenêtî, valahî, dem/kêlîk, vedîtin/hişyarbûn, şûngeh (mekan), menzere, etîk, spehîtî, narinî, fanîtî, mirin, şîn, xemgînî, xewn û xeyal, aramî/hêminî, destjêberdan, aheng-yekparetî, mirov/mirovayî, zarok/zaroktî, diltênîkî, hestgermî (pathos), rê, rêwitî, gerdûn, stêrk, heyv, riwek, ajal û hwd, jî wekî mijar û temayên sereke yên haîkûyê ne. Ji alîyê haîkûnûsan ve di bikaranîna van mijar û temayan de rewşeka neyînîkirin (sublation) û reşbînî nayên kirin, vedîtin

û hişyarbûneka fenomenolojîk û ontolojîk a helbestkî û di heman demê de nihêrîneka estetîkî li pêş in. Bi qewlê Barthes (2018: 161), du neyarên haîkûyê hene: giştî û xirabî. Lewre wekî helbesta felsefî ya hêsan, felsefeya haîkûyê bi redkirina tevahîya vegotina bûyerekê re, di nêv tabîrên “nayê pênasekirin” û “nayê vegotin” de veşartîye (Suzuki Î., 2011: 31).

Haîjîn û haîkû wekî kanîwara xwe angî çavkanîya motîvasyonê xwe ji hêmanên yûgen-wabî-sabîyê werdigire. Ev têgihên zenî û japonî çawa ku di seremonîyên çayvexwarinê (çadô) de wekî jiyîna etîk-estetîkê tê dîtin (Aruoba, 2020: 52-53) di heman demê de wekî rêbazên etîk-estetîk ên haîkûyê jî tê qebûlkirin. Bi kurtasî wabî-sabî ku ji hêjarî û spehîtiya tenêtiyê re tê gotin, li gor Suzuki (2017: 72), pêwendîya haîkû û zenê çand û hunera wabî-sabî ku herweha ewana bi gîyana zenê re yekparetiya çanda japonî dihundirînin, pêk tîne. Di japonî de tevahîya peyam û wateya herî biçûk a di carekî de derêxistina derbirîne ye (Aruoba, 2020: 28).

Haîkû ji hêla naverokê ve herweha berê xwe dide, guhê xwe dide gerdûnê jî. Wekî ku Gorîcanî gotî, “helbet di haîkûyan da jî hizir û hest, rengên jîyanê û derûniya haîkûnûs heye. Lê haîkû piranî ne guhdarkirina xwe û dilê xwe, guhdarkirina dilê gerdûnê ye, yanê ji hebûna xwe pirtir wisa dike ku mirov guhê xwe li hebûnên dîtir bel bike.”²⁷ Ev guhê xwe dan angî guhveçînîna hişê mirovî vedike, bi hişyarbûneka hebûnê re “hişê kozmîk” seh dike, pejn dike û tevî çerxa wê dibe. Pêkan e ku ev hal pêrgî înzîvaya em dizanin, tê; înzîvaya ku mirov bi vîna xwe ketîyê û jê bêhnsivikahîyê digre. Lê ji siruştî haîkûyê em dizanin ku haîkûnûsên sabîyî gerok, hişyar û dînamîk in. Di nav hêmanên vî halî da tenêti, melalî, evîn, rizadilî, hêminî û hetta şadûmanî heye, ku ji bo haîkûnûs atmosfera têbinîdanîne derpêş dike. Peywendîyeke vî rîknî di cihekî ra xwe digihîne feraseta zen-bûdîzmê jî, ku her tiştî di nav yekparetiya kozmîk da dibîne û dibêje ku divê însan xwe ji kurmikên xwe bişo û bi tenahiya xwe ya ontolojîk tevî vê ahengê bibe.²⁸

Tevlîbûna li nav yekparetiya kozmîk wekî ku Platon (BZ 428/427-348/347) di berhema xwe ya bi navê *Timaiosê* (Diyalog) de bi navkirî, bi rêya çalakandina gîyanê *pathos* an jî *pathêmayê* (Cluzeau, 2013: 76) çê dibe. *Pathos*, bêjeyeka grekî

²⁷ *Gûstêrikên Veşarî*, destenota 11an, (berhema neçapkirî).

²⁸ Gorîcan, heman berhem, destenota 18an.

(yewnanîya antîk) ye ku li gel wateya xwe yê têvel tê wateyên wekî ‘xweşî û êş’, ‘jan’, ‘azwerî’, ‘serpêhatî’, ‘her cure hest’ an jî *emotion* (hest) û *affect* (hestgermî) (Cluzeau, 2013: 81). Ji xeynî Platonî, ev peyv herî zêde ji hêla Arîstotelesî ve û bi taybetî jî di berhema wî ya bi navê *Retorîkê* de bi *ethos* û *logosê* re hatîye bikaranîn.

Pênaseya livandineka ku di gîyanê de peyda dibe, li gor Cluzeau (2013: 65), di dawîyê de wê serîkêşîya pênaseya *pathêya* (pathos) Arîstoteles a ku di wateya ‘hestgermî’yê de bi kar anîye, bike. Ji bo haîkûyê derbarê bikaranîna pathosê de Barthes (2018: 114) jî nêrînê xwe weha rave dike: “*Ez vê peyvê (pathos), di tu wateyeka lênekirî de xasma jî di tu wateyeka din (mecaz) a ku qîmetxister lê barnekirî de bi kar tînim angê ez wekî di wateya wê ya yewnanî ya ku ji hêla Nietzscheyî ve gelek caran hatîye emilandin, de bi kar tînim= tevna hestgermî; haîkû û hestgermî (kelecan, coş, ya/yê ku peroşdar).*” Pathos, ji alîyêkî din ve jî ‘hestên kêlîkî’ ye ku hestên haîkûnûsî di nav sirûştê de li pêşberî rewş, bûyer û dîmenekê wekî medcezîrek tevdigerin. Hestgermîya ku li pêşberî van hêmanan peyda dibe, ji alîyê haîkûnûsan ve wekî haîkûyek tê derbirîn.

Kêlîk, di haîkûyan de kêlkirina mekan û zemanê ye, hevgihiştina dîmen û bûyerê û jîyîna liha û nihayê ye. Ji ber vê yekê ye ku haîkû ji alîyêkî dî ve helbesta kêlîkê angê ya “niha”yê ye (Bereh, 2017: 5). Di haîkûyan de vedîtî/jiyîna kêlîkê “lerzeka hişî” (Barthes, 2018:151) angê satorîyê çê dike. Piştî lerza hişî mirov, li pêşberî wê kêlîyê, dîmenê, bûyerê, rewşê û hwd.ê, *tîlta* haîkûyê angê “*va ye/ha ev e*”yê derdibirîne. Li gel vê, tîrbûn û gupîka kêlîkê Virginia Woolf, ji bo haîkûyê wekî “mûcîzeyên biçûk ên rojane” û “niftikên ku di tarîyê de ji nişka ve tîr vêketin” pênase dike (Barthes, 2018: 157). Bi hîlbûna kêlîyê ra sînorek dikêşe navbera dema diherike û dema têdeyî. Çawa ku ew kêlîya vêketina neftîkê kurt e, ku te dî dî, te nedî bi kêlîyeke dî noqî heman tarîyê dibê; haîkû jî ew kêlî ye, te dî dî, te nedî ew kêlî cihê xwe dide heman herikîna rojane. Yanê wek neftîka ji nişka ve vêketî di demeke kurtekin da çav dikirpîne me, xwe bi me dide hestkirin û wînda dibe.²⁹

Her çiqas haîkû, ji hêla bikaranîna mijar û temayan ve ji xeynî li gor demsalan senifandinê, neyên senifandin (Barthes, 2018: 78) jî ji ber giranîya

²⁹ Gorîcan, h. b., destenota 14an.

mijarekê wekî cure jî tê polîkirin. “haîkûyên bêdemsalî” (Blyth, 1965: 382), “senryû” û “jiseî” wekî cureyên haîkû/haîkaîyê derdikevin li pêş. Bi taybetî “haîkûyên mirinê” *jiseî*, wekî xatirxwestina haîkûnûsên ku li ber mirinê ango sekeratê, tê binavkirin. Ev metnên weha bi hest û hizreke bermirinbûna însên û fanîbûna dinyayê têne nivîsîn, û lew ku hemî hostatî û tecrubeya haîkûnûs di hewînîn, ev destehaîkû hem pir muhîm hatine dîtin hem jî wek heneka dawî ya haîkûnûs tê hesibandin. Ev xatirxwestinname xasseten li ser du teşbîhan hatine vehûnandin: pêşrewk (düş) û tipika xwîskê (çiy damlası). Dema nêzikî temenê nodî bûye, haîkûnûs Şosûn tiştêkî weha bi lêv kiriye:

*çi pêşrewkek bû lê—
duh û pêr bihar hebû
bes îro berf û bager³⁰*

Her çendî ku Başô ji bo haîkûyê poetîkayeka birêkûpêk diyar nekiribe jî, bi hokkûya xwe ya herî naskirî ango “beq”ê re xasyetên haîkûyê yên naverokî nîşanî kiriye. Di vê haîkûya xwe de Başô wekî ku Suzuki (2017: 51) gotî, kûrbînîya “sirûştê jîyanê” yan jî “jîyana sirûştê” dike.

*golava kevzgirtî
beqê çipp xwe di navê da
şipp pêjna avê*

Bêjeya “golava kevzgirtî” hem di wateya xwe ya rastînî de dîmeneka kevn temsîl dike û hem wekî mecazî helbest û helbestvanê berî Başôyî û helbesta wî dinimîne. Başô, bi vê bêjeyê re nerazîbûna xwe ji helbesta ku tenê paşêpêşîya peyvan dike, re tîne û nûbûnîyek, henaseyek nû ji hokkûyê (haîkû) re tîne. “Beq”a ku wekî şanîdera demsalî hatina biharê îşaret dike, xwe diavêje lîça kevzgirtî/kevn û pê re jî ji ber wê xwe avetinê sehkirina dengê avê di Başôyî de hay jê bûneka ontolojîk-fenomenolojîk û hişyarîyeka satorî ya zenî çê dike. Başô, bi pêjna/dengê avê re hişyar dibe (Özhan, 2016: 87).

Liv û tevgera beqê û herweha deng û pêjna wê bêhtengîya Başôyî ji holê radike û bêhn berdana wî wekî hênaseyeka şêwazî ya helbestê di van sê risteyan de

³⁰ Gorîcan, h. b., destenota 36an.

xwe nîşanî dike. Her du ristên ewil ku “kêlîkek jîyanê” bi çavdêrîyeke asayî vedibêje, bi rista dawî ku mirov şaşwazî dike diqede. Weku ku di mentiqê de ji du tiştan tişteki bê derxistin. Nefesa ku di her du ristan de hatîye girtin bi a sêyê bi yek derbê ji hundirê mirov derdikeve. Bi vê jî mirov rehet dibe. Di heman demê de dîlferehiyekê dide mirov (Bereh, 2017: 5).

1.2.4. Rêbaz û Hêmanên Wê

1.2.4.1. Kîgo

Di helbesta klasîk a japonî de yek ji hêmanên giringtirîn rêbaza *kîgo* ye û ev rêbaz hîmê helbesta haîkûyê pêk tîne. Terma *kîgoyê* wekî “demsal” an jî “şanîdera demsalê” tê binavkirin. Şanîdera demsalê ji bo Başoyî hêmana herî giring ya haîkaîyê (hokkû) bû (Aruoba, 2020: 31). Derheqê pênaseya *kîgoyê* de Barthes (2018: 80) nêrînên xwe weha rave dike:

“Di haîkûyên herî kevin da ji bo demsalan her daîm telmîhek hebûye, ku jê ra kîgo tê gotin. Navê demsalê yan rasterast tê bilêvkirin, wek kelegerma havînê; yan jî ev amaje bi kod û motîfekê tê pêkanîn, wek kulîlkên alûçeyê=bihar. Lew ku ji haîkûyê ra piştekek e, kîgo hêmanekî binemal e ku tê notkirin. Di haîkûyê da tiştekek heye ku ji reng û rûyê sal, asîman û atmosferê salix dide. Haîkû bi 17 kîte ye lê belê ji kozmosê qet dûr nakeve, ku ew jî Oîkos e, yanê atmosfer e, yanê nuqteya dorvegera erdzmînê ye ku li dor Rojê diqewime. Lewma jî ferqkirina mewsîman her dem mimkun e, hem wek xumanekê hem jî wek îşaretekê.”

Di helbesta japonî ya klasîk de, xweza ne xwediyê çar demsalan in; pênc demsalî ye ango bihar, havîn, payîz, zivistan û sersal (Akalın, 1962: 77). Di pêkhatin û nivîsandina haîkûyê de yan navêkî demsalê/kîgo rasterast tê bikaranîn an jî bêtîyek ku divê nîşaneyeka demsalê be, bi awayekî nerasterast *kîgoyê* tuwanc (îma) dike. Di haîkûyê de hema hema her tim peyva demsalê heye. Ev peyv dibe ku paşxaneya atmosferê bide, dibe ku ev bibe cureyekî tov, tevgerker ku dikare hemû alema hestî, deng, bêhn û rengan serbest bihele (Blyth, 1963: 382). Ji ber vê yekê hêmana *kîgo* valahîya danasîna şewaza haikuyê ya ku pir kurt e, dadigire, ew atmosfera haîkûyeka

ku nikare tişteki weha îfade bike xurt dike. Kîgo di heman demê de di haîkûyên nûjen de hêmaneka jênegere (Suzuki Î., 2011: 34).

Başô, di pêwendîya navbera sirûşt û mirovî de balê dikişîne li ser celebînîya werzê (demsal) û herweha der barê bandora xwezayê li ser teşegirtina cureya helbesta haîkûyê de bê çawa çê dibe, weha vedibêje:

“... Di hemû kesên ku di hunera xwe de gihiştine kamilbûna rastîn, de tişteki hevpar heye, ev: Hişekî bi xwezayê re yekpare û demsal bi demsal bi xwezayê re lihevhatî ye. Hişekî ku wisa dibîne gul e, ya ku xeyal dike heye e. Lê hişekî hov e ku ji xeynî kulîlkê, tişteki din dibîne; Ew hişê heywanan e ku ji heyvê tişteki din disêwire. Nexwe hunermend berî her tiştî, ji bo ku ji barbarî û heywanetî rizgar bibin, pêwîst e ku bi xwezayê re li hevhatî bin û bi xwezayê re bibin yek (Akhan & Büyükarman, 2021: 1132).

Aruoba (2020: 33), şanîderên demsalan ango bêje û termên kîgoyê li gor demsalan ku sersal jî di nêv de, bi giştî bi vî awayî dabeş dike:

Sersal: ewil/nû/spêdeya wê/roja wê/asîmana wê rojê/cil û bergên wê/xelatên sersalê/ pêşrewka wê/kenê sersalê û hwd.

Bihar: moran/alûçe û kulîlkên alûçeyê/gilyaz û kulîlkên gilyazê/ binevş/ asmîn/ simbil/ beq/ bîşeng/ qaz/zirçika birinci/têti/ xox û kulîlkên xoxê/ dûvmeqesk/ barana biharê/ kitik/ bilbil/ cewrik/ mij/ çûk/ hirmî û kulîlka hirmîyê/ pirpirîk/ rengê kesk (hêşîn).

Havîn: pel/ şilavk/ masîzîv/ kamelya/ barana havînê/ şeytanok/ pepûk/ gûstêrk/ ewr/ gîya/ germ/ birûsk/ sosin/ mêşhingiv, moz/ tîtav/ hesp, mehîn/ mêxik/ sîsirk/ xaşxaş (kulîlkê wê)/ gulborî/ dar/ bawêşîn/ xaç darik/ quling/ lavlavk/ gundor/ şaqavî/ qirmeravîya reş/ genim/ simbilê genimê/ mêş/ lotis/ hênikayî/ rengê sor.

Payîz: pelê ketî/ qijik/ berû/ kulî/ heyva çardeşevî/ agirbazî/ kadiz/ mij/ tipika xunavê/ ask/ pelên rengîn dibin (zer, sor...)/ bahoz/ batirsok/ qazkûvî/ mirî-gor/ bayê payîzê/ dawidî (krîsantem).

Zivistan: serma/ şilope/ qurad/ berf/ teyrok (zîpik)/ tîtirwask/ berî/ qerisan/ qeşa/ rengê reş.

Ji xeynî nîşanîkirina demsalan kîgo, herweha wekî metaforên temsîlî angoy remz hest û hizrê mirovan jî amaje dike. Ji metaforên temsîlî yek jî tipka xunavê ye ku bermirinîya însên û dunyaya fanî derdibirîne. Heçî kulîlkvedana gêlasê ye, remza biharê ye. Ku em qalê bînin ser qirikê, ew jî remza payîzê ye û melalîya bêwarîya ruhî dinimîne. Kulîlka ku di haîkûyê da temsîla sebir û paqijîyê dike krîzantem e û her wisa wek remz, pêrgî emirdirêjîyê tê. Çirrçirrk, hem kerrahî hem malvênîya dinê ye. Perperok jî di haîkûyan da îmajek e ku nunerîya xewn û xeyalên serbestîyê dike û ji nêrmendîya zilêm ra dibe îma ku li pey dilbijokîya xwe liha û liwê çeng vedide. Şengebî ji haîkûyê ra hêmaneke xweşkês e ku qesta şox û şengîya dîlbera dilbir dike.³¹

golava kevgirtî
beqê çipp xwe d'navê da
şipp pêjna avê
(Başô)

peleewran veda -
li dara temûzî lê dixwînin
va ye zerketavek
(Shîkî)

zarokino
ev heyîva gêr û ronak
ya kê ye îşev
(Îssa)

xatûna rehmetî –
pêrgî şehê wê hatim li jûrê
hundir cemidî
(Buson)

(wer.: Gorîcan, 2024: 22, 88, 129)

Di haîkûya Başôyî de bêjeya “beq”ê û livandina wê angoy xwe avêtina golava kevgirtîyê wekî şanîdera demsalê (kîgo) demsala biharê, hatina biharê dinimîne. “peleewr”, “dara temûzî” û “zerketav” di haîkûya Shîkîyê de wekî kîgo demsala havînê îşaret dike. Şanîdera demsalê di haîkûya Îssa de “heyîva gêr û ronak” angoy “heyva çardeşevî” ye ku ew jî wekî kîgo demsala payîzê nîşanî dike û herweha di

³¹ Sîdîq Gorîcan, *Gûstêrikên Veşarî*, destenota 21ê, (berhema neçapkirî).

haîkûya Busonî de bêjeyên “xatûna rehmetî (mirin)” û “cemidî” jî wekî şanîdera demsalê, demsala zivistanê îşaret dike.

1.2.4.2. Kirejî

Kire yan jî *Kirejî* di wateyên wekî “vewestandin, sekinandin, birîn”ê de tê bikaranîn ku di nivîsîn û teşegirtina haîkûyên klasîk de bi kîgoyê re wekî du rêbazên bingeîn tê pejirandin. Herweha kirejî, wekî “bêjeya/dengê birînê” jî tê binavkirin (Aytemür, 2021: 10). Awaya xalbendîyên helbestkî (Barthes, 2018: 127) kirejî di haîkûyan de kirpandin, ton û baneşanên hîsên cihê cihê amaje dike. Kirejî, ji wateya bejêyekê wirdetir, wateya hestî didin (Akalin, 1962: 58).

Bêjeyên pêhesandinê kirejî, di helbestên japonî yê klasîk de û di heman demê de di haîkûyan de li gel modekî helbestkî, wateya pejinandinê werdigirin. Her çendîn ku wekî çendanî hejmarên wan di serdemên berê de ji hejdehan zêdetir (Aruoba, 2020: 33) bin jî kirejîyên ku herî zedê hatine bikaranîn sê heb in û ewana jî “ya (j.:や), kerî (j.:ケリ) û kana (j.:かな)” ne. Di hin helbestên japonî yan jî haîkûyan de bêyî kirejîyan wateyên ku yê wekî kirejîyê didin jî hene. Yanê ne şert e ku di her helbest/haîkûyan de rasterast kirejî were bikaranîn.

ya (や): Li şûna di deng û bêjeyên wekî ax, ox, va ye, ha, aha, welê, wisa, ev e ye, ya, gelo, ma, qey û hwd. de tê bikaranîn ku herweha wateyên wekî pirs, guman, herêneyî û hêvîyê jî dide.

kerî (ケリ): Di helbestê (haîkû) de hin carinan wateya heyranîyê dide, hin carinan jî wateya rabirdûya bûyerekê ango tiştên qewimîye dide. Li şûna “weha, bi vî/vê halî, hingê, ne wisa ye!?, wisa ye lê, wisan e ya, wilo ye ya...” tîne emilandin.

kana (かな): Bi giştî dawîya helbestê (haîkû) ji bo dêhn kişandinê, li pêşîya hîsekê bala xwîner/haîkûxwînan dikişîne û wateyên wekî *va*, *wa*, *ev e*, *aha*, *ha* dide.

Kire/kirejîya haîkûyê xasyeta serxwebûn û yekparetîyê tîne ji helbestê re, haîkûyê dibire û bi vî awayî honraweyîyê çê dike. Di heman demê de, haîkûyê li gor tîgihîştina haîkûxwînan pêşkêş dike (Suzuki Î., 2011: 40).

古池や蛙飛び込む水の音
(Matsuo Basho)

(Furukeya Kawazutobikomu Mizunotoo)
(Suzuki I., 2011: 26)

おちこちおちこちとうつきぬたかな (Ochikochi ochikochi to utsu kinuta kana)

(Yosa Buson)

Here and there,
There and here,
Beating fulling-blocks. (Blyth, 1965: 370)

湖の水まさりけりけ月雨 (Mizuumi no mizu masari keri satsuki-ame)

(Kyorai)

The water of the lake
Has increased,
In the rains of June. (Blyth, 1965: 378)

Di van mînan de jî xuya dibin ku ji alîyê haîkûnûsên têvel ve kirejî hatine bikaranîn.

1.2.4.3. Torîawase

Têgiha *torîawaseyê* tê wateya “pevgihan”ê. Ev rêbaz di nava haîkûyê de di navbera du hêmanên ku ji alîyê mijar û temayê ve têkilîyeka mentiqî neyî de girêdanîya hisî û fêhmî çê dike. Metoda pevgihandinê di haîkûyê de rasterast nayê xuyakirin, têkilîya du hêmanên ji hev ne eleqedar li gor têgihiştina xwîneran re tê hêlîştin.

Torîawase, biyekkirina du hêmanan in. Gava ku pêwandîya van her du hêmanan bi kirejîyê re bê nîşanîkirin hingê haîkû derdikeve holê (Suzuki I., 2011: 40). Herweha di navbera kîgoyê û hêmanên ne kîgoyîyê de, di navbera kîgo û hestek, tevgerê û hwd.ê de jî pevgihandin ango torîawase çê dibin. Başê jî di haîkûyan de li ser giringîya vê rêya pevgihandin a ku du hêmanên ji hêla xasyetan ve ji hev du cuda li hev girê dide, rawestîyaye. Li gor Başê, hokkû (haîkû) ji torîawaseyê çê dibe.

Hokkû/haîkû ya ku ji du hêmanan ve bi awayekî xweşik hatîye yekparekirin, hunerek e (Suzuki Î., 2011: 36).

bi zebeşê hênîk be –

ku zar di ber golavê ra çûn

bibe beqa şilek

Îssa

(wer.: Gorîcan, 2024: 72.)

Di vê nimûneya haîkûyê de di navbera du hêmanên wekî “zebeş” û “beqa şilek” de pêşîyê rasterast tu pêwendî nayê dîtîn. Zebeş, wekî şanîdera demsalê (kîgo) havînê îşaret dike û li gel vê beqa şilek jî ku ew jî ji ber germahîya havînê da ku hênîk bibe xwe dike herîya çirango di çiravê de, wekî şanîder di heman demê de demsala havînê û germahîya wê nîşanî dike. Bi vî awayî bi rêbaza pevgihanê torîawaseyê haîkûyek çêdibe û haîkû tê têgihiştin.

1.2.4.4. Sketch/Şaseî

Têgiha *Sketchê*, bingeha teorîya haîkû yê Şîkî ye (Suzuki Î., 2011: 55). Şîkî, ji bo reforma haîkûyê angoya ji bo modernkirina haîkûyê, vê rêbazê peyda dike. Bêjeya *sketchê*, peyveka îngilîzî ye ku wateyên wekî “gelale, pêşnûma, xêz, reşnivîs û karê sêwirandî” dide. Japonîya *sketchê* “shyaseî” (şaseî) ye ku esas wekî termekî hunera wêneyê Şîkî, ji hevalê xwe yê wênesaz Nakamura Fusetsûyê (1866-1943) hîn dibe û di wateya “sêwirandina heyberên wekî xwe” de ji bo bi şewaza haîkûya xwe ya bi navê “tiştên wekî xasyetên haîkaîyî/şewaza vebeyîner a nerîtî” angoya “rastîbînîya vebeyîner”ê bi kar tîne. Lê bes, li gor Karatanî (2021: 207), şewaza wî ya şaseîyê ne wekî rengvedana realîzmeka klasîk/Rojavayî ye angoya ne tenê teswîreka basît û qeba ye.

Şîkî bi şewaza şaseî angoya metoda *sketchê* re haîkûyê ji çarçoveya estetîka gerdişîyê (Ga) derdixîne û ji bo haîkûyê têgihîna şewqdan a ku tiştên xwerû û wekî xwe li cîhana derveyê dîtî, anîye. Peydakirina estetîka nû ya ku heta wê rojê nehatîye dîtîn (zokû), di helbesta japonî de bûye armanca haîkûyên modern (Suzuki Î., 2011: 25). Masaoka Şîkî, ji bo reforma haîkûyê di teşegirtina haîkûyên îroyîn de rêbaza ku

wekî “metoda sketchê” tê binavkirin, emilandîye (Akhan & Büyükarman, 2021: 1131).

Di pêkanîn, nivîsandin û xêzkirina haîkûyan de şêwaza Şîkî yê şaseî, “haîkûyên tsukînamîyê” angî haîkûyên ku ji alîyê tema û mijaran ve xwe nû nake û her car xwe dubare dike, napejirîne. Ji ber vê yekê ye ku metoda sketchê di haîkûyê de sê erkan werdigire:

1. Tsukînamîyê ji holê rakirin
2. Haîkûyê di nav gel de belavkirin
3. Metoda gotina taybet a haîkûyê nîşanîkirin (Suzuki Î., 2011: 42).

Li gor metoda sketch ê Şîkîyê, tiştên ku tên dîtîn bi awayekî xwerû angî weke xwe divê di haîkûyan de bî nivîsandin, xêzkirin. Metoda gotina taybet a haîkûyê jî li gel objektîfîyê, xwe dispêre sîbjektîfîyê.

朝顔やわれに写生の心あり

Asagaoya Warenishyaseino Kokoroari

“Ez gulborîyê dibînim, di min de gîyana sketchê heye.” (Suzuki Î., 2011: 62).

Wekî ku di vê mînakî haîkûya Şîkîyê de jî xuya dibe ku tiştî tê dîtîn (gulborî) di nav rastîya xwe de angî weke xwe hatîye dîtîn û realîzma rengvedanker jî xwe de derdikeve.

Herweha di nav haîkûyan de tenê xeyalkirin (imajînatîon) û îdealên haîkûnûsan çî raman, çî felsefe û çî jî îdeolojî be qebûl nake. Şîkî dixwest ku bi vê şêwaza xwe ya şaseîyê re di nav haîkûyan de li şûna pêlîstandîna peyvan û fantazyayê çavdêrîya rastîbîn a sirûştê çê bike (Beichman, 1982: 45).

赤蜻蛉筑波に雲もなかりけり

Akatonbo Tsukubanikumomo Nakarikeri

“di vê roja ku zeleşûnkên sor difîrin de / li ser Çîyayê Tsukubayê / ewrek tune ye.” (Suzuki Î., 2011: 57).

Di dîmena vê haîkûyê de rêbaza sketchê çavdêrîya rastîbîn a sirûştê amaje dike. Li wê roja payîzê (zeleqûnkên sor kîgoya payîzê ye) ewrek tune ye li ser çîyaya dûr a Tsukubayê. Ew menzere tê dîtin lê bes li pêşberî vê dîmena mezin, zeleqûnkên sor ên biçûk di wê kêlîkê de balê dikişîne ser xwe. Ji ber vê yekê ye ku di nivîsandin/xêzkirina haîkûyan de li gor metoda sketchê jî li girtina “kêlîkê”, li vedîtina “menzereyê” û li bûyîna “vir de/lihayê” hêmanên sereke yên herî giringtir in.



2. HAÎKÛ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE

Binyada hilberîna wêjeyê helbest, çi bi zarkî çi bi nivîskî ferq nake, di wêjeya kurdî de bi saya bikaranîna teşe û cureyên nû bi awayekî berbelav hebûna xwe domandîye. Helbest, di wêjeya kurdî de, cara pêşî di nav wêjeya gelêrî de ji aliyê dengbêj, çîrokbêj, lolobêj û qewilbêjan ve bi awayekî melodîk û bi aheng wekî teşe û cure sêxiştî, destan, lorik, zêmar, dilok, bêlîte, payîzok, heyranok, kilam û hwd., hatine bikaranîn. Herweha di wêjeya kurdî ya klasîk de helbestên dubeytî, rûbaî, xazel û qesîde jî wekî teşeyên nezmê hatine nivîsandin. Bi demê re helbestên serbest, sone³², terzarîma³³, balad³⁴ ên teşeyên nezmê yên Rojavayî (modern) hatine nivîsandin û bi vî awayî di nav helbesta kurdî ya modern de cih girtine.

Di edebiyata kurdî de wekî naverok ji hêla hin mijaran ve û ji hêla yekeya ristesazkirinê ve cureya ku herî zêde dişibe helbesta japonî haîkûyê, sêxiştî ye. Li gor neqilkirina Kerîm Kurmanc, helbestên sêxiştî dişibin haîkûyên japonan (Temo, 2019: 410). Ev cureya helbestkî û melodîk, di edebiyata kurdî ya gelêrî da gelekî berbelav û ji hêla muhtewayê ve jî cihêreng e. Sêxiştî di nava zargotina kurdî da, li seranserê Kurdistanê û dîyasporaya wê da hunereka pir hezkirî û belavbûyî ye. Di hin herêmên kurdan da ji wan ra dibêjin: heyranok, dîrok, sêxiştî, sêrêzî, dilok, manî, bend, çarîn, xweşxanên evîndariyê û hwd (Celîl, 2021: 15).

Nemaze di nav muzîk û helbestên kurdên Xorasanê (Kurdistana Xerîb) da sêxiştî, cihekî taybet digire (Temo, 2019: 413). Sêxiştî, di edebiyata kurdên Xorasanê ya gelêrî da xwedî cihekî girîng e ku forma helbestî ya herî karakterîstîk û berbelav e (Temo, 2019: 410). Sêxiştî, bi çapên xwe mînyatur in, biçûk in, naverok guvaştî ne, dîmenekê, bûyerekê, hîseka evîndariyê li ber guhdaran vedikin. Peyvên lakonîk delîlê dilîne, çîrûska kela evîndaran in, peyvên xemgînîyê û hêvîyê ne, gazî û hewara bêçarîyê û jihevduketina evîndaran e (Celîl, 2021: 16). Li gor Berken Bereh (2022: 16) jî, temayên sêxiştîyan eşq, xweza û xurbet in.

³² Bo nimûneyan b.: Kawa Nemir, *Soneyên Sewdaser*, (2019), Avesta, Stembol.

³³ Bo nimûneyan b.: Selîm Temo, *Sê Deng*, (2011), Weşanên Dara, Stenbol.

³⁴ Bo nimûneyê b.: Kawa Nemir, *Peyvên Biçûk*, (2021), r. 92, Avesta, Stembol.

Sêxiştî (sêrêz/sêrêzî), ji navê xwe jî dîyar e ku ji alîyê yekeya nezmê ve ji sê risteyan û ji 5an heta 15 heceyan, pêk tê. Lê belê, bi heşt heceyî ji yên din pirtir hatîye gotin (Şadkam, 2021: 21). Her riste bi piranî ji heşt kêteyan û bi awaya 4+4 taqî (rawest) teşe girtine. Bi giştî jî bi qewlê Celîlê Celîl (2021: 16) ji bîst û çar lingan (kête) dirûv bûye. Li gel vê, her sê risteyên sêxiştî di nav xwe de bi serwa, pîvan in. Her du rêzên ewil ji alîyê naverok û mijaran ve bi hev re xurt girêdayî ne û risteya dawî ango ya sisêyan azad e. Bo mînak:

84.

Bejnê yarê/dara bîyê 8 kête, 4 /4 rawes
Rûniştîme/li ber sîyê 8 kête, 4/4 rawes
Kînga rûnim/li palîyê 8 kête, 4/4 rawes

140.

Cewanî çû, nika kal im
Çi şîrîn wûm, nika tal im
Her wext bê wî, ez le mal im

241.

Çîyay ser me pir wi merx e
Wi dorê da ketime çerx e
Nata gurê çav li berx e

1536.

Welatê me we kemer e
Me canê xwe daye ser e
Xewer hanîn tirman tere

(Celîl & Şadkam, 2021: 32, 36, 44, 136)

Helbesta japonî haîkû, wekî cureyeka nû û nûjen piştî salên 2000î di nav helbesta kurdî de xuya dibe. Ji sala 2000î û vir ve haîkû bi awayekî forma helbestê tê nivîsîn. Hin ji wan ra hayko, hokko, helbestên mobîl hin sêxiştî dibêjin. Îro gellek kes bi her çar zaraveyên kurdî haîkûyan dinivîsîn (Bereh, 2022: 17). Di kurdî de ji haîjînan ango kesên ku haîkû dinivîsînin re haîkûnûs û haîkûrêş tê gotin û herweha wekî rêbazek a haîkûnûsan ji bo dîmenên haîkûnak ango ji çavenêrî û guhdarîkirina hişyar, baldar, mereqdar, guhbelmayîn û guhbeliqandinê re bêjeya “guhveçîn” jî hatîye bikaranîn (Url 17). Helbestvan û nivîskarên wekî Berken Bereh, Selîm Temo, Kawa Nemir, Ulku Bîngol, Sidîq Gorîcan, Ergîn Sertem, Mem Zînistanî, Şemal Akreyî, Xalid Elî Silêvanî, Dilbirîn Halo, Şehab Akreyî, Şalaw Hebîbe, Rêdûr Dîjle, Rêzan Diljen, Mewlûd Oguz, Henan Cefer, Mûsa Ataç û Zeynep Şemdinoğlu di

cureya haîkûyê de helbest nivîsandine. Hin ji wan dîwanên ku tenê ji haîkûyan pêk hatine, wekî berhem weşandine.

Haîkû, di wêjeya kurdî (kurmancî) de cara yekem di sala 2006an de ji alîyê Berken Bereh ve hatîye nivîsîn. Bereh, di nav berhema xwe ya bi navê *Pandomîmê* (2006) de di binenavê *Haykoyê* de cih daye 115 haîkûyan. Bereh, di berhema xwe ya bi navê *Dilê Min Palgeh e Ji Işqê Re* (2011) de ku pirtûk wekî hemû berhem çap bûye, hemû haîkûyên xwe yên ku yekem car di *Pandomîmê* de weşandî, li gel 340 haîkûyan cara duyem diweşîne. Piştî wekî cara sêyem, bi 455 haîkûyên ku di nav *Dilê Min Palgeh E Ji Işqê Re* de cih girtî re bi tevahî 495 haîkû di sala 2020an de bi navê *Haikuyê* ji Weşanên Avestayê derdikeve.

Helbestvan Selîm Temo, di sala 2011ê de di berhema xwe ya bi navê *Sê Dengê* de cih daye haîkûyan. Temo, di *Sê Dengê* de bi binenavê *Haîkûyên Biharî* tevahî deh haîkû nivîsandîye. Rêdûr Dîjle di berhema xwe ya bi navê *Kêsekê* (2017) de cih daye şeş formên haîkayî ku sisê jê *senryû*, yek jê *jisê* û didu jî ji cureya haîkûyan pêk hatîye. Di heman salê de ango di sala 2017an de ji Weşanên Lîsê, dîwana haîkû yê Kawa Nemirî ya bi navê *Morana Gerdûnê/Bayê Labûte* bi tevî xetên (îlustrasyon) Şener Ozmenî tê weşandin. Herweha Nemir, di berhema xwe ya bi navê *Peyvên Biçûkê* ((2021) de jî cih daye heşt *tankayekan* (tanka) ên yek ji cureya helbesta japonî.

Berhema haîkûyî *Dengê Pepûkê/Haîkûyên Îlona Nû* (2020) ji hêla Ulku Bîngolî ve hatîye nivîsandin. Sidîq Gorîcanî berhema xwe ya bi navê *Gumbil/gupik bi gupik haîkû* (2022) bi fotoxrafên cîyawaz ên ku haîkûnûs bi xwe kişandine û îlustrasyonên Zozan Orakê re di warê berhemên haîkû yên bi kurdî de lê zêde dike.³⁵ Berhema haîkûyî ya dawî derçûyî *Sîhrên Mizewran/سحرین مزموران* (2022) ji alîyê Ergîn Sertemî ve bi du alfabeyan ango latînî û ‘erebî (soranî) hatîye nivîsandin. Herweha Rêzan Diljênî di pirtûka xwe ya *Deftera Qetayî* (2023) de cih daye bi tevahî hejdeha haîkûyan û di *Lîrîka Berbangê* (2024) de jî Mewlûd Oguzî tev bîst û çar haîkû nivîsandîye.

³⁵ Herweha dosyeyeka wî ya haîkûyê bi navê *Gûstêrkên Veşarî* ku nêrînên wî yên li ser haîkûyê wekî destenot û helbestên haîkû tê de ne, li ber çapê ye.

Ji xeynî van, haîkû di hin kovarên kurdî de jî hatine nivîsandin û herweha ji haîkûnûsên têvel ve jî haîkû hatine wergerandin. Di *Kovara Nûbiharê* de haîkûyên haîkûnûs Sidîq Gorîcanî³⁶, yê helbestkar Mewlûd Oguzî³⁷ û ya Zeynep Şemdinoglu³⁸ hatine weşandin. Di heman kovarê de wekî wergêr Sidîq Gorîcanî ji haîkûnûsên navdar ên japonî yên wekî Bashô, Buson, Shiki, Issa, Kikaku, Ômaru, Shôha, Meisetsu, Sôkan û Rippoyî ji îngilîzî bo kurdî (kurmancî) wergerandiye. Gorîcanî di *Kovara LEWergerê* de ji romannûs û haîkûnûsê kanada-amerîkî Jack Kerouacî ku yek ji avakarê *Ekola Beatê* ye, ji îngilîzî wergera sêzdeh haîkûyan kiriye û di heman demê de di *Kovara Bar Helbestê* de jî heft haîkûyên Kerouacî wergerandiye.

Wergêr Gorîcanî, di *Kovara LEWergerê* de dîsan ji îngilîzî ji haîkûyên haîkûnûsên japonî yên wekî Basho, Shîkî, Buson, Issa, Kaso, Getto û hwd.ê wergerandiye. Gorîcanî wekî haîkûnûs di *Bar Helbestê* de jî haîkû nivîsandîye. Ji bilî van Sidîq Gorîcanî, berhema Harold Stewartê (1916-1995) awistralyayî ya bi navê *A Net of Fireflies, Japanese Haiku and Haiku Paintingê* (1960) ku berhem ji wergerandina haîkûyên haîkûnûsên têvel ên japonî pêk tê, ji îngilîzî bo kurdîya kurmancî wekî bi navê *Ji Haîkûnûsên Japonî Demsal Bi Demsal Haîkû* (Nûbihar, 2024) wergerandiye.

2.1. Haiku

Navê berhema *Haikuyê* (2020), ji helbesta japonî ango ji cureya haîkûyê hatiye wergirtin. Haîkûyên Berken Berehî³⁹, berî ku di vê pirtûkê de cih bigirin, hin ji

³⁶ Bo nimûne, hejmarên wekî 141 (2017), 143 (2018), 146 (2019), 150 (2020), 154 (2021), 158 (2022), 164 (2023), 168 (2024), 170 (2025) û hwd. Haîkûnûs hê jî dinivîse.

³⁷ Di hejmara 142an (2018) de bi navê *Haîkûyên Çar Demsalan* bi tevahî şazdeh haîkû nivîsandîye. Oguz, piştî van haîkûyan -bêje û risteyên hinan guherandiye- derbasî berhema xwe ya bi navê *Lîrîka Berbangê* (2024, Avesta) dike.

³⁸ Di hejmara 171ê (2025) de bi navê *Çend Haîkûyên Biharîn* tev 8 haîkû nivîsandîye.

³⁹ Helbestvanê kurd di sala 1954ê li bajarê Şîrnexê hatiye dinê. Cara yekê helbestên wî di kovara Tîrêjê de (yekem kovara kurdî ye li Bakur) de hatine belavkirin. Heta niha helbest û nivîsarên wî di gelek kovar û rojname û TVyên kurdî de belav bûne (Nûbûn, Nûdem, Jiyana Rewşen, Nûbihar û hwd.) Di sala 1999 de bi navê Kulîna Kulîlkan kovareka internetî amade kir û çar hejmarên vê kovarê derketin. Hin helbestên wî li tirkî, almanî, fransî, erebî û farisî hatin wergerandin. Di çendîn komeleyên civakî de tevî konferans û panêlan bû. Nivîskarîya xwe didomîne. Berhemên wî:

Helbest: *Êş* (Weşanên Sî, 2001), *Şagirtên Evîne* (Weşanên Sî, 2003), *Şîna Helbestê* (Weşanên Doz, 2008), *Dilê Min Palgeh E Ji Işqê Re* (Weşanên Lîs, 2011), *Ji Dûriyê re* (Weşanên Lîs, 2013), *Xewna*

wan (115 haîkû) cara pêşîn di *Pandomîmê* de û cara duyem di nav berhevoka wî ya bi navê *Dilê Min Palgeh E Ji Işqê Re* de wekî di binenavê *Haikuyê* de 455 haîkû hatine weşandin. Piştî li gel hemû haîkûyên wî wekî berhemeka serbixwe bi heman navê ango di nav *Haikuyê* de di sala 2020an de tê weşandin. Bereh, bi tevahî di berhema *Haikuyê* de cih daye 495 haîkûyan ango 40 haîkû din lê hatîye zêdekirin.

Di berhemê de ji her haîkûyan re hejmarek hatîye dayîn û herweha li gor van hejmaran haîkû hatine rêzêkirin. Her çiqas wekî hejmar dayînê berhem ji 491 haîkûyan pêk bê jî, ji ber haîkûya dawîn a nimarekirî ku di nav haîkûya bi 491 hejmarî de jî 5 haîkû hene, esas berhem bi tevahî ji 495 haîkûyan pêk tê. Ji xeynî haîkûya bi 491 nimareyî, ji haîkûyên din re tu sernav nehatîye dayîn. Haîkûya dawîn a nimarekirî wekî “Sermet” hatîye binavkirin. Ji aliyekî dî ve haîkûyên tê de, bi tu hêmanên dîtîni yên wekî şewaza haîgayî, îlustrasyon û fotoyan re nehatine şayesandin.

Haîkûyên Berehî, ji hêla teşe û naverokê ve hem xasyetên haîkûyê japonî yên klasîk û hem jî yên modern werdigire. Bereh, di berhemê de ji bilî haîkûyên li gor yekeya kêşa kîte ya japonî hakûyê ango keşa 5/7/5 û 17 kîteyî, ji bona xwendin û rîtmê cih daye gelek kêşa kîte yên têvel û yên ji 17 kîteyan zêdetir û hindiktir. Herweha ji bona kêşa vesazkirina risteyan di hin haîkûyan de kîte xistîye. Di navbera hin haîkûyan de cihê bêje û risteyan diguherîne yan jî bêjeyên nû lê zêde dike. Li gel bikaranîna kirejîyan, li şûna bêjeyên kirejîyan bêhnok, apostrof, pirsnişan, bangnişan û hwd.ê wekî “kirejîyên bi xalbendî” bi kar anîye.

Her çendî ku hêmanên kîgoyê ango şanîderên çar demsal ên haîkûyan di berhemê de bi awayekî birêkûpêk nehatibin senifandin jî, li gor her demsalan haîkû hatine nivîsîn. Ji xeynî mijar û temayên demsalan; gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajel û riwek wekî hêmanên tematîk ên sereke hatîye bikaranîn.

2.1.1. Vekolîna Teşeyî

Dawî (Weşanên Lîs, 2016), *Xana Xemê* (Weşanên Lîs, 2018), *Çemê Baranê* (Avesta, 2019), *Wisa Tê Bîra Min* (Avesta, 2020)

Werger: *Lapis Lazuli* / Mehmet Altun, *A Deryayê Gotî* / Mustafa Köz

2.1.1.1. Teşeya Ristesazî

Di teşegirtin û ristesazkirina haîkûyên berhemê de li gor pîvaneya kîteyê bi tevahî 75 kêşa hilmî (on) yên cihê hatîye bikaranîn. Ji van 75 kêşa kîte/hilmîyan 49ê wê li gor teşeya 3 riste û 17 kîte/hilm yên têvel, 12ê wê 3 riste û 18 hilm ên têvel û 14ê wê jî 3 riste û 16 hilm ên têvel hatîye vesazkirin. Di nav van kêşa kîteyan de yekeya ku herî zêde hatîye bikaranîn teşeya 5/7/5 hilmî ye. 98 haîkû ku wekî hejmar ji hemû haîkûyên berhemê bergî ji 5/1ê tê, wekî hakûya japonî ya klasîk hatine ristandin.

Bereh, her çiqas di ristesazkirina haîkûyan de hemû haîkûyên xwe li gor kêşa kîteya klasîk 5/7/5ê nenivîsandibe jî, xasyetên ahengî, helbestkî û teqldar (rîtmîk) yên haîkûyê di kêşa hilmên dîtir de parastîye. Bi vî awayî, şêwaza xwendina henaseyî ya haîkûyê dide nîşanîkirin.

1.	9.	196.
Bayê şewişî 5	Du pelên ziwa 5	Ker zirî, kew firî 6
hay ji şeva har nîne 7	bê şerm û heya 5	pûng boş û coş 4
pif kir çira min 5	rûyê avê maç dîkin 7	teqez mar miriye 6

Hemû haîkûyên berhemê li gor bikaranîna yekeya teşeya nezm a kêşa kîte/hilmê weha ne:

Kêşa Kîte/Hilman	Hejmara Haîkûyan
1/8/8	150, 168.
2/6/9	229.
2/9/6	71, 145, 181, 310.
2/7/8	80, 144, 228, 241, 282, 301.
2/8/7	210, 265, 401.
3/3/11	112.
3/5/9	75, 137, 178, 207, 309, 346.
3/6/8	44, 134, 200, 264, 400.
3/7/7	60, 83, 98, 147, 183, 185, 218, 231, 297, 447.
3/8/6	19, 30, 219, 235, 237, 240, 245, 370.
3/9/5	47, 87, 216, 270, 299, 349, 393.
3/10/4	104, 255.
3/11/3	46.

4/3/10	24, 305.
4/4/9	192, 211, 271, 281, 284, 319, 368.
4/5/7	466.
4/5/8	3, 128, 141, 170, 180, 263.
4/6/7	8, 33, 77, 78, 82, 99, 102, 119, 187, 224, 227, 249, 291, 342, 344, 359, 389.
4/7/5	426.
4/7/6	11, 65, 95, 115, 131, 133, 154, 159, 242, 259, 325, 371.
4/8/5	6, 62, 89, 93, 103, 121, 125, 129, 173, 182, 261, 266, 295, 351, 356, 366, 378, 379, 434, 449.
4/8/6	31.
4/9/4	202, 304, 320.
4/9/5	391.
5/2/9	247.
5/3/8	68.
5/3/9	70, 294.
5/4/8	59, 69, 130, 212, 223, 239, 254, 316.
5/4/9	253.
5/5/6	79.
5/5/7	4, 9, 51, 56, 81, 92, 143, 156, 169, 208, 232, 275, 289, 307, 313, 331, 340, 369, 448.
5/6/5	138, 262, 484.
5/6/6	14, 32, 35, 101, 111, 113, 114, 139, 148, 164, 175, 206, 221, 288, 298, 380, 399, 432, 463, 487.
5/6/7	396, 482.
5/7/4	403, 458, 491(5).
5/7/5	1, 2, 7, 21, 23, 26, 42, 61, 74, 84, 91, 118, 132, 140, 160, 167, 214, 215, 226, 246, 272, 286, 306, 329, 333, 337, 338, 354, 358, 361, 362, 364, 367, 375, 384, 390, 402, 405, 406, 407, 409, 410, 411, 413, 414, 415, 416, 417, 418, 419, 420, 421, 422, 423, 424, 425, 427, 428, 429, 430, 433, 435, 436, 446, 450, 451, 452, 453, 454, 455, 456, 457, 459, 462, 464, 465, 468, 472, 475, 476.
5/7/6	48, 54, 360.
5/8/3	269.
5/8/4	22, 52, 90, 324, 373.
5/8/5	412.
5/9/3	86, 100, 230, 332.
5/9/4	377.
6/2/9	260.
6/3/8	53, 85, 161, 238, 321, 327.
6/3/9	365.
6/4/6	136, 196.
6/4/7	29, 109, 171, 184, 186, 201, 234, 236, 258, 280, 285, 334, 347, 357, 387.

6/5/6	50, 116, 122, 124, 127, 155, 162, 165, 172, 177, 217, 256, 267, 273, 277, 292, 317, 318, 322, 345, 363, 382, 438, 442, 461, 470.
6/6/4	166.
6/6/5	10, 13, 17, 20, 27, 40, 43, 45, 58, 67, 142, 158, 190, 197, 198, 204, 213, 222, 296, 303, 326, 335, 336, 348, 381, 398, 440, 441, 467, 479.
6/6/6	34, 105, 469.
6/7/3	16, 330.
6/7/4	12, 57, 66, 73, 153, 176, 225, 274, 388, 439.
6/7/5	110, 404, 408, 431, 460.
6/8/3	106, 152, 174, 189, 252, 257, 293, 372, 385, 481, 477, 478, 480, 483, 485, 486, 488, 489, 490, 491(1), 491(2), 491(3), 491(4).
7/3/7	28, 191, 308.
7/4/5	278.
7/4/6	94, 123, 135, 193, 194, 250, 276, 290, 314, 315.
7/5/4	302.
7/5/5	55, 76, 96, 126, 195, 287, 355, 474.
7/6/3	471.
7/6/4	5, 38, 120, 248, 353, 394, 473.
7/6/6	339.
7/7/3	157, 163, 188, 205, 233, 244, 323, 328.
7/8/2	376.
8/1/8	279.
8/2/7	41, 117, 341.
8/3/6	97, 146, 383.
8/3/7	209.
8/4/5	18, 72, 203, 395, 397, 445.
8/5/4	37, 49, 88, 199, 300, 311, 312, 392.
8/5/5	251.
8/6/3	149, 151, 179, 243, 283, 386, 437.
8/8/1	39, 107.
9/4/4	25, 108, 350.
9/5/3	15, 268, 343, 443, 444.
10/4/3	352.

2.1.1.2. Kirejî

Haîkûnûs, di hin haîkûyan de bi rêya kirejîyên kurdî yên wekî “va, vê, ox, ma, qey, gelo, çawa, de, vêca, lê belê, pa, ka, ne wilo, wisa, weha, heyf”ê re li pêşberî dîmen, rewş û bûyerekê hestên xwe yên cuda derdibirîne. Bi kirejîya “va”yê re berê me dide wê kêlik û dîmenê, bi bêjeyên wekî “gelo, çawa, ne wilo, ka, pa”yê re pirsek, kenopirsek, şeqizmayînek, dudîlîyek, gumanek, balkişandinek li ser hiş û

hestên haîkûxwînan çê dike. Bi “weha, wisa” re li hemberî rewşa welêyîya tişt û dîmenan dilxweşîya xwe dide nîşandan. Li gel van bi kirejîyên wekî “ax, ox, heyf”ê re jî reng û dengê hestên xwe vedide.

95.

Va ew jî hat
dibiriqe cam û
xwîdana pelên tûyê

62.

li vira ax!
em radestî xewê dibin
ne bi dilê xwe

31.

Her wisa bik
tenê li lûtkeya çiyê
vexwe azadiyê

Kirejîyên ku di berhemê de hatine bikaranîn, bi vî awayî hatine rêzkirin:

Bêjeyên Kirejîyê	Hejmara Haîkûyan
va, vê, ax, ox, ma, qey, gelo, çawa, de, vêca, lê belê, pa, ka, ne wilo, wisa, weha, heyf,	3, 7, 8, 15, 30, 59, 81, 83, 86, 87, 100, 101, 120, 132, 137, 167, 169, 173, 179, 216, 217, 218, 222, 223, 225, 226, 241, 255, 257, 258, 260, 268, 270, 278, 288, 293, 305, 310, 314, 317, 320, 323, 328, 332, 335, 342, 347, 349, 359, 361, 364, 365, 366, 376, 379, 382, 393, 408, 413, 414, 421, 425, 461, 474, 485.

2.1.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî

Kirejîyên ku bi xalbendîyan re hatine çêkirin an bi tenê xalbendîyan re, yan bi bêjeyên bangkî re û yan jî bi bêjeyên kirejîyan re hatine şanîkirin. Haîkûyên ku bi xalbendîyan re hatine vesazkirin di gava bilêvkirin û xwendinê de bêhvedanê, têgihiştinê, pêhesinê, pejinandinê, yekparetîya wateyê û hwd.ê amaje dikin. Xal, cotxal, sêxal, bêhnok, xalbêhnok, bangnîşan, pîrsnîşan, xêzik, bendik û apostrof (dabir) bi tevahî deh xalbendî di haîkûyên cîyawaz de hatine bikaranîn.

Bi giştî her xalbendî li gor xasyetên xwe di xwendina haîkûyan de harmonî û rîtmeka melodîk li hev tîne. Xasma jî xalbendîyên bêhnok, bendik, pîrsnîşan, bangnîşan û apostrof xwendin û strandina haîkûyan fesîhtir û teqltir dikin. Her çiqas di alfabea kurdî (kurmancî) de tîpa “eyn (‘)” nebe jî, li gor xwendinên hin bêjeyên

(‘eyne, şî’r, ‘ewr, ‘evdal û hwd.) ku di zimanê devkî de têne emilandin, di hin haîkûyan de hatine bikaranîn.⁴⁰ Ev deng, bi şiklê xwe yê transkrîbî wekî grafema fonemê hatiye nîşankirin. Li gel van, îşareta apostrofê çawa ku di helbesta kurdîya gelêrî û klasîkê de ji bona lêanîna nivîsandina kêş, qalib û herweha xwendinê hatibe bikaranîn, di heman demê de ev îşareta xaldanînê di kêşa hakûyan de û di nivîsîn û xwendina haîkûyan de jî heman erkê wergirtîye. Ji xeynî sê haîkûyên⁴¹ ku di wan de apostrof hatine emilandin, hemû haîkûyên bi apostrof li gor 17 kîteyê hatine ristesazkirin. Apostrof bi piranî di pêşdaçek û bazinedaçekan de çê bûye. Herweha bi “xêzik”ê re diyaloga hundirîn a haîkûnûsî jî hatiye derbirîn.

14.

Qulinga b’tenê
ewrê spî genî kir
bi çûn-hatina xwe

39.

li ber dilê ‘evdal
her dem bûkeke ciwan e
kaj

30.

Tê bi lez
bi baran û berf û bahoz
-ma mastê kê tirş e?

465.

J’vir jî dibînim
reqsa stêrkan û heyvê
l’ser Behra Wanê

470.

Li ser tîlê du çûk
yek pîr, yek piçûk
gazindan j’hev dîkin

15.

Sirûştê kirasê xwe guhert
qijak jî hatin
ox! te xwar!

Di berhemê de haîkûyên ku bi rêya kirejîyên xalbendîyan hatine çêkirin li gor xalbendîyan weha hatine senifandin:

Xalbendî	Hejmara Haîkûyan
Xal	211.
Cotxal	120.
Sêxal	107, 257, 380.
Xalbêhnok	76, 146, 168, 178, 207, 223, 224.

⁴⁰ Di haîkûyên 39, 432, 461an de hatine emilandin.

⁴¹ Haîkûyên 278, 330 û 458an bi 16 kîteyê hatiye ristandin.

Bendik	14, 16, 19, 21, 29, 108, 118, 126, 198, 205, 206, 208, 240, 285, 296, 337, 363, 373, 376, 463, 481.
Xêzik	30, 77, 92, 110, 135, 144, 149, 150, 158, 159, 202, 309, 320, 323, 353, 386, 411, 473.
Bêhnok	2, 7, 11, 23, 24, 37, 41, 49, 56, 57, 83, 90, 112, 118, 136, 143, 147, 158, 196, 204, 210, 231, 285, 289, 293, 295, 300, 309, 321, 324, 328, 342, 347, 366, 371, 375, 380, 381, 404, 406, 412, 439, 442, 446, 459, 460, 470, 473, 474, 491/3, 491/4.
Bang û Bangnîşan	15, 61, 63, 92, 110, 144, 152, 169, 210, 283, 286, 291, 313, 320, 358, 376, 379, 381, 382, 386, 395, 411, 415, 431, 441, 457, 467.
Pirs û Pirsnîşan	30, 43, 8, 58, 77, 78, 83, 86, 100, 101, 105, 120, 132, 137, 171, 173, 179, 202, 209, 211, 216, 217, 218, 222, 225, 239, 244, 255, 258, 260, 268, 270, 293, 309, 314, 316, 317, 323, 328, 332, 335, 342, 347, 349, 350, 353, 366, 393, 395, 404, 413, 423, 439, 440, 442, 457, 458, 461.
Apostrof	2, 14, 21, 26, 49, 90, 124, 143, 172, 199, 215, 217, 221, 259, 278, 306, 318, 330, 388, 399, 405, 417, 425, 432, 433, 458, 465, 470, 484, 490, 491/1, 491/2, 491/3, 491/4

Di ristesazkirina hin haîkûyan de bêje yan jî kîte/hilm da ku xwendineka ahengî û bilêvkirina li gor zimanê devkî çêbibe, hatine xistin. Li gel vê, di piranîya van haîkûyan de ji bona li hev hatina 17 kîteyan jî kîte ketine. Bo nimûne:

218.

56.

Ma nabe 3

Ne zarok, ne jin 5

kirasê qumriyekê 7

ne sihek li vir 5

(ez) li guliyê te ve kim 7

(ez) şad im bi qijikê re 7

Di nimûneya haîkûya 218an de hem cinavka “ez”ê û hem di lêkera “bikim”ê de raweya qertafa xwestekê ango “bi” nehatîye gotin. Herweha di haîkûya 56 numareyîyê de jî cinavka “ez”ê ketîye û bi vî awayî her du haîkû li gor kîtesazkirina 17 kîteyê hatîye vesazkirin. Ji bilî van di haîkûyên “3, 23, 31, 49, 72, 90, 93, 171, 176, 177, 220, 278, 291, 308, 320, 350, 354, 428, 468an” de jî bêje û kîte/hilm ketine.

Haîkûnûs Bereh, di hin haîkûyan de yan cihê riste û bêjeyan guhertîye yan jî li şûna hin bêjeyan peyvekî dîtir kiriye dewsa wan. Bi vî awayî haîkûyeka din ji nû ve ava kiriye û li pey wê haîkûya ewil nivîsandîye. Ev haîkûyên sekansî (li pey hev) di navbera xwe de şêwaza renkayî (lecî) çê kirine û di heman demê de atmosfereka rîtmî jî wergirtine. Ev şêwaz an di navbera du haîkûyan de yan jî di navbera ji du haîkûyan zêdetir de hatine çêkirin. Di navbera haîkûyên (38-39-40), (73-74), (176-177), (187-188-189), (193-194), (446-447-448) û (491/1-491/2-491/3-491/4)an de ev form pêk hatîye.

446.

Ba paqij dike

bajêr ji tozê, da şev

xweş lê mexel bê

447.

Ba tûyê

Paqij dike ji tozê

da şev xweş lê mexel bê

448.

Da şev li bajêr

ba xweş mexel bê

ji tozê paqij dike

2.1.2. Vekolîna Tematîk

2.1.2.1. Gerdûn û Sirûşt

Gerdûn û bi taybetî hêmanên wê yên wekî esman, roj, şev-roj, heyv/hîv û stêrk di gelek haîkûyan de cih girtîye. Rewş, liv û tevgera wan, pêwendîya di navbera wan de, dîmenên wan ên curbicur bi şêwazeka lîrîk û bi nihêrtineka empresyonîst haîkû teşe girtine. Ev teşegirtina naverokî bi hunerên edebî yên wekî manendîn (teşbîh), sparde (îstîfare), nixmandin (kinaye), xaze (mecaz), kesandin (teşxîs), axivandin (întaq), dijberî (tezad), pirsyarî (îstîfham), guncanîti (tenasub) û bi teknîka vegotin ên wekî şayesandin û vebêjîyê (tahkîye) hatîye çêkirin. Herweha di haîkûyan de tişt û heyberên gerdûnê, bi nerînekî felsefîk wekî diyalektîk hatine xuyakirin.

239.	240.	4.
Nizanim rojê	Asîman	Çiqas zirav e
Ji kê şerm kir	dest bi tentenê kiriye	navtenga hîvê
Sorsorkî bûye rîyê wê	sîxa wê reng-payîz	pif bikî dê hilweşe

468.	45.	75.
Berdestê sibê	Ji gulokek qîr e	Xem nîne
stêrkan jî bar kir kuro	gerdûna kerr û lal	xem û xweşî jî
lê hê tu hişyar	li nivê şevê	birayên hev in li gerdûnê

Sirûşt, di haîkûyan de bi hêmanên xwe yên sereke yên wekî ewr, baran, berf, ba, bager, xwisî, çîya, deşt, behr, çem, robar, gelî, berî, ax, erd, parzemîn, berwar, kanî, av û hwdê re reng û dengê xwe yên şênber û xwerû bi rêbazên torîawase û şaseîyî hatine nîşanîkirin. Tişt û heyberên sirûştê di haîkûyan de bi rêya sehek û hestan re hin carinan bi awayekî vekirî hin carinan bi awayekî veşartî hatine pevgihandin. Herweha sirûşt û hêmanên wê bi şewaza rengvedanî di haîkûyan de hatine amajekirin. Ji alîyêkî dîtir ve haîkûnûs Bereh, hest û hestgermîyên xwe yên li hemberî sirûşt û hemanên wê jî li gel vegotinên razber û metaforîk derbirîye. Ji xeynî van, haîkûnûs jî deng û dengê olana tişt û heyberên xwezayê (onomatopoeia) jî sûdê wergirtîye.

15.	368.	139.
Sirûştê kirasê xwe guhert	Şevên dirêj	Ji vir dixuye
qijak jî hatin	ewrên qirêj	dûkela robarî
ox! te xwar!	Bayî dîsa gurr kir gotûbêj	pêtûyên axê jî
61.	55.	116.
Çiyayê porspî	Hûrik hûrîk dibare	Orora golikan
hêdî hêdî digirî	ser birîna min	zirzira keran
êêê! Kal bûn zor e	berfa nûzayî	xêra vir jî nema

Di berhemê de haîkûyên ku wekî tematîk gerdûn û sirûştê kirine mijara xwe weha hatine rêzêkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
bayê şewîşî, heyv, gobilandina bayê, navtênga hîvê, ba, esmanê xûz, ewrên rûtirş, stêrkên kal, ‘ewr, rûyê avê, kanî, xunav, çem, ewrê spî, sirûşt, esman/asîman, ewrên reşbelek, hilbehiya ewr, çiya, berf û bager, baran û berf û bahoz, berf û pûk, gerdûna kerr û lal, stêrk, bayê bifîqîn, daristana dêrîn, baran, roj, stêrka sibehê, çiyayê porspî, tîrêj, gerdûn, ax, tavehîv, zinarên şil, pozê çiyê, kulma rojê, nîveka esmên, deşt, sûlav, tipîsk, quntara çiyê, kirasê çiyê, rûbar/robar, heyva ‘enirî, rûyê esmanî, delingê esmên, şevgeş, av, çiqilê çiyê, heyva zîz, stêrkên koçber, pêçeka çiyê, kendal, ‘ewrên sing-sorînî, behr, tipîskên bêriyê, bager, heyva nû, bayê ziryanê, ewrê/n reş, tavsork, şalê çiya, bareş, pêlên rûbarê, teyr, ewrê tolaz, lamên çiyê, pêl, govenda tîrêjan, avzêm, dilqê çiyê, ewrên zêrîn, keysera tîrêj, tav, bayê çermisor, tipîskên baranê, heyva nîvçe, gol, derx, pesarên çiyê, çemê zîvîn û peng, çemê xwaro-vajî, ziryan, heyva zelal û topikî, kembera çiyê, teyrê necis, koyistan, zozan, esmanê tarî, asîmanê rûtirş, lehî, bagera çilek, bayê bêhê, asogeh, newal, çal û kortik, ewrên qirêj, pêlên avê, berri, mija hilkişiya, çiyayê gewr, polên çiyayî, devî, tîna rojê, şirşira avê, heyva kul, bagera bi mij, mij, heyva nû zayî, gelî, esmanê peng, reqsa stêrk û heyvê, sebra heyvê, siha ewrî, mij û moran.	1, 2, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 14, 15, 18, 19, 21, 23, 24, 25, 28, 30, 31, 32, 35, 38, 39, 40, 45, 46, 51, 52, 58, 59, 60, 61, 64, 66, 73, 74, 75, 79, 81, 85, 86, 91, 92, 93, 94, 107, 113, 114, 117, 121, 122, 127, 132, 138, 139, 142, 144, 147, 148, 149, 150, 159, 161, 163, 164, 172, 174, 180, 195, 198, 208, 217, 221, 223, 224, 225, 227, 229, 232, 235, 236, 239, 240, 244, 245, 246, 247, 248, 249, 250, 251, 255, 256, 259, 261, 262, 264, 265, 267, 270, 274, 275, 276, 277, 278, 279, 280, 281, 283, 284, 289, 292, 293, 296, 300, 301, 303, 306, 308, 319, 320, 321, 323, 327, 328, 329, 333, 337, 340, 343, 344, 348, 349, 351, 354, 359, 367, 368, 369, 370, 373, 375, 376, 377, 379, 385, 386, 391, 397, 399, 402, 403, 404, 405, 406, 407, 408, 409, 412, 413, 416, 417, 418, 420, 436, 446, 447, 448, 452, 453, 454, 456, 457, 460, 463, 464, 465, 468, 471, 472, 473, 475, 481, 484, 487, 488, 490, 491/1, 491/2, 491/3, 491/4, 491/5.

2.1.2.2. Demsal

Hem di haîkûyên klasîk de û hem di haîkûyên modern de yek ji hêmanên herî hatîye bikaranîn, demsal û bêjeyên şanîderên demsalê (kîgo) ye. Bereh jî, wekî rêbaz di haîkûyên xwe de herî zêde cih daye demsal, hêmanên demsal û şanîderên wê. Haîkûnûs, bi rêya rêbaza kîgoyê taybetmendîyên demsalan li gel zimanekî lîrîk bi me dide hesandin. Li gel van, di haîkûyan de hem wateya rastîn û hem wateya mecazî yên demsalan hatîye xuyakirin û pêhesandin. Navên demsalan, di haîkûyan de an rasterast hatine dayîn an jî bi awayekî nerasterast ango bi şanîdereka demsalî re hatîye nimandin.

Bo nimûne bêjeyên wekî “beq, giya, adar, pel û belçimên hêşîn, behîv, wîçewîça çûkan, şîreşîre robar û çeman” demsala biharê; “lavlavka har, kelmêş, şevgeş, sîsirk, reqsa stêrkan” demsala havînê; “ewr, hehecik, pelên hişk û ziwa, dara pelweşîyayî, mij” demsala payîzê; û “berf, nîska kel, qirpînîya êzingan, bahoz, qeşa, sobe, lerizandin û recifandin” jî demsala zivistanê îşaret dîkin. Herweha di haîkûyekê de du demsal an jî şanîderên wê jî bi hev du re di heman demê de hatine bikaranîn. Di berhemê de herî zêde demsal û kîgoyên biharê hatîye bikaranîn û li pey wê payîz, zivistan û havîn.

88.	99.	133.
Guregure biharê ye masî diçêrin li xewna min	Dimilmilin gulgenimên hêşîn li ber bayê êvarê	Lavlavka har havîn û ken jî hişk kir ji zexeliya xwe
21.	25.	76.
Payîza rûzer ewrên reş-belek û te çi hêla l’du xwe	Dadiweşîne pelên bîyê berf û bager bi qebale	Berfê bang kir adarê; bi xatirê te heta salek din

Haîkûyên demsalî ango kîgoyên ku di haîkûyan de derbas bûne, demsal bi demsal bi vî awayî hatine senifandin:

Demsal	Kîgo	Hejmara Haîkûyan
Bihar	rûbar, beqê zîz, belçim û giyyayên kubar, ba, kanî û çinar, xunav, quling, ewrê spî, kiras guhertina sirûştê, qijak, kêzik, çem, orîna gayê, qareqara qijakê, ewr, çiqîlê tûyê, kanî, adar, çîlqên biharê, ji xew rabûna axê, heyne fir û gerê, bihara derengketî, darbehîva bûk, pelê xwîsî, dara gwîzê, guregura biharê, çêrandina masîyan, zinarên şîl, qerweşa esmên, çivîk, pelên tûyê, nikulê qumrîyê, xurika şîl, boşelan, adar, gulyê darê, gulgenimên hêşîn, kitik û behîv, kirasekî tarî-hêşîn, sûlav, tipîsk, oraora golikan, zirzira keran, firfirok, pîvaz, dar, dengê beqan, bihar, bî, kulîlk, çinar, çûkên noqar, hehecik, dîreg, kelmêş, legleg, beq, ker, pinpinîk, şûhla gulê, bişkulên şîl, pepûk, xalxalok, şitlek xesî, qumriya har, qumqumok, masîyê singispî, dara bejnkin, tipîskên bêrîyê, spîndar, masiyên şebot, pirpar û kereng, pêlên rûbarê, avzê, mar û pûng, baran, kezîyên şîl, şopa qulingan, çûkên şîngurze, şînbûn, bizir, gul, şûnpîyên qumrîyê, bizin, derx, tora tevnepîrê, ava şîreşîr, bêhna toraqê, mêt, koyistan, deşt, zozan, wîtewîte çivîkan, kevok, robar, reşmêrû, qazquling, quling, spîndara çirçûk, çiqîlê darê, qumrî, ax, konserta çûkan, wîçewîça çûkreşan, dumeqesk, şîrşira avê, wîtwîta beytikan, çiqîlê spîndarê, behîv, bûka salê, bilbil,	2, 6, 10, 12, 14, 15, 16, 20, 23, 49, 64, 69, 73, 74, 76, 80, 81, 82, 83, 85, 86, 88, 89, 90, 91, 95, 96, 97, 98, 99, 106, 108, 113, 114, 116, 117, 118, 120, 126, 128, 130, 131, 140, 141, 143, 146, 148, 149, 152, 157, 171, 175, 176, 177, 180, 183, 197, 201, 202, 203, 205, 212, 217, 219, 236, 251, 254, 256, 261, 266, 267, 272, 273, 277, 279, 281, 283, 288, 289, 293, 296, 297, 301, 304, 306, 309, 314, 318, 321, 322, 323, 329, 336, 341, 348, 353, 364, 367, 373, 374, 375, 383, 386, 387, 390, 392, 393, 413, 419, 423, 424, 432, 434, 451, 459, 460, 462, 463, 470, 473, 481, 483, 485, 486, 490, 491/(5).

	dengê se û beqan, qurqura beqê, simbil, çûkên teql-avêj, çûk, reqsa kevokê, baz, tiliyên bîyê, xuşîna avê.	
Havîn	şîregerm, tîna axê, xwîdana pelên tûyê, dartû, moz, civtên mişmişan, dargerînk, sîsirk, lavlavka har, havîn, havînî, dûkela robarî, kelmêş, alîsore û zebeş, şikêvlato, siya hespî, catir, şevgeş, genim, çavên sîsirkê, rengê tûreşê, bender, heyranok, pale û melûvan, tûreş, pale, mêş, mehîr, sorsorkî, darhinar/kulîlka darhinarê, hêjîrên dêrîn, tenûra rojê, bayê çermsor, dojah, dartû, xêzikek spî, dûvmesas, pelê tû-lavlavkê, asogeha tenûra sor, çûyîna biharê, ba, paqijkirina tûyê, siha tûyê, hejmartina stêrkan, reqsa stêrkan,	5, 94, 95, 109, 110, 111, 123, 124, 133, 138, 139, 141, 142, 144, 151, 154, 159, 181, 184, 185, 204, 213, 232, 233, 234, 235, 237, 238, 239, 241, 251, 265, 276, 322, 326, 330, 332, 337, 349, 367, 374, 399, 401, 442, 447, 449, 465, 482.

Payîz	Ewrên rûtirş, payîz, girîna ewran, pelên ziwa, toz, baskên hişk, pelê zer î beloq, kirasê sirûştê, hatina qijakê, bayê şemetok û xinzir, payîza rûzer, ewrên reş-belek, gula caferî, zerîkî, qareqara qijakê, çiqîlê hişk, bêsihî, pencên tariyê, lerizîna tîrêjê, pepûk, qijik, mar, çiqîlê çiyê, çiqîlê sincê, pelê xeyidî, kevz û sorbûna kendalê, mirina marî, pelên reng-pirteqal, miçiqîna rûbarî, neqayîlbûna esmanî, bender, pale, tavsork, bişkoja berûyê, reng-payîz, darhinar, şilbûna berrîyê, sênca ber pêla, tîrêjên zer û lerzok, kufekufa axê, kew, tivîlk, pêlê sorgewez, hinar, mêşa xewarî, dengê kelmêşan, zirgul, teyrên quşpene, çemê xwaro-vajî, gihûj, hêvrist, kembera çiyê, destên gwîzê, porkur, pelên zer î şimayî, asîmanê rûtirş, lehî, pelê ketî, bayê bêhê, pelên şimayî, savara kelandî, baran û bahoz, şopa kelmêşê, baz, mij, şîna dumeqeskan, ewr, dara pelweşiyayî, bayê jor, ba, nêçira seyê, bédengîya tîrê, mij û moran,	7, 8, 9, 10, 12, 13, 15, 19, 21, 48, 49, 50, 56, 65, 66, 162, 174, 179, 191, 195, 196, 198, 215, 224, 225, 234, 235, 240, 241, 244, 246, 248, 250, 270, 274, 275, 285, 286, 287, 291, 292, 296, 298, 299, 303, 319, 336, 339, 340, 344, 346, 359, 371, 372, 385, 393, 402, 403, 416, 446, 448, 452, 453, 454, 488.
-------	---	---

Zivistan	çira, berf û bager, berf, êzing, kûlîlkên rû- virnî, baran û berf û bahoz, doza esmên, berf û pûk, lerzîn, recifandin, kaj, nivîn, spîndara bêgore, bayê bifîqîn, revdeyek gur, berfa nûzayî, xwelîya sobê, qerisîna peşkan, tûya rûreş (ewrê reş), çiyayê porspî, şevên sar, çiziya berfê, destên kajê, ziryan, bazîna berfê, zerzûlek, bager, bayê ziryanê, pace û derî girtin, bareş, ziryan, nîska kel, zivistan, bagera çilek î ziravok, sira sibê, şevên dirêj, ewrên qirêj, recifandina heyvê, ewrê reş, recifandina reşêleyan, soba karebê, bagera bi mij, tîna sobê, qeşa, barîna berfê, Erzirom.	1, 17, 25, 27, 28, 29, 30, 32, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 42, 43, 51, 52, 55, 57, 58, 59, 61, 67, 68, 76, 80, 98, 117, 192, 193, 194, 221, 227, 228, 236, 300, 307, 314, 343, 345, 368, 369, 376, 379, 388, 420, 421, 445, 450, 458, 463, 464.
----------	---	--

2.1.2.3. Zeman û Mekan

Tevî ku bi kurtbûnîya xwe ve bikaranîna têgihên zeman û mekanê di haîkûyan de gelekî berçav in. Nîşanîkirin û biyekparebûna zeman û mekanê haîkûyê ji cureyên helbestên din vediqetîne û wekî helbesteka “niha û liha”yê tê dîtin. Bi qewlê Berehî (2017: 5) haîkû dibe helbesta kêlikê ango ya “aniha”yê û herwisa wêneyê wê/vê kêlikê.

Bereh, gelek haîkûyên xwe bi vê feraseta balkişandin, guhbelkirin, çavdêrîkirin û nîşankirina yekpareyîya kêlik/niha û liha/şûnwarê nivîsandîye. Haîkûnûs bi sehkirin û hîskirina wê wêneyê kêlikê re haîkûxwînên xwe pêdihesîne. Ji xeynî van, bûyîna wî ya li welatek, derûdorek, bajarek, malek û odeyekê û herweha herîkîn, hatin-çûyîna demê di wî de hest û hestgermîyên têvel çêkiriye, bi vî awayî haîkûyên xwe yên zemanî û mekanî diristîne. Carinan di haîkûyan de mekanek dibe sedema acizî, diltengî û xemgînîyê, car carinan jî dibe dîlfîrehî, aramî û kêfxweşîyê.

Herweha têgiha zeman-kêlikê jî di haîkûyan de hestên bi vî rengî derdixîne holê. Herîkîn û îzafiyeta demê di heman awayî de hem tîrbûnîya hest û hestgermîyê

çê dike û hem jî guhêbarîya hîsan pêk tîne. Di haîkûyên wî yên zeman û mekanê de lê hûrbûnîya hişî jî cihekî giring digire.

20.

Kêzik jî delal in
ber destê êvaran
li ber dilê min

22.

Zengilê xewê
ji mêj ve ye naşixule
li oda min

160.

Tenê ne şî'r e
jiyan bi xwe haiku ye
li welatê min

168.

Dem;
kevanekî vekişî ye
di orta şev û rojê de

485.

Va mêş dîsa hat
çi hebê li ser sifrê
yek bi yek tam kir

490.

Tiliyên biyê
daqûlî avê bûne
kûçik jî l'gel wan

Di berhemê de haîkûyên ku zeman û mekanê kirine temayên xwe weha hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
şev, rûbar, êvar, navtenga hîvê, ji nik te, rê, li esmanê xûz, rûyê avê, kanî û çinar, di navbera me de, li ser şaxê tarî, par, li ser çiqilê çem, sirûşt, li ser xêza teyarê, goga li esman, ber destê êvaran, li ber dilê min, l'dû xwe, ji mêj ve, li oda min, xew, zaroktî, çiya, çarlepki, li cihê xwe, l' eniya min, ji dinê, rûyê esmên, li salnameyê, li lûtkeya çiyê, îro, şeva şemûz, kolan, di bin berfa tê de, her dem, li ber dilê heyva 'evdal, li ber dilê kaj, di nivînê de, di bin berfê de, ji berbangên vî bajarî, gerdûn, li nivê şevê, ji esman, piştî te, roj baş, li ser çiqleke hişk, li ber serê min, daristana dêrîn, di kompûterê de, ser birînê min, li vir, sibê, di vê şeva zîz de, stêrka sibehê, çiyayê porspî, li vira, ewrê li bin heyvê, di pencên tariyê de, li bin baskên qijakê, di şevên sar de, li navbera destên kajê, li çiqilê tûyê, ji kanîya te, vê salê, li gerdûnê,	1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 9, 10, 11, 12, 13, 15, 16, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 26, 27, 28, 29, 31, 32, 33, 34, 36, 38, 39, 40, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 49, 50, 51, 52, 54, 55, 56, 57, 60, 61, 62, 64, 65, 66, 67, 68, 69, 70, 73, 74, 75, 76, 78, 79, 80, 81, 82, 84, 86, 87, 88, 89, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 97, 98, 99, 100, 102, 103, 104, 106, 107, 108, 110, 111,

salek din, ew sal, ji zaroktîya min, bihar, heyra fir û	112,	113,	114,	115,
gerê, bihara derengketî, li pişt qenterê, li ser dara gwîzê,	116,	117,	118,	120,
salan bi leylî, li xewna min, dest, zinarên şil, j' guhanên	121,	122,	123,	125,
demê, esman, beriya rojê, pozê çiyê, li nîveka esmên,	126,	127,	128,	129,
pelên tûyê, li boşalena gund, adar, li ber bayê êvarê, bi	130,	131,	132,	133,
şev, xanî, tam di vê saetê de, di çavên te de, niha,	134,	136,	137,	138,
berbang, îsal, emr, deşta li jêr, li ser kompûterê, ji êvar	139,	140,	141,	142,
de, ji vir, li binaniya xewnekê, sûlav, li ser bircên şevê,	143,	144,	148,	149,
li ser rûyê avê, hê, xêra vir, quntara çiyê, taştê, firavîn û	150,	154,	155,	157,
şîv, li biharê, li paş hêwirzeyê, di govendê de, şûn de, li	158,	159,	160,	161,
kadîna tarî, deh sal, havîn, her di destê êvaran de, di	162,	163,	164,	165,
destê pîrê de, dem, heyva li raser, ji nişka ve, li ser	167,	168,	170,	171,
dîregê, mal, şûngez, li perwazê, li ser minarê, di tenûra	172,	173,	174,	175,
xewê de, rûyê esmanî, nîvro, ber bi çiyê, delingê esmên,	176,	177,	178,	179,
li bin siya hespî, li pesarê dil, tam, şevgeş, li welatê min,	180,	181,	182,	184,
li esmên, çem, kon, ax, li vê dogehê, welat, di orta şev û	187,	188,	189,	190,
rojê de, daristan, di şiverêyan de, li nav avê, di hundirê	192,	193,	194,	195,
min de, li çiqilê çiyê, li ferhenga min, li ser çiqilê sincê,	197,	198,	199,	200,
ji guhanên şevê, ser vî dilî, tenûr, temen, ji îro pê de, li	202,	203,	206,	207,
bin baskan, kendal, ber jor, payîz, li ser çiqilê, hundir, li	208,	210,	211,	212,
nav milên min, li ber behrê, li ser çiyê, ser rû, bihuşt, l'	213,	215,	216,	217,
behçê dilî, parzemîna kifşnebûyî, hezar sal, razên l'şeva	218,	219,	220,	222,
tîr, li guliyê te, tilî, heban, di helbestê de, di dilekî de,	223,	224,	225,	226,
kêlik, mêvanîya vî dilî, têla telefonê, li wir, rûyê te,	227,	228,	229,	231,
bênder, şalê çiya, pêlên rûbarê, deriyê bênderê, di vê	232,	234,	235,	236,
xelayê de, rûyê rojê, asîman, reng-payîz, di nava biska	237,	238,	239,	240,
şevê de, ber pêl, pişt ewr, li ber pozê pencerê, li ser riya	241,	243,	245,	246,
xortanîyê, tiliyên di nav şeva tîr, hundirê min, li	247,	248,	250,	251,
himbêza hev, di beyaniyê de, li ser destê min, beri	252,	253,	255,	256,
zayîna rojê, li bin pirsek spî, li berwaran, piştî baranê,	257,	259,	260,	261,
berî ku biçe, çil sal, li ser piştê, li pişt hişê, şopa	262,	263,	264,	266,
qulingan, berî ku bimre, ji kaniya kal, li ber şibakê, di	267,	268,	269,	271,

bin hişê min de, war, di hundirê min de, li ser têtê, şevê	272, 273, 274, 275,
ro, li ber bayê, li bin esmanê pir kevn, şûnpiyên	276, 277, 278, 279,
qumriyê, îşev, di vê saetê de, li rûyê golê, borîna salê, li	280, 281, 282, 283,
ser pîja pênûsê, li giharên berbangê, derx, li vê dinê, li	284, 285, 286, 287,
berkûrka berbangê, li pesarên çiyê, felek, li odê, li	288, 289, 290, 291,
kolanê, sê sal, îsal, derî, fotograf, çolbir, li kembera	292, 293, 295, 296,
çiyê, li nav pêlên zîvî, d'ber avê, şevederî, çiqên	297, 298, 299, 300,
berûyan, beriya xanî, zivistan, rojek, êvara şirikî, li ser	301, 302, 303, 304,
sifra l'hewşê, destên gwîzê, li vê koyistanê, bakur,	305, 306, 307, 309,
başûr, rojhelat, ban, deşt, zozan, di navbera me de, di	310, 311, 313, 314,
navbera dîrek û dartûyê de, di tariyê de, esmanê tarî,	315, 317, 318, 319,
nîvê şevê, li hewşê, pelê li ser çem, li dîwêr, şibak, li ser	321, 322, 323, 325,
ban, salek, asogeh, li berriyê, newal, li pişt çeperên şevê,	326, 328, 329, 332,
çal û kortik, li deşta hebûna te, çil sal, perdeya şanoyê, li	333, 335, 336, 339,
ser sifre, li vê pesarê, li saqê, li qirikê, dema çûyîna	340, 342, 345, 346,
biharê, şevên dirêj, pêlên avê, di ber hev de, li ser rû,	347, 349, 351, 354,
berî êvarê, şeva çikspî, di berriyê de, ji asoya min, li	357, 358, 360, 362,
cem te, ber êvar, rûkê pencereyê, li ser eynî çiqê darê,	363, 364, 365, 366,
daristan, li bexçê dil vebûyî, l' ber soba karebê, vê	367, 368, 369, 370,
kêlîkê, li ser çinarê, li ser lêvên te, ji êvarî ve, li eynî	371, 372, 373, 374,
odeyê, ji nav polên çiya, li nav deviyê, d'ber milê te re,	375, 378, 379, 380,
ji şeva têhnûyî, heyva li jor, li cem berberan, kolana di	381, 382, 383, 384,
xewê de, heyva li raserî te, vê saetê, ji behra çavan, bayê	385, 386, 388, 389,
ji jor tê, şeva li ser robarî, ji roja roj de, sersalek din,	390, 391, 394, 396,
wêne, derengî şevê, lempeya li kolanê, li ser çiqê	397, 398, 399, 400,
spîndarê, j'dara umrê min, vê spêdeyê, li vê pesara	401, 402, 403, 404,
derew, behîva li bexçê, bûka salê, li ber 'eyneyê, li pişt	405, 406, 407, 408,
ewran, di ro de, dinya, di şeva bêdeng de, li 'eynê, bajêr,	410, 412, 413, 414,
li bajêr, li ser dîwêr, li ser berfê, ber bi gund, wextê	415, 416, 417, 418,
malê, li gelî, qerecdax, li derve, Wan, li esmanê peng,	420, 421, 422, 423,
gom, li Erziromê, li ser Behra Wanê, berdestê sibê,	424, 425, 426, 428,
dema çûyîna ewran, di çem de, li şaneşînê, ji nav	432, 434, 436, 437,

diranan, ji nav lêvên min, di nav pelên raserî, ji ser daristanê, çav, laş, l'gel wan, wext nîvê şevê, gund.	438, 439, 442, 443, 445, 446, 447, 448, 449, 450, 452, 453, 454, 456, 457, 458, 461, 462, 463, 464, 465, 468, 470, 472, 473, 476, 479, 480, 481, 484, 485, 487, 488, 489, 490, 491/1, 491/2, 491/3, 491/4, 491/5.
--	---

2.1.2.4. Civak û Mirov

Bi giştî haîkû ya ku li gel modernbûnê naveroka xwe berfirehtir kirî, ji bilî sirûşt û demsalan temayên civakî jî kiriye mijara xwe. Li gor Berehî (2017: 5) taybetîya herî girîng a haîkûyan xîtabî însên dike, car bi pêşniyazan, car bi hizrên derheqa reseniya sirûşt û însên de. Ji ber vê yekê ye ku di berhemê de hin haîkû li ser çand, rewş, qewimîn, liv û tevgera civak û civaka kurdan hatine ristesazkirin. Bereh, di haîkûyên xwe de cih daye bûyerên berê û rojane ku di nav civaka xwe de hatîye qewimandin, awaya jîyîna kurdan, hêmanên folklorîk ên wekî xwarin, vexwarin, cil û berg, gotinên rojane, gotinên gelêrî.

Li gel wan têkîlîya di nav mirovan de wekî hevaltî, cîrantî peyda bûne, kesên naskirî, amrazên ku mirov pêdîvîya xwe pêk tînin, mijûlayî, hêvî, azadî û gelek mijarên cihê bi hêmanên sirûştê re hatine pêwendîdar û bi vî awayî di haîkûyan de cih girtine.

69.

Li çiqêlê tûyê
çendek qijak
ji La Fontaine pir hez dikan

118.

Mast, savar û dims
taştê, firavîn û şîv
-pîvaz ne be na

144.

Rojê
di tenûra xwe de peht
alîsore û zebeş-noş!

156.

Ji ber êşa gel
min xwe ji bîr kir
ti car dor nehate min

233.

Bi heyranokan seyand
pale û melûvanan
tîna xwe

461.

Temo, ez û Kawa
şî'r û stran û Wan
gelo kî ye zava?

Di berhemê de bi giştî haîkûyên ku bi civak û mirovan re eleqedar in, ev in:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara haîkûyan
çira, kilkirin, cîran, zengil, zarok, mêr, çarlepki, zaroktî, sêhr, salname, mast, azadî, xaçepirs, parsek, çarîk, mêvanî, bûkeke ciwan, 'evdal, nivîn, gore, bêhna sêva tirş, zarok, dengê kilamên rûreş, mala minê, şivan, kompûter, qelî, jin, xweliya sobê, kalbûn, kodik, La Fontaine, bertîl, galûk, hêlepepana, merş, govend, zava, bûk, qenter, qerwaş, cam, balafir, hevaltî, xelk, heft xewn, malmîrat, kiras, pênuş, name, savar û dims, taştê, firavîn û şîv, dahol û zirne, peyv, kenê zarokan, destê pîrê, dîreg, minare, tenûr, sinfonî, deling, gel, lembeya kolanê, haiku, şî'r/helbest, leşkerên biserpûş, kon vedan, xewn, stran, rojî û nimêj, ferheng, dildar, çîrok, lezeleza mirovan, temen, qelem, tîp, lênûsk, henekî, hespê helbestê, heban, du esmer û tîrek, şîn, kes, pîrbûn, têla telefonê, heyranok, pale û melûvan, mindal, pale, xela, tentene, sîx, koro, şevçirax, teşîrîs, ducanî, kur, keç, xortanî, xewnên spî, tilî, xefk, paldayîn, kezî, kafir, xew, bîranîn, kaniya kal, pîja pênuşê, gihar, desmal, xwedê kerîm e, fotograf, gavan, naskirina kesan, mirov, hogirê tariya xwe, sifre, teyara xelkê, qehweşîr, balafir, vetire karwan, şîbak, savara kelandî, şîr û mast, mêvan, mazûvan,	1, 3, 17, 22, 24, 26, 27, 30, 31, 34, 35, 37, 38, 39, 40, 42, 43, 44, 47, 51, 52, 53, 54, 56, 57, 61, 63, 69, 70, 72, 79, 81, 83, 84, 91, 95, 97, 100, 102, 105, 107, 108, 110, 112, 115, 118, 119, 123, 127, 135, 136, 140, 143, 144, 146, 149, 150, 153, 156, 158, 159, 160, 161, 164, 165, 166, 167, 178, 184, 186, 187, 188, 189, 191, 200, 205, 207, 209, 210, 211, 214, 215, 217, 220, 222, 225, 227, 233, 234, 237, 238, 240, 242, 243, 246, 247, 251, 252, 257, 261, 265, 266, 267, 268, 269, 279, 282, 286, 287, 289, 295, 302, 308, 315, 316, 318, 320, 321, 330, 345, 346, 347, 350, 354, 355, 356, 357, 358, 360, 362, 363, 364, 365, 371, 375, 381, 382, 386, 388, 390, 394, 395, 398, 400, 406, 408, 410, 411, 414, 415, 417, 418, 421,

hemet, çeper, lûtkeya gotinê, peya, siwar, çil kezî, perdeya şanoyê, şîr-xewn, piyale, saq, bêbav, kezî, şeh, rûkê pencere, pace, soba karebê, konsêrt, rûpel, sed kes, dûyê cixarê, berber, yar, kuştin, pirs li mêjî, wêne, lempe, peyam, diyarî, bûka salê, ‘eyne, zana û nezan, Berken, tîna sobê, bêrîvan, xwarin û axaftin, derew, nexweş, xwarin, Temo, Kawa, simbêl, bîbik, reqs, keçika cîran, tilî, sermest.	422, 425, 426, 427, 431, 432, 433, 434, 439, 441, 443, 445, 450, 451, 455, 456, 458, 459, 461, 462, 465, 466, 467, 468, 469, 471, 472, 476, 483, 484, 488, 490, 491/(1), 491/(2), 491/(3), 491/(4), 491/(5).
--	--

2.1.2.5. Lîrîzm û Pathos

Helbestvan Bereh, bi şêwaza xwe ya lîrîkî di heman demê de wekî haîkûnûs di haîkûyên xwe de jî bi kar anîye. Hema hema di her haîkûyên ku berhemê de bi cih girtine, em tûşî şêwaza wî ya lîrîkî tên. Li gel vê, pathos a ku li pêşberî rewş, bûyer, dîmenê wekî hestên wê kêlîkê derdikeve, jî di haîkûyên wî de gelekî ber çavan in. Hest û dîlîzîya xwe, bi awayekî gur û boş ji haîkûxwînan re dide pejinandin.

Di haîkûyan de bi hestên cuda yên wekî kelecana, heyranî, matmayî, kêfxweşî, dilgeşî, xem, xemgînî, keser, hesûdî, kenîn, ‘enirandin, şermkirin, dîlpêşewitîn û hwd.ê re yên ku herî zêde cih hatine dayîn evîn û tenêti ne. Evîn wekî ku di navbera du mirovan de dibe, di navbera mirov û heyberên gerdûn û sirûştê de herweha di navbera hêmanên sirûştê de jî çê dibe. Di haîkûyan de hestê tenêtiyê ji bo haîkûnûsî carinan dibe diltengî û acizî, carinan jî dîlfîrehî û dîlxweşî çê dike. Bereh, bi rêya hunera edebî ya kesandinê hestên xwe vediguhezîne sirûşt û hêmanên wê.

8.

Ma van ‘ewran
Hestên te dizîne
ji êvar de digirîn

395.

Ev çi tenêtiyek e looo!
zengila wê
ti car lê naxê

401.

Li vir
havîn jî şibiyaye te
bi dudilî dikene

216.

Got ka işq
ya parzemîna kifşnebûyî
ev hezar sal e?

115.

Nameya te
hê germ û dibişire
pêjnên min tevlihev

142.

Lefiya dargerînk
rojê li perwazê
alast ji kêfa

Haîkûyên ku bi giranî tê de lîrîzm û pathos heyî, weha hatine rêzkirin:

Têgih	Hejmara Haîkûyan
Evîn, tenêtî, kelecane, kêfxweşî, aramî, heyranî, matmayî, dilgeşî, xem, xemgînî, keser, hesûdî, kenîn, ‘enirandin, şermkirin, dîlpêşewitîn, diltengî, acizî, dîlfirêhî, dîlxweşî,	3, 5, 8, 10, 11, 17, 21, 34, 35, 36, 38, 39, 40, 41, 42, 44, 46, 47, 57, 63, 73, 74, 77, 78, 87, 89, 90, 94, 95, 97, 102, 103, 104, 112, 115, 127, 128, 129, 130, 132, 142, 145, 153, 154, 155, 158, 162, 169, 170, 173, 175, 176, 177, 178, 181, 182, 186, 187, 188, 189, 190, 191, 192, 193, 194, 200, 206, 214, 215, 216, 217, 218, 221, 222, 223, 226, 228, 229, 230, 231, 232, 243, 249, 253, 254, 255, 258, 259, 260, 269, 273, 278, 280, 282, 284, 285, 289, 290, 294, 295, 300, 302, 306, 310, 317, 321, 325, 328, 329, 331, 334, 335, 338, 341, 342, 345, 352, 355, 357, 358, 360, 361, 362, 369, 370, 371, 372, 374, 380, 381, 382, 383, 384, 387, 388, 389, 393, 395, 397, 399, 400, 401, 404, 405, 406, 408, 409, 411, 412, 413, 414, 415, 416, 419, 421, 424, 425, 426, 427, 428, 429, 430, 433, 435, 438, 440, 442, 443, 444, 445, 452, 457, 466, 469, 474, 475, 476, 477, 478, 479, 487, 489, 491/1, 491/2, 491/3, 491/4, 491/5.

2.1.2.6. Ajel û Riwek

Bikaranîna ajelan, yek ji taybetîyên haîkûyan in ku hebûna wan di haîkûyan de wateyên cihê cihê îma dikin û wekî kîgoyek jî demsalan nîşanî dikin. Di berhemê

de hatin-çûyîn û xuyakirina ajelokê, dengên wan, şikl û şemalên wan, liv û tevgera wan wekî hêma, remz û metaforek, di erka şanîderê de hatine bikaranîn. Di heman demê de haîkûnûs bi vî awayî hestên xwe derdibirîne û bi me dide pêhesandin.

Bi gelemperî ajel û hêmanên wê di haîkûyan de li gor demsalan wekî şanîdera demsalan bi cih girtine. Bo nimûne: “çûk/çîvîk/beytik, golik, legleg, quling, pinpinîk, beq, sivûrî” demsala biharê; “sîsirk, dûvmesas, şikevlato, kelmêş” demsala havînê; “qijik/qijak,” yê payîzê û “zerzûr/reşêle, gur, rûvî,” jî demsala zivistanê nimandine. Ji xeynî van, xasyetên wan ên xwezayî ji bona amajekirina hîs, raman, jîyîn, rewş, bûyer, liv û tevgerê hunerên edebî yên wekî manendin (teşbîh), axivandin û kesandin hatine bikaranîn.

236.

Çavgirtok dilîzin
bareş û beq
bi pêlên rûbarê re

471

Sîsirk stranan dibêjin
ji bo sebra heyvê
min çi jê

66.

Dilerize tîrêj
li bin baskên qijakê
êvar e tê

379.

Şeva çîkspî
Reşêle direcîfin ax!
Di berriyê de

390.

Konsêrta çûkan
lê kes ji wan naxuye
li ser çinarê

23.

Hilbehiya ewr
çem jî, bi orîna ga
ji xewa şîrîn

Riwek û hêmanên wê wekî remza ajelan di haîkûyan de xwedî cihekî giring werdigire. Hebûn û nebûna wan, taybetîyên wan ên karakterîstîk, hest, dilzîzî û çavdêrî yên ku di ser mirovî de hêlîştîne, temsîliyeta wan ên bi demsalan re di haîkûyên Berehî de jî xwe dide xuyakirin.

Riwek û hêmanên wê yên diyarkirî û sereke di hin haîkûyan de wekî kîgoyên demsalan hatine şanîkirin û bi rêya bikaranîna riwek û hêmanên wê re haîkûxwîn wê demsalê hîs dike, pêdihese. Li gel vê, xasyetên mirovî yên bi piranî jî hîsî û derûnî bi hunera guhêzîya sehekan re ji mirovan ber bi sirûştê ve hatine veguhestin. Herweha wateyên wê yên remzî û hêmayî di haîkûyên haîkûnûsî de xasyetên cîhanbînî û gelêrî yên aîdî gelê wî jî dihevin.

6.	128.	299.
Diberisin	Ev deh sal in	Hêvristê
belçim û giyayên kubar	her şibîyan te	îsal jî ne weşand pelê xwe
ba rê dimale	kulîlkên li vir vedibin	ji rika kajê

83.	230.	251.
Govend e	Masîyên şebot	Li ser riya xortanîyê
darbehîv e bûk, baş e	pirpar û kerengê xwe xwarin	avzêmen zîvîn
lê zava kî ye gelo?	Pîştî te	hêjîrên dêrîn

Wekî ku xuya dibin di haîkûyên 6, 128, 83 û 230an de bêjeyên “belçim, giya, kulîlk, darbehîv, pirpar û kereng, avzê” wekî şanîder li demsala biharê; “hêvrist û kaj” di haîkûya 299an de li demsala zivistanê û di haîkûya 251an de “hêjîr” jî demsala havînê îşaret dîkin. Di heman demê de bêjeyên wekî “berisandin, rik, govend” bi rêya kesandinê xasyetên mirov û civakê reng hatîye vedandin.

Di berhema *Haikuyê* de ajel, riwek û hêmanên wan ên ku ji alîyê haîkûnûs Berehî ve hatine bikaranîn li gor nimareya haîkûyan li jêrê bi vî awayî hatine dabeşkirin:

Ajel	Riwek
Beq: 2, 120, 146, 236, 459, 460, 482. Pepûk: 71, 171, 298. Qijik/Qijak: 15, 16, 49, 56, 66, 69, 162, 296, 314, 315, 378, 412, 434. Kêzik: 20. Quling/Qazquling: 14, 266, 283, 373, 367. Çûk/Çîvîk/Çûkreş/Beytik: 32, 33, 37, 46, 92, 131, 146, 183, 267, 341, 390, 392, 423, 463, 470, Kûçik/Se/Seyê tûle: 54, 490, 124.	Belçim/Pel/Gîya/Tixûb: 6, 19, 85, 191, 198, 311, 339, 340, 346, 481. Darbî/Bî: 25, 47, 126, 296, 490. Kûlîlk: 29, 128, 273, 336, 387. Dar/Şax/Çiqil/Çiqilê Darê/Gulî/GulîyaDarê/Dara

Masî: 88, 212, 230. Qumrî/Qumrik: 96, 202, 213, 218, 277, 383, Kitik: 106. Moz: 110. Ga/Garan: 23, 452. Golik: 116. Sivûrî: 197. Bişkûl (pez): 171. Mar/Reşmar: 162, 196, 224, 254, 370. Xalxalok: 175. Gur: 52, 328. Kew/Marî (mêkew): 196, 270, 324, 416. Hêk (mirîşk): 136, 137. Ker: 116, 149, 196. Pinpinîk: 152, 201, 309. Sîsirk: 124, 181, 204, 442, 471, 482. Şikêvlato/Kûsî: 151, 263. Hehecik/Dumeqesk: 131, 157, 176, 177, 180, 205, 393. Legleg: 140, 143, 148. Dîk/Keleşêr: 124, 147. Rûvî: 147. Kelmêş: 141, 180, 287, 297, 371. Mêş: 238, 286, 318, 451, 458. Hesp: 151, 199, 217, 344. Zerzûr/Reşêle: 192, 193, 194, 379. Qumqumok: 203. Tivîlk: 274. Bizin: 288. Tevnepîr: 304. Kevok: 326, 348, 483. Dûvmesas: 332.	Pelweşîyayî: 12, 13, 50, 120, 164, 327, 383, 403. Çinar: 10, 130, 390, 423. Kaj: 38, 39, 40, 68, 299. Xwîsî: 85. Genim/Gulgenim: 99, 184, 185, 467. Lavlavk/Dargerînk: 123, 133, 142, 337. Spîndar: 43, 219, 279, 313, 375, 424. Darbehîv/Behîv: 83, 97, 106, 432. Gul/Gula Caferî/Gula Pirpizêk: 48, 65, 134, 152, 273. Dartû/Tû/Tûreş: 59, 69, 95, 109, 213, 237, 326, 447, 449. Dara Gwîzê/Gwîz/Gwîza Pûç: 86, 319, 466. Sêv (Sêva Tırş): 44. Alîsore: 144. Zebeş: 144. Catir: 154. Xesî: 183. Pûng: 196, 245. Sinc/Sênc: 179, 246. Simbil: 462. Pirpar: 230. Kereng: 230. Berû: 235, 310.
---	---

Reşmêrû: 353. Mişk: 370. Baz: 372, 486. Bilbil: 434.	Darhinar: 241. Hêjîr: 251. Hêvrist (hevris): 299. Gihûj: 298. Nîsk: 307. Daristan: 385, 487.
---	---

2.2. Morana Gerdûnê

Berhema bi navê *Morana Gerdûnê/Bayê Labûte* yê Kawa Nemirî⁴² di sala 2017an de ji Weşanxaneya Lîsê derçûye. Bi tevahî 300 haîkû, li gel 33 xetên (ilustrasyon) nivîskar û hûnermend Şener Ozmenî di berhemê de cih girtine. Nemir (2017: 3), di destpêka berhemê de wekî jêrenot derheqê serpêhatîya nivîsandina haîkûyan de weha dibêje: “Ji defterên haîkûyan. Di 24ê Gelawêja 2015an de, di Hepsa Midyadê de dest pê bû. 66 hebên pêşîn di hepsê de hatin nivîsîn, yên mayîn li Mêrdîn, Amed, Stembol, Batman û li bajarine din.”

Şêwaza xetkirinê (ilustrasyon) ku wekî rêbaza haîgayî ango ji wêne-helbesta haîkû ya klasîk hatîye sîldwergirtin, ji bona hin haîkûyên berhemê bi awayekî lihevhatî hatine xêzkirin. Bi tu haîkûyan re sernav nehatîye dayîn, li gel vê ji her haîkûyan re hejmarek hatîye dayîn û haîkûyên tê de bi vî awayî hatine rêzkirin. Di destpêka berhemê de haîkûyek ji haîkûnûs Berken Berehî wekî epîgraf hatîye jêgirtin.

Morana Gerdûnê û herweha *Bayê Labûte* jî wekî binenav lê hatîye dayîn, bi giştî ji hêla naverok û wateyî ve hem gerdûna haîkûyên berhemê hem cîhanbînî û poetîkaya haîkûyî yê haîkûnûs Nemirî vedigire. Bikaranîna hunera meremveşêrî (tewriye) ji bona têgihiştina rastîn û mecazî ya navê pirtûkê nîrxandineka duhêlî

⁴² Kawa Nemir (Îdir, 1974): Helbestkar, wergêr, nivîskar û edîtor. Edîtorîya kovara mehane ya bi navê *Jiyana Rewşenê* ya çandî, hunerî û wêjeyî û di pey re jî, edîtorîya kovara *Rewşen-Nameyê* kir. Di sala 2003yan de weşanxaneyeka bi navê *Bajar* damezirand. Wî heta niha berhemên gelek helbestkar, çîroknûs, romannûs, û şanonûsên bijarte yên ji wêje û şanoya îngilîzî, amerîkî, îrlandî û tirkî wergerand. Wî bi tenê ji îngilîzî bo kurdî ji 7000î zedetir helbest wergerandine kurmacî.

derdixîne holê. Navê berhema xwedîyê duwateyî -yan jî pirwateyî ku yek ji taybetîyê helbesta haîkûyê ye- di nava haîkûyên ku bi navê pirtûkê re eleqedar de xwe xuya dikin:

103.	300.	10.
Haîkûya minê!	Min girt nivîsî	Kerengpera jar
Deng î gurr, bejne kinê!	Kulîlkvedana hişyar	Bext kire neqeba xwe
Gerdûna <i>dewwar</i> .	Çilkên gerdûnê.	Bayê labûte

Moran di rastîya xwe de bûyereka hewayî ya sirûştê ye û ji alîyê ûrbûnîya xwe ve ji mijê vekirîtir, zelaltir e. Li gel vê, wekî şanîder (kîgo) jî di haîkûyan de demsala biharê nişanî dike. Morana gerdûnê di haîkûyên berhemê de wekî tevlibûna “hişê kozmîk” ê haîkûnûsî rave dike û di wê gerdûna bi moranîyê de haîkû mîna kulîlkek vedidin. Bêjeya labût/labûteyê term û alaveka cotkarîyê ye ku bêrikeke hesinî ya pir biçûk a misasên cotkirinê ye, li ser serekî misasê ku darekî dirêj ê cotkirinê ye, tê bicîkirin û axa ku di dema cotkirinê de bi gîsinê cot ve dizeliqe bi wê tê paqijkirin. Labût wekî mecazî jî di wateya kes an jî lawirê têwkiriye ku ji ber wê rewşa wê/wî pir lawaz û jar bûye de, tê bikaranîn. Bayê labûteyê jî wekî şanîder û wate hem rewşa livandinê hem rewşa lawazbûnê îşaret dike.

Piranîya haîkûyan ji alîyê ristesazkirin û kîtesazkirinê ve kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî an ku ji 17 kîteyan pêk hatine. Hin bêje di hin haîkûyan de ji ber balkişandin û pêhesandinê hatine îtalîkkirin.⁴³ Herweha di hin haîkûyan de heçkû du kes diaxivin wekî şewaza *gotegot* a wêjeya kurdî ya gelêri hatine honandin. Di navbera hin haîkûyan de li gor hawirdora mijar û temayeka hevpar bi awayekî rengayî hatine honandin. Ev şewê, di heman demê de wekî bersivdayîn jî tê zanîn ku Nemir di navbera haîkûyên 77-78an de bi bikaranîna hunera întaqê “qehweya şevê” dide axaftinê û di navbera wan de haîkûyên rengayî derdikeve holê.⁴⁴ Ji xeynî van, du

⁴³ Haîkûyên bi îtalîk: 34, 49, 103, 114, 157, 227, 260, 288.

⁴⁴ 77.	78.
Qehweya şevê!	Erê, min livand
Gelo te livand dara	parêza li Darzerkê:
ku xuşînî kir?	Min, bê, qehweyê.

rêbazên sereke yên haîkûyê kîgo û kirejî bi feraset û şêwaza Şîkî ya ku felsefeyeka sade û basît ji haîkûyê modern re amaje dike, re di haîkûyan de hatine emilandin.

2.2.1. Vekolîna Teşeyî

2.2.1.1. Teşeya Ristesazî

300 haîkû, bi tevahî ji 9 kêşa kite/hilmên ji hev cuda ve hatine vesazkirin. Ji nehan jê çar li gor 16 kiteyan, yek li gor 18 kêteyan û çar jî li gor 17 kêteyan hatine ristesazkirin. Ji 300 haîkûyan bi tevahî ji 293ê wê ji 17 kêteyan pêk hatine.

183.		2.		7.
Bêtir jî ew çîya;	6	Tûya ku digirî	5	Mozedebeşê keleş 7
mazî'l başkurîyê ne,	7	Hincet e baran	5	Civatê dide revê 7
qut, di ber xwe de.	5	Wer bê xwedî maye	6	Tîrsa zûr 3

Hemû haîkûyên berhemê li gor teşeya ristesazkirin û kêtesazkirinê ve herweha li gor numarekirina haîkûyan weha hatine senifandin:

Kêşa Kîte/Hilman	Hejmara Haîkûyan
4/5/8	8.
4/7/5	49, 284.
5/5/6	2.
5/6/5	125.
5/6/6	18.
5/7/4	75, 164.
6/7/5	183.
7/7/3	7.

5/7/5	1, 3, 4, 5, 6, 9, 10, 11, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65, 66, 67, 68, 69, 70, 71, 72, 73, 74, 76, 77, 78, 79, 80, 81, 82, 83, 84, 85, 86, 87, 88, 89, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 97, 98, 99, 100, 101, 102, 103, 104, 105, 106, 107, 108, 109, 110, 111, 112, 113, 114, 115, 116, 117, 118, 119, 120, 121, 122, 123, 124, 126, 127, 128, 129, 130, 131, 132, 133, 134, 135, 136, 137, 138, 139, 140, 141, 142, 143, 144, 145, 146, 147, 148, 149, 150, 151, 152, 153, 154, 155, 156, 157, 158, 159, 160, 161, 162, 163, 165, 166, 167, 168, 169, 170, 171, 172, 173, 174, 175, 176, 177, 178, 179, 180, 181, 182, 184, 185, 186, 187, 188, 189, 190, 191, 192, 193, 194, 195, 196, 197, 198, 199, 200, 201, 202, 203, 204, 205, 206, 207, 208, 209, 210, 211, 212, 213, 214, 215, 216, 217, 218, 219, 220, 221, 222, 223, 224, 225, 226, 227, 228, 229, 230, 231, 232, 233, 234, 235, 236, 237, 238, 239, 240, 241, 242, 243, 244, 245, 246, 247, 248, 249, 250, 251, 252, 253, 254, 255, 256, 257, 258, 259, 260, 261, 262, 263, 264, 265, 266, 267, 268, 269, 270, 271, 272, 273, 274, 275, 276, 277, 278, 279, 280, 281, 282, 283, 285, 286, 287, 288, 289, 290, 291, 292, 293, 294, 295, 296, 297, 298, 299, 300.
-------	--

2.2.1.2. Kirejî

“Va, han, lê, lo, lê ye, geh/geh, gelo, vê, ev, ho, ha, hoy, ka, wayla, axx, ne heyf, zeman, çawa, heçku, hê, heyirîme” wekî kirejî di nav haîkûyan de cih girtine. Bi van kirejîyan re lêhûrbûn û balkişandina li ser kêlik û dûmenê, nîşanîkirin û pejinandina hestên wekî dudilî, guman, dilşadbûn, heyfa xwe lê anîn, kesirîn, şaşbûn, hêrsbûn, jêkerixîn û hwd.ê hatiye amajekirin. Di hin haîkûyan de kirejî rasterast li ser bêjeyên wekî “ne heyf, zeman, heyirîme” hatiye dabînkirin. Ji bo ku kirpandin û

balkişandin li ser hestan bên kirin, bi rêya van peyvan re dengê haîkûyan hatine birandin.

66.

149.

129.

Gêlaza'l hewşê

Ez kîngê vexwim?!

Li kaşê bazî,

Ev kulîlk 'edû ne ha

Zeman dizane. Zeman?

va, kevoka Fatmayê,

Lêv maç dîkin bê

Rast e ev zeman e.

bi fetil datê.

Bi giştî, kirejîyên ku di *Morana Gerdûnê* de hatine emilandin, li gor nimre haîkûyan weha hatîye rêzkirin:

Bêjeyên Kirejîyê	Hejmara Haîkûyan
va, han, lê, lo, lê ye, geh/geh, gelo, vê, ev, ho, ha, hoy, ka, wayla, axx, ne heyf, zeman, çawa, heçku, hê, heyirîme.	4, 5, 39, 50, 66, 74, 75, 77, 83, 84, 85, 87, 88, 106, 128, 129, 138, 143, 145, 147, 148, 149, 159, 161, 175, 176, 186, 271, 273, 282, 295.

2.2.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî

Ji xeynî bêjeyên kirejîyan, bikaranîna xalbendîyan jî di metnên haîkûyan de bi mebesta veguhestin û rengvedana hest, ponijîn, rewş û bûyeran bi awayekî lihevhatî cih girtine. Herwisa, kirejîyên bi xalbendî di bilêvkirina haîkûyan de da ku bi rengê teqlîdar û stranî bên xwendin, hatine bikaranîn. Di haîkûyan de xal, bêhnok, xalbêhnok, cotxal, sêxal, bendik, pirsnîşan, bangnîşan, pirs-bangnîşan, dunik û apostrof tew yanzdeh xalbendî hatine bikaranîn. Nemir, di haîkûyan de jî nav xalbendîyan zedetirîn cih daye îşareta xalê û bi gelemperî ev xalbendî di dawîya haîkûyan de cih girtiye. Haîkûnûs Nemir, di tercihkirina bi vî rengî de bi giştî yekaneya haîkû ya ku li hemberî tişt, dîmen, rewş û bûyerekê hîs û dîlîzîyê îşaret dike, amaje kiriye.

Îşareta dunikê, hem jî bona nîşanîkirina gotinan ango li şûna xalbendîya xêzikê ku yan kesek an jî du kes di heman haîkûyê de bi şêwaza gotegotî hatine

axaftin,⁴⁵ hem nîşanîkirina ji boyî denge nalîna zarokan hatîye emilandin.⁴⁶ Li gel vê, Nemir, bêjeyên bi apostrof ku bi piranî di pêşdaçek û bazinedaçekan hatina emilandin, ji bo bilêvkirina li gor taybetîya haîkûyan bi peyvên ku li pêşîya wan hatine nivîsandin re zeliqandîye. Ji bo rastxwendin û bilêvkirinê tîpa eynê (‘) di hin resenîya peyvên de hatîye nîşandan.

133.

Nêrî’b selawat,
hate xwarê, ser avê,
xuşexuşe çêm.

146.

Li ber tavikê,
Xanî dibêje Kurdan,
“Dereng e, dereng!”

52.

Qinyat nayê bi
Minminîka matmayî
ji ‘emrê dirêj⁴⁷

Di berhema *Morana Gerdûnê* de kirejîyên bi xalbendî bi vî awayî ne:

Xalbendî	Hejmara Haîkûyan
Xal	15, 19, 72, 78, 85, 86, 89, 90, 91, 92, 94, 95, 100, 101, 103, 105, 106, 107, 113, 121, 122, 124, 127, 128, 129, 133, 139, 141, 142, 143, 147, 148, 149, 151, 153, 155, 160, 161, 162, 163, 164, 165, 166, 167, 168, 170, 171, 175, 177, 180, 181, 182, 183, 184, 186, 189, 190, 191, 192, 193, 195, 196, 197, 198, 199, 201, 204, 205, 206, 207, 216, 217, 218, 221, 223, 224, 227, 228, 232, 233, 234, 236, 237, 238, 239, 240, 242, 243, 244, 245, 246, 247, 248, 249, 251, 252, 253, 256, 257, 259, 260, 261, 262, 263, 264, 265, 266, 267, 269, 287, 288, 289, 290, 291, 292, 293, 294, 295, 296, 299, 300.
Cotxal	76, 86, 100, 114, 134, 155, 164, 165, 168, 224, 227, 236, 258, 264, 269, 270, 271, 272, 300.
Sêxal	88, 114, 137, 159, 178, 180, 203, 242, 258.

⁴⁵ Haîkûyên 15, 19 û 122an bi vî rengî ne.

⁴⁶ Haîkûya 114an.

⁴⁷ Herweha tîpa eyn (‘) di peyvên haîkûyên 4, 32, 66, 69, 114, 132, 141 û 142an de hene.

Xalbêhnok	84, 127, 139, 183, 249, 261, 266, 283.
Bendik	25, 35, 40, 56, 92, 113, 182, 196, 241, 266.
Dunik	15, 19, 114, 143, 146, 258.
Bêhnok	4, 14, 15, 19, 20, 22, 23, 28, 29, 30, 33, 34, 72, 74, 75, 78, 84, 87, 88, 89, 94, 95, 103, 105, 106, 113, 114, 117, 121, 122, 127, 129, 133, 138, 140, 141, 143, 145, 146, 148, 154, 155, 161, 162, 163, 168, 170, 175, 176, 177, 178, 180, 181, 182, 183, 184, 185, 191, 192, 195, 197, 201, 204, 205, 233, 238, 239, 244, 248, 249, 251, 252, 256, 259, 260, 262, 263, 265, 266, 268, 270, 272, 273, 278, 286, 288, 291, 294, 295, 296, 299.
Bang û Bangnîşan	4, 5, 15, 20, 22, 23, 28, 34, 39, 50, 56, 77, 86, 87, 88, 101, 103, 140, 145, 146, 147, 148, 149, 153, 154, 176, 178, 180, 186, 192, 196, 200, 260, 268, 286, 287.
Pirs û Pirsnîşan	3, 5, 14, 19, 20, 28, 33, 44, 50, 56, 77, 84, 85, 87, 99, 122, 128, 134, 138, 149, 150, 160, 169, 190, 237, 286.
Pirs-bangnîşan	149.
Apostrof	11, 19, 53, 55, 61, 66, 76, 79, 84, 94, 101, 108, 133, 140, 141, 160, 163, 168, 171, 183, 190, 198, 202, 219, 228, 234, 243, 246, 250, 252, 255, 261, 264, 268, 269, 274, 291, 292.

2.2.2. Vekolîna Tematîk

2.2.2.1. Gerdûn û Sirûşt

Haîkûyên ku bi gerdûn û sirûştê re eleqedar, bi giştî xwe dispêre liv û tevgerên hêmanên wan ên wekî tav, heyv, aso, esman, erd, bûka baranê, ewr, ba, baran, bager, çem, robar, kanî, qarxûn(lehî), mij, moran, ax, çîya, devî, zevî, berrî, mêrg, deşt, gelî, dol, zinar, newal, şev-roj, berbang. Di haîkûyên Nemirî de gerdûn û

sirûşt, geş û gur in, sewt û dengên hêmanên wan di her haîkûyan de xwedî hay jê bûnek çê dikin. Xasma têgiha gerdûnê wekî metafor ji her haîkûyan re gerdûnek ava kiriye û pê re jî bi awayekî hêmayî her haîkû rewş û livandina gerdûnê nîşanî dike. Bi vî awayî her haîkû dibe “çilkên gerdûnê”.

Li gel vê, haîkûnûs haîkûyê dişibîne “gerdûneka *dewwar*” ango pêreheka ku barê gerdûnê hilgirtîye li ser pişta xwe. Nemir, bi vegotina xwe ya îmajîst gerdûn, sirûşt û hêmanên wana di haîkûyan de dinexşîne, sewt û dûmenan ji bo haîkûxwînan re dide pêhesandin, xuyakirin.

Sewt û dengên hêmanên gerdûn û sirûştê di haîkûyan de cihekî pir giring digirin. Bo nimûne, “sewta qarxûnê” telmîhek, “sewtên qurqurangên zeng” hestekî dilşewat, “sewta bayê tûj” dilsojîyek û ‘inta berrîyê, sewta baranê’ jî hêvî û dilgermîyek çê dike.

103.

Haîkûya minê!

Deng î gurr, bejn e kinê!

Gerdûna *dewwar*.

58.

Xwezeya mirî

Asokî dilewlibe

Li deşta derya

123.

Sewta qarxûnê

Nalenala Zînê ye

Tê jûra vala



Bi giştî gerdûn, sirûşt û hêmanên wan ên ku di haîkûyên berhemê de bûne mijar weha hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
çilka baranê, baran, ewrê şûm, daristan, sîngê zinarê, bayê labûte, robarê xuşxuş, lepên tavsorkê, girê zer dûman, tava tenikhal, hewşa bayê, derya, newqa çîyê, mêrga sivsivî, mij, heyva sotikgeş, ewrên reş-kaw, heyva mirwarî, kanîmija zor, kanîya şîr, ba, esman, ‘inta berrîyê, ewrên xilxime, mêrg, çîyayê kal-pîk, ava heyatê, ewrên gevelorî, tav, bêrm, roya cîrnexweş, devî, gêlî/gelî, devîya mazî, partên ewrên payîzê, bûka baranê, çem, bayê pêt, xwezaya mirî, asokî deşt, berbanga mijê, gelî û geboz, heyv, ax, zevî, çîyayê mirêsdar, sewta baranê, dola zinarên zexel, esmanê gewr, bager, daristana altindar, erd, girê tarî, çîyayê tenê, gerdûna dewwar, aso, bayê çîyê, newal, çîyayên kesk, mija giran, sewta qarxûnê, hateve, çîya, asoya çûr, xuşexuşa çem, erda dêm, govenda esmên, zikê çîyê, bayê tozweşan, barana çîyê, hevnên esmanan, berpal, tav, barana çarşev, şilî, dengê baranê, erda qelişî, delav, çola qaqir, asoya part, deşta bêhteng, palazên erdan, gelîyê tolam girtî, xweza, deşta tarî, zinar, siruşt, robarên har, ava gelîyê asê, ger û guhêrên çîyê, gerdûna hêl, pêşa çîyê, ewrên karwan, pola asoya zer, pîk, çilkên gerdûnê.	1, 2, 6, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 16, 17, 18, 20, 21, 24, 25, 26, 27, 29, 30, 32, 33, 35, 37, 39, 40, 41, 42, 43, 50, 51, 54, 55, 57, 58, 61, 63, 64, 65, 67, 69, 71, 72, 74, 75, 76, 80, 81, 85, 86, 88, 94, 95, 103, 111, 112, 113, 117, 119, 121, 123, 124, 125, 126, 130, 131, 133, 134, 135, 136, 137, 145, 146, 154, 163, 164, 165, 168, 171, 183, 184, 185, 189, 193, 195, 198, 199, 202, 203, 206, 207, 208, 209, 210, 211, 212, 213, 214, 215, 217, 218, 221, 223, 227, 231, 234, 235, 240, 244, 248, 261, 262, 263, 264, 267, 271, 275, 276, 281, 283, 284, 287, 291, 298, 300.

2.2.2.2. Demsal

Demsal û hêmanên wê yên sereke di berhemê de li gor xasyetên rêbaza kîgoyê hatine dirûvandîn. Ji her çar demsalan re cih hatîye dayîn û her demsal hem bi xwedîyê celebên xwe yên xwezayî û rastîn û hem wekî taybetîyên xwe yên hêmayî di haîkûyan de hatine honandîn.

Di haîkûyan de demsala ku herî zêde cih hatîye dayîn demsala biharê ye. Piştî li gor çendanîyê demsala payîzê, zivistanê û herî hindik jî demsala havînê hatîye bikaranîn. Ji hêla çendahîyê ve bikaranîna demsalan hem li hemberî xwezayê nêzîkatîya haîkûnûsî eşkere dike û hem jî poetîkaya wî ya der heqê haîkûyên demsalî de tê xuyakirin. Li gel rasterast bikaranîna peyvên demsalê yên bihar, havîn û payîzê, bêjeyên şanîderên demsalan ji bona hemû demsalan bi awayekî tuwancî hatine emilandin.

Deng û rengên heyberên xwezayê yên wekî riwek, ajal û herweha liv û tevgerên hêmanên wê jî wekî şanîderên demsalan hatine nîşandan. Bêjeyên “xuşxuşa robarê, minminîk, bûka baranê, dûvmeqesk, hêlîn” biharê; “tû, germ, tavsork, pûşper” havînê; “mij, ewrên xilxeme, bayê pelweşanê, asoya zer, berû” payîzê û “bager, kaj, gur, pîk” jî wekî kîgo demsala zivistanê nîşan didin.

49.

Cendirme tèn

Çi govendeke geş e

Li gastîna vêl

265.

Bavo, Pûşperê,

li bine pûş-pelaxan

kurm Wî birr dîkin.

291.

Berê êvarê

bazê pîk bi xwe'r tîne

Çavbijûna xort.



Haîkûyên ku tê de demsal û şanîderên demsalê hatine bikaranîn demsal bi demsal weha hatine senifandin:

Demsal	Kîgo	Hejmara Haîkûyan
Bihar	marmasîya şil, m‘azelîlkê tilîk, gêrik, mirmirkê devzûtik, daristana narewanan, nêrîyê kovî, kerengpera jar, robarê xuşxuş, biskên bîya dûr, darbeyanî, minminîkê beş, daristana nêrebend, mêrga sivsivî, gul, kanîya şîr, ba, kunfeqîrqa mal, mija gelî, porê bîşengan, kulîlkên xoxan, nermebê, minminîka matmayî, bûka baranê, dar, xana çûkan, gula şêstper, gelî û geboz, keçelekundik, gêlaz, kulîlk, gamêş, hêlînên leglegan, zevî, qijik, qund, sewta baranê, berx, çêl, derbihar, devlingsor, biryana teyrar, binevşa şerûd, sardonya, xûrnûk, nermeba, minminîka belek, çîyayên kesk, hêlînên gujgûj, dara gumreh, bihar, kulîlkên ruh, çîya, reh, dûvmeqesk, marê sermedî, xuşexuşa çêm, bafirok û tav, govenda esmên, reh û rîşal, gula bişkivî, moran, gula zîpikê, şax, jûjî, mêrg, baran, takegula şil, şilî, xweza, dengê baranê, xuşxuşa daran, bayê xilxeme, behîv, pel, pez, sivesiva kesk, mêşên hingivîn, robarên har, kufkarikên terr, spîndar, çivîk, dar, bî, mêş, çîçîk, xezaloka kerr, çûka şînxalî, kizwan, esman û eylo.	3, 4, 5, 8, 9, 10, 11, 14, 17, 20, 21, 22, 29, 36, 40, 43, 46, 48, 52, 54, 55, 56, 63, 65, 66, 67, 70, 71, 74, 87, 88, 90, 91, 93, 97, 98, 99, 101, 110, 118, 119, 120, 122, 124, 125, 126, 130, 131, 133, 134, 135, 144, 154, 163, 166, 168, 171, 172, 173, 174, 187, 202, 208, 209, 210, 211, 213, 221, 223, 225, 228, 231, 233, 240, 243, 244, 247, 248, 255, 256, 261, 271, 285, 293, 295, 297, 298.
Havîn	tû, mozadebeşê keleş, germ, baxên hênîk, gonîya çolxerabê, payê pêt, garis, havîna neylon, serban, genim, tîrmeha hişyar, pûşper, pûşpelaxan, aşê havînê, havîna mirî, xirnûf,	2, 7, 16, 19, 27, 57, 59, 60, 136, 143, 191, 265, 290, 299.

Payîz	çilka baranê, kaja nobedar, ewrê şûm, girê zer, xirnûf, payîz, mij, ewrên reş-kaw, ‘inta berrîyê, kanîmija zor, ewrên xilxeme, şiva tirî, rez, dehl, kew, devî, gastîna vêl, dara zeytûnê, devîya mazî, toz, partên ewrên payîzê, xwezaya mirî, qij, ba, ewr, berû, esmanê gewr, payîzde, sênc, qijik, kan, pelweşan, mija giran, mey, tav, hişkbûna dartûyê, sewta bayê tûj, werîna bayê, mazî, bayê tozweşan, qijika kullek, baran, gurregurra daran, beytika bêxew, bêjing, dengê baranê, asoya part, genimê seyfok, xuşxuşa daran, ewrên karwan, havîna mirî,	1, 6, 13, 16, 23, 24, 25, 27, 32, 33, 37, 38, 41, 42, 43, 47, 49, 50, 51, 58, 61, 64, 68, 69, 71, 74, 75, 76, 79, 80, 81, 82, 84, 86, 97, 98, 112, 113, 117, 121, 137, 141, 164, 165, 183, 185, 189, 193, 198, 200, 203, 206, 212, 215, 216, 217, 218, 226, 246, 256, 262, 263, 264, 267, 284, 299.
Zivistan	çîyayê kal-pîk, piştî bagerê, kaj, gurên pişthêşîn, şetele şûhûk, seyê gurêx, qaz, savarok, bager, çira, pîk, gaz û gêdûk	35, 81, 94, 222, 235, 236, 237, 241, 287, 289, 291, 292.

2.2.2.3. Zeman û Mekan

Zeman, mekan û pevgihandina van her du têgihan yek ji taybetîyên cureya helbesta haîkûyê ye. Ev rêbaz di haîkûyên haîkûnûs Nemirî de jî li ber çavan in. Ji alîyekî din ve hêmanên zeman û mekanê bi awayekî berfireh di haîkûyan de cih girtine. Dem, di haîkûyan de bi giştî dema niha ye û kêlik pirî caran zemanê haîkûyê diyar dike. Li gel vê piranîya mekanê vegira gerdûna haîkûyên berhemê jî nîşan dike.

Herçî di haîkûyan de mekan e, her çiqas bi piranî sirûşt û hêmanên aîdî wî bin jî di haîkûyên berhemê de welat, herêm, bajar, bajarok, bendîxane, xanî, jûr, şaneşîn, perestgeh, mizgeft, wekî şûngeh hatine amajekirin. Kurdistan, Mezopotamya,

Amsterdam, Ekbatan (Hamedan), Amed, Bostaniçî, Galat, Mêrdîn, Nisêbîn, Qoser, Gir ‘Herrîn, Axreşk, Qabala, Laleş, Dara cih û warên navên taybet ên ku di haîkûyan de bi cih girtine, wekî mekan hatine nîşankirin.

149.


Ez kîngê vexwim?!
Zeman dizane. Zeman?
Rast e ev zeman e.

258.

Ji Ekbatanê
radigihîne Pound:
“kûçeyên bineqş...”

121.

Êvar hevala
mija giran li gêlî
kerr, bi tilîlî.



Hêmanên zeman û mekanê di berhemê de bi giştî di wekî hêma, remz û metafor bi vî awayî cih girtine:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
hevraz, li kiraşoyê, di camê re, beyanî, fecr, daristana narewanan, li sîngê zinarê kal, dergûşê xilmaş, robarê xuşxuş, li ber lepên tavsorkê, maltenûrka boş, li ser pişt, girê zer dûman, darbeyanî, şev, li hewşa bayî, deryaya şeva şor, dinya, newqa çîyê kul, mêrga sivsivî, şaneşîn, nava çavan, payîz, ji sirsûma qul, heyv, ewr, li ser deryayê, kanîmij, êvara zimrûd, kanîya şîr, esman, keleh, êvar, berî, mêrg, çîyayê kal-pîk, xerzika rezan, welatê xêrzeynet, ewrên gevelorî, bêrma li dehlê, ji nav devîyan, gêlî, li ser maseyê, êvara hênîk, dara zeytûnê, xîreta demê, li birdîyê, li ber xuşxuşê, devîya mazi, toza li palê, partên ewrên payîzê, ji ‘emrê dirêj, perestgeha li ber gerê, dara’l rexê rê, çemê jêr, xana çûkan, xwezaya mirî, li deşta derya, bajar, li baxên hênîk, havîna neylon, ‘l gêlî, gelî û geboz, lûsên li deştê, gêlaza’l hewşê, deşt, weqt, rêya Bismilê, hêlîn, zevî, li ser pizdanan, îsal, çîyayê mirêsdar, li perê bajêr, dola zinarên zexel, li derzerkê, niha’l Axreşkê, esmanê gewr, payîzdeya par, piştî bagerê, li nava rezan, li ser sêncên han, ‘l ser hêkan, daristana altindar, erd, li nava wê girrikê, derbihar, şeva nêhre, li terazinê, li alema bazarê, di nava tarîyê re, li girê tarî, di çîyayê tenê re, li nînegî, Mêrdîn, şevên baskên qer, cîhan, nivê şevê, li banê bêdeng, bi salan, darên li hewşê, gerdûna dewwar, xanîyê dêrin, hewş, Kela Mêrdînê, di birka wê de, ala li jorê, şevên heynîyê, li nava xûrnûkan, li asoyê, li nava zevîyan, çîya, ji jêrê, jûra Şener Ozmenî, li ber bayê, gelî, newal, li nava çîyayên kesk, hêlînên gujguj, li binê dara gumreh, bihar, jûra vala, dereke bala, li dûyê gewr, bi axa berxwedêr de, kafe, li kaşê bazî, li asoya çûr, di nava zevîyan re, li banî, xwarê, ser avê, çem, erda dêm, li wir, li	1, 6, 8, 9, 11, 12, 13, 14, 15, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 24, 25, 26, 27, 29, 30, 31, 32, 33, 35, 38, 39, 41, 42, 43, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 55, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 66, 67, 68, 70, 71, 72, 73, 75, 76, 77, 78, 79, 80, 81, 82, 84, 85, 87, 88, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 97, 98, 99, 101, 102, 103, 104, 105, 107, 108, 109, 110, 111, 112, 113, 114, 116, 117, 118, 119, 120, 121, 122, 123, 124, 125, 126, 127, 129, 130, 131, 132, 133, 134, 135, 136, 137, 138, 139, 140, 141, 142, 144, 146, 149, 150, 152, 155, 158, 159, 160, 161, 163, 165, 166, 167, 168, 169, 170, 171, 172, 173, 175,

destên lêwik, serban, li Mêrdînê, li ber tavê, Nisêbîn, şaneşîna rind, banî, piştî B.'yê, 'l Gir 'Herrînê, li banî, li milê çepê, Mezopotamya, li ber tavikê, zeman, li ber devê, tewleyê, her gav, tim, Kurdistana lal, li vê qefesa bêesman, li tenekeyê, cîyê kursîyan, hê, morana'l jêrê, rozgara qer, duh danê nîvro, ji binê zemanan, deydika'l nava şaxan, Taxa Trafoyê, Qosera bêser, gula'l qorzîyê, 'l qarişî, bendîxane, li Ameda dûr, li Amedê, li goşe, guldank û kûçe, ji lêvên mêran, duh, Amsterdama pîr, Mêrdîna jor, rêla esmên, li hemberî min, li zikê çîyê, li nêv bexçe, li vêrê, li gel fînda berbangê, piştî rojên germ, li pey xwe, li Bostancıyê, çîçîka sibehê, tîrmeha hişyar, li welatê Galatan, roj, caxên hişyar, rêya li ber te, şîjik û hevraz, barana çîyê, bajarê bejî, cîyê pencên min, mêrga'l serfêzê, hevnên esmanan, Kurdistan, li Kurdistana rasteqîn, Qabala, li berpala firk, li ber baranê, rozgar, li verandayê, çola qaqir, barîta li ser hêkan, li asoya part, kotana bi erdê ve, payîzde, li deşta bêhteng, palazên erdan, xanîyên reben, gelîyê tolam girtî, xweza, goma çilmasî, niha, ji xilxile, girê bêxwedî, ji deşta tarî, sihara bedew, dûrgeha nêzik, hêla zinarê, siruşt, hezgeh, li tewlê, odeya şuştî mûştî, tendûra ximximê, robar, derya, berê, pêşîya malê, 'l serên kufkarikên terr, gelîyê aşê, her sibeh, di ber malê re, şaneşîna şil, li nava daran, gildîna jûrê, saeta li ser mêzê, kûçeya'l jêrê, li jêr, qubeya kevir, taq û kutekên demjen, quncik, bi diwarî ve, li ber kûçeya zehf teng, ji Ekbatanê, kûçeyên bineqş, jûr, jor, sîyên berbangê, 'l berpale, ji şev pê ve, nav malê, bayê zemên, akoşkeya serşokê, ji kuncên heyra Bavo, pûşper, li binê pûş-pelaxan, ji duh bi şev ve, şeva kurman, berêvara nerm, rabirdû, hê gava din, Laleşeya geş, ger û guhêrên çîyê, gerdûn, li pêşa çîyê, ji fotrafê min, şeva orxe, li pala asoya zer, bajar, sibeh,	176, 180, 181, 182, 183, 184, 185, 187, 188, 189, 190, 191, 192, 193, 195, 197, 198, 199, 202, 203, 204, 205, 206, 207, 208, 210, 211, 212, 213, 215, 216, 217, 218, 219, 220, 221, 222, 223, 224, 226, 227, 228, 229, 230, 231, 234, 236, 237, 238, 239, 240, 242, 243, 244, 245, 246, 247, 249, 250, 253, 254, 255, 256, 257, 258, 260, 261, 262, 263, 264, 265, 267, 268, 269, 270, 271, 275, 276, 279, 281, 282, 283, 284, 285, 286, 287, 288, 289, 290, 291, 292, 293, 294, 297, 298, 299, 300.
---	--

berbang, lan, li şaneşînê, mizgeft, kêlîyên teral, aşê havînê, berê êvarê, li ber min, ser kizwanê, Laleş, esman, dîyar, havîna mirî, çilkên gerdûnê.	
---	--

2.2.2.4. Civak û Mirov

Di *Morana Gerdûnê* de ji xeynî haîkûyên ku behsa sirûşt û demsalan dîkin, haîkûyên rewş, liv û tevgera civak û mirovan qiset dîkin jî hatine nivîsandin. Haîkûnûs, li gor bawerî, çand, wêje, dîrok, jîyana rojane, axaftin û gotinên rojane yên civaka xwe, haîkûyan honandîye. Herweha yan rasterast an jî bêjeyên ku bi wan hêmanan re têkildar, di haîkûyan de cih daye civak, kesên aîdî wê civakê û bawerîyên cûda yên wekî êzidî/êzidîtî, suryanî, fileh, somerî, galatî, holandî, îrlandî, îngilîzî, amerîkî, kanadî û rûsî.

“Sirsûm, tenûr, çîrok, govend, cin, qesasê kevnar, beraş, bafirok, bilûr, gom, xaliçe, devgem, hût, gaz û gêdûk, çirayên bajêr, şarevanî, kafe, mîkrofon, ksîlofon, bixur, şerab” wekî bêje û hêmanên ku bi civakê re pêwendîdar di haîkûyan de hatine emilandin. Li gel vê kesên naskirî û nenaskirî yên hem aîdî ciwaka xwe û hem ên cihê cihê yên wekî “(M) Cizîrî, (E) Xanî, Şakiro, Selîm Temo, Şener Ozmen, Mazlûm, Fatma, Fîdan, Zîn, Sîyabend, Evdille, Erol, B., Pîra nivêjger; Îsa Mesîh, Îsayê Suryan, Gabî, Îzla, Homeros, (Ezra) Pound, (Îvan) Gonçarov, Matthew Arnold, Şarlo (Charlie Chaplin), Stevie Smith, William Butler Yeats, Leonard Cohen, Gerd Boer û wekî kom jî Pink Floyd wekî nav di haîkûyan de cih girtine.

Nemir, bi şêwaza xwe ya pirhêl û pirreng bi vî awayî gerdûna haîkûyên xwe ji hêla civak, çand, bawerî, kes, kesên navdar û kesên nenaskirî ve berfireh kiriye.

19.

Go, “Dinya ça’n e?”

Go, “Dirrêşika germê

Dirêse germê.”

158.

Mija Şakiro

Xermaneya pîyar e

Kurdistana lal

155.

Stevie Smith:

Kaxiza zer e her car

dibişkive tim.

157.

Bilûra geş î

Learning to flyek î

Pink Floyd î Tu

252.

Îsayê Suryan

Gabî'w keça xwe Îzla,


awêne, kevir.

109.

Pîra nivêjger

Şevên heynîyê mişe

Raxistî li ber



Bi gelemperî di *Morana Gerdûnê* de haîkûyên ku wekî tematîk behsa civak û mirov dikin, weha hatine rîstandin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
civat, labûte, doqik, sirsûma qul, senger a kavil, guhdêr, defîne, çîrok, govenda cinan, find, cendirme, birdî, govend, çirayên bajêr, mala xelkê xirakirin, Kawa, sîloya bajêr, stran, qehwe, helbest, çira, şarevanî, sewta haîkûyan, haîkû, saetên zêrîn, Fîdan, sîxurê terzî, pîrê nivêjger, qewsika lêwîk, qesasê kevna, beraş, aş, naleya zarokan, zarok, Şener Ozmen, wêne, nalenala Zînê, Mazlûm, tîtalak, kafeya belaş, Fatma, peyker, bafîrok, hefsar, serban, mey, B., ‘hurr Somerî, Kurd, mirov, Xanî, Selîm Temo, dover, Matthew Arnold, hevalê Şarlo, Stevie Smith, kaxiz, mîkrofon, Leonard Cohen, bilûra geş, Learning to flyek, Pink Floyd, mija Şakiro, teneke, kursî, titûna Erol, Taxa Trafoye, çerxa etlesê, ritsos, siwar, jin, haîkûya bişkivî, lêvên mêran, şer, Gert Boer, agirkuş, find, gede, dê, sîyabendê bêhevalî, kurê delalî, cax, devgem, helbesta kurdî, heste, qurqurangên zeng, şivan, gulleyên şeşar, Evdilleyê har, gundîyên celeb, William Butler Yeats, derzîya pîlaqê, semerê pezî, nanê genim, tendûr, fayke û şîşik, textîlo, mantroqeya fît, saet, Ksîlofon, Îsayê Mesîh, Îsayê Suryan, Gabî, Îzlaya keça Gabî, awêne, bixur û şerab, şûşeyên vala, Pound, Homerosê pîr, kilam, bilûr, bavo, xalîçe, kur, hûtê hesin, xebat, Cizirî, fotraf, hororyo, oşor, Berpala Gonçarov, rûpel, mizgeft, aşê havînê, gaz û gêdûk, kaxizên spî.	7, 10, 15, 17, 24, 28, 44, 45, 48, 49, 59, 60, 69, 73, 74, 77, 78, 86, 96, 100, 102, 103, 104, 107, 109, 110, 111, 112, 114, 115, 116, 120, 123, 125, 126, 127, 129, 134, 135, 136, 137, 140, 142, 144, 145, 146, 147, 148, 152, 153, 155, 156, 157, 158, 160, 161, 167, 169, 172, 175, 176, 177, 179, 180, 181, 182, 187, 188, 190, 192, 194, 195, 196, 201, 204, 219, 220, 222, 224, 225, 230, 233, 234, 239, 241, 242, 245, 249, 250, 251, 252, 254, 255, 258, 259, 260, 264, 265, 266, 267, 268, 274, 277, 279, 282, 286, 288, 289, 290, 292, 294.

2.2.2.5. Lîrîzm û Pathos

Di haîkûyên berhemê de bi awayekî berbelav lîrîzm û pathos xwe nîşan dide, xwe dide hîskirin. Hestên ciyawaz û dîlîzîya li pêşberî xweza û hêmanên wê, herweha li hemberî kêlik, bergeh, rewş û bûyerekê naveroka haîkûyan ji hêla lîrîzm û pathosê ve dide xuyakirin.

Haîkûnûs, hestên ku di wî de peyda bûne, yên wekî keyfxweşî, eş-jan, kulderd, heyirîn, xem-xemgîni, bêdengî, tikîtenêtî, firşiktengî, dûrbûn, nayîrîn, kelogirî, danavîbûn, arezû, şad, diltezîn, aramî bi şêwaza rengvedanî li ser tişt, heyber, hemanên xwezayê, riwek, ajelek û hwd.ê dide pêhesandin. Li gel vê Nemir, di hin haîkûyan de hemanên ku li sirûştê diyar in, bi hunerên edebî yên wekî axivandin û kesandinê re lîrîzm û pathosa ku di navbera wan de diqewimê ji haîkûxwînan re dide nîşandan, pejinandin.

Ji xeynî van haîkûnûs, li hemberî sewtek ên heyberên xwezayê, dengên mirovan, piştî rewş û bûyerekê bibîranîn, mekanek, bajarek, hest û hestgermîyên xwe yên têvel di haîkûyan de bi pêş çavan dixe. Hezkirineka nepenî, tikîtenêtîyeka diltengijandî û aramîya xwezayê lîrîzm û pathosa wî ya haîkûyan derdibirîne.

139.

Şaneşîna rind
Nisêbin bir bi xwe re:
nema lîrîk e.

278.

Gelek tişt hene
Xweş rabûne pêdarê
Ez, tikîtenê

190.

Sîya xwe wisa
dikişînî li pey xwe
Bi kû ve, B'yê?

242.


Textîloya min
sar bûye li xebatê.
Çend şên bû berê...

186.

Tariya pîyar,
Te ez ji bîr kirim Lê!
Bi vê rindîyê.

201.

Ew tiştê biçûk,
Ku bi te ne çu tişt e,
bo min helbest e.



Haîkûyên ku bi giştî lîrîzm û pathosê re eleqedar in weha hatine rêzkirin:

Têgih	Hejmara Haîkûyan
keyfxweşî, eş-jan, kul-derd, heyirîn, xem-xemgîni, bêdengî, tikîtenêtî, firşiktengî, dûrbûn, nayîrîn, kelogirî, danavîbûn, arezû, şad, diltezîn, aramî	22, 23, 26, 33, 34, 37, 39, 43, 50, 51, 52, 54, 56, 57, 61, 63, 66, 72, 74, 75, 77, 83, 84, 86, 87, 88, 89, 90, 92, 95, 99, 101, 102, 103, 106, 114, 119, 120, 122, 123, 124, 128, 132, 138, 139, 140, 142, 143, 145, 146, 147, 148, 149, 150, 151, 152, 153, 154, 155, 156, 157, 158, 160, 162, 163, 164, 165, 167, 168, 169, 170, 173, 174, 176, 177, 178, 179, 180, 181, 184, 186, 187, 188, 190, 191, 192, 193, 195, 196, 197, 199, 200, 201, 203, 204, 216, 217, 220, 227, 228, 229, 238, 239, 241, 242, 244, 246, 247, 248, 249, 251, 256, 260, 268, 269, 270, 271, 272, 273, 274, 275, 276, 278, 279, 280, 283, 286, 294, 295, 296, 297, 298, 299, 300.

2.2.2.6. Ajel û Riwek

Ajelên ku di haîkûyan de cih girtine, li gel xasyetên xwe yê resen herweha li gor temsîlekê jî hatine nîşandan. Di pêwendîya şanîderê de ku yek ji taybetîya helbesta haîkûyê ye, hem wekî hêmanên kîgoyê ango şanîdera demsalê û hem wekî nimandina hestan deng, şikl, liv û tevgerên ajelan di haîkûyan de hatine bikaranîn. Bo nimûne, “hêlîn, cûcîk beytîk” demsala biharê; “zîz û bextewarî”ya kundî, “ji hev re xweş hêlîn”a esman û eyloyê di heman demê de hestên haîkûnûsî jî dinimîne. Herweha, ajelên ku di nav sirûştê de bi hêmanên sirûştê re û bi faunaya xwe re têkilî ava kirine, di haîkûyan de reng hatîye vedan.

Ji xeynî van, haîkûnûs Nemir di hin haîkûyan de bi ajelan re canêcanê dibe ango hasbîhalek datîne di navbera xwe û wan de. Bi vî awayî rewşa hîsê xwe yê ku tê de, bi haîkûxwînan re rave dike û wan pê dihesîne.

293.

Li şaneşînê
Cabê nadê cûcikan.
Beytîk û hêlîn.

161.

Cîyê kursîyan
diguhêzim, zerîle
hê jî dixwîne.

98.

Kund nîvê şevê
Çend zîz û bextewar e
Li banê bêdeng

5.


Mirmirkê devzûtik
Malavano!
Ev kê hat tarî tefand?

298.

Esman û eylo
Ji hev re xweş hêlîn in
Du dar û dîyar

13.

Kerê boz î pîr
Dehla gund li ser piştê
Girê zer dûman



Riwek û hêmanên wê di haîkûyan de hem wekî xasyetên xwe yên xwezayî hem wekî hêmayî hatine nîşandan. Her wekî ku xîtabî sehekên mirovî dikin di heman demê de bi wateya xwe yên hêmayî xîtabî hişî jî dikin.

Wekî şanîder riwek jî mîna ajelan di hin haîkûyan de demsalan amaje dikin. Bo nimûne, “kulîlk, kulîlkê xox û gêlazan, gul, bîşeng, kufkarikên terr,” wekî kîgo demsala biharê îşaret dikin. Herweha rewş û tevgerên wan ên li sirûştê bi hunerên edebî yên wekî şibandin û kesandinê re jî hatine nîşandan û haîkûnûs bi vî awayî hestên xwe jî di haîkûyan de dide pêhesandin.

40.

Kunfeqîrka mal
Ji gêrikê sor-gir re
Tavê didoşe

43.

Mija li gêlî
Bi destpelkê şeh dîke
Porê bîşengan

46.

Kulîlkên xoxan
Vegirtine rozgara
Êvare hênîk

223.

Bayê xilxeme
dilivîne behîvê
niha xurt in pel.

226.

Berû dêris bûn
Bizin dikurîsînî
Girê bêxwedî

247.

Devê xweş heye
çivîkên li xwendinê
li nava daran



Li gel hêmanên wan, zêdetirî 40 ajelên curbicur û herweha zêdetirî 30 riwekên ciyawaz di berhemê de cih hatine dayîn. Ajel, riwek û hêmanên ku di haîkûyan de hatine bikaranîn li gor hejmara haîkûyên berhemê weha hatine senifandin:

Ajel	Riwek
Gêrik: 4, 40, 136. M'azelîlk: 4. Mirmirk: 5. Mozedebêş: 7. Nêrî: 9, 133. Ker: 13. Minminîk: 17, 52, 118. Dîk/Keleşêr: 34, 39. Mişk: 36. Moz: 38. Çûk/Çivîk/Çûka Şinxalî//Beytik/Teyr: 55, 84, 90, 200, 247, 293, 295, 296, 297. Çîçîk/Cûcik: 191, 285, 293, 295. Hêlîn: 119, 293, 298. Kundê Kor/Kund: 62, 98. Keçelekundik: 65. Gamêş: 67. Qij/Qijik: 68, 71, 97, 187, 197. Legleg: 70. Kotir/ Kevok: 80, 108, 129, 138. Mok: 82. Hêk: 84. Kew: 86, 185. Berx: 87.	Dar: 55, 77, 100, 101, 115, 120, 218, 247, 287, 298. Daristan: 8, 20, 85. Garis: 57. Gêlaz: 66. Sênc: 84, 127. Kerengpare: 10. Darbeyanî: 14. Xirnûf: 16. Gul: 22, 56, 91, 171, 172, 173, 174, 208, 229. Tixûb: 22, 130. Gonî: 27. Tirî: 37. Xerzik: 38. Kunfeqîrk/Kufkarik: 40, 243. Devî: 42. Dara Zeytûnê: 47. Kûlîlk: 66. Kûlîlkê Xoxan: 46. Mazî: 50, 183. Sardonya: 99. Pel: 68, 223, 285, 299. Berû: 76, 79, 226. Binevş: 93.

Çêl: 88.	Kaj: 94.
Dûvmeqesk: 130, 209.	Dartû: 141.
Mar: 131.	Daremerx: 206.
Zerîle: 161, 162.	Genim: 217.
Kana: 185.	Behîv: 223.
Jûjî: 187.	Încas: 232.
Eylo: 298.	Spîndar: 244.
Ga: 213.	Bî: 248.
Gur: 222.	Bîşeng: 43, 269.
Mêşê Hingiv: 233.	Kizwan: 297.
Qaz: 236.	
Mehîn: 237.	
Hesp/Kihêl: 147, 148, 150, 151, 259.	
Seyê Gurex: 237.	
Pez: 234.	
Mêş: 255.	
Xezalok: 261.	
Kurm: 265.	
Kitik/Pişîk: 36, 282.	
Bizin: 226.	

2.3. Dengê Pepûkê

Berhema bi navê *Dengê Pepûkê/Haîkûyên Îlona Nû* di sala 2020an de hatîye weşandin. Helbestvan Ulku Bîngol⁴⁸ bi tevahî di berhemê de cih dayê 68 helbestên haîkûyê. Hemû haîkûyên tê de li gor kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî ango sê riste û 17 kîteyê hatine vesazkirin. Ji haîkûyên ku di berhemê de cih girtin re tu sernav nehatine dayîn û herwisa haîkû nehatine nimrekirin. Li gel vê, ji haîkûyan re senifandinek,

⁴⁸ Helbestvan di sala 1981ê de li gundê Pîrahmedê ya bi ser navçeya Erxenîya Amedê hatîye dinyayê. Li zanîngeha Marmarayê beşa erdnîgarîyê qedandîye. Ji xeynî *Dengê Pepûkê* berhemên wî yên din, ev in: *Mohra Xuda*, *Peyman û Sîba (Nû)* wekî sê pirtûkên helbestî, *Hespên Hesînî* (roman) û *Katib û Kûçik* (Çîrok).

dabeşkirinek jî nehatîye kirin û di berhemê de ji bo haîkûyan îlustrasyon nehatine bikaranîn. Ji xeynî bêhnok û apostrofan wekî din tu xalbendî nehatine emilandin.

“Pepûk” an jî “Dengê Pepûkê” ji alîyê xwe ya wateyî û remzî ve wekî yek ji giringtirîn metafora helbesta haîkûyê tê zanîn. Di helbesta japon a klasîk de û herweha di haîkûyên klasîk a japonan de *hototogisû* ango pepûk wekî şanîdera remzî, hêmayî û hêmaneka jêneger her tim di helbest û haîkûyan de hatîye bikaranîn. Pepûk û dengê wê di heman demê de di haîkûyan de wekî şanîdera demsalê, demsala biharê îşaret dike. Herweha wekî remzî jî di çand û bawerîyên cihê yên civakan de hestên têvel ên wekî bêrî, evîn, xapandin, bêwefatî, bêbext, xweşbext, tenêti, şermînî, êş, xemgînî, mirin û hwd.ê tuwanc dike.

Wekî ku ji navê berhemê jî diyar e, Bîngol jî wekî şanîder û remzeka xwemalî, naskirî “pepûk” û “dengê pepûkê”yê ku wekî çîrok di nav çand û wêjeya kurdî ya gelêrî de gelekî berbelav e, bi kar anîye. Haîkûnûs, bi giştî di haîkûyan de atmosfera şêwaza gînkoyî dide haîkûxwînan. Bi gotineka dî, Bîngol di haîkûyan de wekî haîjînekî gerok tevdigere û bi vî awayî haîkûyên xwe dide hîskirin.

Ji xeynî van, têgiha “deng”î wekî onomatopoeia di berhême de cihekî giring digire. Di haîkûyan de rengvedana dangan, jîndarî û xwezayîya haîkûyan, pêwendîya haîkûyan a bi sirûştê re amaje dike. Haîkûnûs, bi “dengê çirçirkê”, “dengê dîkan”, “vingîna mozê”, “şehîna hespê”, “şelpîn, xumîn û şirrîna avê”, “şingîna pencereyê” û “xişîna pelan” re dengên li xwezayê, di haîkûyan de ji haîkûxwînan re dide pêhesandin.

2.3.1. Vekolîna Teşeyî

2.3.1.1. Teşeya Ristesazî

Haîkûyên berhemê ji alîyê ristesazkirin û kîtesazkirinê ve hemû li gor pîvana hakûya japonî ango 5/7/5 û 17 kîteyê hatine nivîsandin. Di haîkûyên wekî rûpela 12(1), 30(2), 38(2) û 49an de da ku li gor kêşa risteya 5/7/5 hilmî çê bibin, bêjeyên “zeman, xanî, çem û dîwar” li gor rêgeza tewangê ku yek ji taybetîyê rêzimana kurdî ye, di nav hundirê xwe de ditewin û awayê “zemên, xênî, çem, dîwêr” werdigirin. Di heman awayî de li gor xwendin, bilêvkirin û lihevhatîya 5/7/5ê di haîkûyên rûpela

36(2), 42(1) û 52(2)an de di bazinedaçekê “di...da”yê de “di” hatine êxistin û di haîkûya rûpela 37an de jî bêjeya “sterk”ê li gor xwendinê wekî “s-terk” angû du kîte/hilmê hatîye vesazkirin.

12 (1).	36 (2).	37.
Pel weşand <i>zemên</i> 5	Salnameyan da 5	Zer bibû tirî 5
Li bin wê dara tuyê 7	Cîranê me ermen e 7	Stêrka qurix hilat 7
Li hewşa xanê 5	Çûm mêvaniyê 5	Şipîn jê hat 5

2.3.1.2. Kirejî

Di haîkûyan de rêbaza kirejî û bi wê re têkildar xalbendî, hindik hatine bikaranîn. Di hin haîkûyan de jî bo deng birîn û balkişandinê kirejîyên “va, kê, ha û hew” hatine emilandin.

19.	35.	51.
Westîyayî Hesp	Kuçeyek xewle	Neçilmisînin
Ketime rêya mûşê	Xwê difirotin berê	Qevda kulîlkên Xweda
Va Hesendîn e	Hew li vê derê	Ew, zarokin ha

Bêjeyên kirejî yên ku di berhema *Dengê Pepûkê* de hatine emilandin, ev in:

Bêjeyên Kirejîyê	Rûpela Hejmara Haîkûyan
va, kê, hew, ha.	18(2), 19, 27, 35, 51.

2.3.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî

Di *Dengê Pepûkê* de wekî kirejîyên bi xalbendî tenê apostrof û îşareta bêhnokê cih hatîye dayîn. Îşareta apostrofê di haîkûyan de hem jî bo lihevhatina kêşa risteya 5/7/5 hilmî û hem nîşanîkirina hin peyvên taybet ên wekî “tûm û bîr”ê xasra jî nîşanîkirina duwateyîya “bîr”ê bi hunera edebî tevriyeyê re hatîye bikaranîn. Li gel vê, îşareta bêhnokê jî ji ber deng birîn, bêhnvedan û ahengê cih hatîye dayîn.

14 (1).

41.

42.

Tî bû, li çolê

Li koyê şingal

Şev zû bihurî

Fîstanekî sorgulî

Hehecokan av d'anî

Xewroşkên wî zemanî

Av da wê jinê

Lêvên terikî

Wê bên bîr'a te

Di berhemê de kirejîyên ku bi rêya xalbandîyan hatine bikaranîn, weha hatine senifandin:

Xalbandî	Rûpela Hejmara Haîkûyan
Bêhnok	14(1), 20(1), 50(1,2), 51.
Apostrof	8(1), 24(2), 30(1), 41, 42(2), 48(2).

2.3.2. Vekolîna Tematîk

2.3.2.1. Gerdûn û Sirûşt

“Kadiz, ro, hîv, stêrk, stêrka qurix” wekî hêmanên gerdûnê û “çiya, ko(kuh), deşt, gelî, çem, behr, çol, av” wekî hêmanên sirûştê di haîkûyan de cih girtine. Dicle, Gilîdax, Xelat (Sîpan) û Gawûrdax di haîkûyan de wekî navên taybet ên çem û çiyayan hatine emilandin. Hêmanên gerdûnê ji xeynî rasteqînîyên xwe bi bikaranîna hunera teşbîhê re bi piranî wekî metafor hatine bikaranîn.

Bergeh û livandinên hêmanên sirûştê bi telmîhekê re hest û bîranînên têvel di haîkûnûsî de çê dîkin. Çûyîn û hatina derekê, ji deverê re derbasbûn, ji xwezayê dîmenek bi şewaza bi peyvan re nexşandin di haîkûyên Bîngolî de xwe dide xuyakirin.

8(2).

9.

45.

Ro li ber ava

Hîv li wê deştê

Çîrokbêjekê

Li qesra îshak paşa

Payî wek pêsira dê

Xîrarê qul digerland

Gilîdax zîn e

Dengê çirçirkê

Li şopa kadiz

13.

46(2).

52(1).

Siwarên behrê

Di xweroşkan da

Bi şev li gelî

Bi xof ketibûn wê rê

Şopa gakûvî diçe

Zarok stêrkan dixwaze

Behr bi Alan e

Ber bi xelatê

Şirrîna avê

Di berhemê de bi hêmanên gerdûn û sirûştê re haîkû hatine honandin, weha hatine xuyakirin:

Hêma, Remz û Metafor	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
ro, Gilîdax, hîv, deşt, çiyayê miqêm, behr, çol, av, çiyayê asê, çiya, Gawûrdax, berf û boroz, şelpîna avê, mohra hîvê, stêrka qurix, çem, ko, Dicle, xumîna avê, kadiz, xelat, berf, serav, ba, gelî, stêrk, şirrîna avê.	8(2), 9, 11, 13, 14(1), 18 (1,2), 23, 26(1), 27, 28(2), 32(2), 34(2), 37, 38(1,2), 40(2), 41, 42(1), 45, 46(2), 47, 49, 50(1,2), 52(1)

2.3.2.2. Demsal

Herçendî ku wekî binenav navê berhemê *Haîkûyên Îlona Nû* jî be haîkûyên tê de bi tenê demsala payîzê amaje nakin. Her çar demsal jî bi rêbaza kîgoyê hatine nîşandan. Ji xeynî navê demsala havînê yên di rasterast di haîkûyan de saz bûne.

Haîkûyên demsalî yên haîkûnûsî li gel vegotina şayesî ya xwerû û fesîh, herweha bi şêwaza vegotina çîrokkirinî re jî hatine honandin. Bikaranîna lêkerên dema borî haîkûnûsî dike wekî haîjînê “xewroşkan”. Her demsal li gel xasyetên xwe bi kîgoyan re hatine nîşanîkirin. Bo nimûne “hêlîna hehecikê, siya gulê bişkivî, bêhna kulîlkê, kerîyek xezal” demsala biharê; “bindeq û sarincên avê” demsala havînê; “weşandina pelan, siya başokê, stêrka qurix, tirîyê zer” demsala payîzê û “berf û boroz” jî wekî şanîdera demsala zivistanê hatine nimandin. Ji xeynî van kîgoyên demsalan wekî hêma xasma bi têgihên “zeman, êş, xem”ê re jî hatine bikaranîn.

12(1).

26(1).

47.

Pel weşand zemên

Li Gawûrdaxê

Hêla yek sêwaz

Li bin wê dara tuyê

Sar bû qasa kamyonê

Hêla din kur û erez

Li hewşa xanê

Diçûn bindeqan

Zû hat berf îsal

Haîkûyên ku bi demsalan re têkildar bi giştî demsal bi demsal weha hatine dabeşkirin:

Demsal	Kîgo	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Bihar	hêlîna hehecikê, xema kulîlkê, siya gulê bişkivî, bilbil, şîn, berf, gul, aşê avê, bêhna kulîlkê, perpenîk, dengê pepûkê,, bihar, şelpîna avê, hehecok, xumîna avê, gulên nîsanê, zag, serav, keriye xezal, kulîlkên behîvan, qevda kulîlkên xweda, şîrrîna avê.	15, 17, 18(1,2), 20(1,2), 24(2), 31, 32(2), 41, 42(1), 44(1), 49, 50(2), 51, 52(1)
Havîn	dengê çirçirkê, sarincên avê, bindeq.	9, 16 (2), 26(1)
Payîz	tûm'a hinarê, payîza paşîn, pel weşîn, dara tûyê, îlona başûr, siya başokê, zerbûna tirîyê, stêrka qurix, payîz, gûz, hişkbûna dara tehûyê, lorandina bayê.	8(1), 10(1), 12(1), 24(2), 30(1), 37, 38(1), 46(1), 50(1)
Zivistan	zivistan, berf û boroz, berf.	24(1), 28(2), 47

2.3.2.3. Zeman û Mekan

Têgihên zeman û mekanê hema hema di her haîkûyan de bi awayekî berbiçav xwe nîşanî dikin. Lewre haîkûyên berhemê gotin bi cî be, li ser hîmê zeman û mekanê hatine avakirin. Li gel term û parên wî yên wekî “şev, roj, berêvar, fecra sibê, salname, îsal û zemanê berê” zeman, bixwe bi awayekî giştî bi hunerên edebî kesandî û şibandinê re wekî heyberekî şênber di haîkûyan de hatîye xuyakirin û pê re jî hebûna zemanî ji haîkûxwînan re hatîye pêhesandin. Demên haîkûnûsî di haîkûyan de li bin dara tuyê “pelê xwe diweşîne”, wekî dirindeyek “har dibe”, di qonaxên vala de “bi xem dibe”, li devê dêrî “şêrekî bi gulî ye” û “nefret” e. Dem di haîkûyan de bi piranî dema borî ye û ew jî di haîkûyan de şewazeka vegêrînîyê derdixîne holê.

Mekan, ji bo ku haîkûnûs di haîkûyan de wekî şairekî gerok (gîngo) tevdigerê ango her tim di rê de ye, gelek curbicur û berfireh e. Her cih, dever, der û dor xaseten tê nîşanîkirin. “Bajar, gund, xanî, mal, hewş, şaneşîn, hêlkan, kuçe, dêr, gelî, qonaxên vala, Dêra Extirmanê, Kela Zerzewanê, Qesra Îshak Paşa, Rêya Mûşê, Hesendîn, Amîd, Qamişlo, Hesenkêf, Arbela (Hewlêr), Mêrdîn, Mahden (Maden), Gawûrdax, Kela Xarpetê, Yemen, Welatê Kenan, Koyê Şingal, Cizîr, Sêwaz û Mehabad cihên ku wekî mekan di haîkûyan de hatine bikaranîn.

28(1).	23.	16(1).
Har bûye zeman	Hebû tunebû	Fecra sibê ye
Hestiyan dimêjîne	Tacek zîvîn bû Mêrdîn	Dengê dîkan tê ji gund
Pêsîra vê dê	Li çiyayekî	Ketime wê rê
44(2).	20(1).	52(2).
Bi şev ketim rê	Nû vebibûn gul	Xewnek şevan da
Navek li wê gustîlê	Li Amîd, aşê avê	Biçim wê mehabadê
Gul û cizîr e	Çûm guhdariyê	Birînek nas e

Bi giştî haîkûyên ku zeman û mekanê kirine mijara xwe rûpel bi rûpel weha hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
li wê hewşê, piştî wê êşê, li ber ava, li qesra îshak paşa, Gilîdax, li wê deştê, payîza paşîn, li wan qonaxên vala, zeman, di devê rê da, li vî başarî, bajarek li wê piştê, li bi wê dara tûyê, li hewşa xanê, vê berêvarkê, kuçeya hedad, behr, li çolê, zemanê berê, li devê dêrî, li qatya xênî, hêlîna hehecikê, mal, fecra sibê, gund, şopa xezalê, li kela Zerzewanê, li dêra extirmanê, li Berbihîvê, bi ser bilbil da, der û dor, çiyayê asê, rêya mûşê, Hesendîn, li Amîd, aşê avê, ber bi Qamişlo, li hesenkêfê, di fecrek sibeyê da, xanîyekî kevn, li Arbelayê, Mêrdîn, li çiyayekî, wext zivistan, Îlona Başûr, di rêya mahdenê da, li Gawûrdaxê, qasa kamyonê, kela xarpetê, pêsîr, berf û boroz, li Yemena dûr, payîza paşîn, qatya xênî, li dor, bihar, li vir, welatê kenan, di hêlkanê da, di rê da, li şaneşînê, kuçeyek xewle, li vê derê, berê, erd, li vê enîşkê, salnameyan da, payîz, ji bin gûzê, çem, ji pencereyê, çavîyek xanî, hezar û yek sal, li koyê şingal, Dicle, pencereya dêrê da, şev, di devê tifîngê da, gulên nîsanê, zagên li ser rê, bi şev, li wê gustîlê, Cizîr, li şopa kadiz, li wê banîyê, xewnên şevan, ber bi xelatê, sêwaz, îsal, şeva kerr û lal, bîr'a derwêşan, serav, dîwar, li qeracan, berf, li gelî, mehabad.	8(1,2),9,10(1,2), 11, 12(1,2), 13, 14(1,2), 15, 16(1,2), 17, 18(1,2), 19, 20(1,2), 21, 22(1,2), 23, 24(1,2), 25, 26(1,2), 28(1,2), 29, 30(1,2), 31, 32(1,2), 33, 34(1,2), 35, 36(1,2), 38(1,2), 39, 40(1,2), 41, 42(1,2), 43, 44(1,2), 45, 46(1,2), 47, 48(1,2), 49, 50(1), 52(1,2)

2.3.2.4. Civak û Mirov

Kiryarên civak û mirov ên wekî çandî, aborî, rojane û di heman demê de rûdanên ku di nav ciwaka kurd de gelekî bi tesir bûnê, bûne mijarên haîkûyan. Haîkûnûs, di haîkûyên xwe de cih daye hem kesên dîrokî yên wekî pêxember Brahîm, helbestvan Konstatinos Kavafîs û Ehmedê Xanî hem yên wekî kolber, hedad, mûmfiroş. Ji xeynî van, tîfal, Alan (Kurdî) û wekî gel ermenî jî di nav haîkûyan de cih bûne.

“Aşê avê, tîfîng, barûd, xîrar, hêlkan, kêr, kalan, şûr û mertal” wekî alavên civakê û “şîn, şevbihurk, xewroşk, çîrokbêj” wekî çand û wêjeya gelêrî li gel bikaranîna hunera telmîh û teşbîhê bi zimanekî vegotîni di haîkûyan de hatine emilandin. Di haîkûya “Îlona Başûr” de geşedana civakî ya referandûma Başûrê Kurdistanê û herweha di haîkûya “Siwarên Behrê” de bûyera trajîk a Alan Kurdî bi rêbaza torîawaseyê hatîye bibîrxistin.

32(1).

Welatê kenan

Hêkelên ji rittamê

Brahîmek divê

22(2).

Qiravî ketî

Vê helbesta Kavafîs

Li Arbelayê

28(2).

Berf û boroz e

Rêbirran rê birrîne

Li van Kolberan

11.

Çiyayê miqêm

Bajarek li wê piştê

Çûm şevbihurkê

24(2).

Îlona Başûr

Kêr kiş'ya ji kalanê

Dengê Pepûkê

13.

Siwarên behrê

Bi xof ketibûn wê rê

Behr bi Alan e

Bi giştî haîkûyên ku wekî tematîk bi civak û mirovan re têkildar in, li gor hêma, remz û metaforan bi vî awayî hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Rûpela Hejmara Haîkûyan
zîn, pêşîra dê, şîn, şevbihurk, hedad, siwarên behrê, Alan, fîstaneî sorgulî, jin, sûretê xwedê, aşê avê, dengê zarokan, lelbesta Kavafîs, Îlona Başûr, kêr, kalan, şûr, kamyon, tîfîng, rêbir, kolber, şûrekî pîr, tîfal, dojeh, hêkel, Brahîm, çîrok, hêlkan, cotek solên hêsinî, mûmfîroş, salname, cîran, ermen, mêvanî, Xanî, şûr û mertal, lêvên terikî, xewroşk, bêhna barûdê, gustîl, çîrokbêj, xîrar, dengê erbaneyan, bîr'a derwêşan, xalîçe, zarok.	8(2), 9, 10(2), 11, 12(2), 13, 14(1), 17, 20(1), 22(1,2), 24(2), 25, 26(1,2), 28(1,2), 29, 30(1), 31, 32(1,2), 33, 34(1), 36(1,2), 40(1,2), 41, 42(2), 43, 44(2), 45, 46(2), 48(2), 49, 50, 52(1).

2.3.2.5. Lîrîzm û Pathos

Haîkûnûs, di hin haîkûyan de li hemberî bûyerek, dîmenek an jî bîranînekê yan rasterast bi awayekî eşkere hestên xwe reng vedide yan jî li ser tişt, heyber û hêmanên sirûştê re bi rêya hunera teşxîs, teşbîh û mubalexeyê hest û hestgermîyên xwe nîşanî dike. Hisîyatên wekî xwestin, hêrsbûn, xemgînî, êş, xem, xof, kênîn, dîlxweşî, acizî, bêrîkirin, xeyalkirin, nefret, bibîranîn û hwd.ê da ku haîkûxwîn ji hest û dîlîzîyî ku haîkûnûs lê bandor bûye, pê bihesin di haîkûyan de bi zimanekî lîrîk hatine honandin.

8(2).

Tûm'a hinarê

Venebû li vê hewşê

Piştî wê êşê

9.

Hîv li wê deştê

Payî wek pêşîra dê

Dengê çirçirkê

10(2).

Di devê rê da

Minareyê şîn danî

Li vî bajarî

31.

Biharek wê bê
Hilçinin vê dogehê
Em li vir dijîn

33.

Kenîyan bi min
Ji dûr ve min xwe didî
Di hêlkanê da

42(2).

Şev zû bihûrî
Xewroşkên wî zamanî
Wê bên bîr'a te

Di berhemê de haîkûyên ku bi temayên lîrîzm û pathosê re eleqedar, weha hatine rêzkirin:

Têgih	Rûpela Hejmara Haîkûyan
xwestin, hêrsbûn, xemgînî, êş, xem, xof, kênîn, dilxweşî, acizî, bêrîkirin, xeyalkirin, nefret, bibîranîn	8(1), 10(1), 13, 17, 26(1,2), 27, 34(1,2), 38(2), 40(1,2), 41, 42(1), 50(1), 51, 52(1,2)

2.3.2.6. Ajel û Riwek

Ajelên ku di haîkûyan de hatine bikaranîn bi piranî ji bona şanîdera demsalan û derbirîna hestan wekî remzî û hêma hatîye xuyakirin. Di haîkûyan de ji dîmenên wan ên heyberî wirdetir şop, deng û sîya wan hatîye amajekirin û bi vî awayî haîkûnûs Bîngol, bala haîkûxwînan zêdetir dikişîne li ser şop, sî û dengên ajelan.

“Sîya başokê”, “şopa xezal û gakûvîyê” û dengên curbicur ên wekî “şehîna hespî, vingîna mozê, dengê pepûkê, dengê çirçirkê, dengê dîkan” wekî motifên ajelan di haîkûyan de hatine nexşandin. Herweha bi wan hêmanan re rewşek, bûyerek, çîrokek li gel hunera telmîh û şibandinê hatîye îmakirin an jî dîmenek hatîye nîşanîkirin.

30(1).

Payîza paşîn
Sîya başokê d'anî
Kevirê asê

46(2).

Di xewroşkan da
Şopa gakûvî diçe
Ber bi xelatê

41.

Li koyê şingal
Hehecokan av d'anî
Lêvên terikî

39.	14(2).	38(1).
Bi bîr ve çûbûm	Zemanê berê	Payîz e edî
Şehîna hespekî hat	Şêrêkî bi gulî ye	Av diza ji bin gûzê
Ji pencereyê	Li devê dêrî	Vingîna mozê

Riwek, bi motîf û hêmanên xwe re di berhêrê de hem li gor xasyetên xwe yê xwezayî hem jî wekî metafor û hêma bûne mijarê haîkûyan. Haîkûnûs li gel bikaranîna rêbaza kîgoyê ango ji bo nîşankirina demsalan, riwekan di heman demê de ji bo pêhesandina rewşa hestên ku tê de, wekî remz emilandîye.

Ji xeynî erka kîgo, metafor, hêma û remzê, herweha riwek li gor xwezayîya xwe ya şûngehî bi hêmanên din ên sirûştê re jî pêwendîya wan hatîye nîşanîkirin. Ev pêwendî riwek û hêmanên riwekan bi hunera şayesandî û şibandinê re wekî tabloyek hatîye xêzkirin.

18(1).	24.	50(2).
Li Berbihîvê	Wext zivistan bû	Li qeracan tê
Siya gulê bişkivî	Ji wê dewsa hîroyê	Kulîlkên van behîvan
Bi ser bilbil da	Em hecirandin	Spî, tu dibê berf

Ajel, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyan de hatine bikaranîn, li gor rûpel û hejmara haîkûyan weha hatine rêzkirin:

Ajel	Riwek
Çirçirk: 9. Şêr:14(2). Hehecik: 15, 41. Dîk:16(1). Xezal/Kerîyê Xezalan:16(2), 49. Bilbil:18(2). Hesp:19, 39. Perpenîk: 20(2). Pepûk: 24(2).	Tûma Hinarê: 8(1), Dara Tuyê: 12(1). Pel: 12(1), 48(1). Kulîlk: 17, 20(2), 51. Gul/Gula Bişkivî: 18(1), 20(1), 27, 43, 44(1,2). Hîro: 24(1). Bindeq:26(1). Tirî: 37.

Başok: 30(1). Moz: 38(1). Gakûvî: 46(2). Pisîk: 48(2).	Gûz: 38(1). Dara Tehû: 46(1). Darên Kehrîbar: 50(1). Kulîlkên Behîvan: 50(2).
---	--

2.4. Gumbil

Berhema Sidîq Gorîcanî⁴⁹ ya bi navê *Gumbil/gupik bi gupik haîkû* di sala 2022an de hatîye weşandin. *Gumbil* ku wekî şanîdera helbesta haîkûyê beşa herî jor ê daran amaje dike, mîna dîwaneka haîkûyê ji hêla qewareyê ve berfireh û çeşîtdar e. Li gel *Pêşgotîna* helbestvan Berken Berehî, wekî epîgraf gotinek ji Roland Barthes, haîkûyek ji haîkûnûsê japonî Matsuo Başô û yê kurdî Berken Bereh û ji xeberojkeka kurdî hatine jêgirtin û di berhemê de cih hatine dayîn.

Ji xeynî van *Gumbil*, tev ji 301 haîkû, 32 wêne, ji ferhengokek û pêrista demsalan hatîye sazîkirin. Di ferhengokê de 118 bêje bi ravekirin û pênasekirina peyvan re hatine dayîn û di dawîya pirtûkê de di *reqem bi reqem pêrista demsalî ya haîkûyan* de jî bi tevahî 122 haîkû hatine rêzîkirin. Hema hema hemû haîkûyên li berhemê li gor xwendin û bilêvkirina pîvana 5/7/5 hilmî hatine nivîsandin. Di honandin û ristesazkirina pîranîya haîkû yê ku li gor pîvana 5/7/5ê de bêjeyên kirejîyê û xalbendîyên ku li dewsa kirejîyan digirin, hatine bikaranîn.

Hin haîkûyên tê de, li gel îlustrasyonên Zozan Orak û fotrafên têvel ên ku ji hêla haîkûnûsî ve hatine kişandin, wekî *xêz bi xêz haîkû* hatine resmandin. Li gel vê, hemû haîkûyên berhemê ji alîyê naverokê ve wekî *gupik bi gupik haîkû*, *çîrok bi çîrok haîkû* û *nav bi nav haîkû* hatine dabeşîkirin. Gorîcanî, di beşa *gupik bi gupik haîkûyê* de cih daye li gel haîkûyên haîgayî yê ku ji 7 fotraf û 17 îlustrasyonan hatine şayesandin, tev 226 haîkû, di beşa *çîrok bi çîrok haîkûyê* de 26 haîbûn û 4

⁴⁹ Sidîq Gorîcan (Haci Yılmaz) ji Hizana Bedlîsîyê. Ji beşa Mamostetîya Îngilîzî ya Zanîngeha Uludagê mezûn bûye. Li Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê mastira xwe li ser helbestvan Laxer kiriye. Niha li Zanîngeha Yuzuncu Yilê ya Wanê, di Beşa Zîman û Çanda Kurdî de wek hîndekar dixebite. Heta niha bi navê *Şev û Roj berbiqê li ser avê me* (helbest), *Çîrokên Ezopî* (werger), *Lorîname* (Helbest), *Unîte bi Unîte Xwendin û Têgihîştin* (pirtûka dersê), *Dîwana Laxer û Ji haîkûnûsên Japonî Demsal bi Demsal Haîkû* (werger), li gel berhema wî ya bi navê *GUMBIL Gupik bi Gupik Haîkûyê* heft pirtûkên wî hatine çapîkirin.

haîkûyên haîgayî tev 30 haîkû û herwisa di *nav bi nav haîkûyê* de jî cih daye bi tevahî 45 haîkûyan ku dudu ji wan bi fotrafan re û dudu ji wan bi îlustrasyonan re hatine nexşandin. Tev 32 wêne, 9 jê fotraf û 23 jê xêz (îlustrasyon) hatine resmandin.

Bêjeyên hin haîkûyan ji bona balkişandinê bi îtalîk hatine nivîsandin û hemû haîkûyên tê de hatine numarekirin. Berhem, ji xeynî teşegirtina helbesta japonî ya klasîk cureya haîkûyê di heman demê de cureyên din ên helbesta japonî yên wekî senryû, haîkaî no renga, jiseî û rengayî jî hatine şêwandin.

2.4.1. Vekolîna Teşeyî

2.4.1.1. Teşeya Ristesazî

Ji 301 haîkûyan ji bilî 4 haîkû ango 297ên wê li gor hakûya japonî ango kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî û 17 kîteyî hatine kîtesazkirin û ristesazkirin. Di haîkûya 10an de li gor kêşa kîte ya 5/6/5 hilmî û 16 kîteyê, di haîkûya 206an de kêşa kîte ya 5/7/4 hilmî û 16 kîteyê, di haîkûya rêza 126an de li gor kêşa kîte ya 6/7/5 hilmî û 18 kîteyê û di haîkûya rêza 191ê de jî li gor kêşa kîte ya 5/7/6 hilmî û 18 kîteyê hatine vesazkirin.

Herweha gelek peyv, ji ber lihevhatina ristesazkirina 5/7/5ê di rastnivîsîn û xwendinê de ji hev cuda tên nîşanîkirin. Bo mînak, neketîye/neketye, qîzikê/qîzkê, zilîkê/zilkê, dixuyê/dixyê, zelalîya/zelalya, bavikan/bavkan, ronîya/ronya, nekiriye/nekirye/, nasîyar/nasyar, landikê/landkê, hatine/hatne, qirikê/qirkê, zevîyan/zevyar, kirine/kirne, dayika/dayka, qijika/qijka, nemirin/nemrin, huvîyet/huvyet, jûjîyê/jûjyê bi vî awayî di xwendina bideng de kîte tên xistin.

130.	9.	10.
meşar bi meşar	5 ew roj ev roj e	5 çik mam fikirî
hatine şûvkirin l'zevîyan	7 av û tav l'vî rûyê han	6 l'şax û belga j'hev dûr
şûnparêzên par	5 neketîye çûye	5 yek rût yek mirî

206.

şêlû û pêlgêrr

5

j'kevîyan dixwe vedixwe 7

çemê nizêr

4

126.

ne şor e ne kelî

l'mala mamoste memo 7

tama xweşbêjîyê

191.

ho dilmirîyo

b'şev kevelê xwe dixwî 7

b'roj tû dikî şeytên 6

5

7

6

2.4.1.2. Kirejî

Kirejî, di haîkûyan de hem ji bona deng birînê, bêhnvedan, vehesîn, kirpandin, balkişandinê û hem wekî “tîltek” hayjêbûn û pêhesandinê bi awayekî berfireh hatîye bikaranîn. Haîkûnûs Gorîcan bi vî rengî, di haîkûyan de rîtmek, newayek di xwendina bideng de çê dike. Bi heman armancî, hem ji hêla nihêrtinê ve hem ji hêla guhdarkirinê ve di nav risteyan de xweşlihevkirinek pêk tîne.

Ji alîyekî dî ve bikaranîna rêbaza kirêjîyan di heman demê de di haîkûyan de rewşa hestên haîkûnûsî yên ku li wê kêlikê, ji haîkûxwînan re dide pê hesandin. “Çîq, dilo, han, hê, hê jî, hew, kanê, weyl, weyl li yê, kîj, l'kîj, ka, ha, ha...ha, rehmetîyo, yan, a ji vir, şivano, ho, kê, va, kavlexanîyo, lo berbero, lingno, weha, l'kîjan, ewk, şey, xweşmêro, huwwe, ma ne, pirrbêjo, we ye, çi, yan ne, a va, hin” wekî bêjeyên kirejî yên ku di haîkûyan de hatine emilandin.

2.

çîya nin çîya

bar û piştî l'te dilo

serê min j'te ra

35.

wek kêr û penêr

ketine pêsîra hevdû—

weyl li yê nermik

59.

can rehmetîyo

em hê jî disimsimin

li vî alîyê han

115.

serwext nebûm ha

ka şer e l'wan yan leyz e

l'wan kevokên ha

243.

we ye keça min—

xweş bajar e ev devbehr

lê va nebû yar

297. zozê

vê sewt vê stranê

dil l'me kir ar ku dibêj

a va hat bihar

Bêjeyên kirejî yên ku di *Gumbilê* de di hatine bikaranîn, weha ne:

Bêjeyên Kirejîyê	Hejmara Haîkûyan
çîq, dilo, han, hê, hê jî, hew, kanê, weyl, weyl li yê, kîj, l'kîj, ka, ha, ha...ha, rehmetîyo, yan, a ji vir, şivano, ho, kê, va, kavlexanîyo, lo berbero, lingno, weha, l'kîjan, ewk, şey, xweşmêro, huwwe, ma ne, pirrbêjo, we ye, çi, yan ne, a va, hin	1, 7, 9, 19, 27, 30, 31, 34, 45, 51, 57, 64, 65, 68, 85, 88, 92, 104, 106, 112, 113, 114, 117, 118, 125, 127, 135, 141, 147, 148, 152, 161, 162, 165, 169, 172, 176, 178, 179, 183, 184, 189, 191, 193, 207, 210, 212, 223, 230, 237, 252, 253, 267, 275, 280, 287, 294, 299, 301.

2.4.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî

Bêhnok, pirsnişan, cotxal, bendik û apostrof bi tevahî pênc nîşandekên xalbendî di haîkûyan de hatine bikaranîn û mîna rêbaza kirejîyê tevgerîyane. Îşareta cotxal û pirsnişan carek, bêhnok heft car, bendik şeş û heft car û apostrof jî di haîkûyan de du sed û bîst û sê caran hatîye nîşanîkirin. Apostrof, hem bi haîkûyên ku pirsnişan û bêhnok tê de hatine bikaranîn re û hem bi çil û şeş haîkûyên ku îşareta bendikê tê de heyî re vêkre hatine bikaranîn.

Haîkûnûs, wekî ku ji bikaranîna çendîniya xalbendîyan jî dîyar e, ji xeynî di pêncî û pênc haîkûyan de îşaretên xalbendî di hemû haîkûyan de bi kar anîye. Tercîhkirina kirejîyên xalbendî yê bi vî awayî hem di haîkûyan de ji hêla xwendinê ve melodîyek û armonîyek hem li gor ristesazkirina 5/7/5ê jî lihevkiyane pêk anîye. Bi taybetî jî ji emilandina bendik û apostrofan mebest, di haîkûyan de derbirîn û nîşanîkirina hestên haîkûnûsî, di pêşberî tişt, dîmen, rûdan û qewîmînan de hestgermîya ku di wê kêlîkê de peyda bûye, ji haîkûxwînan re nîşanîkirin û pêhesandin e.

11.

her diçe li min
kin û kêr dibe umir
helbest jî: haîkû

237.

heyf ku l'te sed dev
û yek guhikê kerr heye
ma ne, pirrbêjo?

287. mexreb

ho tenê bî tu,
j'sapeyê wêdatir e
banga mexrebê

128.

xirbeyên dêrê—

j'rojên xwîn û talanê

salixa riprût

227.

berz û berzeyî

stran û helbestyarikê—

do jî îro jî

290. dilxet

her xal û peyva

l'van desxetên dîwaran

j'dil û kerbê tê

Ji alîyê teşegirtinê ve ji xeynî bikaranîna kirejî û xalbendîyan ji bona balkişandin, pêhesandin û kirpandina li ser peyvan, hin bêje û gotin hatine îtalîkkirin. Haîkûyên ku tê de bêje û gotin hatine îtalîkkirin, ev in: 77(*li min umrê nuh nîne*), 84(*nazli dersim*), 95(*cînga*), 123(*heşterxan tewûskî*), 138(*xwêşmêr*), 157(*qirç*), 199(*hêrs*), 247(*anna*), 248(*mirîyê heram*), 254(*lorîya cemîlayê*), 277(*lorîname*).

Xalbendîyên ku di haîkûyên berhemê de hatine bikaranîn, bi vî awayî hatine dabeşkirin:

Xalbendî	Hejmara Haîkûyan
Bêhnok	7, 32, 86, 99, 143.
Bendik	4, 5, 6, 12, 17, 25, 27, 35, 40, 45, 50, 52, 54, 55, 66, 77, 79, 88, 91, 95, 96, 101, 103, 106, 122, 123, 131, 132, 133, 134, 137, 138, 149, 153, 156, 159, 166, 168, 171, 175, 183, 185, 190, 193, 195, 200, 213, 216, 238, 243, 276, 230, 239, 246, 250, 257, 258, 273, 275, 288, 291, 293, 298, 299.
Apostrof	2, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 12, 13, 14, 15, 16, 17, 20, 23, 25, 26, 27, 29, 31, 32, 33, 34, 36, 37, 38, 41, 42, 43, 45, 48, 49, 51, 52, 53, 55, 56, 57, 58, 60, 62, 63, 64, 65, 66, 67, 68, 70, 71, 72, 73, 74, 75, 76, 77, 78, 79, 80, 81, 82, 83, 84, 85, 86, 87, 88, 89, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 98, 99, 100, 101, 102, 103, 104, 105, 106, 107, 108, 109, 110, 112, 115, 116, 117, 118, 119, 120, 121, 124, 126, 127, 129, 130, 132, 133, 134, 136, 137, 138, 139, 140, 141, 142, 143, 145, 146, 150, 151, 152, 154,

	156, 158, 159, 160, 163, 164, 167, 168, 169, 170, 174, 175, 176, 177, 179, 180, 181, 182, 184, 185, 186, 187, 188, 189, 191, 193, 195, 196, 197, 198, 199, 200, 201, 202, 205, 206, 210, 211, 212, 213, 217, 218, 220, 222, 225, 226, 228, 229, 230, 231, 232, 236, 239, 240, 242, 244, 245, 246, 247, 248, 249, 250, 251, 252, 253, 254, 255, 256, 257, 258, 260, 261, 262, 263, 264, 265, 266, 267, 268, 270, 271, 272, 273, 274, 275, 278, 280, 281, 282, 283, 284, 285, 286, 288, 289, 291, 293, 295, 297, 298, 299, 301.
--	---

2.4.2. Vekolîna Tematîk

2.4.2.1. Gupik bi Gupik Haîkû

Di vê beşê de haîkû ku ji 226 haîkûyan pêk tê, her yek ji wan wekî remzî şibandina gupikê hatîye kirin. Gupik, ji lûtkeya derekê yan jî tiştêkî re tê gotin ku Gorîcanî her haîkûyên xwe wekî “gupikek” pênasê kiriye. Di van “gupikan” ango haîkûyan de babetên ku bi gerdûn, sirûşt, demsal, zeman, mekan, civak, mirov, ajel, riwek, lîrîzm û pathosê re têkildar gupik bi gupik hatine honandin.

Hêmanên gerdûn û sirûştê bi taybetîyên xwe yên resen û xwezayî di *gupik bi gupik haîkûyan* de bi rêya hunera şibandin û şayesandinê hatine tevnkirin. Haîkûnûs li gel şewaza xwe yê xwezayî û zimanê xwe yê zela balê dikişîne li ser dîmen, liv û tevgera heyberên gerdûn û sirûştê ku li wê kêlikê li ser haîkûnûsî bibandor bûne. Bi vî rengî haîkûxwîn di haîkûyan de hem tûşî hestên haîkûnûsî dibin hem ji wê dîmen û kêlikê hêmanên gerdûn û sirûştê hay jê çêdibin.

Hêman û heyberên gerdûn û sirûştê yên wekî “roj, tav, baran, bûsetav, dîn, ro, şevstêrk, hîv, şevstêrk, çîya, mij, şilî, şet, çem, çemê b’ sûlav, zozan, stêrka fecerê, çal, bayê gûzan, demsal, gol, golav, heyîva çardehî, çîyageh, pelên ewran, dûmij, kehnî, zevî, çemê biharê, hîvron, heftrenga şilîyê, heyîva îşev, zozana bajêr, bayê bezê, rez, kendal, ax, şilî û şo, ewr, newal, derya, med û cezr, tipikên baranê,

erd, rê, behr, çemê nizêr, sîpanê dûser, gelîyê bilîsê, çîyayê reş” bi giştî bi vî awayî di haîkûyan de hatine nîşandan.

6.	68.	134.
bûsetava germ	stêrika fecerê	heftrenga şilîyê
l'enîya çîyê ye ewil—	hê jî diçîrûse l'jor	l'gerdena çîyayê reş
zêr l'nav zîvê ye	b'westa û tenê	bûye hemayîl

Bi gelemperî haîkûyên ku bi gerdûn, sirûşt û hêmanên wan re eleqedar, weha hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
roj, tav, baran, bûsetav, l'enîya çîyê, dîn, ro, şevstêrk, hîv, şevstêrk, çîya, mij, şilî, şet, çem, çemê b' sûlav, zozan, stêrka fecerê, çal, bayê gûzan, demsal, gol, golav, heyîva çardehî, çîyageh, pelên ewran, dûmij, kehnî, zevî, çemê biharê, hîvron, heftrenga şilîyê, heyîva îşev, bayê bezê, rez, kendal, ax, şilî û şo, ewr, newal, derya, med û cezr, tipikên baranê, erd, rê, behr, çemê nizêr, sîpanê dûser, gelîyê bilîsê, çîyayê reş	2, 3, 6, 8, 9, 22, 34, 48, 55, 60, 63, 64, 66, 68, 78, 87, 93, 99, 107, 111, 113, 117, 119, 121, 129, 130, 131, 132, 134, 139, 143, 148, 150, 152, 158, 168, 173, 185, 186, 188, 189, 190, 193, 197, 204, 206, 208, 211, 216, 218, 219, 220, 223, 224, 225.

Têgiha zeman û mekanê di haîkûyan de bi awayekî berfireh hatine bikaranîn. Zeman, hem wekî wateya xwe ya gelemper, hem li gel dan û parîyên xwe û hem jî wekî rojên taybet di haîkûyan de bi cih bûne. Herçendîn ku wekî parîya demê dema borî hatibe emilandin jî bi piranî zeman, dema niha ye û haîkûnûs wê parîya demê bi awayekî aşkere di haîkûyan de nîşanî dike. Têgih, rojên taybet û parîyên demê “şev, roj, îro, sibê, fecr, niha, bîst û pêncê îlonê, demsal, pertava îro, heft roj, du roj, roj bi roj, duh, do pêr, roja eydê, berbang, sal, her gav” di *gupik bi gupik haîkûyan* de wekî şanîderên zemanê hatine xuyakirin.

179.

ha ew merzel in
ku b'şev û roj sorgulê
pîrs l'me kirine ferz

154.

b'vê eyda şahîyê
kirine behra zarokan
şekirên eware

69.

ew pitika do
niha duçerxê diajo
li dû heka xwe

Di haîkûyên Gorîcanî de mekan gelekî ciyawaz û biçêşîd in, li gel şênberîya xwe cih û war di heman demê de nedîtbar in jî. Di beşa *gupik bi gupik haîkûyan* de mekan, car dibe ji sirûştê cihek, deverêk ên wekî çîya, behr, çem kendal, zevî, golav, zozan, gelîyê bilîsê, çemê nizêr, çîyayê reş, gumbila darekê, car dibe cihek ji laşê mirovî yê wekî guh, dev, lêv, cerg, sing û ber û carinan jî dibe amûrên rojane yê wekî minîbûs, servê, landik, eynik, helemînco, bêjing.

Herweha cihên ku mirov lê dijîn, dimînin, digerin û di nav çand, bawerî û jîyana rojane ya civakê de xwedî cihekî giring in, ên wekî mal, ode, tenûr, gor, goristan, merzel, kêl, medreseya sor, parqa bajêr, çarsû, mixaze, AVM jî di haîkûyan de cih girtine. Ji xeynî cihên şênber, xeyalgeh, xeyalname, bîr û dil jî wekî cihên razber di haîkûyan de hatine bikaranîn. Haîkûnûs, hem bi awayekî dîyarker berê haîkûxwînan dide li wan mekanan û hem hêmanên mekanê di haîkûyan de bi şêwazekî remzî û hêmayî û herweha bi vegotîneka metaforîk dide nîşanîkirin.

12.

xeyalgeha l'min—
b'derîyekî ra dikevîmê
b'sedan ra dertêm

50.

li rex pûna xwe
venişîye qijika belek—
li hiş zilîkên nû

195.

l'ser singê keçîkê
hest bi sê peyvan bûne gol—
girls never forget

Bi giştî haîkûyên ku di vê beşê de wekî tematîk bûne mijarên zeman û mekanê weha ne:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
şev, roj, îro, sibê, fecr, niha, bîst û pêncê îlonê, demsal, pertava îro, heft roj, du roj, roj bi roj, duh, do pêr, roja eydê, berbang, sal, her gav, çîya, behr, çem kendal, zevî, golav, zozan, gelîyê bilîsê, çemê nizêr, çîyayê reş, guh, dev, lêv, cerg, sing û ber, minîbûs, servê, landik, eynik, helemînco, bêjing, mal, ode, tenûr, gor, goristan, merzel, kêl, medreseya sor, parqa bajêr, çarsû, mixaze, AVM, xeyalgeh, xeyalname, bîr, dil, rê, li rex rê, dîwar, zilîk, derya, devîya sinçîyê, li ber tavê, pûn, çal, peyarê, salon, gewrî, derî, , berîk, devê golê, şûnrê, li ber serê bavo, jor, jêr, mala mamoste memo, serban, binban, dêr, zevî, bajar, welatê serfîraz, girê tirbûşê, zozana bajêr, dinya, erd, devîya şîlankê, navban, xak, artemêt, li dû, gumbila dara gûzê, gumbila spîndarên rût, gulbax, newal, mal, navsing, koşk, li gel şarmên, li ber sêdaran, şûv, li derve, baxçe, behr, şûnpên	8, 11, 12, 13, 14, 15, 20, 24, 27, 28, 30, 31, 32, 34, 40, 41, 42, 44, 45, 47, 48, 49, 50, 58, 59, 60, 63, 65, 66, 67, 68, 69, 72, 76, 77, 78, 80, 81, 83, 84, 85, 86, 88, 91, 92, 95, 102, 103, 104, 105, 107, 109, 110, 112, 113, 114, 117, 118, 119, 120, 122, 126, 127, 128, 129, 130, 131, 134, 137, 139, 140, 141, 142, 143, 146, 147, 150, 151, 152, 154, 158, 159, 160, 162, 164, 165, 166, 168, 169, 171, 173, 174, 175, 176, 179, 182, 183, 184, 185, 186, 187, 188, 189, 190, 191, 192, 193, 195, 197, 198, 199, 200, 201, 202, 203, 206, 211, 213, 214, 215, 216, 217, 218, 219, 220, 221, 222, 224, 225, 226.

Ji hêla mijara civak û mirovan ve haîkûyên Gorîcanî, pirreng û pirdeng in. Li gel hêmanên çand, ziman, wêje, huner, bîr û bawerî, kiryar û tevgera rojane yên civaka xwe herweha alav û amûrên rojane jî bûne mijarên haîkûyan. Bi taybetî hem mirovên ji rêzê û temenên wan ên têvel hem kesên ku di nava civaka kurd û yên cîhanê de binavûdeng bûne, bi xasyetên xwe yên sereke di haîkûyan de hatine amajekirin.

Nîşanîkirin û balkişandina li ser hêmanên civak û kesan, di heman demê de derbirîna hest û hizrên haîkûnûsî jî dide pêhesandin. Bo mînak, bikaranîna têgihên

zarokan yê wekî *bîbîk*, *hûrcan*, *biçûkê malê*, *pitik*, *zar*, *kurikê tintage* û *mindalok* hestyarî û dîlnazikîya Gorîcanî, li hemberî zarokan dide xuyakirin. Li gel vê, rainer maria rilke, frantz fanon, furûx ferûxîzad, franz kafka, axaok, macin, laxer, şakiro, îsmail beşîkçî, kawa nemir û hwd.ê jî kesên ku wekî remz û îmaj di haîkûyan de gerdûna hest û ramanên civak û mirovan temsîl kiriye, di heman demê de feraset û hizrên haîkûnûsî nimandîye û bi vî awayî cîhanbînîya wî jî ji haîkûxwînan re dide nîşandan.

Ji bilî van, “keçikên şox, dê, bav, dapîrk, mêrikê zirzop, xortê kopî, mamê zeydîn, hek, xwişk û bira, pêxember, cellad, zoro, fêlbaz, oblomov, ferhad, şivan (perwer), lawikê malmela, mem, mamoste memo, xweşmêrê dilsoz, elîf û bavê elîfê, mêrikê benjbala, xalê sergovendê, porsorkirî, ermen, çetoyê xemxwir, girls (keçikan), bêritebêj, cotyar, profê turkmênc, pirrbêj, bafirok, teyare, panzer, kêr, penêr, dew, tenûr, duçarxe, îlon bîst û pênc (referandûma 25ê îlona 2017an), kurmancî, landik, cil û berg, kopal, çira, newroz, cixare, meşar, şûvkirin, ziman, helemînco, bavê pele, cînga, devdelîngên spanyolî, eyda şahîyê, şekirên eware, hevrişim, roman, helbest, kitêb, servêş, werîs, guhar, kevçik, timtêl, kevel, xwedê, şeytan, kuran, cotkirin, şevbêrk, tirkî, hûrkanok, parîyê şermê” bêjeyên ku di haîkûyên civak û mirov de wekî mijar û tema hatine bikaranîn.

7.	149.	199.
l'van bîbîkên han	furûxa dilkul	îro l'gel şarmên
baş binêr hûrcana min,	—ku tebat lê nehatîye	me j'xwe ra <i>hêrs</i> kire ders
rojê tîn bîrê	çîrok dirêj hişt	em l'pey fanon çûn
203.	31.	130.
me go ev şevbêrk	du can pelixîn	meşar bi meşar
dunya bibe wêran jî	bav j'cellêd ra bû spasdar	hatine şûvkirin l'zevîyan
bê macin nabe	panzer bûn sed lib	şûnparêzên par

Haîkûnûs, di vê babetê re têkildar, cih daye cureyên têvel ên helbesta japonî ya klasîk. *Senryû* ku wekî helbesta cureya haîkaî ya rexneyî tê zanîn, kêmasîyên rewş, qewîmin, liv û tevgerên mirov û civakê tête rexnekirin. Cureya *haîkaî no renga* wekî helbestên “qerfî, henekî, komîk” tê binavkirin ku alîyê pêkenî ya kes û civakê dike mijara xwe. *Haîkûyên jiseîyî* ango “haîkûyên şîn û mirinê” ji bo bibîranîna rastîya mirinê, piştî mirina kesekê/î derbirîna, pêhesandina êş û xemgîniyê tîrî nivîsandin. *Haîkûyên rengaî* jî bi şewaza lecî ango bi awayekî diyalogî di yek haîkûyê de hatîye bikaranîn.

Di *gupik bi gupik haîkûyan* de di haîkûyên 44, 52, 85, 89, 207, 212, 222an de senryû, di haîkûyên 144, 195an de haîkaî no renga, di yên 11, 73, 141, 198, 214an de haîkûyên jiseîyî û di yên 136, 167, 172an de jî haîkûyên rengaî cih hatine dayîn.

207.	212.	195.
li dû peyva şey	gava ku pirrbêj	l’ser singê keçikê
kaş bû çû profê turkmênc	peyv l’peyvê ha bar dîkin	hest bi sê peyvan bûne gol—
tirkî kire ewk	çav l’mîna diçin ava	girls never forget
(senryû)	(senryû)	(haîkaî no renga)
141.	214.	167.
ew mêrikê do pêr	ew jî wekê te	mîna go j’rojê tê
ku xweş xweş tûtê reş d’xwar	li van deran digerîya	zerê l’navê te zerîyê
va ketê gorê	got kêla Laxer	zerîyê go j’zêrê
(jiseî)	(jiseî)	(rengayî)

Haîkûyên ku bi civak û mirovan re pêwendîdar in, weha hatine rêzkirin:

Hêma, Remz û Metafor	Hejmara Haîkûyan
bîbîk, hûrcan, biçûkê malê, pitik, zar, kurikê tintine û mindalok, rainer maria rilke, frantz fanon, furûx ferûxzad, franz kafka, axaok, macin, laxer, şakiro, îsmail beşikçî, kawa nemir, keçikên şox, dê, bav, dapîrk, mêrikê zirzop, dîwana ropo, xortê kopî, mamê zeydîn, hek, xwişk û bira, pêxember, cellad, zoro, fêlbaz, oblomov, ferhad, şivan (perwer), lawikê malmela, mem, mamoste memo, xweşmêrê dilsoz, elîf û bavê elîfê, mêrikê benjbala, xalê sergovendê, porsorkirî, jinik, berber, keçika ciwan, ermen, qewm, çetoyê xemxwir, girls (keçikan), şarman (mehmet), bêritebêj, şêx, cotyar, profê turkmênc, pirrbêj, bafirok, teyare, panzer, kêr, penêr, dew, tenûr, duçarxe, îlon bîst û pênc, kurmancî, landik, cil û berg, kopal, çira, newroz, cixare, binka cixare, meşar, şûvkin, simît, penceşêr, ziman, helemînc, bavê pele, cînga, devdelîngên spanyolî, eyda şahîyê, şekirên eware, hevrişim, roman, helbest, kitêb, servêş, werîş, guhar, kevçik, timtêl, kevel, xwedê, şeytan, kuran, cotkirin, şevbêrk, tirkî, hûrkanok, parîyê şermê,	7, 18, 19, 22, 32, 33, 35, 44, 52, 53, 56, 61, 62, 63, 64, 65, 69, 77, 79, 81, 83, 84, 85, 89, 92, 94, 95, 96, 97, 98, 99, 100, 102, 105, 106, 118, 119, 120, 122, 123, 126, 130, 133, 136, 138, 140, 141, 142, 144, 145, 146, 149, 151, 154, 155, 156, 162, 163, 165, 166, 169, 170, 172, 175, 177, 182, 184, 185, 187, 188, 191, 192, 195, 196, 199, 200, 201, 202, 203, 204, 205, 207, 208, 209, 212, 213, 214, 222, 223.

Li gel di hemû haîkûyan de lîrîzm hebin jî di hinan de bi awayekî tîr û geş xwe didin pejmandin. Haîkûnûs bi zimanekî hestbar, zelal û xwerû, lîrîzm û pathosa xwe bi rêbaz û şewaza şewqdanîyê di haîkûyan de bi kar anîye. Bi vê rengvedanîyê, bi hunerên edebî yên wekî kesandîn, şibandîn û şayesandîne re pêk anîye. Bi vî rengî Gorîcan, rewşa derûnî, hest û hestgermîya xwe yên ku li pêşberî rûdan, dîmen û kêliyêkê derketine holê, di haîkûyên xwe yên mişt lîrîk de dide pêhesandin.

Haîkûnûsê ku li hemberî qewimandin, rewş û manzereyekê tûşî hestên têvel bûne, li pêşberî di hest û derûnîya aloz, tevlihev û giran de diltengî û êşka ontolojîkê

jî di hin haîkûyan de amaje dike. Ji xeynî van, hestên wekî “kesirîn, aramî, kêfxweşî, bêrî, xeyalkirin, xwestîn, heyifandin, acizî, eşq, dostanî, silbûn, hezkirin, mestbûn, xem, westandin, tenêtî, tengijîn, hêrsbûn, neçarî, dudilî, êş, şabûn, ratoqîn, dilxweşî, xwezîyar, reşvalahî, melankolî, biqbiqîn, kerixîn” jî bûne mijarên haîkûyan.

82.

çîya b’qasî xwe
zil b’qasî xwe tenê ye
dil bi qasî xwe

88.

nav vî dilê han
bi hezaran dil hene—
b’ya kîjanî kim

117.

va ez im îro
teyrika l’ser pelên ewran
ji fera xwe dûr

124.

min guhek l’qirikê
yê din l’bilbilkê bel kir
tilîyê’m livlivîn

53.

j’singê dêya min
deyn kiriye bêhna xwe
kulîlka sincîyê

137.

rê û mê neman
—bajar bû gêrav j’dil ra
divê ratoqim

Bi giştî haîkûyên ku lîrîzm û pathos tê de bi awayekî zêde pê hatine hesandin weha hatine rêzandin:

Têgih	Hejmara Haîkûyan
kesirîn, aramî, kêfxweşî, bêrî, xeyalkirin, qehirîn, xwestîn, heyifandin, acizî, eşq, dostanî, silbûn, hezkirin, mestbûn, derkenarîtî, simsimîn, xem, xemxwarin, westandin, tenêtî, bêzarî, tengijîn, gazind, hêrsbûn, neçarî, windayîbûn, xalîtî, şaşmayîn, dudilî, êş, şabûn, ratoqîn, dilxweşî, xwezîyar, reşvalahî, melankolî, biqbiqîn, hesidîn, kerixîn	2, 5, 7, 10, 11, 12, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 25, 26, 30, 31, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 42, 45, 46, 47, 48, 53, 55, 58, 59, 60, 63, 64, 65, 67, 70, 71, 73, 77, 78, 79, 81, 82, 83, 84, 85, 86, 88, 90, 93, 95, 96, 97, 98, 99, 100, 101, 103, 104, 106, 107, 108, 117, 118, 122, 123, 124, 125, 126, 128, 129, 135, 136, 137, 141, 142, 145, 149, 152, 153, 155, 156, 157, 159, 161, 162, 163, 164, 165, 166, 169, 170, 175, 177, 178, 179, 181, 182, 184, 186, 188, 189, 190, 191, 193, 194, 195, 196, 197, 198, 199, 200, 201, 203, 205, 208, 210, 211, 213, 218, 220, 223, 224, 226.

Di *gupik bi gupik haîkûyê* de ajel, riwek û hêmanên ku bi wan re pêwendîdar hem di rastî û xwezayîya xwe de hem wekî sembol û hêmayî hatine bikaranîn. Haîkûnûs, riwek, ajel û motîfên wan bi rêbaza realîzma rengvedanî û li gel şewaza îmajîst haîkûyên xwe honandîye. Têkilîya wan ên bi hev du re, bi sirûştê re yan jî bi insên re hatîye amajekirin.

Gorîcanî, di teşegirtina haîkûyên bi vî rengî de ji dîmen, şikl, deng û kiryarên ajel ên curbicur û di heman demê de ji dirûv, bêhn, xuyang û rewş ên nebatan sûd wergirtîye. Ev gîyandaran, ji xeynî rastîya xwezayîyên xwe herweha ji hêla metafor, remz û îmajî wekî şanîder hatine xuyakirin. Bi vî awayî, ajel û riwek hem wekî şanîderên demsalan hem şanîdera derbirînên hestan û hem jî wekî dost û yarên haîkûnûsî yên dem bihartine, suhbetkirinê di haîkûyan de hatine nîşandan.

5.

l'nav firê ne çûk
l'nav leyz û lezê ne se—
gilêş e xweş e

10.

çik mam fikirî
l'sax û belga j'hev dûr
yek rût yek mirî

54.

bê nav û navber
vizzîna temûzîyan tê—
sor dibin gelas

165.

te dî rihankê
dinya li vî mêrikê han
ça bûye kapan

194.

bûm liba sisêyan
ku min dît firr dan û çûn
du lib qîqîkan

217.

b'shev l'artemêtê
gumbila spîndarên rût
b'qirikan şîşîliye

Ajel, riwek û hêmanên wan ên ku di *gupik bi gupik haîkûyan* de bûne mijar, li gor nimrekirina haîkûyan weha hatine senifandin:

Ajel	Riwek
Çûk/Çivîk/Teyrik/Nêrebeytik: 5, 18, 20, 117, 121, 133, 160, 174. Qirik/Qijika Belek/Qar û Qijak: 17, 41, 50, 124, 180, 202, 217, 226.	Belçim/Bişkoj/Gupik/Xezemzer/Şax û Belg: 10, 16, 24, 30, 46, 49, 78, 181, 225. Dara Gûzê/Gûz: 78, 160, 171, 219. Darzerdele/Zerdele: 28, 31. Dar/Darkulîlk/Kevnedar: 17, 24, 48, 80, 184.

Temûzî/Çîçirk: 51, 54, 200. Morî/Morîyên Biperik: 75, 216. Perwane: 72. Daxîsk: 57, 221. Kûçik/Se: 5, 13. Berx: 27. Reşêle: 28. Perperok: 40. Mêşhingiv: 42. Dawidê Dunikil: 46. Kevok: 115 Mar: 119 Heşterxan: 123. Bilbil: 124. Mêş: 158. Çîz û Moz: 158. Hesp: 158. Qîqîk: 194. Kêç: 176. Kerîyê Beremakkirî: 29. Pez: 211. Pezpezk: 211.	Kulîlka Sincî/Sinçî/Sênc: 43, 53, 215. Zeytûn/Gulîyên Zeytûnê: 89, 116. Çîçek/Çiqçîçek: 49, 135. Ûşî: 150. Gelas: 54. Mûz: 23. Bih: 91. Geznik: 131. So: 131. Şîlank: 147, 174. Bîşeng: 153. Hirmî: 157. Rihan: 165. Nîlufer: 175. Sorgul/Gulbax: 179, 187. Spîndar: 217. Çêre: 127.
--	---

2.4.2.2. Çîrok bi Çîrok Haîkû

Cureya haîbûn a ku di wêjeya japonî de wekî “çîrokê haîkûyê” yan jî “haîkûyên çîrokkirî” tê zanîn, di vê beşa berhema *Gumbilê* de ango di bin navê *çîrok bi çîrok haîkûyan* de hatîye nivîsandin. Ev şêwaza pexşan-helbestkî, di nav haîjînên japonan de xasma jî di nav berhemên Matsuo Başôyî de gelekî berbelav hatîye emilandin. Haîkûyên çîrokî haîbûn bi piranî ji alîyê helbestvanên gerok gînkoyan ve hatine nivîsîn.

Gorîcan jî di nivîsîna van haîkûyan de wekî helbestvanê gerok tevgerîyaye, geh berê guh û çavên xwe dide sewt, dîmen, rewş, liv û tevgera gerdûn, sirûşt û hêmanên wan ên wekî heyv, çîya, heyvan, nebat geh guhê xwe ji gotin, mamik, stran, helbest, xebroşk, çîrokên kes û civakê re bel dike, çavên xwe ji kiryar, rewş, rûdan û dîmenên mirov û milletê re vedike. Ji wan sûdê werdigire; hest, hestgermî û hizrên xwe yên curbicur dide pêhesandin. Bi vî awayî haîbûnên wî bi awayekî çalak û zindî tî honandin.

231.

min dît ku heyîv gelekî li çîyayan hatiye. paşî mamika ku carekê xwişkê min sûretxanê gotibû, xwe li peyvan pêçand: di çardehan da dêm e, di panzdehan da kême; ka bêje ew çi ye?

hîva çardehê
îşev dêm e sibê kême
pîroz be l'çîyê

256.

rûyê lê heyî kulîlkvedana darzerdelayan, kulîlkvedana zerdeleyan jî rûyê lê heyî li ber bîra min dixê. lewma jî, dema bihar tê, ez nikarim xwe nekim silavbêjê van her du xemlên dilbir û mucîzewer.

gupik bi gupik
silavan l'te d'kin zerê
zerdeleyên l'vir

255.

mamê nayîf hêj ku di ser parêz û baxçeyê xwe ra tivinga li milê xwe neteqandî da ku beraz sil bin û neyêne zeraşê, em li ber sêncê baxçê wî li erdê rastî çirûskê hatin. şev tarî bû. go mamosta, de bizane ka em ji vê çirûskokê ra dibêjin çi? min lez da hafizê xwe û yekcar got gûstêrk!

l'gûstêrkê binêr
eqêma ew jî hatîye
berazan sil ke

Ji alîyekî dî ve, haîkûnûs wekî çîrokbejekî kurd di *çîrok bi çîrok haîkûyê* de qismê metnên pexşanê bi şêwazekî vegêranî saz dike û pê re jî bi mijara pexşanê re eleqedar helbesta xwe yê haîkûyê vesaz dike. Herweha carinan wekî rexnegirekî tevdigere, kêmasî û xeletîyên civakê bi taybetî jî derbarê zimanê kurdî de rewşa civaka xwe bi rêya haîbûnan rexne dike.

249.

çar û pênc apên mamê hecî sofî evdila hebûn. li her yekî jî hema bêje çar û pênc zar hebûn. hecî mamê hecî sofî evdila ye, ew yekane kurê bavê xwe bû. roj tê, ji mam û kurmamên wî yek kes li heyatê namîne û tev wefat dikin. lê mamê hecî evdila piştî wan jî neh û deh salan dijî. di dîwanekê da jê tê pirsîn ka ew çi hikmet e ku mam û pismamên wî tev mirine, lê belê, wek yekaneyê bavê xwe, ew hê jî saq e û li heyatê ye. li ser vê pirsê, bersiva mamê hecî evdila remîzat û hikemî bûye: ew berxê ku xwedê xwî kirî, tu gur jî nikare bixwe, dibêje.

berxê ku xwedê
nehwêd salan xwî kirî
l'ber ruhê xwe ye

242.

janeke xedar e: dapîr û nevîyên ku li eynê bajarî dijîn êdî ji zimanê hev û ji hev serwext nabin. gurra pişafînê ye, û silav ji frantz fanonê rehmetî ra.

dapîrê çi got
nevî pê serwext nebû
l'heman bajarî

246.

malkambaxîya gel û miletekî ka dê çankî be edî!

sibat bîst û yek
ne dê maye l'me ne zimên—
pîroz be l'welêt

Haîkûyên çîrokî, ne tenê li gor çavderîyên haîkûnûsî hatine nivîsandin, herweha li gor tiştên ku hatî serê wî bi xwe jî, dibe yek ji sedemên nivîsandina haîbûnan.

233.

wek pincarçînekî ecemî, dema min kêr li binî da û bihara girûzokê da qedandin, li devçemê nizêr hest li min piçpiçî.

kêr li binî ket
û bihar lê qedîya
girûzoka şên

Li gel van, rûdan û qewimînên ku di nav civaka kurd de gelekî bibandor bûne, bi gotineka dîtir di hizr, dil û derûnîya civata xwe û yê wî de encamên travmatîk û diltezînî peyda bûne, bûye mijara haîbûnên Gorîcanî.

254.

roj dê bê, dê weha bê gotin: cemîle zarokeka deh salî bû, û hate qetilkirin. lê belê kula li ser kulê, lew ku derketina derve li taxa bajarê wê qedexe bû, malbata wê nekarî ew li axê biveşarta, lewma jî dayika wê cenazeyê cemîleya xwe bi sê roj sê şevan di sarinca sar da parast da ku wicûda wê ya bêruh xirab nebe. her ku guhdarî stran û helbesta cemîlayên vî welatê han dikim, ji şerman dibime revendeyê dilê xwe.

rû l'min şermoke
l'ber lorîya cemîlayê
çav li min pirr pirr

2.4.2.3. Nav bi Nav Haîkû

Ji her haîkûyên ku di vê bêşê de hatine nivîsandin re sernavek hatine dayîn. Ji ber vê yekê ye ku haîkûyên tê de wekî *nav bi nav haîkû* hatine binavkirin. Mijar û temayên her haîkûyan, li gor van sernavan hatine dîyarkirin û di heman demê de “haîkûyên navî” li gor van sernavan hatine honandin. Her sernav an rasterast wekî peyv di nav haîkûyan de hatine bikaranîn an jî bi awayekî nerasterast bi rêya bêjêyên ku bi wan navan re pêwendîdar, hatine îmakirin.

Gorîcan, di *nav bi nav haîkûyê* de bi rêya van nav/sernavan re hizr û ramanên xwe, rewşa derûniya xwe, hest û hestgermîyên xwe derdibîrîne. Li gel vê, rewşek, rûdanek, dîmenek û kêlîyek li ser van navan tê pêhesandin. Her navên taybet ên wekî kes, riwek û ajelan, termek û têgihek wekî şanîdera remzî û îmajî di haîkûyan de ji aliyê haîkûnûsî ve hatîye nîşanîkirin. Bi vî rengî sînorên haîkûyan nav bi nav tên amajekirin.

293.	300.	282.
celadet	jûjî	xîyar
ku ez tune bim —got xencera mîrê zimên j’kêçê jî b’tirsîn	çi derket pêşî bêhn kir çû bi fişefîş jûjîyê piştşûjin	l’bindara devçem hênîkî j’hênîkîyê za b’tîşên xîyaran
271.	286.	298.
melevan	mêtingeh	geremol
b’vê siba hênîk xortek û şeş extîyar bûn masîyên golê	l’kaşgeha Kêrsê j’bil xwe min bavek nedît ku b’lêva xwe be	rabûm raketim l’dor êşa xwe şêwişîm— biharek jî çû

Di *nav bi nav haîkûyê* de her sernav li gor nimrekirina haîkûyan weha hatine rêzîkirin:

Bêjeyên Sernavan	Hejmara haîkûyan
keser, penaber, derkenar, rêbend, timbirlök, alzeymir, sererastkarî, dinya, kêş, fehmi, mistik, mamoste, şahid, melevan, hayko, bêref, bawerî, şilî, zelê, bermalî, cemre, heft qîz, reşe, xîyar, bar, kulîlk, qebeqeb, mêtîngeh, mexreb, dê, suhbet, dilxet, têkoşîn, dû, celadet, mezax, neçar, muhasebe, zozê, geremol, huvîyet, jûjî, çira.	257, 258, 259, 260, 261, 262, 263, 264, 265, 267, 268, 269, 270, 271, 272, 273, 274, 275, 277, 278, 279, 280, 281, 282, 283, 284, 285, 286, 287, 288, 289, 290, 291, 292, 293, 294, 295, 296, 297, 298, 299, 300, 301.

2.4.2.4. Xêz bi Xêz Haîkû

Huner û forma haîgayî angî şewaza wêne-helbestê di her sê bêşên *Gumbilê* angî *gupik bi gupik haîkû*, *çîrok bi çîrok haîkû* û *nav bi nav haîkûyê* de wekî *xêz bi xêz haîkû* cih hatîye dayîn. Haîkûyên xêzkirî, her çiqas li gor hunera haîgaya japonî ya klasîk bi gotineka dî li gor stîla haîjînên japonî yê berê nehatibin nivîsandin û xêzkirin jî wekî îlustrasyonên modern ên haîgayî di berhemê de hatine xêzkirin.

Herweha hin haîkûyên tê de li gor fotoyan ku ji hêla haîkûnûsî ve hatîne kişandin, hatine nivîsandin. Li gel piraniya xêz û foto yê siruştî, yê wekî portre, vehonandî (xeyalkirî), tişt, amûr û alav ên wekî duçerxe, kopal, teyare, saet û ça, kaxiz û pênuş, cih û avahiyên wekî bajar, xanî, merzel jî hatine xêzkirin û kişandin.

Haîkûnûs, li gel bikaranîna rêbaza sketchê (şaseî), haîkûyên xwe yê xêzkirî û fotrafkirî bi awayekî lihevhatî nivîsandîye. Angî haîkûyên foto bi foto li gor wan dîmenan hatine honandin û îlustrasyonên haîkûyan li gor naveroka haîkûyan hatine xêzkirin. Bi vî awayî mijar û temayên haîkû yê xêzkirî wekî dîtînî tîne sewirandin û dîmenên fotoyan jî bi rêya nivîsandinê peyv bi peyv tîne nexşandin. Ji xeynî van, Gorîcanî hest û hizrên xwe bi heman rengî di *xêz bi xêz haîkûyan* de dide şewqdan.

Di berhema *Gumbilê* de haîkûyên bi fotraf û haîkûyên xêzkirî li gor haîkûyên nimrekirî weha ne:

Fotraf: 1, 60, 79, 108, 147, 166, 205, 257, 301.

Xêz (îlustrasyon): 10, 20, 30, 40, 50, 69, 88, 98, 117, 127, 137, 156, 175, 185, 195, 214, 224, 229, 236, 243, 250, 266, 276,


1.

pêşî sira xwe
dipifîne berfa spî
paşî dibêj çîq



50.

li rex pûna xwe
venişîye qijika belek—
li hiş zilikên nû



250.

j'kalê miksî ra
bûm kopalekî çar çav—
şadî şahid e



276.

zîna biskilba—
perperokên kurmançî
difirin ji lêvan



301.

çira
hin te dît rojkê
çirayê dunyaya ron
yekcar vêsîya l'te



2.4.2.5. Demsal bi Demsal Haîkû

Haîkûyên demsalî, di dawîya berhemê de ji alîyê haîkûnûsî ve bi navê *reqem bi reqem Pêrista Demsalî ya Haîkûyan* li gor demsalan hatine dabeşkirin. Bi vî awayî haîkûyên ku bi demsalan re têkildar li gor numareyan demsal bi demsal hatine diyarkirin. Gorîcan, di *Gumbilê* de li gel bikaranîna her çar demsalan herî zêde cih daye demsala havînê. Demsala biharê 27 car, demsala havînê 45 car, demsala payîzê 35 car û demsala zivistanê jî 15 car bûye mijarê haîkûyan û bi tevahî 122 haîkûyên demsalî hatine emilandin.

Haîkûnûs, bi zimanekî fesîh û sade, bi şêwaza xwe ya çavên û sêwirkar haîkûyên demsalî nivîsandîye. Bi hunerên edebî yê wekî şibandî û kesandinê re li ser hêmanên demsal, sirûşt û gerdûnê yê wekî mij, ba, şilî, berf, av, ax, riwek, ajel, esman, heyv, çîya, çem û zozanan hizir, hest û hestgermîyên xwe dide pêhesandin.

Di haîkûyên demsalî de şanîderên demsalan an rasterast bi navên demsalan re tên nîşanîkirin an bi bêjeyên kîgoyan re bi awayekî nerasterast, hatine îmakirin. Li gel vê, şanîder û bêjeyên du demsalan di yek haîkûya demsalî yê haîkûnûsî de bi hev re jî hatine bikaranîn.

22.	279.	51.
mil daye mijê	cemre	ka bisekine
herîr bi herîr tê jêr	ruh kete avê	dor hatîye temûzîyê
şilîya newrozê	hewa meyaye jixwe	çîçirkoka xef
	dor hatîye axê	
228.	78.	3.
zarokatîya me	yê ku vê sibê	tilvîsa kêmrô
ma l'gumbila wan daran	belgê l'reqsê germ dike	perûya tav û baranê
gelas dîlber ma	bayê gûzan e	binberf î îro

Haîkûyên demsalî li gor bêjeyên şanîdera demsalan weha hatine rêzkirin:

Demsal	Kîgo	Hejmara Haîkûyan
Bihar	Fesla biharê, qirik, ba, mij, şilîya newrozê, bişkojên daran, adar, reşêle, darzerdele, kerîyê beremakkirî, zerdele, cemre, zilikên nû, gulîyên zeytûnê, bilbil, meşar, şûvkin, çemê biharê, qîqîk, çirçirk, cotyar, cotkirin, şêlû û pêlgêrr, gûza qutimstûr, spîndar, gupikên zerdeleyan, şilî.	14, 17, 19, 21, 22, 22, 24, 28, 29, 31, 40, 41, 50, 66, 116, 124, 130, 131, 194, 200, 202, 206, 219, 229, 256, 275, 279, 298.
Havîn	Dendika sevê, çîyayê ava berxan, mêşhingiv, rengê zer ê derdoran, dar û belgên ber tavê, temûzî, kulîlka sinciyê, şetên çemê nizêr, dew, perwaneyên erdê, morîyên biperik, bilbil, hîvron, heftrenga şilîyê, tûtê reş, havîn, zozana bajêr, bayê bezê, bîşeng, şîqa tavê, mêş, çîz û moz, gumbila dara gûzê, qîqîk, pezpezk, şarşara kehnîyê, karwanê morîyan, gelas, spîndar, qijika genimxwer, dara biyê, reşêle, gûstêrk, dara tûyê reş, siba hênîk, bizin, reşe, xîyar, suhbet, zozanî, çûyîna biharê, jûjî.	4, 27, 41, 42, 45, 46, 47, 48, 51, 53, 54, 55, 58, 60, 63, 72, 75, 124, 132, 134, 141, 143, 148, 153, 155, 158, 160, 194, 197, 211, 216, 228, 229, 238, 251, 252, 255, 270, 271, 274, 281, 282, 289, 298, 300.
Payîz	Sira berfê, tilvîs, dendika sêvê, şaxê rût û belgên mirî, hafa avdayî, bayê gûzan, kulîna rengan, payîz, bih, sereberfan, cil û berg lixwekirin, çêre, heftrenga şilîyê, şîlank, ûşî, rez, şilî, werîsê şil, bîr, gûza şeqşeqî, şilî û şo, çardehşevî, qirik, xezemzera payîzan, kevnedar, cotyar, cotkirin, gumbila spîndarên rût, payîza têrxwê, parîyê şermê, spîndar, heyvika îlonê, qirik, beraz, êzingên zêvîyê, çirîya sar, nazkulîlka mor, ba.	1, 3, 4, 10, 74, 78, 87, 91, 94, 127, 132, 134, 147, 150, 157, 168, 170, 171, 173, 180, 181, 184, 193, 202, 217, 221, 223, 229, 253, 255, 266, 273, 283, 284, 291.

Zivistan	Berf, binberf, bûsetava germ, şaxê rût û belgên mirî, belga hişkolek, kulîyê berfê, zikê sibatê, devîya şîlankê, zivistan, gumbila spîndarên rût, parîyê şermê, tava zer, sîpanê dûser, berfa devbehr, şûnpên, devîya şîlanê, kaşgeha Kêrsê.	1, 3, 6, 10, 16, 40, 109, 174, 186, 217, 223, 224, 226, 244, 286.
----------	--	---

2.5. Sîhrên Mizewran

Berhema bi navê *Sîhrên Mizewran* ê Ergîn Sertem⁵⁰ di sala 2022an de hatîye weşandin. Sertem, di destpêka pirtûkê de derheqê demajoya nivîsîna haîkûyan de têbînîyek nivîsandîye û weha rave dike: “*Piraniya van haîkûyan di navbera payîza 2018 û havîna 2019an de li Stockholm-Uppsala (payîz-zivistan) û li Şemzînan (zivistan-bihar-havîn) hatine lêkirin... ku ev dem û dever divê li nav rêzan jî diyar bin...*” (2022: 6).

Sertem, piştî vê ravekirinê herweha di destpêkê de wekî epîgrafek, haîkûyek ji Şalaw Hebîbeyî jê wergirtîye. Di *Sîhrên Mizewranê* de bi tevahî 202 haîkû cih girtine û haîkûyên tê de di bin navê *Zivistan, Bihar, Havîn, Payîz û Fêrîkî* de wekî pênc beş hatine dabeşkirin. Haîkûyên *Zivistanê* 37, haîkûyên *Biharê* 45, haîkûyên *Havînê* 25, haîkûyên *Payîzê* 46 û yên *Fêrîkî* jî ji 49 haîkûyan pêk hatine. Haîkûyên demsalî tev 153 haîkû ne ku bi rêya rêbaza şanîderên demsalan ango kîgoyê di nav beşên *Zivistan, Bihar, Havîn û Payîzê* de hatine diyarkirin. Li gel vê, haîkûyên *Fêrîkî* ku haîkûyên di vê beşê de cih girtine, li gor risteyên helbestên helbestvanê kurd *Fêrîkî Usîvî* bi emilandina hunera edebî ya nîv jêgirê (nîv îqtîbas) hatine honandin.

Haîkûyên berhemê nehatine numarekirin û ji xeynî bikaranîna her pênc bin navan wekî din tu sernav ji haîkûyan re nehatîye dayîn. Ji ber giringî û balkişandinê

⁵⁰ Ergîn Sertem (Ergin Öpengin) di sala 1985an de li Şemzînana Colemergî hatîye dinê. Li Stenbol û Parîsê lîsans û xwendina bilind di warê zimannasîyê de temam kiriye. Çendîn kitêb û wergerên wî li gel hejmareka meqaleyên wî li ser zimannasî û wêjeya kurdî çap bûne. Di warê helbestê de dîwana wî bi navê *Çend Danên Hişyar* (2018) û wergera wî ya *Illuminations* ya Arthur Rimbaud bi navê *Bîrçên Dîrexşan* (2019) çap bûne. Li Zankoya Kurdistan-Hewlêrê mamostetî kiriye. Niha li Zanîngeha Cambridegyê ye.

hin nav û bêjeyên taybet bi rêya îtalîkkirinê hatine kirpandin.⁵¹ Ji bo têgihiştina hin peyvên resen ango di zimanê nivîskî de zêde nehatine emilandin, bi rêya têbînîyan hatine îzahkirin. Herweha ji bo ku hin bêje di alfabeya latînî de li gor resenîya bilêvkirina xwe ya di zimanê erebî de rast bên xwendin û nivîsandin di ser hin tîpan de îşareta eynê (‘) û ya hemzeyê bi rêya apostrofê (’) hatîye bikaranîn.⁵²

Haîkûyên tê de bi latînî û erebî wekî du alfabe û bi kurmancî û soranî wekî du zaravayên kurdî hatine nivîsandin. Bo mînak:

14/2.

Sivdera jûrê

سڤدەراژ و وری

Nefesek ji payîzê

نەفەسەک ژ پایزی

Bêhna bîhokê

بێهنا بێهۆکی

Sihrên Mizewran, ji hêla ristesazkirin û kitesazkirina teşeyî ve her çiqas kêşa kîte (hilm) yên cihêreng hatibin bikaranîn jî piranîya haîkûyan li gor hakûya 5/7/5 û 17 kîteyê hatine vesazkirin. Di gel zêde nebikaranîna bêjeyên kirejîyê, ji ber aheng û newaya haîkûyan û herweha ji ber lihevhatina kêşa riste ya 5/7/5 hilmî kirejîyên bi xalbendî, zêdetir bi vî armancî hatine emilandin.

Berhem, hem bi rêya sernavê pirtûkê hem bi pênc binenavên naverokê re ji hêla mijar û temayan ve xwe nîşanî dike. *Sihrên Mizewran*, tê wateya *ewrên tenik ên bi efsûn* ango *mij’ewrên efsûnî* ku hem wateyeka asayî, sirûştî hem wateyeka dersirûştî dide. Bi vî rengî wek remz û hêmayî *Sihrên Mizewran* şanîdera poetîkaya haîkûyên haîkûnîsî ya “rasteqînîya efsûnî” amaje dike.

Li gel vê, haîkûyên *Zivistan*, *Bihar*, *Havîn* û *Payîzê* ango yên demsalî û sirûştî jî bi şêwaza rêbaza kîgoyê û bi awayekî lîrik hatine honandin. Ji bilî van, haîkûyên *Fêrîkî* jî li gor mijar û temayên helbestên bijarte yên helbestvan Fêrîkî Usîvî ku

⁵¹ Bêjeyên îtalîkkirî: Bîrqên Direxşan (39/3), Morana Gerdûnê (39/4), birch (52/1), Birch (52/2).

⁵² Bêjeyên bi îşareta eynê (‘) hatî bikaranîn: ‘edem (13/3, 13/4), ‘eba (16/1), ‘ewr (31/4, 47/4, 50/2, 56/2), ‘esr (39/3), şem’a (41/1), sa’et (49/1), ‘hewk (58/1), şa’ir (68/3, 69/1, 70/3, 73/3)

piranîya wan lîrîk û pastoral in, bi awayekî pêwendîdar û lihevhatî hatine ristesazkirin.

2.5.1. Vekolîna Teşeyî

2.5.1.1. Teşeya Ristesazî

Haîkûnûs, di teşegirtina haîkûyan de ji 202 haîkûyan bi tevahî 140 haîkû li gor kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî û 17 kîteyê ristesaz kiriye. Di beşa *Zivistane* de 35; di beşa *Biharê* de 27; di beşa *Havînê* de 18; di beşa *Payîzê* de 37 û di beşa *Fêrîkîyê* de jî 23 haîkû li gor kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî û 17 kîteyê hatine nivîsandin. 60 haîkûyên din jî ji xeynî kêşa kîte ya 5/7/5 hilmî û 17 kîteyê li gor kêşa kîteyên curbicur hatine vesazkirin.

Di sazkirina haîkûyan de xasma jî di yên 5/7/5an de ji alîyê xwendina bideng ve ahengek, newayeka soneyî hatîye amajekirin. Di vê lihevkerinê de ji kirejîyan, kirejîyên bi xalbendî bi taybetî xalbendîyên apostrof û bendikan jî sûdê hatîye wergirtin.

12/1.

24/4.

65/2.

Xanikê tenê	5	Ka ar-çekuçên	5	Koç milmilîn	4
Li xeta rêl-zeviyan	7	Kawa w Adarê, ho	7	Kanîbihar xulxulîn	7
Paceyên ronî	5	Bajarê ketî	5	Ez bi heyr, hesret	5

(Çiyano)

Ji hêla ristesazkirinê ve haîkûyên berhemê li gor pênc beşan weha hatine dabeşkirin:

Beş	Kêşa Kîte/Hilman	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Zivistan	4/7/5	15(3)
	5/7/5	11(1,2,3,4), 12(1,2,3,4), 13(2,3,4), 14(1,2,3,4), 15(1,2,4), 16(1,2,3,4), 17(1,2,3,4), 18(1,2,3,4),

		19(1,2,3,4), 20(1)
	6/8/7	13(1)
Bihar	4/7/5	28(4)
	5/5/5	24(1)
	5/6/5	23(1,4), 26(1,2,3), 28(1)
	5/7/5	24(2,3,4), 25(2,3,4), 27(1,2,3,4), 28(2,3), 29(3,4), 30(1,3,4), 31(1,3,4), 32(1,2,3,4), 33(1,2), 34(1)
	5/7/6	23(2), 26(4), 30(2)
	6/5/6	25(1)
	6/6/7	23(3)
	6/7/5	29(1,2), 31(2), 33(3)
	6/8/5	33(4)
Havîn	5/7/5	37(1,4), 38(1,3), 39(1,3), 40(1,2,3,4), 41(1,2,3,4), 42(1,3,4), 43(1)
	5/7/6	38(2), 39(4), 42(2)
	5/8/6	37(2)
	5/9/5	37(3)
	5/9/6	39(2)

	6/7/5	38(4)
Payîz	5/6/6	56(1)
	5/7/4	56(4)
	5/7/5	47(1,2,3,4), 48(1,2,3,4), 49(1,2,3,4), 50(1,4), 51(1,2,3,4), 52(1,3,4), 53(1,2,3,4), 54(1,2,4), 55(1,2,4), 56(2,3), 57(2,4), 58(1,2)
	5/7/6	52(2), 53(3), 57(3)
	6/7/5	50(1,2), 54(3), 57(1)
Fêrîkî	4/7/5	65(2), 69(2)
	5/6/5	79(1)
	5/6/6	69(1), 78(1)
	5/6/7	67(1)
	5/7/4	63(1), 72(2)
	5/7/5	63(2), 64(1,2,3,4), 65(1), 68(3), 70(3), 71(1), 72(1,3), 73(1,2), 74(1,2,3), 75(2,3), 76(1,3), 77(1,2,3)
	5/7/6	65(3), 70(1), 78(2)
	5/8/6	68(2), 70(2)
	5/9/5	78(3)
	6/5/5	71(2)

	6/7/5	63(3), 66(1), 68(1), 75(1), 76(2)
	6/7/6	73(3)
	6/7/7	66(2), 69(3)
	6/7/8	67(2)
	6/8/8	67(3)
	6/9/7	66 (3)
	7/5/6	71(1)

2.5.1.2. Kirejî

Di *Sîhrên Mizewranê* de rêbaza deng birînê kirejî, di gel bikaranîna hin bêjeyan ji ber yekpareyî ya bi teql û melodîk a haîkûyan, zêde nehatîye tercîhkirin. Bêjeyên kirejî yên “vê û ew” wekî tîltek di haîkûyan de dîmena wê kêlîyê nîşan dike, bêjeya “ho”yê bangkirin, yên “ka, çi” bi rêya pîrskirinê balkişandinê îşaret kiriye.

23/2.

56/4.

63/1.

Sî-sîtava vê

Sîngê zer-mêrg e

Sifet terrîcan

Darmaziya hezar-lep

Bejna ji çîn û maçîn

Dilê'm çivîka birçî,

Rû berfa adarê

Ho Feraşîn

Ka ramûsan?!

(Sifetê Te)

Bêjeyên kirêjî yên ku di haîkûyan de hatine bikaranîn, weha hatine senifandin:

Beş	Bêjeyên Kirejîyê	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Zivistan	vê.	11(2)
Bihar	ho, vê, ew, ka, ta.	23(1,2,4), 24(1,4), 25(2), 30(3), 31(2)

Havîn	tu, diçe, tê.	37(2), 42(2), 43(1)
Payîz	ho.	56(4)
Fêrîkî	ka, ma, çi.	63(1), 65(3), 68(1), 79(1)

2.5.1.3. Kirejîyên Bi Xalbendî

Di berhemê de her çiqas nukteşanîyên kirejîyê gelekî cihêreng nebin jî, wekî kirejîyên xalbendî yên zêdetirîn hatine emilandin apostrof, bendik û bêhnok in. Sertem, di nav van her sê îşaretên xalkirinê de herî zêde cih dayê îşareta bendikê. Di gel ku di haîkûyan de mebesta bikaranîna kirejîyên bi xalbendîyan têvel bin jî, li gor xasyetên haîkû yên wekî teql û armonî, xwendin û bilêvkin û teşeya ristesazkirin a kêşa kîteyan, xalbendî bi armanceka hevpar hatîye amajekirin.

Bo nimûne, îşareta apostrofê hem ji bo şanîkirina bilêvkin û xwendina bideng ên bêje û pêşdaçek/bazinedaçekan hem pêhesandina ahengên haîkûyan û hem jî li gor kêşa kîte yên cihêreng hatîye bikaranîn. Li gel vê, bêhnok di kontekst û yekpareyîya haîkûyan de da ku xwendineka birêkûpêk û têgihiştineka fambar çêbibe di erka rawestandîna de hatîye xuyakirin. Ji xeynî van, îşareta bendikê jî di haîkûyan de ji bona peywirên cuda yên wekî li şûna gîhaneka “û”yê, xwendin û deng birînê hatîye nîşanîkirin.

17/3.

41/4.

64/3.

Cotê qeşqe

Mizewrên perrik

Distre cew nazik

Kopê dara mazîyê

şahî li erd-esmanan

Siya biyê, per-milyaket

Hêlîn d' bin berfê

dilên tenik sayî

Datê l' can-cesed

(Cew Distrê)

Kirejîyên bi xalbendî li gor her çar beşên demsalî û beşa Fêrîkî bi vî awayî hatine dabeşkirin:

Beş	Xalbendî	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Zivistan	Bêhnok	12(4)
	Bendik	12(1), 13(1,2), 14(4), 17(2), 18(3), 19(1,2,3)
	Apostrof	11(2), 12(2), 13(1), 17(3), 18(2), 19(2)
Bihar	Bêhnok	24(1,3,4), 25(3), 26(1), 31(1,2)
	Bendik	23(2,3,4), 24(4), 25(2), 27(1), 28(3), 29(1), 31(2,4), 32(1)
	Pirsnişan	25(2)
	Apostrof	23(1,3), 24(1,2), 25(1), 26(1), 27(1), 28(1), 31(4), 34(1)
Havîn	Bêhnok	37(2,3,4), 39(4), 40(1), 42(2)
	Bendik	37(1,2,3), 38(2,4), 39(1,2,4), 40(3), 41(2,4)
	Apostrof	38(2), 39(4), 40(1), 43(1)
Payîz	Bêhnok	49(3), 50(4), 57(1,4)
	Bendik	47(1), 48(1,2,4), 50(2,3,4), 51(3), 53(1,3), 56(2,3,4), 57(2), 58(1)
	Apostrof	47(2,3), 48(1), 52(1), 57(1)

Fêrîkî	Bêhnok	63(1), 64(1,3), 65(1,2), 66(1,2,3), 67(2,3), 68(1,2), 69(1), 70(2), 71(3), 75(2), 78(1)
	Bendik	63(2,3), 64(3), 65(1), 66(2,3), 67(3), 68(2,3), 69(1), 70(1), 71(2,3), 72(2,3), 73(1,2), 75(3), 76(2,3), 78(3), 79(1)
	Dunik	78(3)
	Pirsênîşan-Bangênîşan	63(1)
	Apostrof	63(1,2,3), 64(1,2,3), 66(3), 67(1,3), 68(1,2), 69(3), 70(1,2,3), 71(2), 73(2), 74(2), 75(2), 76(1), 77(1), 78(1)

2.5.2. Vekolîna Tematîk

2.5.2.1. Zivistan

Haîkûyên demsalî yên zivistanê bi şêwaz û rêbaza kîgoyê li gor bêje û têgihên demsala zivistanê hatîye nivîsîn. Wate, hêma, remz û metaforên haîkûyên vê beşê li ser demsala zivistanê wekî şanîdêr hatîye tixûbdarkirin. Bi vî rengî haîkûyên demsala zivistanê ji alîyê temayan ve di nav yekpareyîya demsala zivistanê de hatîye nîşanîkirin.

Peyv û têgihên ku bi gerdûn û sirûştê re eleqedar, wekî şanîdera demsala zivistanê di nav haîkûyên zivistanê de hatine parzûnkirin. “Tîrêj, gir, werz, mij, tav, heyv, şape, gerdûn, çîya, roj, esman, bilindahî, tebyet, bask, bandev, baran, şilove, dol, lan” ên ku di vê demsalê de wekî bêje û hêma, remz, metaforên gerdûn û sirûştê hatine bikaranîn, di heman demê de cîhanbînîya haîkûnûsî ya derbarê demsala zivistanê de jî diyar dike.

11/3.

13/2.

13/3.

Şexteya salê

Zivistana kerr

Heyva qemirî

Bir werzê cudayîyê

lalome li xwe naînî -

Peşk ji şapeya 'edem

Qerisîn guvîj

Tav û heyv bêzar

Xema gerdûnê

Zeman û mekan di beşa demsala zivistanê de yan bi awayekî rasterast an jî bi şêwaza îmakirinê hema hema di her haîkûyan de cih girtine. Têgiha zemanê di haîkûyan de li gor dan û yekeya demî ya demsala zivistanê bi awayekî lihevhatî hatîye xuyakirin. Kêlîyên dem û danên zivistanê yên haîkûnûsî bi dîmenên mekanan re di haîkûyên zivistanî de xwe nîşan dike. Herweha piranîya mekanên Sertemî yên xwezayê ne ku di haîkûyên vê beşê de dîmen û dîtbariyên şûngehan li gor demsala zivistanê hatine honandin.

Hêma, remz û metaforên zeman û mekan yên ku bi demsala zivistanê re têkildar “êvar, têt, sal, berbang, şev, xanî, xeta rêl-zevîyan, rêl, zivistan, gerdûn, şeva yelda, şevçere, çile, sivdera jûr, payîz, dawîya kanûnê, spêde, sîber, berêvar, welatê xudîk, qefesa sîngê tep, werzê tarî, li bin ‘ebayê çiya, qepenên sîyê, quntar, demsal, esman, sibê, sivande, kopê dara mazîyê, hêlîn, di bin berfê, di nava berfê re, çarşev, tebyet, pesar, baskên çileyê, heyhot, banê kezîşor, ser sobê, bin berfê, bandev, gelawêj, gozik, gîsk, dan, reşeme, dolên demsalê” ne. Ev bêje û têgihên zeman û mekanê di heman awayî de wekî bêje û têgihên kîgo ango şanîderên demsala zivistanê hatine nîşandan.

11/4.

18/2.

20/1.

Rêla darkajan

Spêda heyhotê

Marê bêlan e

Berbanga deşta berfîn

Diteyîse sirra hişk

Şîvika zivistanê

Reşeyên şevê

J' banê kezîşor

Di nava berfê re

Civak, mirov û hêmanên wan ên sereke yên wekî çand, bawerî, dîrok, alavên rojanê û jiyîna rojane di haîkûyên zivistanê de bûne mijarên vê beşê. Li gel vê, haîkûnûs bi rêya bikaranîna bêjeyên “şeva yelda” “taqê zulkarneyn” “pîrêmêr” “sefer” “dêlindêz” “şûr” “çaydank/sobe” “têştexewa” “xwîn” ên ku hem hêmanên bi

civak û mirovî re û hem peyvên ku bi demsala zivistanê re pêwendîdar in, cih daye temayên civakî û mirovî.

13/4.

Şeva Yelda ye

Koşa şevê mişt hinar

Têhna ji 'edem

15/1.

Xirêneke bênezm

Ji qefesa sîngê tep

Xewa pîremêr

18/3.

Çaydank ser sobê

Neqreta zivistanê -

Gizêna bi hemd

Lîrîzm û pathos di haîkûyan de li gor rewş û atmosfera demsala zivistanê hatine honandin. Haîkûnûs, hest û hestgermîyên xwe yên cihêreng li hemberî demsalê bi rêya hunerên edebî yên wekî îstîare, kesandin, şibandîne re di haîkûyan de daye şewqandin. Herweha dîmen, qewimîn û kêlîyên demsala zivistanê yên ku lê tesîr bûne, bikaranîna bêje û têgihên wekî “bêdengî, kerrbûn, tenêti, bêzar, xem, dilveker, nefes, aramî, xudîk, westiyayî, bêaramî, şeng, hêsir, mitbûn, bêsebr”ê di haîkûyên zivistanê de hatîye pêhesandin. Bi vî awayî Sertem his û dîlîzîya xwe ya ku di demsala zivistanê de çê bûye, dide nîşandan.

17/2.

Spêdeya berfê

Lep-tilîkên bûka şeng

Şaxên gêlazê

18/4.

Diteyîse roj

Di têtstexewa xwe de mit

Palên bin berfê

19/2.

Şere-gelawêj

Gozikên şiloveyê

B' ser gîskê bêsebr

Ajel û riwekên haîkûyên zivistanê hem wekî kîgo, şanîderên demsala zivistanê hatine bikaranîn û hem wekî metafor, remzî û hêmayî rengpêdana hest û dîlîzî ya haîkûnûsî hatine amajekirin. Piranîya ajel û riwekan di nav yekpareyîya demsala zivistanê de bi awayekî nîşander di haîkûyan de xwe didin nîşandan. Sertem, li gel xwezayî û asayîya wan, bi şewaza îmakirin û îmajê jî ajel û riwekan di haîkûyên zivistanê de saz dike.

12/3.

Li pişt berfê

Rêla darkajên hevbejn

Reşeyên herherê

15/3.

Li ber çavan

Hêjûrên tijî şîre

Zivistana tal

17/3.

Cotê qeşqe

Kopê dara maziye

Hêlîn d' bin berfê

Bi giştî, hêma, remz, metafor û têgihên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos ajel, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyên *Zivistanê* de cih girtine weha hatine senifandin:

Tema	Zivistan	
	Hêma, Remz, Metafor û Têgih	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Gerdûn û Sirûşt	Tîrêj, gir, werz, mij, tav, heyv, şape, gerdûn, çîya, roj, esman, bilindahî, tebyet, bask, bandev, baran, şilove, dol, lan.	11(1,2,3,4), 12(4), 13(2,3), 15(4), 16(1,2,3,4), 17(4), 18(1,4), 19(1,2,3,4), 20(1)
Zeman û Mekan	êvar, têt, sal, berbang, şev, xanî, xeta rêl-zevîyan, rêl, zivistan, gerdûn, şeva yelda, şevçere, çile, sivdera jûr, payîz, dawîya kanûnê, spêde, sîber, berêvar, welatê xudîk, qefesa sîngê tep, werzê tarî, çîya, qepenên sîyê, quntar, demsal, esman, sibê, sivande, kopê dara mazîyê, hêlîn, di bin berfê, di nava berfê re, çarşev, tebyet, pesar, baskên çileyê, heyhot, banê kezîşor, ser sobê, bin berfê, bandev, gelawêj, gozik, gîsk, dan, reşeme, dolên demsalê.	11(1,2,3,4), 12(1,2,3), 13(1,2,3,4), 14(1,2,3,4), 15(1,3,4), 16(1,2,3,4), 17(1,2,3,4), 18(1,2,3,4), 19(1,2,3,4), 20(1)
Civak û Mirov	şeva yelda, taqê zulkarneyn, pîrêmêr, sefer, dêlindêz, şûr, çaydank, sobe, têştexewa, xwîn.	13(4), 14(4), 15(1), 15(2), 16(3), 16(4), 18(3), 18(4), 19(1)

Lîrîzm û Pathos	bêdengî, kerrbûn, tenêti, bêzar, xem, dilveker, nefes, aramî, xudîk, westiyayî, bêaramî, şeng, hêsir, mitbûn, bêsebr.	12(1,2), 13(1,2,3,4), 14(1,2,4), 15(3), 16(3,4), 17(2), 18(3,4), 19(1,2)
Ajel û Riwek	reşêle, qel, qeşqel, kew, mar.	11(2), 12(4), 17(3), 18(1), 20(1),
	guvîj, rêl, darkaj, dar, hinar, bîhok, hêjîr, şaxên gêlazê, dara mazî.	11(3,4), 12(1,2,3), 13(1,4), 14(2), 15(3,4), 17(2,3)

2.5.2.2. Bihar

Haîkûyên vê demsalê li gor dîmen, rûdan, rewş, liv û tevgera hêmanên biharê hatine nivîsîn. Kîgo, peyv û têgihên haîkûyên biharê bi şiklekî xuyaker û geşker hatine bikaranîn. Sertem, metafor, remz û îmajên resen ên ku bi demsala biharê re pêwendîdar, haîkûyan nexşandiye. Bi vî rengî çavdêrî û pêhesînên xwe yên ku bi demsala biharê re eleqedar in, di haîkûyên biharê de derbirandiye.

Gerdûn û sirûşt di haîkûyên biharê de jîndar û livdar in. Hêmanên gerdûn û sirûştê li gel hatina demsala biharê, di nav xwezayîyên xwe de kirasên xwe diguherînin. Haîkûnûs, vê seremonîya dîmen û livandinê bi bikaranîna hunerên edebî yên wekî dirûvpêxistin, teswîrkirin û kesandinê di haîkûyan de amaje dike. “Tav, sî-sîtav, helan, serav, rûbar, erd, pêsar, ax, tavik, ba, berq, pal, beng, çel, çîya, reş’ewr, esman, baran, xunav, gizing, hurreba, berpalî” wekî bêje û termên gerdûn û sirûştî ne ku di haîkûyan de cih hatine dayîn. Herweha, evana wekî peyvên şanîker hatine bikaranîn û wateyên haîkûyên biharê bi vî awayî tên xuyakirin.

25/4.

Şurrikên adarê

Vedişon dîs zewaca

Axê û berfê

32/1.

Esmanê zîvîn

Li pey barana şevê

Rû-rengên xwedê

32/2.

Xunava belor

Diçilvile li belgan

Gizinga zêrîn

Di haîkûyên demsala biharê de têgiha zeman û mekanê di nav duyatîya xwe de hatine nîşankirin. Yekeyên zemanê ji kêlî, dan, roj û mehên demsala biharê pêk hatine. Kespa demê, di haîkûyan de bi piranî ji dûmen û pêhesîyên kêlîkan çê bûye û demsala biharê, li gel parçeyên zemanê bi awayekî berçav hatîye xêzkirin. Li gel vê, hêmana mekanê jî ji şûngehê biçûk ên wekî “li ser tavên derbiharî, li ser tilîyên nazik, banê kîvarkê” ta yên mezin ji “esman, çiya, gelî” wekî cihên haîkûyên biharê hatine diyarkirin.

Zeman û mekan, ji xeynî van bi bêjeyên wekî “adarok, adar, serav, rêza cot-daran, adara dewran, bihar, zistan, bajar, nîsan, danesal, pesar, rêza darên kevnar, tirbe, bakurzemîn, spêda nîsanê, rûbar, pêşîrên çiya, gelî, beral, dola nîsanê, êvara biharê, li ber tavî, stêrezerka nîsanê, sal, îsal, demsal, demê nîvro, beng, rez, li serê stûnê, çel-çiya, sibê, werz, Çelên Gomanê, gulan, esman, şev, biheşt, spêdeya biharî, li ber tava nîvro, d’ber bayê nawext”ê re jî di haîkûyên demsala biharê de hatine kêlîkirin.

23/4.

Rêza cot-daran

Qurmên qutbê ne ew

Perrên rûbarî

27/4.

Roja nîsanê

Li ser banê kîvarkê

Vedibe bihar

31/2.

Çel-çiyayên xerre

Xerq û berze, vê sibê

Mija werzê şaş

Temayên civak û mirovî di haîkûyên biharî de exlebî li gor kesên cihêreng, bawerî, çand, amûr û kiryarên civakê hatîye honandin. Haîkûnûs, bi rêya hunerên telmih û teşxîsê re kes, kirû û kiryarên ku bi demsalê re eleqedar, amaje kiriye. Herweha rewş, liv û tevgera civak û kesên a ku li gor xasyetên demsala biharê derketîye holê, wekî tabloyek di haîkûyan de hatîye xuyakirin. Hêma, remz û metaforên ku bi temayên civak û mirovan re têkildar, ev in: “ar-çakûç, kawa, newroz, têstexew, banga xwedê, şivan, pale, tevr, rû-rengê xwedê, şevreşk”.

24/4.

Ka ar-çekuçên

Kawa w Adarê, ho

Bajarê ketî

28/1.

Çavan venakin

Bişkojên behîvan

J’ şextên newrozê

30/4.

Rezê li bengê

Dinalîne li ber tevrên

Rêza paleyan

Di haîkûyan de lîrîzm û pathosa ku li hemberî demsala biharê hatîye derbirîn, bi piranî hestên keyfxweşî û aramîyê di xwe de hewandîye. Deng, reng, menzere û “reqs”a biharê, di hest û hestgermîya haîkûnûsî de bandoreka erênî, întibayeka çavtêr/diltêr çê kiriye. Sertem, li gel bikaranîna peyvên wekî “kerb, sone, cîkeçik, giranî, cejn, xeşîm, mendo, şad, dil, nalîn, şaş, gêj, bedew, nazik, reqs, bêdilî” hestên xwe yên bi demkî û kêlîkî dide pêhesandin.

23/3.

Soneyên adarê

Peng û pengurrî l’ber

Şîn-helanê seravê

27/3.

Nisanxêr dahat

Çû lihêfa danesalê

Bakurzemîn şad

33/1.

Li pêşber çiya

Bûnewereke bedew

Hilûya kulîlkwer

Herçî ajal, riwek û hêmanên wan in, di haîkûyan de hem wekî remzên demsala biharê û hem wekî îmajê şewqdan a derbirana hestên haîkûnûsî hatine nîşankirin. Ji alîyekî dî ve, şayesandîna wan di nav xwezayîya xwe de bi awayekî xwerû li pêş çavan hatîye xistin. Sertem; dîmen, rewş, livandinên ajal û riwekan di nav sirûştê de bi demsala biharê re bi rengê lihevhatî, daye xuyakirin. Li gel vê, xasyetên mirovî li ser wan veguheştîye û bi vî awayî hestpêkirinek, pêhesandinek di haîkûyên demsala biharê de çê kiriye.

27/2.

Feslê nîsanê

Dibarin ser tirbeyê

Daneyên mirwarî

32/3.

Baranê vekir

Serî hilda nefelê

Lota hengan e

34/1.

Reqsê bê dil e

Darhilûya kulîlkwer

D’ber bayê nawext

Hêma, remz, metafor û têgihên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajal, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyên *Biharê* de cih girtine, weha ne:

Tema	Bihar	
	Hêma, Remz, Metafor û Têgih	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Gerdûn û Sirûşt	Tav, sî-sîtav, helan, serav, rûbar, erd, pesar, ax, tavik, ba, berq, pal, beng, çel, çiya, reş'ewr, esman, baran, xunav, gizing, hurreba, berpalî	23(1,2,3,4), 25(1,3,4), 26(1,3,4), 27(1), 28(1,3,4), 29(1,2,3,4), 30(3,4), 31(2,3,4), 32(1,2,3,4), 33(1,3,4), 34(1)
Zeman û Mekan	li ser tavên derbiharî, li ser tilîyên nazik, banê kîvarkê, esman, çiya, gelî adarok, adar, serav, rêza cot-daran, adara dewran, bihar, zistan, bajar, nîsan, danesal, pesar, rêza darên kevnar, tirbe, bakurzemîn, spêda nîsanê, rûbar, pêsiirên çiya, gelî, berpal, dola nîsanê, êvara biharê, li ber tavî, stêrezerka nîsanê, sal, îsal, demsal, demê nîvro, beng, rez, li serê stûnê, çel-çiya, sibê, werz, Çelên Gomanê, gulan, esman, şev, biheşt, spêdeya biharî, li ber tava nîvro, d'ber bayê nawext.	23(1,2,3,4), 24(2,3,4), 25(1,2,3,4), 26(1,2,3,4), 27(1,2,3,4), 28(2,3,4), 29(1,2,3,4), 30(1,2,3,4), 31(1,2,3,4), 32(1,4), 33(1,2,3,4), 34(1)
Civak û Mirov	ar-çakûç, kawa, newroz, têştexew, banga xwedê, şivan, pale, tevr, rû-rengê xwedê, şevreşk.	24(1,4), 28(1,2), 29(1,2,3), 30(3,4), 32(1)
Lîrîzm û Pathos	kerb, aramî, cîkecik, giranî, cejn, xeşîm, mendo, şad, dil, nalîn, şaş, gêj, bedewî, nazikî, keyfxweşî, bêdilî.	23(1,3), 24(1,2,3,4), 25(1,2,3), 26(1,3), 27(3,4), 30(2,4), 31(1,2,4), 32(3), 33(1), 34(1)

Ajel û Riwek	şevşevok, terlan, çûk, mirwarî, mêşehingiv, bizin, qeşqela belek, reşbelek.	24(1), 24(3), 26(4), 27(2), 28(2), 29(3), 33(4), 31(1), 33(4)
	dar, dara mazî, qurm, dara dêrîn, şîlan, ber, dahat, bişkoj, kîvark, bişkojên behîvan, belg, nefel, pişk, dar hilû, hilû, kulîlk, kulîlkwer, xox, pel.	23(4), 26(3) 23(2) 23(4) 25(2) 26(2) 26(4), 28(3) 27(2) 27(1), 31(4) 27(4) 28(1) 32(2), 32 (3) 32(4) 32(4), 33(1), 34(1), 33(1), 33(2), 34(1) 33(2) 33(3)

2.5.2.3. Havîn

Haîkûyên *Havînê*, di nav wateyên xwe yên remzî û hêmayî de hatine ristandin. Haîkûnûs, demsala havînê li gel bêje û têgihên şanîderên demsalê di nav haîkûyan de bi rêbaza sketchê resmandîye. Bi vî awayî, bi giştî haîkûyên di vê beşê de li gor metod û şêwaza kîgoyê ji bo nîşanîkirin û pêhesandina demsala havînê hatine vesazkirin.

Temayên gerdûn û sirûştê di haîkûyên havînî de li gel bikaranîna hêma, remz û metaforên ku bi wan îşaret û îma dike, yên wekî “heyv, çem, çîya, esman, beyar, şevba, dol, zinar, stêr, nîv-heyv, birq, ax, kop, roava, gelî, deşt, deryaçe, şem’a, çilvilîn, hewa, pal, mizewr, erd, esman, aso, bayê şerqî” pêk hatine. Haîkûnûs, bi şêwaza sêwirandin, şibandin û çavdêrîyeka xwerû haîkûyên xwe honandîye. Gerdûn û sirûşt, wekî tematîk di vê beşê de ji xeynî çar haîkûyan (39/1,2,4 û 42/1), di her haîkûyên havînê de hatine bikaranîn.

38/2.

Heyva têr-şema

Ronkatiyên zîvîn l’ser

Zinarên tîrmehê

40/2.

Axirê tebaxê

Dikişe kopên başûr

Roava bi dor

41/4.

Mizewrên perrik

şahî li erd-esmanan

dilên tenik sayî

Hêmanên zeman û mekanê di haîkûyên demsala havînê de bi renegekî lihevhatî bi gotineka dî li gor diyardeya *niha* û *lihayê* hatine sazîkirin. Bi giştî, têgiha zemanê di haîkûyan de yan bi navên mehên havînê re hatîye diyarkirin an wekî danek ji demsala havînê hatîye nîşanîkirin. Piranîya mekanaan, ji hêmanên gerdûn û xwezayê hatine bijartin. Sertem, li gel bikaranîna hêma, remz û metaforên “şev-hezîran, şev, çem-çiya, havîna esman, sihar, zevî, tîrmeh, beyar, dol, zinar, şeva nivê havînê, ‘esir, l’nav perrên Morana Gerdûnê, l’ser axa tebaxê, axirê tebaxê, kopên başûr, deşta kizirî, havîna başûr, li ser rûbarê, deryaçe, şevên havînê, spêde, erd-esman, aso, sibe, gelî, şeva Dêrsimê, Gelîyê Xezekya, payîz”ê di nav haîkûyên havînê de kêlîkên mekanên xwe û herweha menzereyên mekanên xwe amaje kiriye.

37/3.

Şeva peng-rewan

Esmanê qure, li siharê

Zevî hazir e

40/3.

Kit-biyên bêzar

Li rex deşta kizirî

Havîna başûr

42/3.

Strana sîsirkan

Disime geliyê kûr

Şeva Dêrsimê

Di beşa *Havînê* de haîkûyên ku bi civak, mirov û hêmanên wan re eleqedar, tenê di rûpelên 39(1,2,3,4), 42(1)an de hatine emilandin. Di van pênc haîkûyan de bêjeyên ku hêmanên civak û mirovan nîşanî dike ev in: “saz-sêtar, şerab, mosîqa, mirovî, Birqên Direxşan, Morana Gerdûnê, nivêja cejnê û şaşıka Mela Mezher”. Haîkûnûs, bi wan haîkûyên civak û mirovî jî di nav yekpareyîya demsala havînê de vesaz kiriye.

39/2.

Stûr dike dîsa

Sore-şeraba mosîqayî

Xasyetê miroviyê

39/3.

Roniya ‘esrê

Dûrebînêd bedewiyê

Birqên Direxşan

42/1.

Nivêja cejnê

Şaşıka Mela Mezher

ma nepêçayî

Lîrîzm û pathos, di haîkûyên havînê de li gel bikaranîna bêjeyên hestî yên wekî “hezîn, kubar, peng-rewan, qure, qelb, sukût, stran, mosîqa, bedewî, berdoş, pest-perîşan, bêzar, cergê kizirî, bêdengî, şahî, dilên tenik sayî, bûk, telaş”ê hatine derbirîn. Di rengvedana hest û hestgermîyan de haîkûnûs, exlebî heyber û hêmanên

gerdûn, xweza û demsalê bi kar anîye û bi rêya hunera veguhestina xasyetên mirovî ango teşhîsê jî lîrîzm û pathosê di haîkûyan de dide hesandin.

37/2.

41/2.

42/4.

Şevên sivik bar

Hewa tenik-mend

Geliyê Xezekya

Teysa heyvê li çem-çiya

Parçeyên bêdengiyê

Êkedarên bi telaş

Tu, havîna kubar

Lê hilawistî

Palên payîzê

Di haîkûyên demsala havînê de ajel û riwekên ku bi demsala havînê re pêwêndîdar li ber çavan in. Her çiqas ajel û riwek di vê bêşê de zêde nehatibin bikaranîn jî mar, gustêrk, sîsirk, pêşû, bî, dar û spîndar wekî şanîderên remzî û hêmayî yên demsala havînê hatine diyarkirin. Li gel wan, ajel û riwek di heman demê de wekî temsîla hestên haîkûnûsî jî hatine nîşanîkirin.

39/1.

39/4.

43/1.

Saz-sêtar betal

Pêşûya berdoş

Bayê şerqî tê

Şeva nîvê havînê -

Pest-perîşan, l'nav perrên

Gişên e li spîndaran

Strana sîsirkan

Morana Gerdûnê

Wexera te b'xêr

Têma, remz, metafor û têgihên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajel, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyên *Havînê* de cih girtine weha hatine senifandin:

Tema	Havîn	
	Hêma, Remz, Metafor û Têgih	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Gerdûn û Sirûşt	heyv, çem, çîya, esman, beyar, şevba, dol, zinar, stêr, nîv-heyv, birq, ax, kop, roava, gelî, deşt, deryaçe, şem'a, çilvilîn, hewa, pal, mizewr, erd, esman, aso, bayê şerqî.	37(1,2,3,4), 38(1,2,3,4), 39(3), 40(1,2,3,4), 41(1,2,3,4), 42(2,3,4), 43(1)

Zeman û Mekan	şev-hezîran, şev, çem-çiya, havîna esman, sihar, zevî, tîrmeh, beyar, dol, zinar, şeva nîvê havînê, 'esir, l'nav perrên Morana Gerdûnê, l'ser axa tebaxê, axirê tebaxê, kopên başûr, deşta kizirî, havîna başûr, li ser rûbarê, deryaçe, şevên havînê, spêde, erd-esman, aso, sibe, gelî, şeva Dêrsimê, Gelîyê Xezekya, payîz.	37(1,2,3,4), 38(1,2,4), 39(1,3,4), 40(1,2,3,4), 41(1,3,4), 42(2,3,4), 43(1)
Civak û Mirov	saz-sêtar, şerab, mosîqa, mirovî, Birqên Direxşan, Morana Gerdûnê, nivêja cejnê, şaşika Mela Mezher.	39(1,2,3,4), 42(1)
Lîrîzm û Pathos	hezîn, kubar, peng-rewan, qure, qelb, sukût, bedewî, berdoş, pest-perîşan, bêzar, xemginî, bêdengî, şahî, diltenikî, dilxweşî, telaş.	37(1,2,3,4), 38(4), 39(1,2,3,4), 40(3,4), 41(2,4), 42(2,3), 43(1)
Ajel û Riwek	mar, gustêrk, sîsirk, pêşû.	37(4), 40(1), 38(3), 39(1), 42(3), 39(4)
	bî, dar, spîndar.	40(3), 42(4), 43(1)

2.5.2.4. Payîz

Remz û wateya demsala payîzê di haîkûyan de bi piranî li gor bejêyên ku bi demsalê re pêwendîdar in, hatine amajekirin. Payîz, di hest û ramana haîkûnûsî de xemgînîyek, diltengîyek û herweha tengezarîyeka ontolojîk çê kiriye. Bi rêya îmakirinê ev rewş, di haîkûyên demsalê de bi hêmanên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, ajal û riwekê re hatine xuyakirin.

Rengvedana demsala payîzê di hêmanên gerdûn û sirûştê de bi awayekî diyarker hatîye nimandin. Rûdan, rewş, deng û dîmenên hêmanên gerdûn û xwezayê her yek ji wan wekî şanîderek di haîkûyan de hatine emilandin. Sertem, bi rêya hêmayên resen û li gel şewaza xwe yê *tebyetbîntêr* haîkûyên payîzî yên ku bi gerdûn û sirûştê re têkildar, honandîye. Di heman demê de, hest û pêhesînên xwe yên li hemberî gerdûn û sirûştê jî li ser haîkûyên demsala payîzê veguhezandîye. Ev rewş li gel bikaranîna bêje û têgihên wekî “tavî, berpal, çîya, gewal, esman, ‘ewr, zinar, tav, baran, tebyet, derav, heyv, brûsk, qirî, ba, gewr-‘ewr, dol, deşt, tîrêj, zertav, erd, tîrêj bawîşe, dinya, dorge, mêrg, baran, ax, kanî, aso, pêl” hatîye nîşankirin.

47/1.

Taviya gizîngê

Bi ser berpalên xewar –

Vedizelin çîya

48/3.

Kirr bûn wîtewît

Derava heyama sar

Tebyeta şkestî

50/2.

Bezîne esmanî

Gewr- ‘ewrên ba girtî

Payîzewar şên

Unsûrên zeman û mekanê di vê beşê de gelekî berfireh in. Zeman û yekeyên wî yên wekî dan, meh û heyam li gor demsalê hatine diyarkirin. Ango zeman û yekeyên demê li gor demsala payîzê hatîye sînorkirin. Haîkûnûs, haîkûyên payîzê wekî sêwiranên kêlikî saz kiriye. Li gel şûngehên şênber, mekanên razber yên ku bi hêma û îstiareyan hatine çêkirin, yên wekî “li ser pêlên klarnetê, doşega esman, doşega xalxalokê, kaniya dinê” jî hatine bikaranîn.

Bêjeyên wekî şanîderên zeman û mekanê hatine amajekirin, ev in: “berpal, çîya, esman, spêdeya esmanî, der û ban, şehr, serê zinarên ‘ewran, gom, coxîne, tebyet, derava heyama sor, dem, şev, sibe, rû, li ser pêlên klarnetê, payîz, şeva payîzê, dol, ode, spêde, Sîpan, deşta payîzê, payîza deştê, pêyên payîzê, l’ser lêva rêlên bakur, birchên payîzê, rêlên bakur, daristan, zistan, dêm, erd-çîmen, çaxê çirîyê, çirî, werz, doşega xalxalokê, dan, dinya, danesal, sal, dorge, morîkên payîzê, serban, doşega esman, rixtim, mêrg, çîn û maçîn, Feraşîn, barana payîzê, tendûr, barana çirîyê, zikê axê, kîvara payîzê, biheşt, kaniya dinê, aso, zeman”.

52/1.

Tîrêjên lawaz

L' ser lêva rêlên bakur

birchên payîzê

53/2.

Çaxê çiriyê

Sîber dirêj kêşayî

Tîrêj bawîşe

56/4.

Sîngê zer-mêrg e

Bejna ji çîn û maçîn

Ho Feraşîn

Her çiqaş temayên civak û mirovî kêm hatibin emilandin jî, di vê beşê de haîkûyên civak û mirovî bi demsala payîzê re bi awayekî lihevhatî hatine honandin. Sertem, çanda civakê, kiryar, alav û amûrên civakê û rewşa mirovan, di haîkûyên payîzê de bi rêya rêbaza pevgihanê (torîawase) û bi şewaza xwe yê şayesandinê daye şanîkirin. Herweha haîkûnûs di haîkûyên civak û mirovî de cih daye îmajên resen ên ku li gor demsala payîzê hatî çêkirin. “Şehrîyên xewar, sa’et, çavên Ritayê, klarnêt, sentûr, şelik, govend, şelte, doşeng, gemî, dûyê tendûrê, teşt, melhem, qodî û xwîn” wekî peyvên ku bi haîkûyên civak û mirovî re eleqedar, hatîye bikaranîn.

49/1.

Sîsirka sibê

Li rûyê şehriyên xewar

Sa’eta serhişk

56/2.

Şelteyê spî-pehn

Tewqên serbanê ‘ewran

Doşega esman

57/4.

Melhem e biheşt

Li çavê şeti, dinya

qodiya rojê

Şewqvedana lîrîzm û pathos ê haîkûnûsî di haîkûyên vê demsalê de li gor nîma û wateya payîzê hatine derbirîn. Herweha xasyetên ku aîdî mirovî yên hestî û hestgermîya hebûnî yê haîkûnûsî di haîkûyên payîzîyê de xwe dide xuyakirin. Îmajên biresengiran, di nav yekpareyîya demsala payîzê de hatine çêkirin. Hestên payîzî, di haîkûyan de bi rêya sêwirana kêlîkî hatine pêkanîn û bi vî rengî Sertem hest û dîlzîzîya xwe yê li hemberî demsala payîzê daye pêhesandin û şanîkirin.

“Xewar, vezilîn, bêminetî, nerm-bizav, sone, şad, şkestî, bêtaqet, serhişk, xem, dengê payîzê, şên, şad-hişyar, şaş-şepirze, lawaz, lêv, şeng, şox, kubar, govend, şadrenge, fetisî, bêhna xezanê, bêhna mizê, bêxem, werandin, rût û pût, sax, kerr, tenha, sext, mend, tena, qurnisîn, axa lawaz, melhem, pêla xwînê” di haîkûyên demsala payîzê de wekî bêje û têgihên tema yên ku bi lîrîzm û pathosê re pêwendîdar in, hatine bikaranîn.

48/2.

Sone ser gomê

Şaş û şad li sî-tava

Barana gurgî

52/2.

Bircha şeng î şox

kubara rêlên bakur

Govenda dawî ye

58/2.

Bêhna hebûnê

Ji du asoyên zeman

Yek pêla xwînê

Navên ajal, riwek û herweha hêmanên wan bi giştî di haîkûyan de wekî remz û şanîderên demsala payîzê hatine xuyakirin. Rewş, liv û tevgera ajal û riwekên curbicur di nav xwezayê de û li hemberî demsala payîzê li pêş çavan hatine xistin. Sertem, di heman awayî de di haîkûyan de deng û dîmenên wan ên payîzwer jî, dide pêhesandin û amajekirin. Li gel vê, haîkûnûs bi rêya hunerên edebî yên wekî kesandin û dirûvpêxistinê hest û hestgermîyên xwe yên kêlikî dide nîşankirin.

51/3.

Hecî leglegê

Şaş-şepirze li ber

Payîza deştê

53/4.

Belgên germijî

Şûnpaşerokên rizî

Werzê bêhna miz

54/1.

Gerejûya germ

Doşega xalxalokê

Daneke bêxem

Hêma, remz, metafor û têgihên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajal, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyên Payîzê de cih girtine weha hatine senifandin:

Tema	Payîz	
	Hêma, Remz, Metafor û Têgih	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Gerdûn û Sirûşt	tavî, berpâl, çîya, gewal, esman, ewr, zinar, tav, baran, tebyet, derav, heyv, brûsk, qirrî, ba, gewr-ewr, dol, deşt, tîrêj, zertav, erd, tîrêj bawîşe, dinya, dorge, mêrg, baran, ax, kanî, aso, pêl.	47(1,2,3,4), 48(1,2,3), 49(3,4), 50(1,2,3), 51(1,2,3), 52(1,4), 53(1,2,4), 54(2), 55(3), 56(2,3,4), 57(1,2,3,4), 58(1,2)

Zeman û Mekan	li ser pêlên klarnetê, doşega esman, doşega xalxalokê, kaniya dinê, beral, çiya, esman, spêdeya esmanî, der û ban, şehr, serê zinarên ewran, gom, coxîne, tebyet, derava heyama sor, dem, şev, sibe, rû, li ser pêlên klarnetê, payîz, şeva payîzê, dol, ode, spêde, Sîpan, deşta payîzê, payîza deştê, pêyên payîzê, l'ser lêva rêlên bakur, birchên payîzê, rêlên bakur, daristan, zistan, dêm, erd-çîmen, çaxê çirîyê, çirî, werz, doşega xalxalokê, dan, دنیا, danesal, sal, dorge, morîkên payîzê, serban, doşega esman, rixtim, mêrg, çîn û maçîn, Feraşîn, barana payîzê, tendûr, barana çirîyê, zikê axê, kîvara payîzê, biheşt, kaniya dinê, aso, zeman.	47(1,2,3,4), 48(1,2,3,4), 49(1,2,4), 50(1,2,3,4), 51(1,2,3,4), 52(1,2,3,4), 53(1,2,3,4), 54(1,2,3,4), 55(1,3,4), 56(1,2,3,4), 57(1,2,3,4), 58(1,2)
Civak û Mirov	şehrîyên xewar, sa'et, çavên Ritayê, klarnet, sentûr, şêlik, govend, şelte, doşeng, gemî, dûyê tendûrê, teşt, melhem, qodî, xwîn.	49(1,2,3,4), 52(2), 56(2,3), 57(1,2,4), 58(2)
Lîrîzm û Pathos	xewar, vezilîn, bêminetî, nerm-bizavî, dilgeşî, şad, şkestî, bêtaqet, serhişk, xem, şên, şad-hişyar, şaş-şepirze, lawazî, şeng, şox, kubarî, şadeng, fetisî, xezan, bêxem, werandin, kerrbûn, canzerîbûn,	47(1,2), 48(1,2,3,4), 49(3,4), 50(2,4), 51(2,3), 52(1,2,3), 53(1,3,4), 54(1,2,3), 55(1,3), 56(1,3,4), 57(1,3,4), 58(2)

	tenayî, sext, mend, qurnisîn,	
Ajel û Riwek	sîsirk, mar, qaqilbaz, hecî legleg, xalxalok, qaz, qurîng, morîk, sandûlk, qijalk.	48(4), 49(1), 55(3), 51(1,2,3,4), 54(1), 56(1), 57(1), 58(1)
	pempû, pel, spîndar, gulî, şemamok, dan, rêl, birch, daristan, çewrebî, belg, çîmen, darberû, şûnpaşerok, gerejû, kelûşkên gwîzê, daregwîz, reh, guvîj, kîvar.	48(1), 50(3,4), 52(1,2,3,4), 53(1,3,4), 54(1), 55(1,2,4) 56(1), 57(3)

2.5.2.5. Fêrîkî

Haîkûyên Fêrîkî ku ev beş navê xwe ji navê helbestvanê kurd Fêrîkî Ûsivî wergirtîye, li gor risteyên helbestên wî yên bijartî hatine vesazkirin. Bi gotineka dî, haîkûyên tê de bi rêya hunera îqtîbasê (esas nîv jêgir) teşe girtine. Haîkûnûs, di destpêka beşa haîkûyên *Fêrîkî* de derheqê serûvena lihevanîn û nivîsandina haîkûyan de weha salix dide:

“Ev haîkû di ber xwendin û melheze û têxebitîna helbestên Fêrîkê Ûsiv re pêk hatine. Di zêdetirîya wan de gotin û terkîbên yekser ji rêzeyên helbestekê wergirtî hene, lê di pêkgihandina wan de giyanekê xweser û nisbeten azad ji helbesta jêder hasil bûye, ku jixwe ew e sebebê nezmê û vê bezmê” (2022: 61).

Ji bilî sê haîkûyan (70/3, 74/2, 78/3), di binê her haîkûyên ku ji rêze hatine wergirtin de navê helbesta jêgirtî, hatîye nivîsandin. Bi giştî, haîkûyên Fêrîkî lîrîk û pastoral in û tema û hêmanên gerdûn, sirûşt, demsal, zeman, mekan, civak, mirov, ajel û riwekan li gor van şêwazên helbestî hatine honandin.

Gerdûn û sirûşt di haîkûyên Fêrîkî de li gor hêmanên wan ên wekî “stêrk, heyv, esman, çiya, ba, mij, rûbar” bûne mijar. Nemaze rewş, dîmen û livandina tebyetê bi rengekî têrcan û jîndar hatîye xuyakirin. Şayesandina hêmanên gerdûn û sirûştê bi metafor û îmajên ciyawaz hatine çêkirin. Bi vî awayî haîkûnûs, di haîkûyên

vê beşê de van her du temayan di nav xasyetên wan ên xwezayî de pêş çavan dixe. Bêjeyên “stêrk, pirêz, çîya, heyv, gol, esman, kanîbihar, rûbar, dinya, bayê reş, roj, erd, bayê har, çehl, tebyet, brûsk, beyar, ewr, mij, çîya-çivane, din, bager, gelî, stêr, dol, behr, zinar, tav, şîn-hêşîn, çol, çayîr, şems, ba-bende, ba, hewa, cew” wekî nîşanderên gerdûn û sirûştê hatine emilandin.

70/2.

Tebyet hezar terz

Dide yek, dibe l’dewsê yek

Kevn d’mire bo teze

(Xewna Mîrmih)

71/2.

Def-zirneyê ewran

Mij xêlî l’ bûkê

Maça erd l’ esman

(Daweta Tebyetê)

76/3.

Heyva nivîşkî

Ba-bende razayî kûr

Seyek dizûke

(Heyveron)

Demsal wekî tematîk, li gel bikaranîna her çar demsalan di haîkûyên Fêrîkî de cih girtine. Her çar demsal di haîkûyan de yan rasterast bi navên xwe re hatine amajekirin yan jî bi awayekî nerasterast ango bi bêjeyên şanîderên demsalan hatine îmakirin. Herweha, hestgermîyên haîkûnûsî yên ku li pêşberî her çar demsalan peyda bûne, bi şewazeka lîrîkî di haîkûyan de hatiye pejrandin. Ev pêhesandin, bi piranî bi rêya veguhezîna xasyetên mirovî re dabîn bûye.

“Pirêz, şeva havînê, kanîbihar, dengê gulêd rûnêrm, berf, beng-bihar, bayê reş, bihar, berxvan, dem cenet, gur-diz, bayê har, erd î gewr, miş-piş, heyva payîzê, brûsk, ewr, mij, aşê ava gurr, co, çûkêd perrawaz, ewrê tijî, perd, çile, bihara gelî, refê reşêleyên dengbêj, dolîdang, binefşa bişkiftî, heyra havînê, şiverêyên şîn-hêşîn, mij, kurşe, gula beşer-geş, ba-bende, bayê wehde, sikîsar, ‘ewrê payîzê, gîsko” wekî bejêyên kîgoyê di haîkûyên Fêrîkî de ji bona nîşanîkirina her çar demsalan hatine bikaranîn.

66/3.

Berf jî danî l’ çiya

Beng-bihar niciya, neguldayî

Man çi qas gulêd şa’ir

(Dûman Li Dibûriyan)

75/3.

Heyra havînê -

Şiverêyên şîn-hêşîn

Çolên çayîrî

(Bêriya Havînên Gund)

78/2.

‘Ewrê payîzê

Pistepistek li hewa

Hesreta cenûbê

(Mînanî Bezê)

Temayên zeman û mekanê bi giştî bi hêman, peyv û remzên gerdûn, sirûşt û demsalê re hatine diyarkirin. Zeman, di haîkûyên Fêrîkî de carinan bi bêje û şanîderên her çar demsalan ên wekî “bihar, havîn, ‘ewrê payîzê, çile, kurşe, gîsko”yê re, carinan jî bi danên rojê yên wekî “berbang, sibe, şev”ê re hatîye amajekirin. Herweha, kêlîyên dîmenên gerdûn, xweza û demsalan bi şêwazeka teswîrî û bi awayekî berbiçav, di haîkûyan de şewq daye. Hêmanên temaya mekanê, li gel şûngehên şênber ên wekî “tebyet, Elegez, esman, menzel”, bi metafor û îmajan cihên razber ên wekî “rûbarê dinyayê, li hevrazên hubê” re jî hatîye çêkirin.

Ji xeynî van Sertem, di haîkûyên Fêrîkî de hayjêbûnek, pêhesandinek li ser têgihên zeman û mekanê çê dike. Temayên zeman û mekanê di haîkûyên Fêrîkî de bi rêya bikaranîna hêma, remz û metaforên “pêş çiyê, l’ber binevşê, şeva havînê, l’nav gola esmên, sal, rûbarê dinyayê, Elegez, esman, dinya, çiya, bihar, şev, dem, cenet, siwarê şevê, şev-roj, erd, wextê dagêrê, çehl, l’bin heyva payîzê, tebyet, Qemerdax, beyar, co, dema xatirî, çiya-çivane, din, rûbarê dinê, çile, berbang, gol, ser behrê, zinar, l’bin pêncên tavê, havîn, şiverêyên şîn-hêşîn, çolên çayîrî, ser kurşe, li hevrazên hubê, ser gula beşer-geş, l’ber bayê wehde, Çiyayê Gemî, menzel, odeya kavi, ‘ewrê payîzê, tava li dîwêr, sibe, gîsko”yan re pêk hatine.

66/1.

Elegez, xewna naz
Esman te tasa durr
Şaîr difirîne

(Ji Elegezê Re)

72/1.

Tûmê hijmekar
Co datê bi fûrefûr
Mirin di hembêz

(Li Rex Coyê)

77/1.

L’ber bayê wehde
Hêlekaneke xewnî
Çiyayê Gemî

(Çiyano)

Civak û mirov di haîkûyên Fêrîkî de bi giştî li gor çand, kevneşop, rewş, liv û tevgera kurdan hatîye sêwirandin. Amrazên ku di nav civaka kurdan de hatine emilandin, taybetî û kiryarên mirovan wekî şanîderên temayan di haîkûyan de hatine nîşankirin. Li gel vê, Sertem bi bikaranîna metafor û hêmayên resen re jî xasyetên mirovên ku di haîkûyên Fêrîkî de cih daye, daye diyarkirin. Bêjeyên ku bi temayên civak û mirovan re eleqedar, ev in: “Kurmancî, mêt, per-milyaket, can-cesed, benîya bedew, şaîr, cahilî, mêvan, berxvan, zar, ruh, cenet, siwarê şevê, pîrê olacaxê, pengurî, hêlekan, max, bedewperest, nivîsîn, xwîn-tamar, koç, siwar, dawet, def-

zirne, bûk, aşê avê, co, zarên tîfal, beraş, fikr-mital, dengbêj, dolîdang, kulenk, êlkan, tas, heyva nivîşkî”.

63/3.

Pîrêza pêş çiyê

Gul-perîka Kurmanciyê

Datê b' pûrepûr

(Gul û Perîka Kurmanciyê)

68/2.

Siwarê şevê

Netirsê gur-diz, batirsan

J' pîrê olecaxê

(Nûr Beg)

69/2.

Erd î gewr e

Berê koçê li rêkê

Wextê dagerê

(Bo Zarokan)

Lîrîzm û pathos bi piranî di haîkûyên vê bêşê de ku ji risteyên lîrîk û pastoral ên helbestên Fêrîkî Usîvî re wekî gîredayî, li ser hub (evîn), bêrî û hezkirina demsal û xwezayê hatine sazîkirin. Haîkûrê, hest û hestgermîyên xwe yên cihê yên ku li hemberî hub, mehbûb (xoşewîst), demsal û tebyetê hatine derbirîn, di haîkûyên Fêrîkî de bi uslûbekî xwerû û fesîh dide pêhesandin. Ev pêhesandin û şayesandin, bi emilandina hunerên edebî yên îstîfare, manendina berzî (teşbîha belîx), kesandin, ciwanîya sedemî (husnê te'lîl) û hwd.ê hatine pêkanîn.

Di haîkûyên Fêrîkî de bêjeyên “sîfet terrîcan, ramûsan, dil, hub, nazik, permilyaket, benîya bedew, heyr, hesret, naz, durr, rûnêrm, bêhn-bihîşt, keser, beng-bihar, edilandin, xem, beşerxweş, verêkirin, navno, cenet, lêvên lerizî, batirs, gur-diz, çira şa'îr, xwîn-tamar, bêhnçikî, şa'îr, har-zîz, xewika şêrîn, mirin, teze, dawet, def-zirne, bûk, maç, dilê reben, hambêz, perrawaz, dil, hezar rewş, bar, dilê şa'îrî, dengêj, girîn, huba biharê, heyirîn, hevrazên hubê, gula beşer-geş, razîn, xewnî, sikîsar, xewna kelamê, tebyethez, rihetiya ruh” wekî şanîderên ku bi temayên lîrîzm û pathosê re pêwendîdar, hatine bikaranîn.

63/1.

Sîfet terrîcan

Dilê'm çivîka birçî,

Ka ramûsan?!

(Sîfetê Te)

68/1.

Şev şemal, dem cenet

Lêvên lerizî, l' yên nar

Ma, xewneke xas

(Tu Hub)

76/3.

Li hevrazêd hubê

Ramûsan şiqitîn ser

Gula beşer-geş

(Tu Mitala Min)

Remz, îmaj û metaforên ajel û riwekan, di haîkûyên Fêrîkî de hem wekî şanîderên demsalan û hem jî wekî rengvedana hizr, hest û dilzîzîya haîkûnûsî hatine

bikaranîn. Rewş, dîmen, deng û livandina hêmanên ajel û riwekan bi rêbaza pevgihandinê di haîkûyan de hatine şayesandin. Haîkûnûs, ajel, riwek û herweha hêmanên wan, bi şêwaza îmayî û hêmayî di nav haîkûyên Fêrîkî de daye xuyakirin.

64/2.

Şeva havînê

Heyva sûravêlk e soran

L' nav gola esmên

(Şevêd Havînê)

64/3.

Distrê cew nazik

Siya biyê, per-milyaket

Datê l'can-cesed

(Cew Distrê)

74/1.

Bihara gelî

Refê reşêleyên dengbêj

Giriya roviyê pîr

(Bihar e Şaîr)

Bi gelemperî hêma, remz, metafor û têgihên gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajel, riwek û hêmanên wan ên ku di haîkûyên Fêrîkîyî de cih girtine weha hatine senifandin:

Tema	Fêrîkî	
	Hêma, Remz, Metafor û Têgih	Rûpel û Hejmara Haîkûyan
Gerdûn û Sirûşt	stêrk, heyv, esman, çiya, ba, mij, rûbar, stêrk, pirêz, çîya, heyv, gol, kanîbihar, rûbar, dinya, bayê reş, roj, erd, bayê har, çehl, tebyet, brûsk, beyar, ewr, çîya-çivane, din, bager, gelî, stêr, dol, behr, zinar, tav, şîn-hêşîn, çol, çayîr, şems, ba-bende, ba, hewa, cew.	63(2,3), 64(2,3), 65(2,3), 66(1,2,3), 67(1), 68(3), 69(2,3), 70(1,2,3), 71(1,2), 72(3), 73(1,2,3), 74(1,2,3), 75(1,2,3), 76(1,3), 77(1), 78(2,3), 79(1)
Demsal	Pirêz, şeva havînê, kanîbihar, dengê gulêd rûnêrm, berf, beng-bihar, bayê reş, bihar, berxvan, dem cenet, gur-diz, bayê har, erd î gewr, miş-piş, heyva payîzê, brûsk, ewr, mij, aşê ava gurr, co, çûkêd perrawaz, ewrê tijî, perd,	63(3), 64(2), 65(2), 66(2,3), 67(1,2), 68(1,2), 69(2,3), 70(1), 71(1,2,3), 72(1,2,3), 73(1,3), 74(1,2,3), 75(2,3), 76(1,2,3), 77(1,3), 78(2,3)

	çile, bihara gelî, refê reşêleyên dengbêj, dolîdang, binefşa bişkiftî, heyra havînê, şiverêyên şîn-hêşîn, mij, kurşe, gula beşergeş, ba-bende, bayê wehde, sikîsar, 'ewrê payîzê, gîsko.	
Zeman û Mekan	bihar, havîn, 'ewrê payîzê, çile, kurşe, gîsko, berbang, sibe, şev, tebyet, Elegez, esman, menzel, rûbarê dinyayê, li hevrazên hubê, pêş çiyê, l'ber binevşê, şeva havînê, l'nav gola esmên, sal, rûbarê dinyayê, Elegez, esman, dinya, çiya, bihar, şev, dem, cenet, siwarê şevê, şev-roj, erd, wextê dagêrê, çehl, l'bin heyva payîzê, tebyet, Qemer dax, beyar, co, dema xatirî, çiya-çivane, din, rûbarê dinê, çile, berbang, gol, ser behrê, zinar, l'bin pêncên tavê, havîn, şiverêyên şîn-hêşîn, çolên çayîrî, ser kurşe, li hevrazên hubê, ser gula beşergeş, l'ber bayê wehde, Çiyayê Gemî, menzel, odeya kavi, 'ewrê payîzê, tava li dîwêr, sibe, gîsko.	63(3), 64(1,2), 65(3), 66(1,2,3), 67(2), 68(1,2,3), 69(2,3), 70(1,2,3), 71(1,2,3), 72(1,3), 73(1,2,3), 74(1,2,3), 75(1,2,3), 76(1,2), 77(1,2,3), 78(2,3), 79(1)

Civak û Mirov	Kurmancî, mêr, per-milyaket, can-cesed, benîya bedew, şair, cahilî, mêvan, berxvan, zar, ruh, cenet, siwarê şevê, pîrê olacaxê, pengurî, hêlekan, max, bedewperest, nivîsîn, xwîn-tamar, koç, siwar, dawet, def-zirne, bûk, aşê avê, co, zarên tîfal, beraş, fikr-mital, dengbêj, dolîdang, kulenk, êlkan, tas, heyva nivîşkî.	63(3), 64(1,3), 65(1), 66(1,2,3), 67(2,3), 68(1,2,3), 69(1,2,3), 70(3), 71(1,2,3), 72(1,2,3), 73(2,3), 74(1,2,3), 75(1,2,3), 76(1,3), 77(1,3), 78(1), 79(1)
Lîrîzm û Pathos	sifet terrîcan, ramûsan, dil, hub, nazik, per-milyaket, benîya bedew, heyr, hesret, naz, durr, rûnêrm, bêhn-bihişt, keser, beng-bihar, edilandin, xem, beşerxweş, v erêkirin, navno, cenet, lêvên lerizî, batîrs, gur-diz, çira şa'ir, xwîn-tamar, bêhnçikî, şa'ir, har-zîz, xewika şêrîn, mirin, teze, dawet, def-zirne, bûk, maç, dilê reben, hambêz, perrawaz, dil, hezar rewş, bar, dilê şa'irî, dengêj, girîn, huba biharê, heyirîn, hevrazên hubê, gula beşer-geş, razîn, xewnî, sikîsar, xewna kalamê, tebyethez, rihetiya ruh.	63(1,2), 64(1,3), 65(1,2), 66(1,2,3), 67(1,2,3), 68(1,2,3), 69(1,3), 70(1,2,3), 71(1,2,3), 72(1,2,3), 73(1,2,3), 74(1), 75(1,2,3), 76(2,3), 77(1,3), 78(1,2), 79(1)

Ajel û Riwek	çivîk, sûravêlk, gur, çûk, şêr, perd, pez, rovî, reşêle, se, pisîk.	63(1), 64(2), 68(2), 72(2), 73(1), 73(1), 73(3), 74(1), 74(1), 76(3), 78(3)
	bî, gul, binevş, once, reh, genim, çêre.	63(3), 64(1,3), 65(1), 66(2,3), 67(3), 71(3), 73(3), 75(2), 76(2)

2.6. Berawirdineka Giştî Di Navbera Pênc Berhem û Haîkûnûsan De

Piştî vekolîna her pênc berheman pêkan e ku li gor poetîkaya haîkûyê di navbera her pênc berheman de û herweha di navbera haîkûnûsên wan de nirxandinek, berawirdinek bê çêkirin. Bi vî awayî li gor bikaranîn û nêzîkatîya poetîkaya haîkûyê cudahî û hevparîya haîkûnûs û berheman dê derbikeve holê.

Di her pênc berheman de ji hêla teşeya ristesazkirinê ve kêşa kîteya klasîk go-shichi-go ango 5-7-5 hatîye bikaranîn û ji xeynî berhema *Dengê Pepûkê*, di her çar pirtûkên dîtir de kêşa kîte/hilmên cihêreng ên modern jî haîkû hatine vesazkirin. Her pênc haîkûnûs jî li gor her çar rêbazên sereke (kîgo, kirejî, torîawase û şaseî) yên haîkûyê, haîkûyên xwe rîstandine. Li gel vê, her pênc haîkûrê di haîkûyên xwe de ji bona şanîkirina/derbirîna hest û hestgermîyên xwe, dengbirîn û rawesê cih dane bêjeyên kirejî yên bi kurdî û kirejîyên bi xalbendî. Her pênc haîkûnûs li gor şêwazên xwe yên cihêreng di berhemên xwe de hêmayên resen çê kirine û herweha hunerên edebî yên cihêreng jî bi kar anîne.

Her pênc haîkûnûs jî ji hêla naverok û tematîkê ve derbarê temayên gerdûn, sirûşt, demsal, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajal û riwekan de nimûneyên haîkûyan dane. Bi tenê Kawa Nemir û Sidîq Gorîcan li gor formên haîgayê ango bi şêwaza wênekirinê (xet/îlustrasyon û fotraf) wekî wêne-helbest haîkû nivîsandine/nexşandine. Ji bilî vê, tenê Sidîq Gorîcan terza pexşan-helbesta japonî ya klasîk haîbûnê nivîsandîye. Berken Bereh, Kawa Nemir û Sidîq Gorîcan di dîwanên xwe de cih dane teşe û cureyên helbesta japonî ya klasîk ên wekî haîkûyên rengayî, haîkaî no renga, jiseî û senryûyan.

Her pênc haîkûnûs jî ji xeynî bikaranîna xasyetên helbesta japonî haîkûyê ji kereste, babet, tema, şêwaz û xasyetên zimanê helbestî yên helbesta kurdî xasma jî yên wêjeya gelêrî sûd wergirtine û bi vî rengî teşe û reng dane hin haîkûyên xwe. Bi gelemperî derheqê bikaranîna poetîkaya haîkûyê ji bona her pênc dîwanên haîkûyî û haîkûnûsên wan de berawirdineka giştî û birêkûpêk di nav tabloya jêr de weha hatîye destnîşankirin:

Navê berhem û haîkûnûs	Haiku (B. Bereh)	Morana Gerdûnê (K. Nemir)	Dengê Pepûkê (U. Bîngol)	Gumbil (S. Gorîcan)	Sihren Mizewran (E. Sertem)
Hejmara haîkûyan	491	300	68	301	202
Ziman û Şêwaz	Lîrîk remzî hêmayî guhveçînî sêwirkar	Hêmayî remzî vegêrînî guhveçînî sêwirkar	Vegêrînî guhveçînî remzî hêmayî sêwirkar	Remzî hêmayî guhveçînî lîrîk sêwirkar	Hêmayî remzî lîrîk pastoral sêwirkar
Ji hêla teşeyî ve	Haîkûyên tê de li gor kêşa 5-7-5 û yên têvel hatine vesazkirin. Kirejî û kirejîyên bi xalbendî hatine bikaranîn.	Ji xeynî 10 haîkûyan, hemû haîkûyên dîn li gor kêşa 5-7-5ê hatine vesazkirin. Kirejî û kirejîyên bi xalbendî hatine bikaranîn.	Hemû haîkûyên tê de li gor kêşa 5-7-5ê hatine vesazkirin. Kirejî û kirejîyên bi xalbendî hindik hatine bikaranîn.	Ji xeynî 4 haîkûyan, hemû haîkûyên dîn li gor kêşa 5-7-5ê hatine ristîn. Kirejî û kirejîyên bi xalbendî hatine bikaranîn.	Haîkûyên tê de li gor kêşa 5-7-5 û yên têvel hatine vesazkirin. Kirejî (hindik) û kirejîyên bi xalbendî hatine bikaranîn.

Ji hêla tematîk û naveroke ve	Hêmanên	Hêmanên	Hêmanên	Hêmanên	Hêmanên
	gerdûn	gerdûn	gerdûn	gerdûn	gerdûn
	sirûşt	sirûşt	sirûşt	sirûşt	sirûşt
	demsal	demsal	demsal	demsal	demsal
	zeman	zeman	zeman	zeman	zeman
	mekan	mekan	mekan	mekan	mekan
	civak	civak	civak	civak	civak
	mirov	mirov	mirov	mirov	mirov
	lîrîzm	lîrîzm	lîrîzm	lîrîzm	lîrîzm
	pathos	pathos	pathos	pathos	pathos
	ajel û riwek	ajel û riwek	ajel û riwek	ajel û riwek	ajel û riwek
	hatine	hatine	hatine	hatine	hatine
	bikaranîn.	bikaranîn.	bikaranîn.	bikaranîn.	bikaranîn.
	Haîkûyên	Haîkûyên	Haîkûyên	Haîkûyên	Haîkûyên
	tê de ji	tê de li gor	tê de li gor	tê de li gor	tê de li gor
	xeynî	tu	tu	binenavan	binenavan
	binenava	binenavek	binenavek	hatine	hatine
	“sermest”ê	nehatine	nehatine	dabeşkirin.	dabeşkirin.
	wekî din li	dabeşkirin.	dabeşkirin.	Îlustrasyon	Îlustrasyon
	gor tu	Îlustrasyon	Îlustrasyon	hatîye	tune ye.
	binenavek	hatîye	tune ye.	bikaranîn.	
	nehatine	bikaranîn.		Cureya	
	dabeşkirin.			haîbûnê	
	Îlustrasyon			hatîye	
	tune ye.			bikaranîn.	

ENCAM

Helbesta japonî haîkû, zêdetirî sed sal in bi taybetî jî piştî nîveka sedsala 20an di nav wêjeya cîhanê de cih girtîye, her millet û helbestvanên ku cih dane haîkûyê, li gor xasyet û şêwazên xwe yên edebî, çandî û folklorî haîkû nivîsandine. Helbestvan û haîkûnûsên kurd jî ji salên 2000î pê ve li gel taybetîyên klasîk û modern ên haîkûyê, li gor şêwazên xwe yên poetîk û herweha li gor kirasê teşe û cureyên helbesta gelêrî haîkû honandine, vesaz kirine.

Berken Bereh di *Haikuyê* (2020) de haîkûyên xwe ji bilî kêşa kîte/hilmî ya 5-7-5 û 17 kîteyî ya haîkûyên klasîk, li gor gelek kêşa kîte/hilm ên têvel vesaz kiriye. Bi gotineka dî haîkûnûs, hem teşeya ristesazkirina klasîk û hem jî ya nûjen a haîkûyê emilandîye. Li gel bêjeyên kirejî yên bi kurdî, herweha kirejîyên bi xalbandî jî bi kar anîye. Bereh, her çiqas hêmanên kîgoyê ango bêjeyên şanîderên çar demsal ên haîkûyan di berhemê de bi awayekî birêkûpêk nehatibin senifandin jî, li gor her demsala haîkû ristesaz kiriye. Herweha ji xeynî temayên demsala, bi terza xwe ya lîrîk û empresyonîst haîkûnûs, gerdûn, sirûşt, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajel û riwek wekî hêmanên tematîk ên sereke cih daye di nav haîkûyên xwe de. Bereh, ji xeynî bikaranîna îmajên resen, di heman demê de ji hunerên edebî, sembol û metaforan jî sûd wergirtîye. Haîkûnûs, di hin haîkûyan de yan cihê riste û bêjeyan guhertîye yan jî li şûna hin bêjeyan peyveka dîtir kiriye şûna wan. Bi vî awayî haîkûyeka din ji nû ve ava kiriye û li pey wê haîkûya ewil nivîsandîye û li gel van haîkûyên li pey hev, bi şêwaza helbesta gelêrî ango bi lecîkirinê wekî haîkûyên rengayî ya ku yek ji cureya helbesta klasîk a japonan e, pêk anîye.

Kawa Nemir, di *Morana Gerdûnê* (2017) de ji 300 haîkûyan tev 293yê wê li gor ristesazkirina go-shichi-go ango 5-7-5 û 17 kîteyê nivîsandîye. Bi bikaranîna rêbaza kirejî û herweha bi wê ve têkildar ên bi xalbandîyên curbicur ritm û ahengek daye haîkûyên xwe. Nemir, bi cih dayîna xetan (ilustrasyon) re ku ji forma wêne-helbesta haîkû ya klasîk ango ji şêwaza haîgayî hatîye sûdwegirtin, û li gel bikaranîna rêbaza sketçê haîkûyan sewirandîye. Herweha hin haîkûyên xwe, li gor şêwaza gotegot a ku di wêjeya kurdî ya gelêrî de hatîye emilandin, honandîye. Herçî temayên ku bûne mijarên vekolînê, haîkûnûs bi şêwaze xwe ya îmajîst muhtewayay

haîkûyên xwe nîşan kiriye. Nemir, bi hêmaya “morana gerdûnê” re ji bo “çilkên gerdûna” xwe anga hemû haîkûyên xwe wekî aşopkirinek (imagination), çê kiriye.

Ulku Bîngol, Di *Dengê Pepûkê* (2020) de hemû haîkûyên xwe li gor kêşa kîte ya 5-7-5 hilmî anga sê riste û 17 kîteyê vesaz kiriye. Bîngol, di haîkûyan de rêbaza kirejîyê hindik bi kar anîye û ji xeynî bêhnok û apostrofan di haîkûyan xwe de cih nedaye tu kirejîyên bi xalbendî. Haîkûrê, wekî şanîder û remzeka xwemalî, naskirî “pepûk” û “dengê pepûkê” ku wekî çîrok di nav çand û wêjeya kurdî ya gelêrî de gelekî berbelav e, bi kar anîye. Bîngol, bi giştî di haîkûyan de atmosfera şewaza gînkoyî li haîkûxwînan daye pêhesandin. Bi gotineka dî, ew di haîkûyên xwe de wekî haîjînekî gerok, çîrokbêjeka ku her tim di rê de ye, tev gerîyaye. Bi vî rengî, bi şewaza xwe ya vegêrînî di haîkûyan de cih daye temayên ku amaje pêhatine kirin.

Sidîq Gorîcan, di *Gumbilê* (2022) de hema hema hemû haîkûyên xwe li gor xwendin û bilêvkirina kêşa kîte ya 5-7-5 hilmî rîstandîye. Haîkûnûs, di honandin û ristesazkirina haîkûyan de cih daye bêjeyên kirejîyê û kirejîyên bi xalbendîyan. Di gelek haîkûyan de da ku xwendina bideng a birîtm û biaheng, bilêvkirina zimanê rojane û herweha li gor kêşa 5-7-5ê çê bibe, îşareta apostrofê emilandîye û di hin bêjeyan de kîte xistîye. Gorîcan ji bona hin haîkûyên xwe wekî şewaza haîgayî ya modern, îlustrasyon bi kar anîye û di heman demê de cih daye hin fotrafên cihêreng ên ku ji hêla haîkûnûsî ve hatine kişandin. Gorîcanî, berhema xwe ji hêla naverokê ve wekî sê beş anga *gupik bi gupik haîkû*, *çîrok bi çîrok haîkû* û *nav bi nav haîkû* dabeş kiriye û îlustrasyon û fotrafan jî li gor haîkûyên dîyarkirî di nav van her sê beşan de rareşandîye.

Haîkûnûs, peyvên *gumbil* û *gupikê* ji bona haîkûyên xwe wekî metaforeka haîkûyî bijartîye, di çîrok bi çîrok haîkûyan de cih daye forma klasîk a japonî pexşan-helbest anga haîbûnê û beşa di nav bi nav haîkûyan de li gor her sernavan haîkûyek honandîye. Haîkûrê, ji xeynî bikaranîna helbesta klasîk a japonî haîkûyê, di heman demê de cih daye cureyên din ên helbesta japonî yê wekî senryû, haîkaî no renga, jiseî û haîkûyên rengayî. Li gel van, Gorîcanî bi şewaza xwe ya guhveçînî, tîltî, şanîkirin û nexşandîne û herwisa li gel zimanê xwe yê xwerû, zelal û xwezayî haîkûyên xwe yê ku bi temayên gerdûn, sirûşt, demsal, zeman, mekan, civak, mirov, lîrîzm, pathos, ajel û riwekan re têkildar, vesaz kiriye.

Dîwana haîkûyî ya dawîn a ku bûye mijara vekolîna me, di *Sîhrê Mizewranê* (2022) de Ergîn Sertem haîkûyên xwe di binenavê *Zivistan, Bihar, Havîn, Payîz û Fêrîkî* de wekî pênc beş dabeş kiriye. Sertem, haîkûyên tê de bi latînî û erebî wekî du alfabe û bi kurmancî û bi soranî wekî du zaravayên kurdî nivîsandîye. Haîkûrês, ji hêla ristesazkirin û kitesazkirinê ve her çi qas kêşa kîte/hilmî yên cihêreng bi kar anî be jî piranîya haîkûyên xwe li gor hakûya 5-7-5 û 17 kîteyê vesaz kiriye. Di gel pir hindik bikaranîna bêjeyên kirejîyê, zehf cih daye xalbendîyên curbicur ên kirejîyê. Sertem, wekî ku ji her çar beşên pêşî diyar dibe, bi rêya rêbaza kîgoyê piranîya haîkûyên xwe di nav her çar demsalan ristesaz kiriye. Li gel vê, haîkûyên Fêrîkî bi awayekî lîrîk û pastoral li gor risteyên helbestên helbestvanê kurd Fêrîkî Usîvî bi emilandina hunera edebî ya nîv jêgirê (nîv îqtîbas) honandîye. Haîkûnûs, di haîkûyên xwe yên demsalî de wekî bejêyên şanîderên her çar demsalan gelek peyvên resen bi kar anîye û herweha ji navê berhema xwe jî amaje kiriye ku bi şêwaza xwe yê hêmayî di nav haîkûyên tematîk de cih daye gelek hêmayên resen.

Me di vê xebatê de, bi hûrgilî dupat kir ku poetîkaya haîkûyê, bi pêkhatayên wê yên wekî erdnigarî, dîrok, civak, çand, dîn, bawerî, ziman, nivîs û wêjeya gelê japon re bi awayekî kolektîf û formatîf çê bûye û poetîkaya haîkûyê li gel vê bêjara yekpareyîya xwe ve di nav helbesta kurdî de reng vedaye. Li gel vê, me tespît kir ku di nav haîkûrêsen kurd de yekem kesê ku haîkû bi kurdî (kurmancî) nivîsandîye, helbestvan Berken Bereh e. Bereh, di sala 2006an de di nav berhema xwe yê bi navê *Pandomîmê* de bi binenavê “hayko”yê cih daye helbesta japonî haîkûyê. Bi vî awayî ev cure di nav helbesta kurdî (kurmancî) de cih girtîye û qewareya nivîsandina haîkûyên kurdî ji wê salê pê de ji aliyê gelek helbestvanên kurd ve her ku çûye zêdetir, pirreng û pirdeng bûye.

Di vê xebata xwe de, me vekolîna xwe li gor poetîkaya haîkûyê, derheqê pênc berhemên haîkûyî yên bi kurdî (kurmancî) de ji hêla teşe û tematîk ve destnîşan kir. Berî vekolîna berhemên, ji ber şibandina helbesta haîkûyê me bi kurtasî behsa cureya gelêrî helbesta sêxiştîyê kir. Herweha me geşedana dîrokî ya haîkûyê di nav helbesta kurdî (kurmancî) de bi awayekî kronolojîk destnîşan kir. Li gel van, ji bo analîza xwe me wekî teorîk geşedana dîrokî ya têgiha poetîkayê di wêjeya cîhanê de, bandora xasyetên helbesta japonî li ser poetîkaya haîkûyê, geşbûn û belavbûna

haîkûyê di wêjeya cîhanê de, jêderkên haîkûyê û xasyetên poetîkaya haîkûyê dîyar kirin. Herweha da ku cudahî û hevparîyên her pênc berhem û haîkûnûsên wan bi awayekî berbiçav bîr dîyarkirin me berawirdineka giştî di navbera berhem û haîkûnûsan de çê kir. Bi vî awayî ji ber ku di warê wêjeya kurdî de derheqê rengvedana poetîkaya haîkûyê li ser haîkûnûs û haîkûyên kurdî (kurmancî) de xebateka berfireh nehatibû kirin, teza me armanc kir ku pirs û kêşeyên derbarê wan mijaran de ji holê rake. Ji xeynî van di encama xebata me de pêwîstîyek berbiçav dîyar bû ku divê ferhengê termî û tîgîhî ji bo haîkûyên kurdî çê bibe.

Ev xebat, ji bo lêkolînên li ser xebatên haîkûnûsên kurd, berhemên wan û di heman demê de ji bona xebatên li ser poetîkaya haîkûyê, semantîka çandî, wêjeya berawirdî dê bibe nimûneyek. Herweha lêkolîner dê jê sîd werbigirin û pêkan e ku di siberojê de ji bo xebatên nû yê ku derheqê van mijaran de lêkolîneran dê teşwîq ji bike.

JÊDER

- Akalın, Sami L. (1962). *Japon Şiiri Tarih ve Antolojî*. İstanbul: Varlık Yayınları.
<https://www.scribd.com/document/353777850/Japon-%C5%9Eiiri-Tarihi-Ve-Antolojisi> (d.x.: 17.02.2025).
- Akhan, N., & Ardalı Büyükarman, D. (2021). “*Haiku Estetiği ve Oruç Aruoba’nın Haikuları Üzerine Yapısal Bir Deneme*”. *Folklor/Edebiyat*, Jimar: 108 r. 1127-1138.
- Akman, K. (2013). “*Buşido: Japon Samuraylarının Felsefesi*”. *Yalova Sosyal Bilimler Dergisi*, Jimar: 1 r. 132-150.
- Aktan, İ. (2025). *Karihōmen Japonya’da Kürt Olmak*. (ç. 2.). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Alan, R. (2019). *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*. (ç. 2.). Stenbol: Weşanên Peywend.
- Anesaki, M. (2023). *Japon Mitolojisi Efsaneler, Ölümsüzler ve Gelenekler*. (ç. 3.). (wer.: C. C. Tarımcıoğlu). İstanbul: Maya Kitap.
- Aristoteles. (2020). *Poetika*. (ç. 4.). (wer.: F. Akderin). İstanbul: Say Yayınları.
- Aruoba, O. (2020). *Başo Kelebek Düşleri*. (ç. 3.). İstanbul: Metis Yayınları.
- Aydın F. (2013). *Yaşayan Dünya Dinleri*. (ç. 3.). Eskişehir: Anadolu Üniversitesi.
- Aytemür, E. (2021). *Sinema Ve Şiirin Kesişiminde Yeni Bir Anlatı Biçimi Olarak “Haiku - Kısa Film”: Scream For Ice*. Sanatta Yeterlik Tezi (Teza çapnebûyî). İstanbul Maltepe Üniversitesi, Lisansüstü Eğitim Enstitüsü. İstanbul.
- Barthes, R. (2018). *Romanın Hazırlanışı 1*. (ç. 3.). (wer.: S. Rifat, M. Rifat). İstanbul: Sel Yayıncılık.
- Barthes, R. (2023). *Göstergeler İmparatorluğu*. (ç. 6.). (wer.: T. Yücel). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

- Başô, M. (2021). *Kuzeye Giden İnce Yol*. (wer.: C. Yerli). İstanbul: Kırmızı Kedi Yayınevi.
- Bayburtlu, Çimen. (2018). “*Kimono ve Batı Modasına Etkisi*”. Uluslararası Disiplinlerarası Ve Kültürlerarası Sanat, Jimar: 5 r. 55-81.
- Beichman, J. “*Masaoka Shiki: His Life and Works*”. The Haiku Foundation Digital Library, accessed March 17, 2025.
<https://www.thehaikufoundation.org/omeka/items/show/2573>.
- Bereh, B. (2006). *Pandomîm*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Bereh, B. (2011). *Dilê Min Palgeh E Ji Işqê Re*. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Bereh, B. (2017). *Haîkû*. Nûbihar. Jimar: 141. r. 4-5.
- Bereh, B. (2020). *Haiku*. (ç. 2.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Bîngol, U. (2020). *Dengê Pepûkê Haîkûyên Îlona Nû*. İzmir: Weşanên Na.
- Blyth, R. H. “*Haiku - Volume I*”. The Haiku Foundation Digital Library. accessed March 17, 2025. <https://thehaikufoundation.org/omeka/items/show/220>.
- Borges, J. L. (2022). *Atlas*. (ç. 3.). (wer.: E. İmre). İstanbul: Can Yayınları.
- Cançat, A. (2023). “*Asya resim sanatında mürekkep tekniklerine dair bir seçki*”. Kayseri Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Jimar: 1 r. 1-14.
- Celîl, C., Şadkam, G. (2021). *Sêxiştîyên Kurmancî Xorasan*. (ç. 2.). Diyarbakır: Weşanên Wardozê.
- Clements, J. (2023). *Kısa Japonya Tarihi*. (wer.: A. C. Ay). İstanbul: Kronik Kitap.
- Cluzeau, F. (2013). “*Platon ’un Ruh Kuramı ’nda Pathos*”. Cedrus, 1. 65-87.
- Çelikaş, S., & Ertekin, M. Z. (2024). “*Dahûrîna Wergera Kurdî ya Heft Haîkûyên Jack Kerouac li dor Modela Analîza Werger-Navend a Christiane Nordê*”. Kurdiyat, Jimar: 10 r. 7-24.

- Davis, H. F. (2022). *Japon Mitleri ve Efsaneleri*. (wer.: C. C. Tarımcıoğlu). İstanbul: Maya Kitap.
- Demir, F., (2013). “*Aristoteles'in, Novalis'in ve Todorov'un Metinleri Bağlamında Poetikanın Tarihsel Gelişimi*”. The Journal of Academic Social Sciences Studies, Jimar: 1 r. 433-453.
- Dîjle, R. (2017). *Kêsek*. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Diljên, R. (2023). *Deftera Qetayî*. Stenbol: Weşanên Sor.
- Esen, E. (2019). *Kadim Japon Şiiri Man'yōshū*. Ankara: Gece Akademi.
- Fromm, E. (2023). *Psikanaliz ve Zen-Budizm*. (ç. 3.). (wer.: N. Soysal). İstanbul: Say Yayınları.
- Gorîcan, S. (2017). *Deh Haîkû*. Nûbihar. Jimar: 141. r. 19.
- Gorîcan, S. (2018). *Panzdeh Haîkûyên Xalî*. Nûbihar. Jimar: 143. r. 71.
- Gorîcan, S. (2019). *Deh Haîkûyên Êşzê*. Nûbihar. Jimar: 146. r. 51.
- Gorîcan, S. (2020). *Haîkû*. (xêz: Zozan Orak). Nûbihar. Jimar: 150. r. 53.
- Gorîcan, S. (2022). *Gumbil Gupik bi Gupik Haîkû*. Diyarbakır: Weşanên Dara.
- Gorîcan, S. (2022). *Heft Haîkûyên Heftane*. Nûbihar. Jimar: 161. r. 59.
- Gorîcan, S. (2022). *Şeş Haîkû*. Bar Helbest. Jimar: 5. r. 56.
- Gorîcan, S. (2024). *Şeş Haîkû*. Bar Helbest. Jimar: 7. r. 84.
- Gorîcan, S. (2024). *Şeş Haîkûyên Nîsanê*. Bar Helbest. Jimar: 8. r. 39.
- Gorîcan, S. *Gûstêrkên Veşarî*. (berhema çapnebûyî).
- Gurdilî. A. (2021). *Ferhenga Felsefeyê*. Îzmîr: Weşanên Na.

- Güç, Ahmet. (2001). “*Konfüçyüs Ve Konfüçyüsçülük*”. Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Jimar 2 r. 43-65.
- Güngören, İ. (2020). *Zen Budizm Bir Yaşama Sanatı*. (ç. 8.). İstanbul: Yol Yayıncılık.
- Gür, A. & Koçakoğlu, B. (2009). “*Yeni Türk Edebiyatında Kaynak Olarak Poetika*”. Journal of Turkish Studies, Jimar: 4 r. 79-187.
- Hakutani, Y. (2006). *Cross-Cultural Visions in African American Modernism: from Spatial Narrative to Jazz Haiku*. The Ohio State University Press. Columbus.
- Hakutani, Y. (2009). *Haiku and Modernist Poetics*. Palgrave-Macmillan, New York.
- Hakutani, Y. (2020). *American Haiku, Eastern Philosophies, and Modernist Poetics*. Lexington Books, Lanham.
- Hane, M. (2023). *Kısa Japonya Tarihi*. (ç. 2.). (wer.: Ş. Alpagut). İstanbul: Say Yayınları.
- Henderson, Harold G. (1990). *Haiku in English*. Charles E. Tuttle Company, Rutland, Vermont & Tokyo, Japan.
- Işık, Y. A. M. Ç. Y. . (2003). “*Budizm*”. Necmettin Erbakan Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Jimar: 16 r. 169-181.
- Karaca, A. (2013). *İkinci Yeni Poetikası*. (ç. 3.). Hece Yayınları: Ankara.
- Karatani, K. (2021). *Derinliğin Keşfi Modern Japon Edebiyatının Kökenleri*. (ç. 2.). (wer.: D. Çetin Güven, İ. Öner). İstanbul: Metis Yayınları.
- Karatani, K. (2021). *Tarih ve Tekerrür*. (ç. 2.). (amd.: S. M. Lippit, wer.: E. Ünal). İstanbul: Metis Yayınları.
- Keene D. (d.t.). “*Japanese Literature*”. <https://www.britannica.com/art/Japanese-literature/Origins> (d.x.: 15.01.2025).

- Kerouac, J. (2022). *Heft Haîkûyên Payîzê*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 1. r. 38.
- Kerouac, J. (2024). *Heft Haîkû*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 6. r. 22.
- Kerouac, J. (2024). *Şeş Haîkû*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 7. r. 43.
- Koç, K. (2020). “*ÜLKE TANITIMI JAPONYA*”. *Asya Araştırmaları Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi*, Jimar: 1 r. 125-134.
- Meyer, M.W. (2022). *Japonya Tarihi*. (wer.: Lizet Deadato). İstanbul: İnkılâp Kitabevi.
- Nemir, K. (2017). *Morana Gerdûnê Bayê Labûte*. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Nemir, K. (2019). *Soneyên Sewdaser*. Stembol: Weşanên Avesta.
- Nemir, K. (2021). *Peyvên Biçûk*. Stembol: Weşanên Avesta.
- Ocek, N. (2022). *Dîn û Mîtolojî*. (ç. 2.). Wan: Weşanên Sîtav.
- Oguz, M. (2018). *Haîkûyên Çar Demsalan*. Nûbihar. Jimar: 142. r. 51.
- Oguz, M. (2024). *Lîrîka Berbangê*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Özhan, Günhan. (2016). *Japon Şiiri (Haiku) ve Noo Tiyatrosu*. Ankara: Hitabevi Yayınları.
- Özkan, C., Gündüz, Ş. (ed.). (2021). *Dünya Dinleri*. (ç. 5.). İstanbul: MinelNihal Yayınları.
- Sanchez, S. (2021). *Şiir Şarkı Haiku (Seçilmiş şiirler)*. (wer.: E. Oğuz, E. Nevzat). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Sertem, E. (2022). *Sihren Mizewran*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Stewart, H. (2018). *Neh Haîkûyên Zivistanê*. (wer.: Gorîcan S.). Nûbihar. Jimar: 142. r. 35.

- Stewart, H. (2022). *Heft Haîkû*. (wer.: Gorîcan S.). Bar Helbest. Jimar: 6. r. 21.
- Stewart, H. (2022). *Pênc Haîkûyên Biharê*. (wer.: Gorîcan S.), Nûbihar. Jimar: 160. r. 39.
- Stewart, H. (2023). *Heft Haîkûyên Zivistanê*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 2. r. 33.
- Stewart, H. (2023). *Heft Haîkûyên Zivistanê*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 3. r. 13.
- Stewart, H. (2024). *Ji Haîkûnûsên Japonî Demsal Bi Demsal Haîkû*. (wer.: Gorîcan S.). İstanbul: Nûbihar.
- Stewart, H. (2024). *Heft Haîkûyên Havînê*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 5. r. 33.
- Stewart, H. (2024). *Heft Haîkûyên Havînê*. (wer.: Gorîcan S.). LEWerger. Jimar: 5. r. 33.
- Suzuki, D. T. (1949). *An Introduction to Zen Buddhism*. Internet Archive, accessed March 10, 2025. The Philosophical Library. New York.
- Suzuki, D. T. (2017). *Zen ve Haiku*. (Amd.: û wer.: A. C. Bûker). İstanbul: Okyanus Yayıncılık.
- Suzuki, D. T. (2021). *Zen Budizm*. (ber. û wer.: İ. Güngören). İstanbul: Yol Yayıncılık.
- Suzuki, İ. (2011). *Ahmet Hâşim'in Şiirlerinde Japon Haiku Estetiğinin Tesirleri*. Yüksek Lisans Tezi (Teza çapnebûyî). Marmara Üniversitesi, Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü. İstanbul.
- Şemdinoglu Z. (2025). *Çend Haîkuyên Biharîn*. Nûbihar. Jimar: 171. r. 48.
- Şenavcu, Halil İ. (2016). *"Tarihsel Süreç İçerisinde Japon Budizmi: Genel Bir Bakış"*. Türkiye Din Eğitimi Araştırmaları Dergisi, Jimar: 1 r. 45-64.

- Şenavcu, Halil İ. (2022). “Şintoizm’deki Tanrı İnancının Japon Sosyal Yaşamına Etkisi”. Eskiye, Jimar : 46 r. 73-88.
- Şenavcu, Halil İ., Gündüz, Ş. (ed.). (2021). *Dünya Dinleri*. (ç. 5.). İstanbul: MinelNihal Yayınları.
- Tekmen, A. N. (2010). “Japon şiiri haiku ve Türk Edebiyatındaki yansıması”. *Türkoloji Dergisi*, Sayı: 1 r. 149-157.
- Temo, S. (2019). *Horasan Kürtleri*. (ç. 3.). İstanbul: Alfa Yayınları.
- Temo, S. (2020). *Sê Deng*. (ç. 4.). Amed: Weşanên Dara.
- Todorov T. (2024). *Poetikaya Giriş*. (ç. 5.). (wer.: Şahin, K.). İstanbul: Metis Yayınları.
- Türkdoğan, M. G. (2012). “Mesnevilerde Poetika”. *Dede Korkut Türk Dili Ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi*, Jimar: 2 r. 179-188.
- URL 1. (2004). <https://commons.wikimedia.org/wiki/File:JomonPottery.JPG> (d.x.: 28.11.2024).
- URL 2. (2022). https://commons.wikimedia.org/wiki/File:NintokuTomb_Aerial_photograph_2007.jpg (d.x.: 04.12.2024).
- URL 3. (2020). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=451411> (d.x.: 08.12.2024).
- URL 4. (2019). <https://www.worldhistory.org/image/11015/exterior-of-a-traditional-japanese-house/> (d.x.: 09.12.2024).
- URL 5. (2008). <https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Sorakuen14st3200.jpg> (d.x.: 12.12.2024).
- URL 6. (2017). <https://www.pelinerem.com/chado/> (d.x.: 10.12.2024).

- URL 7. (2004). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=35322> (d.x.: 18.12.2024).
- URL 8. (2019). [https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Tatsumiyagura, Tokyo Imperial Palace \(52158185625\).jpg](https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Tatsumiyagura,_Tokyo_Imperial_Palace_(52158185625).jpg) (d.x.: 19.12.2024).
- URL 9. (2016). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=108182> (d.x.: 11.12.2024).
- URL 10. (2015). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=1338436> (d.x.: 09.12.2024).
- URL 11. (2016). [https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/a/ac/Motonobu Vier Jahreszeitenlinks.jpg](https://upload.wikimedia.org/wikipedia/commons/a/ac/Motonobu_Vier_Jahreszeitenlinks.jpg) (d.x.: 16.12.2024).
- URL 12. (2017). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=5576388> (d.x.: 15.12.2024).
- URL 13. (2011). [https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Basho by Hokusai-small.jpg](https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Basho_by_Hokusai-small.jpg) (d.x.: 26.12.2024).
- URL 14. (2011). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=13954616> (d.x.: 05.04.2025).
- URL 15. (2022). https://x.com/harf_olarak/status/1493701222532100100?lang=ar (d.x.: 30.12.2024).
- URL 16. (2007). <https://commons.wikimedia.org/w/index.php?curid=2097778> (d.x.: 07.04.2025).
- URL 17. (2023). “Nîvdestpêkek bo haîkûya kurdî”. <https://botantimes.com/nivdestpekek-bo-haikuya-kurdi/> (d.x.: 12.04.2025).
- Verhart, M. “*Haiku in the Netherlands and Flanders*”. The Haiku Foundation Digital Library, accessed April 03, 2025.

Watts, A. (2020). *Taoculuk, Zen ve Batı Kùltürü*. (ç. 3.). (ber.: û wer.: İ. Güngören). İstanbul: Yol Yayıncılık.

Watts, A. (2022). *Zen Yolu*. (wer.: N. Erdoğan). İstanbul: Sola Unitas.

Yasuda, K. (2011). *The Japanese Haiku*. Tuttle Publishing Boston & Tokyo.

Yeşilçayır, C. (2020). “Şiirin Yeryüzüne İniş: Poetika”. *Ay Vakti, Jimar*: 188 r. 13-15.



ÖZGEÇMİŞ

KİŞİSEL BİLGİLER

Soyadı ve adı : Mazlum SABAZ

Uyruk: T.C.

Doğum tarihi ve yeri:

Telefon:

Fak:

E-mail:

Eğitim:

- Lisans: Dicle Üniversitesi, Eğitim Fakültesi, Ortaöğretim Sosyal Alanlar Eğitimi, Türk Dili Ve Edebiyatı Öğretmenliği, (5 Yıllık), 2016.
- Yüksek Lisans: Dicle Üniversitesi, Eğitim Fakültesi, Ortaöğretim Sosyal Alanlar Eğitimi, Türk Dili Ve Edebiyatı Öğretmenliği, (TEZSİZ), 2016.

İş Deneyimi :

Yıl

Yer

Görev

Yabancı Dil : İngilizce (B1)



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu

Öğrenci Bilgileri	
Adı-Soyadı	Mazlum Sabaz
Öğrenci No	22950001002
Anabilim Dalı	Kürt Dili ve Kültürü
Programı	Tezli Yüksek Lisans
Statüsü	☒ Yüksek Lisans ☐ Doktora

Tez Bilgileri	
Başlığı/Konusu	POETİKAYA HAİKÜYÊ DI HELBESTA KURDÎ (KURMANCÎ) DE
Tez Orijinallik Raporu Bilgileri*	
Sayfa Sayısı (Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümleri)	224
İntihal Tespit Programı	Turnit in
Benzerlik Oranı (%)	%02
Tarih	17.05.2025

* Orijinallik raporu, aşağıdaki filtreler kullanılarak oluşturulmuştur:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimizi ve yukarıda vermiş olduğumuz bilgilerin doğru olduğunu beyan ederiz.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

Danışman		Öğrenci
Adı Soyadı	Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş	Mazlum Sabaz
İmza		
		Tarih 18.05.2025